



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

**MERSÎYE DI EDEBIYATA KURDÎYA KURMANCÎ YA
KLASÎK DE**

Cihan TURAN

171306208

Teza Doktorayê

Şewirmendê Tezê

Prof. Dr. Nusrettin BOLELLÎ

BÎNGOL - 2023



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KLASİK KÜRT EDEBİYATININ KURMANCİ LEHÇESİN DE
MERSİYE

Cihan TURAN

171306208

Doktora Tezi

Tez Danışmanı

Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ

BİNGÖL-2023

NAVEROK

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	V
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ	VI
KURTE	VII
ÖZET	VIII
ABSTRACT.....	IX
PÊŞGOTIN	X
LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN	XIV
KURTEBÊJE	XVIII
DESTPÊK	1
A-METODOLOJÎ	1
1.Mijar.....	1
2.Girîngî û Armanca Mijarê.....	1
3.Rêbaz	3
4.Sînor û Çarçoveya Tezê	4
5.Astengî û Zehmetiyên Tezê	5
6.Hîpoteza Tezê û Pirsên Wê.....	6
7.Çavkanîyên Tezê.....	7
B.MERSÎYE Û PÊŞVEÇÛNA WÊ YA DI EDEBIYATA ROJHILAT DE.....	9
1.Mersîye di Edebiyata ‘Erebî de.....	14
2. Mersîye di Edebiyata Farisî de.....	17
3.Mersîye di Edebiyata Tirkî de.....	21
BEŞA YEKEM	26
DESTPÊK Û PÊŞVEÇÛNA KEVNEŞOPÎYA MERSÎYÊYÊ DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE.....	26
1. Şîn û Şîngirtin di Nav Civaka Kurdan de	28
2.Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Goranî, Soranî û Zazakî ya Klasîk De	31
3.Destpêk û Pêşveçûna Kevneşopîya Mersîyeyê di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de.....	42
3.1.Mersîyenûsên ku di Sedsala XVI û XVIIem de Jiyane.....	42
3.2.Mersîyenûsên ku di Sedsala XVII û XVIIIem de Jiyane	45
3.3. Mersîyenûsên ku di Sedsala XVIIIem de Jiyane	48
3.4. Mersîyenûsên ku di Sedsala XVIII û XIXem de Jiyane	49
3.5. Mersîyenûsên ku di Sedsala XIXem de Jiyane	50
3.6. Mersîyenûsên ku di Sedsala XIX û XXem de Jiyane	51

3.7. Mersîyenûsên ku di Sedsala XXem de Jiyane	55
3.8. Mersîyenûsên ku di Sedsala XX û XXIem de Jiyane	57
3.9. Mersîyenûsên ku di Sedsalên XIX û XXIem de Jiyane	59
BEŞA DUYEM.....	64
VÊKOLÎNA MERSÎYEYAN JI ALIYÊ RUXSARÎ VE	64
1. Teşeyên Nezmê	64
1.1. Qesîde	65
1.2. Xezel	70
1.3. Mesnewî.....	72
1.4. Murebbe‘	75
1.5. Muxemmes.....	79
1.6. Muselles	82
1.7. Museddes	85
1.8. Terkîbbend	87
1.9. Tercî‘ bend.....	98
2. Wezn	104
2.1. Îmale	107
2.2. Med	107
2.3. Zihaf.....	108
2.4. Wesl	109
3. Serwa	109
3.1. Li Gorî Cih Cureyên Serwayê.....	111
3.1.1. Serwaya Bêpaşserwa.....	111
3.1.2. Serwaya Bipaşserwa	113
3.2. Li Gorî Hevbeşîya Denga Cureyên Serwayê	115
3.2.1. Serwaya Mucerrred	116
3.2.2. Serwaya Muqeyyed.....	117
3.2.3. Serwaya Murdef.....	118
4. Paşserwa(Redîf)	120
4.1. Paşserwayên Qertafi.....	121
4.2. Paşserwaya ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne	124
4.3. Paşserwaya ku di Halê Bêje an ji Kombêjeyan de ne	126
BEŞA SÊYEMÎN.....	133
HÛNERÊN EDEBÎ DI MERSÎYEYÊN KURDÎ DE	133
1-Hûnerên Edebî yên bi Mecazê re Têkildar	134
1.1. Teşbîh.....	134

1.2.Îstiare.....	136
1.3. Kînaye.....	138
1.4.Mecaza Mursel.....	140
1.5. Întaq/Teşxîs.....	142
2.Hûnerên Edebî yên bi Wateyê re Têkildar.....	144
2.1.Tenasûb.....	144
2.2. Telmîh.....	146
2.3. Mubalexe.....	148
2.4.Tezad.....	150
2.5.Tekrîr.....	152
2.6.Nîda.....	153
2.7. Îstîfham.....	156
2.8. Tecahula ‘Arîf.....	157
2.9. Îqtîbas.....	158
BEŞA ÇAREMÎN.....	160
BEŞÊN MERSÎYEYÊN KLASÎK.....	160
1. Mirin.....	161
2. Şîn-Girîn.....	165
3. Pesindayîn.....	171
4. Sîtema ji Felekê re.....	175
5. Dinya-Axiret.....	178
6. Sebir.....	180
7. Di ‘a-Temennî.....	182
BEŞA PÊNCÊMÎN.....	187
KESÊN KU MERSÎYE LI SER WAN HATINE NIVÎSÎN.....	187
A-MERSÎYEYÊN KU LI SER ŞEXSAN HATINE NIVÎSÎN.....	187
1.Ên ku li ser Mîr û Axayan Hatine Nivîsîn.....	187
1.1. Mîr.....	187
1.2. Axa.....	195
2. Ên ku li ser Pêşewa û Rêberên Kurdan Hatine Nivîsîn.....	200
2.1. Şêx Se‘îd.....	200
2.2. Se‘îdê Kurdî.....	203
2.3. Mele Mistefa Barzanî.....	208
3. Ên ku li ser Şêx-Seyda-Seyîdan Hatine Nivîsîn.....	217
3.1. Şêx.....	217
3.2. Mela.....	229

3.3. Seyîd	232
4. Ên ku li ser Hz. Huseyîn Hatine Nivîsîn.....	237
5- Ên ku li ser Endamên Malbatê Hatine Nivîsîn	245
5.1. Bav	246
5.2. Law	249
5.3. Qîz.....	255
5.4. Hevser	257
5.5. Bira.....	269
5.6. Kurap.....	273
5.7. Kalik.....	276
6. Ên ku li ser Hunermendan hatine nivîsîn	282
7. Ên ku li ser Siyasetmedaran Hatine Nivîsîn.....	286
8.Ên ku li ser Dost û Hevalan Hatine Nivîsîn	290
9. Ên ku li ser Helbestvan û Rewşenbîran Hatine Nivîsîn	293
10.Ên ku li ser Hz. Muhemmed Hatine Nivîsîn.....	296
11. Ên ku ji teref Şa'iran ve Berî Mirina xwe li ser xwe Hatine Nivîsîn	300
12.Ên ku Nediya in li ser kî Hatine Nivîsîn.....	305
B-MERSÎYEYÊN KU LI SER WELAT, BAJAR, DÎN Û MIRINÊ HATINE NIVÎSÎN...	310
1.Welat	313
2.Bajar	318
3.Dîn	321
4.Mirin	324
ENCAM	330
ÇAVKANÎ	335
PÊVEK:.....	351

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

22/05/ 2023

Cihan Turan

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Cihan TURAN tarafından hazırlanan **Mersîye Di Edebîyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk De** başlıklı bu çalışma, 23.05.2023 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliđi* başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	Prof. Dr Mehmet Zahir ERTEKİN	İmza:
Danışman	: Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ	İmza:
Üye	: Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	İmza:
Üye	: Prof. Dr. Abdullah KIRAN	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah Bedeva

Enstitü Müdürü

KURTE

Mersîye di edebiyata Rojhilat a klasîk de ji mêj ve xwedîyê cîhekî taybet û muhîm e. Ev cûreya helbestê ya ku li ser mirina kesekî hezkirî, qedirbilind û qîmetdar hatiye nivîsîn ji bo mersîyenûsan geh bûye wargeha şingirtinê û rondikrijandinê û geh jî bûye wargeha pesindayîn, dua û nifirkirinê. Ev cûreya helbestê di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî xwedî cîhekî girîng e.

Armanceke vê xebatê nîşandayîna rewş û peşveçûna kevneşopîya mersîyeyê ya di edebiyata Kurdî de ye. Xebat bi wan mersîyeyên ku bi zaravaya Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn, hat sînorkirin û di bergeha xebata berhevkarîyê de 183 mersîye hatin berhevkirin.

Bi vê xebata ku hat kirin, hat armanckirin bê nîşandan ka edebiyata Kurdî ya klasîk di warê mersîyenûsîyê de di kîjan astê de ye û di kîjan sedsalî de kîjan mersîyenûsî çend mersîye nivîsîne. Xebata me lêdipirse ku mersîye di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de çi wextî dest pê kiriye, di kîjan sedsalê de çend mersîye hatine nivîsîn, herî zêde kîjan wezn, teşeya nezmê û cûreya serwayê di mersîyeyan de hatiye bikaranîn. Bi heman awayî xebata me lê dipirse, herî zêde li ser kîjan çîne mersîye hatine nivîsîn û mersîyeyên Kurdî ji hêla beşên mersîyeyan ve kîjan beşên mersîyeyan di nav xwe de dihewînin.

Di encama xebata ku hat kirin de hat dîtin ku bi zaravayê Kurmancî bi tevahî 183 mersîye hatine nivîsîn. Derket holê edebiyata Kurdî ya klasîk digel ku di destpêkê de di warê mersîyenûsîyê de pêşve neçûbe jî di sedsalên paşî de gelek zêde pêşve çûye, dewlemend bûye û hebûna xwe bi mersîyeyên ku hatine nivîsîn domandiye.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Kurdî, Kurmancî, Mersîye

ÖZET

Mersiye yüzyıllardan beri Klasik Doğu Edebiyatında önemli bir yere sahip olmuştur. Değer verilen ve sevilen bir insanın ölümünden ötürü yazılan bu şiir türü, bazen şa'ir için yas tutma ve gözyaşı akıtma mekânı bazen de ölen kişiye dua etme, onu övme ve eğer başka birisi tarafından öldürülmüşse katiline beddua etme yeri olmuştur. Bu şiir türü, Klasik Kürt Edebiyatında da önemli bir yere sahiptir.

Yapılan bu çalışma ile mersiye geleneğinin Klasik Kürt Edebiyatındaki durumu ve gelişimi gösterilmeye çalışılmıştır. Çalışma Kürtçe'nin Kurmanci lehçesi ile yazılmış olan mersiyelerle sınırlandırılmış olup bu çerçevede toplam 183 mersiye ulaşılmıştır.

Bu çalışmayla mersiye geleneğinin Klasik Kürt Edebiyatında hangi seviyede olduğu tespit edilmeye çalışıldı, sonra da yüzyıllara göre Kürt Edebiyatında Kurmanci lehçesiyle hangi şa'ir tarafından kaç mersiyenin yazılmış olduğu belirtilip; çalışma da mersiye geleneğinin hangi yüzyılda başladığı, hangi yüzyılda kaç mersiyenin yazıldığı, bu mersiyelerin en fazla hangi nazım şekli ve aruz kalıbıyla yazıldığı, mersiyelerde en çok hangi kafiye çeşidinin kullanıldığı, mersiyelerin en çok kimin üzerine yazıldığı ve Kürtçe mersiyelerin klasik bir mersiyenin hangi bölümleri içerisinde barındırdığı tespit edilmeye çalışıldı.

Yapılan araştırma neticesinde bu alanda Kürtçe'nin Kurmanci lehçesiyle 183 mersiyenin yazılmış olduğu tespit edildi. Sonuç olarak denilebilir ki mersiye geleneği her ne kadar başlangıçta Klasik Kürt Edebiyatında gelişmiş olmasa da ilerleyen yüzyıllarda gözle görülür bir mesafe kat etmiş, zenginleşmiş ve varlığını yazılan mersiyelerle devam ettirmiştir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Kürtçe, Kurmanci, Mersiye

ABSTRACT

Elegiac poetry has held a significant position in Eastern Classical Literature for many years. It is a type of poetry that is composed following the death of respected or valued individual and it serves as a means of expressing grief, offering prayers, and honoring the deceased. When the individual's death is a result of someone else's actions, the elegy can also be used to condemn the cruelty of the perpetrator. This poetic form holds a significant position in Kurdish Literature as well.

This study aims to demonstrate the status and development of the elegiac poetry tradition, known as "mersiye" in Classical Kurdish Literature. The study is limited to elegies written in the Kurmanji dialect of Kurdish and includes a total of 183 elegies.

The initial goal of this study is to determine how widespread elegiac poetry was in Classical Kurdish Literature and to identify the number of elegies written in the Kurmanji dialect of Kurdish literature, categorized by century and poet. Then, the study has focused on identifying the starting point of elegiac poetry in Kurdish Literature, as well as determining the number of elegiac poems written during a specific century and the predominant verse and prosody patterns utilized in such poetry. Additionally, it aimed to determine on whom elegiac poems were mostly written and to identify which elements of a classical elegy were present in Kurdish elegies.

Based on the research conducted in this field, it was found that 183 elegiac poems were written in the Kurmanji dialect of the Kurdish language. In conclusion, while elegiac poetry was not prevalent in classical Kurdish literature during the earlier centuries, it has flourished and covered a considerable distance in recent centuries, and continues to exist today.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Kurdish, Kurmanji, Elegy

PÊŞGOTIN

Ji roja ku dinya hatiye xûliqîn heta roja me ji ber mirinên ku di nav civakê de pêk tên însan xemgîn dibin û êş û elemê dikşînin. Ji ber vê yekê dixwazin derdê dilê xwe sivik bikin û serî li hinek rêyan didin. Hin ji wan ji ber zexta êş û elema mirî hêstiran dibarînin, hin di nav bêdengîyê de şîna xwe digirin û hin jî radibin vê êş û elemê bi rêya wan helbestên ku ji wan re mersîye tê gotin tînin zimên. Ev şîna ji ber mirinê an jî dûrketina ji tiştekî mîna welat tê girtin, di edebiyata Kurdî ya klasîk de xwedî cihekî muhîm e û bi cûrbecûr teşeyên nezmê li serê helbest hatine nivîsîn. Mersûyenûs bi rêya van mersîyeyên ku nivîsîne xwestina huzna di dilê xwe de sivik bikin û derd û kulên xwe bînin zimên. Me jî xebata xwe li ser wan mersîyeyên klasîk saz kir ku ew li ser wê êş û elema ji ber mirina yekî, ji ber dûrketina welatekî yan jî ji ber tiştekî din ên ku bûye sedema êş û elemê hatin nivîsîn. Di vê xebata bi navê *“Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de”* hewl hat dayîn bersiva van pirsan bê dayîn: Kevneşopîya mersîyeyê di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de di kîjan sedsalî de bi kîjan mersîyenûsî dest pê kiriye, di kîjan sedsalî de çend mersîyenûs çî qas mersîye nivîsîne, di van mersîyeyên Kurdî de herî zêde kîjan qaliba arûzê, kîjan teşeya nezmê û kîjan cûreya serwayê, kîjan hûnera edebî hatine bikaranîn û rêjeya wan çî ne, mersîyeyên ku hatine berhevkerin li gor beşên mersîyeyeke klasîk di kîjan astê de ne?

Me xebata xwe bi wan wan mersîyeyên ku ew bi zaravaya Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn sînordar kir. Di encama xebata ku hat kirin de tevde 183 mersîye hatin berhevkerin û xebata me li ser van mersîyeyan hat avakirin. Xebat tevde ji destpêk, pênc beş û encamekê pêk tê.

Di beşa destpêkê de piştî ku qala metodolojîyê hat kirin me pênaseya mersîyeyê kir û me lêkole ka kelîmeya mersîyeyê ji kû tê, di ferhengan de ji bo wê çî tê gotin û wek terîmekê tê çî manayê. Dema ku ev pênase hat kirin serî li gelek çavkanîyan hat dayîn. Piştî vê yekê hewl hat dayîn bê tespîtkirin helbesta yekemîn a ku însan ji ber êş û elema firaqa mirinê bi şiklê mersîyeyê gotiye kîjan e û li ser vê yekemînûnê kî çî gotiye. Ji bilî van mijarên ku qala wan hat kirin dîsa di vê beşê de hewl hat dayîn bersiva van pirsan bê dayîn: Helbestên ku wek mersîye tên nivîsîn li ser kî tên nivîsîn, gelo ji bo li ser kesekî mersîye karibe bê nivîsîn ferz e ku pêwendî di navbera

mersîyenûs û kesê wefatkirî de hebe, mersîyeya ku tê de bîranîna başîyên kesê mirî tê dayîn û li serê şîn tê girêdan ji hêla beşên mersîyeyê ve divê di nav xwe de kîjan beşan bihewîne, mersîyenûs di nav civakê de çima nivîsîna mersîyeyê li ser xwe wek tiştêkî ferz dibîne?

Piştî ku hewl hat dayîn bersiva van pirsan bê dayîn vêca jî mijarên “*Mersîye di Edebiyata Erebî de*”, “*Mersîye di Edebiyata Farisî de*” û “*Mersîye di Edebiyata Tirkî de*” hatin nirxandin û hat armanckirin qala mersîye û mersîyenûsîya van neteweyan bê kirin. Ji vê yekê jî armanca me ew bû ku dema xwîner an jî lêkolîner di vî warî de xebetên berawirdî kirin jê sûdê werbigrin.

Di beşa yekemîn a xebatê de li ser kevneşopîya mersîyenûsîyê ya di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de hat rawestîn. Lêbelê berî vê yekê di binbeşekê de qala kevneşopîya şîn û şîngirtinê ya di nav Kurdan de hat kirin û dûre pênasaya wan têgehên ku di nav Kurdan de ji bo şîne û şîngirtinê tên bikaranîn hatin dayîn. Piştî vê qonaxê me di vê beşê de di bin sernava “*Mersîye di Edebiyata Kurdîya Goranî, Soranî û Zazakî ya Klasîk de*” qala kevneşopîya mersîyeyê ya di her sê zaravayên Kurdî de kir û ji bo her yekî ji wan wek mînak mersîyeyek da. Piştî van gavan pêşî di bin sernava “*Destpêk û Pêşveçûna Kevneşopîya Mersîyeyê di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de*” de hewl hat dayîn bê tespîtîkirin ka mersîyeya ewil a bi Kurdiya Kurmancî di kîjan sedsalî de ji teref kîjan helbestvanî ve hatiye nivîsîn. Dû re li gorî sedsalên ku mersîyenûsên Kurd lê jiyane mersîye hatin senifandin û her yek ji wan di kîjan sedsalî de çend mersîye nivîsîne wek tablo hat nîşandan.

Di beşa duyemîn a vê xebatê de mersîyeyên ku hatibûn berhevkerin ji hêla rûxsarê ve hatin tehqîqkirin. Di vê bergehê de mersîyeyên Kurdî yên hatine berhevkerin ji aliyê teşeyên nezmê ve hatin nirxandin. Di encama vê nirxandinê de teşeyên nezmê yên mersîyeyan wek; qesîde, mesnewî, xezel, murebbe' û hwd. hatin dîtin û ji bo her yekî ji wan mersîyeyek mînak hat dayîn. Bi heman awayî di bin her teşeyeke nezmê de tabloyek hat dayîn û tê de hat destnîşankirin mersîyeyên Kurdî bi kîjan teşeyê nezmê hatiye nivîsîn. Her wisa di vê beşê de weznên temamê mersîyeyan yek bi yek hatin dîtin û hat destnîşankirin ka kîjan ji wan çiqas hatine bikaranîn, rêjeya bikaranîna wan çiqas e. Ji bilî vê yekê di vê beşê de mersîye ji aliyê îmale, med, zihaf û cureyên mîna wan ve jî hatin nirxandin û bi mînan ve hatin ravekerin. Di vê

pêvajoyê de dîsa temamê mersîyeyan ji aliyê serwa û paşserwayê ve bi mînan hatin tehqîqkirin, rêjeya bikaranîna wan û bikaranîna cûreya serwayan wek tablo û grafik di bin sernava têkildar de hatin dayîn.

Di beşa sêyemîn a xebatê de mersîyeyên ku hatin berhevkerin di bin sernava “*Hunerên Edebî di Mersîyeyên Kurdî de*” hatin nirxandin. Hunerên edebî yên ku ji teref mersîyenûsên Kurd ve di 183 mersîyeyan de hatine bikaranîn yek bi yek hatin tespîtkirin. Piştî pênaseya her hunereke edebî ya ku di mersîyeyê de hatiye bikaranîn, hejmar û rêjeya bikaranîna wê hunera edebî hat dayîn. Her wisa di bin navê her hunereke edebî de hat lêkolînkirin çima û bi çî armancê ev huner ji teref mersîyenûsan ve hatiye bikaranîn.

Di beşa çaremîn a bi sernava “*Beşên Mersîyeyên Klasîk*” de li ser wan beşên mersîyeyên Kurdî hat rawestin. Dema ku derheqê vê mijarê de nirxandin hat kirin mersîyeyên Kurdî li gor beşên mîna: Mirin, şîn-girîn, pesindayîn, sîtema ji felekê re, dinya-axiret, sebir, di‘a-temennî û nifir hatin analîzkirin. Her wisa derheqê her beşeke mersîyeyên klasîk de agahî hat dayîn, qala formên wan ên ku di mersîyeyên Kurdî de cî digirin hat kirin û ji bo her yekî mersîyeyek wek mînak hat dayîn.

Di beşa pêncemîn a xebatê de mersîyeyên ku hatibûn berhevkerin yek bi yek hatin nirxandin ka kîjan mersîye li ser kî hatiye nivîsîn. Me vê senifandinê wek gaveke mecbûrî dît. Lewra di edebiyata Kurdî ya klasîk de hinek mersîye li ser beg-mîr-axayan, hinek mersîye li ser şêx-alim-seydayan, hinek mersîye li ser endamên malbatê, hinek mersîye li ser dûrbûna ji welat an jî di halê nexweşiyê de û hinek mersîye jî an li ser siyasetmedar an jî li ser kesekî din hatine nivîsîn. Dema ev senifandin hat kirin temamê mersîyeyan li gorî şazdeh beşan hatin senifandin. Di vê bergehê de hewl hat dayîn da ku bê dîtîna ka kîjan mersîyenûsî li ser kî yan jî çî, çend mersîye nivîsîne. Dema ku ev yek hat kirin her mijarek bi beyt an jî bendên pêwendîdar re hat dewlemendkirin û ji bo wan mînak hat nîşandan. Piştî ku bersivê van pirsan hat dayîn vêca jî rêjeya wan kesên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn wek grafîkekê hat dayîn. Di dawîya beşa pêncem de me wek tablo navê temamê mersîyenûsan û qaliba mersîyeyên ku nivîsîne û li ser kî nivîsîne bi şiklê tabloyê da.

Ev xebata me ya doktorayê di netîceya pêvajoyeke zor û zehmet de derket holê. Bi ya me di amadekirina vê tezê de bes ne keda kesekî; beravajî keda gelek kesan heye.

Lewra dema ku me dest bi xebata xwe kir; hinek kes bi fikr û ramanên xwe, hinek kes bi peydakirina metnên mersîyeyan, hinek kes bi rêbertîya ku ji me re kir û hinek jî bi alîkarîyên xwe yên manewî piştgirî dan amadekirina vê teza doktorayê. Di serî de ez ji malbata xwe ya ku ji destpêka xebatê heta dawîya wê her tim piştgirî da min re minnetdar im û spasîya wan dikim. Her wisa ez dixwazim di vê bergehê de ji wan mamosteyên xwe yên hêja yên mîna Prof. Dr. Abdurrahman ADAK, Prof. Dr. Zahir ERTEKÎN, Prof. Dr. Abdullah KIRAN û Tehsîn Îbrahîm DOSKÎ û kesên ku navên wan li vê derê nehatin zikirkirin û ji min re bûn alîkar re spas bikim. Lewra ew, di demajoya amadekirina vê tezê de him bi fikr û ramanên xwe him bi pêşniyazên xwe û him jî bi peydakirina metnên mersîyeyan ji min re gelek zêde alîkarî kirin.

Û xusûsen ez ji şewirmendê xwe Prof. Dr. Nusrettîn BOLELLÎ re spas dikim ku ew di teza min a mastirê de jî şewirmendîya min kiribû û di vê rêya akademiye de ji serî heta niha piştgirî da min, rê nîşanî min da û min teşwîqî xebatê kir. Xweda her tim serkeftinê bike nesîbê wî û mamosteyên navborî û her tim sihhetê bike para wan.

Cîhan TURAN

Bîngol-2023

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN

TABLO

Tablo 1: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVI û XVIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.....	45
Tablo 2: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVII û XVIIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.....	48
Tablo 3: Mersîyenûsên ku di sedsala XVIIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan	49
Tablo 4: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVIII û XIXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan	50
Tablo 5: Mersîyenûsên ku di sedsala XIXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan	51
Tablo 6: Mersîyenûsên ku di sedsalên XIX û XXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan	55
Tablo 7: Mersîyenûsên ku di sedsala XXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan	57
Tablo 8: Mersîyenûsên ku di sedsalên XX û XXIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.....	59
Tablo 9: Mersîyenûsên ku di sedsalên XIX û XXIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.....	59
Tablo 10: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn.	67
Tablo 11: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya xezelê hatine nivîsîn.....	71
Tablo 12: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn.....	73
Tablo 13: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya murebbe'ê hatine nivîsîn.....	77
Tablo 14: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatine nivîsîn.....	80

Tablo 15: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya musellesê hatine nivîsîn in.	83
Tablo 16: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya museddesê hatiye nivîsîn.....	85
Tablo 17: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya terkîbbendê hatiye nivîsîn.....	88
Tablo 18: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya tercî' bendê hatine nivîsîn.....	99
Tablo 19: Qalib û behrên 'erûzê yên mersîyeyan.....	105
Tablo 20: Mersîyeyên ku li ser mîran hatine nivîsîn.....	190
Tablo 21: Mersîyeyên ku li ser axayan hatine nivîsîn.....	195
Tablo 22: Mersîyeyên ku li ser Şêx Se'îd hatine nivîsîn.....	201
Tablo 23: Mersîyeyên ku li ser Se'îdê Nûrsî hatine nivîsîn.....	204
Tablo 24: Mersîyeyên ku li ser Mela Mistefa Barzanî hatine nivîsîn.....	209
Tablo 25: Mersîyeyên ku li ser şêxan hatine nivîsîn.....	226
Tablo 26: Navê mersîyenûs û navê wan seyda/melayên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn.....	230
Tablo 27: Navê mersîyenûs û navê wan seyîdên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn	233
Tablo 28: Mersîyenûsên ku li ser Hz. Huseyîn mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyan	239
Tablo 29: Mersîyenûsên ku li ser bavên xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	247
Tablo 30: Mersîyenûsên ku li ser lawan mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	252
Tablo 31: Mersîyenûsên ku li ser hevserên xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyan.....	258
Tablo 32: Mersîyenûsên ku li ser birayên xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	270
Tablo 33: Mersîyenûsên ku li ser endamên malbatê mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan	282
Tablo 34: Mersîyeyên ku li ser siyasetmedaran hatine nivîsîn.....	287

Tablo 35: Mersîyeyên ku li ser dost û hevalan hatine nivîsîn û teşe û qalibên wan.....	291
Tablo 36: Mersîyenûsên ku li ser helbestvan û rewşenbîran mersîye nivîsîne û teşeya nezmê ya mersîyeyan.....	294
Tablo 37: Mersîyenûsên ku li ser Hz. Muhammed mersîye nivîsîne û teşe û qalibê mersîyeyên wan.....	296
Tablo 38: Mersîyenûsên ku li ser mirina xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	301
Tablo 39: Mersîyenûsên ku nediyar in li ser kî hatine nivîsîn û teşeya mersîyeyên wan.	306
Tablo 40: Mersîyenûsên ku li ser welat mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan	314
Tablo 41: Mersîyenûsên ku li ser bajaran mersîyenivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	318
Tablo 42: Mersîyenûsên ku li ser dîne Îslamê mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.....	321
Tablo 43: Mersîyenûsên ku li ser mirinê bi xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.	324

GRAFÎK

Grafîk 1: Hejmara Mersîyeyan li gorî Sedsalan.....	60
Grafîk 2: Hejmara Mersîyenûsan li gorî Sedsalan.....	60
Grafîk 3: Rêje û hejmara cureyên helbestên mersîyeyî.....	103
Grafîk 4: Rêjeya behrên erûzê yên helbestên mersîyeyî	107
Grafîk 5: Rêjeya bikaranîna bêpaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de.....	112
Grafîk 6 : Rêjeya bikaranîna bipaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de.....	114
Grafîk 7 : Li gorî teşeyên nezmê daneyên bikaranîna bipaşserwa û bêpaşserwayê di helbestên mersîyeyî de.....	115
Grafîk 8: Rêjeya bikaranîna serwaya mucerred ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de	117
Grafîk 9: Rêjeya bikaranîna serwaya muqeyyed ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de	118

Grafik 10: Rêjeya bikaranîna serwaya muqeyyed a di teşeyên helbestên mersîyeyî de	119
Grafik 11 : Bikaranîna cureyên serwayê ya di teşeyên helbestanên mersîyeyî de...	120
Grafik 12: Rêjeya bikaranîna paşserwaya qertafî ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de.....	124
Grafik 13: Rêjeya bikaranîna paşserwaya di halê qertaf û bêje an kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de.....	126
Grafik 14: Rêjeya bikaranîna paşserwayan a di halê bêje an jî kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de	130
Grafik 15: Hejmara bikaranîna sê cureyên paşserwayê ya di teşeyên helbestên mersîyeyî.....	131
Grafik 16: Rêjeya bikaranîn her sê cûreyên paşserwayan(redîf) a di 183 mersîyeyan	132
Grafik 17: Reqema bikaranîna hunerên edebî yên di mersîyeyan de nîşan dide.....	133
Grafik 18: Rêjeya bikaranîna hûnerên edebî di mersîyeyên Kurdî de nîşan dide....	159
Grafik 19: Rêjeya mersîyeyên li ser kesên rêber û pêşewa hatine nivîsîn.....	217
Grafik 20: Hejmara mersîyeyên ku li ser endamên malbatê hatine nivîsîn	282
Grafik 21: Kes û hejmara mersîyeyên ku li ser wan hatine nivîsîn	328
Grafik 22: Rêjeya kesên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn	329

PÊVEK

Pêvek 1 : Lîsteya tamamê mersîyenûs û mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin digel kesê ku li serê mersîye hatiye nivîsîn û her wisa teşe, qalib û behra mersîyeyê nîşan dide.....	351
---	-----

KURTEBÊJE

a.s. : aleyhîs selam

amd. : amadekar

b.: berî

b.m.: berîya mîladê

bnr. : binêrin

c. : cild

DÎA : Diyanet Îslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê ya Diyanetê]

h. : hejmar

h.b. : heman berhem

h.d. :heman destxet

hwd. : her wekî din

Hz. : hezrefî

j. : jimare

m. : mirin

p. :piştî

r. : rûpel

s. : sal

s.a.w. : sellellahû aleyhî wesellem

s.x.l. : silavên Xweda li ser bin

wer. : wergêr

weş. : weşan, weşanxane

DESTPÊK

A-METODOLOJÎ

1.Mijar

Mirin û êş û elema ku ji ber wê tê kişandin û xemgînîya dûrketina ji welatekî an jî ji ber windakirina tiştêkî ku jê tê hezkirin di edebiyata neteweyên din de bi şiklekî berfireh cî girtiye û di vê çarçoveyê de gelek helbest hatine nivîsîn ku ji wan re mersîye tê gotin. Ev mijar bi heman awayî di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de jî cihê xwe girtiye û li ser vê mijarê gelek helbestên ku jê re mersîye tê gotin hatine nivîsîn.

Mijara xebata me ya bi sernava “*Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de*” ew mersîyeyên klasîk in ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn. Di çarçoveya vê sernavê de hewl hat dayîn mersîyeyên klasîk ên Kurdîya Kurmancî ji hêla rûxsar û hunerên edebî ve bîr xandî, li gorî sed sala ku lê hatine nivîsîn bîr dabêşkirin, li gorî kesên ku li ser wan hatine nivîsîn bîr senifandin û ji hêla beşên mersîyeyan ve bîr hilsegandin.

2.Girîngî û Armanca Mijarê

Edebiyata Kurdî ya klasîk ji damezrandina mîrektîyan vir ve digel temamê rewş, bûyer û geşedanên menfî hebûna xwe domand û bi şiklekî ne kamil be jî digel berhemên xwe yên bêhempa gihaşt dewra me. Ev berhemên qedirbilind û dewlemend ên ku ji ber zext û zordarîyan di bin erdê de mabûn an jî hatibûn veşartin bi demê re wek gencîneyeke ku nû hatibe keşifkirin ji cihên xwe derketin û derdikevin. Dema meriv li van berhemên Kurdî yên ku ji teref helbestvan, alim, şêx û rewşenbîrên Kurd ve hatine nivîsîn mêze dike, bi şiklekî eşkere dibîne ku helbestên wan bes ne li ser mijareke tenê ye. Ango hinekan li ser evîna mecazî û îlahî, hinekan li ser tesewûf û îrfanê, hinekan li ser welatperwerîyê û axa welat û hinekan jî li ser êş û elema ku ji ber mirina kesekî ku jê hez dike mersîye nivîsîne.

Mijara teza me jî ew êş û elem e ku ji ber mirina kesekî yan jî ji ber dûrbûna welat an jî tiştêkî din tê kişandin. Di helbestên klasîk ên Kurdî de pir caran ev yek derdikeve pêşîya me û ev cûre wek mersîye tê binavkirin. Di encama lêkolîna ku hatin

kirin de hat dîtin heta îro li ser mersîyeyên klasîk ên Kurdîya Kurmancî bes çar xebat hatine kirin. Ji van xebatan du xebat ji teref Ahmet Seyarî¹ ve, xebatek ji teref Sinan Hakan² ve û xebatek jî ji teref Mesûd Serfiraz³ ve hatiye kirin. Di van xebatan de Ahmet Seyarî li ser mersîyeyên du edîbên Kurd, Sinan Hakan li ser çend edîbên ku ji Miksê derketine û li ser çend mersîyeyên wan û Mesûd Serfiraz jî bi şiklekî giştî li ser mersîyenûsîya di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de rawestiyaye.

Him ji ber kêmbûna xebatên di vî warî de him jî ji ber ku heta îro xebateke wiha hûr û kûr li ser mersîyeyên Kurdî nehatiye kirin bi ya me ev xebata ku hatiye kirin girîng e û dê di warê xwe de bibe xwedî cihekî muhîm. Lewra di edebiyata Kurdî ya klasîk de an ji ber mirina kesekî yan jî ji ber hezkirin û dûrbûna ji tişteki gelek mersîyeyên ku bi teşeyên cûrbecûr hatine nivîsîn hene. Ji ber ku ev mersîye heta îro nehatine berhevkirin, li gorî sedsalan nehatine senifandin, li gorî kesên ku li ser wan hatine nivîsîn nehatine dabeşkirin û di vê bergehê de xebateke akademîk a berfireh nehatiye kirin ev yek ehemîyet û girîngîya xebatê zêdetir dike.

Armanca me ji nivîsîna vê tezê ew e ku ev helbestên li ser mirina kesekî yan jî ji ber dûrbûna ji warekî û windakirina tişteki hatine nivîsîn û wek gencîneyeke veşartî ne, bi awayekî akademîk bîn lêkolînkirin û ji edebiyata Kurdî û ji kesên ku dê li ser edebiyata Kurdî xebatan bikin re bîn pêşkêşkirin.

Bi nivîsîna vê tezê dîsa tê armanckirin bê nîşandan; edebiyata Kurdî ji hêla mersîyenûsîyê ve xwedîyê dewlemendîyeke çawa ye, di kîjan sedsalî de ji teref kîjan mersîyenûsî ve çend mersîye hatine nivîsîn, mersîyeyên Kurdî ji hêla kesên ku li ser wan hatine nivîsîn ve di çi rewşê de ne, mersîye herî zêde li ser kî hatine nivîsîn û mersîyeyên Kurdî ji hêla beşên mersîyeyêke klasîk- pesindayîn, di 'a kirin, şîn, sebir, di 'a, sîtem, nîfir- ve di çi rewşê de ne û di nivîsîna wan de herî zêde kîjan serwa, qaliba arûzê û teşeya hunera edebî hatiye bikaranîn?

¹Ahmet Seyarî, *Mersiyeyên Mela Zahirê Tendûrekî ji Alîyê Tema, Ziman û Hunerên Edebî ve*, Kovara Nûbiharê, h:147, 2019, r.32-36.

Ahmet Seyarî, *Mersiyeyên Mela 'Elîyê Baqûstanî Ji Alîyê Tema, Ziman, Teşe û Hunerên Edebî ve*, Kovara Nûbiharê, h:148, 2019. r.44-49.

² Sinan Hakan, *Ji Wida hetta Mele Muhammed Gulnarê Miksî û Pêwendîya Helbestvan û Mîrên Miksê*, Kovara Nûbiharê, h:111, 2007, r.45-47.

³ Mesud Serfiraz, *Mersîye û Di Edebîyata Kurdî de Mersîye*, Kovara Nûbiharê, h;120, 2012, r.30-33.

3.Rêbaz

Pêvajoya amadekirina vê xebata me ji du heyamên cuda pêk tê. Di heyama ewil de hewl hat dayîn berhemên lêkolînê yên ku li ser edebiyata Kurdî ya klasîk hatine nivîsîn û dîwanên Kurdî yên ku bi tîpên latînî û Erebi hatine çapkirin yan jî wek destxet hatine muhafizekirin bèn berhevkerin. Piştî karê berhevkerîyê ew helbestên ku li ser mirina kesekî, ji ber windakirin an jî dûrbûna tişteki wek mersîye hatine nivîsîn hatin tespîtkirin. Di vê qonaxê de bi tevahî 183 helbest hatin tespîtkirin ku ew wek mersîyeyê hatine nivîsîn.

Piştî karê berhevkerin û xwendina berhemên û tespîtkirina wan helbestên ku wek mersîyeyê hatine nivîsîn, danasîna mersîyeyê hat kirin û mersîye li gorî kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wek; şêx, alim, seyda, beg, axa, şa'ir, pêşivan û rêberên Kurdan, kesayetên siyasî, welat û endamên malbatê hatin senifandin. Dû re helbestên hatine berhevkerin ji hêla şiklên nezmê, wezn, qafîye, redîf, hunerên edebî, beşên ku di mersîyeyan de hatine bikaranîn û ji hêla kes û kesayetên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn ve hatin nirxandin. Rêje û daneyên ku derketin holê wek tablo û grafîkê hatin destnîşankirin. Di vê pêvajoyê de ji bilî çavkanîyên Kurdî sûd ji çavkanîyên Tirkî jî hat girtin.

Dema ku metnên mersîyeyan ji hêla teşeyên nezmê, wezn, serwan, paşserwa û cûreyên hunerên edebî ve hatin nirxandin îqtîbas hatin kirin. Ji bona ku îqtîbasên hatine kirin bi hêsanî werin peydekirin, pêşî navê mersîyenûs berîya mînakê hat dayîn û berhema ku jê hatiye girtin wek dîpnot hat destnîşankirin. Bi heman awayî hejmarên malikên ku hatine îqtîbaskirin, di kêleka malikan de di nav kevanekê de hatin nîşandan.

Dema xebat hat amadekirin di beşên pêwendîdar de gelek tablo û grafîk hatine amadekirin û dane û rêjeyên ku derketine holê di wan de hat destnîşankirin. Wek mînak: Dema mersîyenûs li gorî sedsalên ku lê jiyane hatin dabeşkirin di bin navê her sedsalekê de navê mersîyenûsên ku di wê sadsalê de mersîye nivîsîne wek tablo hat dayîn. Dîsa dema mersîye ji hêla rûxsarê ve hatin nirxandin daneyên ku derketin holê bi şiklê grafîkê hatin destnîşankirin. Ji bilî vê yekê mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin li gorî kesayetên li ser wan hatine nivîsîn, hatin senifandin û rêje û daneyên ku

derketin dîsa wek grafîkê hat dayîn da ku xwîner û lêkolîner karibin bi hêsanî ji xebatê sûdê werbigrin.

4.Sînor û Çarçoveya Tezê

Me vê xebata xwe li ser wan metnên menzûm ên ku di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de wek mersîye hatine nivîsîn saz kir. Di vê bergehê de metnên menzûm ên mersîyeyî yên klasîk tev bûn warê xebata me. Lêbelê dema ku metnên menzûm ên mersîyeyî yên klasîk hatin berhevkerin û xebat li ser wan hat avakirin me xebata xwe ji hêla zaravaya ku li ser xebat hat kirin ve sînordar kir. Û me bes wan mersîyeyên klasîk ên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn tevî xebata xwe kir. Ji ber vê yekê jî me sernava “*Mersîye di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de*” li xebata xwe kir.

Ji ber ku xebat bi wan mersîyeyên ku bes bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn hat sînordarkirin ew zaravayên din ên Kurdî tevî xebatê nehatin kirin. Bes di bin beşeke tezê de rewşa kevneşopîya mersîyenûsîyê ya di zaravayên Soranî, Goranî û Zazakî de hat nîşandan.

Tez, ji bilî zaravayên Kurdî her wisa di warê wextê ku mersîyenûs lê jiyane de jî hat sînordarkirin. Di vê çarçoveyê de ji bo destpêka mersîye û mersîyenûsê ewil sînorek nehat danîn û mersîye û mersîyenûsê ewil wek destpêka sînore hat qebûlkerin. Lêbelê ji bo dawîya wext sînorek hat diyarkirin. Ew jî destpêka Şerê Cîhanê ya Yekem e ku di sala 1914an dest pê kiriye, di sala 1918an de bi dawî bûye û tesîra xwe jî heta salên 1923yan domandiye. Ji ber vê tesîrê me ew helbestvanên Kurd ên ku heta vê tarîxa 1923yan ji dayik bûne li tezê zêde kir.

Ev xebata me ya bi navê “*Mersîye di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de*” ji destpêk, pênc beşên cuda û ji encamekê pêk tê.

Di beşa destpêkê de bi şiklekî hûr û kûr li ser pênaseya mersîyeyê tê rawestîn û qala kevneşopîya mersîyeyê ya edebiyata Tirkî, Erebi û Farisî ya klasîk tê kirin. Di beşa yekemîn a xebatê de tradîsyona mersîyenûsîya di edebiyata Kurdî de tê lêkolînkirin û hewl tê dayîn bê destnîşankirin, mersîyeya ewil ji teref kî ve û her wisa di kîjan sedsalî de çend mersîye hatine nivîsîn. Di beşa duyem de mersîyeyên ku hatin berhevkerin ji hêla teşeyên nezmê, serwa, paşserwa û arûzê ve hatin tahlîlkerin. Dane

û rêjeyên ku derketine holê di bin her mijarekî de wek tablo û grafîk hatin dayîn. Di beşa sêyem de 183 mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin di bergeha hunerên edebî de hatin nirxandin û hunera edebî ya ku herî zêde di mersîyeyan de hatiye bikaranîn hat tespîtîkirin. Di bin her cureyeke hunera edebî de hejmar û rêjeya bikaranîna wê hunera edebî hat dayîn. Dema ku ev yek hat kirin dane û rêje wek tablo û grafîk hatin nîşandan. Di beşa çaremîn a xebatê de bi temamê li ser mijara beşên mersîyeyên klasîk hat rawestîn. Di vê beşê de beşên mersîyeyan yek bi yek hatin nirxandin û ji bo her yekî ji wan mînakên bi mijarê re eleqedar hatin dayîn. Beşa dawî ya ku dibê beşa pêncemîn a xebatê de jî bi şiklekî berfireh li ser kes an jî tiştên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn hat rawestîn û hewl hat dayîn bi mînakên mijar bi şiklekî berfireh bê îzahkirin. Herî dawî di dawîya her beşê de ji helbestên transkîrîbkirî mersîyeyek wek mînak hat dayîn û nirxandina wan hat kirin.

5. Astengî û Zehmetiyên Tezê

Di heyama amadekirina vê xebatê de em li rastî hinek zor û zehmetîyan hatin ku ya yekem bi şiklekî komkirî tunebûna metnên mersîyeyan bû. Ji ber vê yekê wextekî zêde ji karê berhevkirina metnên mersîyeyan re hat veqetandin. Di vê wextê ku hat veqetandin de me hewl da xwe bigihînin şî'ir û dîwanên Kurdî yê çapkirî û ne çapkirî. Piştî karê berhevkirinê li ser her yek ji wan bi şiklekî hûr û kûr lêkolîn hat kirin û mersîyeyên di nav wan de hatin tespîtîkirin û yê ku bi tîpên Erebî hatibûn nivîsîn hatin latînzekirin. Di bergeha vê xebatê û lêkolîna ku hat kirin de derket holê ku 183 mersîye bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn.

Zor û zehmetîyeke din a ku di demajoya amadekirina tezê de em lê rast hatin tunebûna xebatên akademîk bû ku ew li ser mijara mersîyeyê hatine kirin. Ji ber kêmasîya xebatên ku bi Kurdî hatine kirin me berê xwe da wan xebatên ku di Edebiyata Tirkî û Farisî de hatin kirin û me ji wan jî îstîfade kir.

Astengî û zehmetîya dawî ya ku em li rastî hatin, hê jî bi şiklekî kamil derneketina holê ya dîwan, destxet û helbestên Kurdî bû. Lewra ji ber hinek zor û zehmetiyên ku heyamekê hatin serê Kurdan, Kurd mecbûr man ku dewrekê hemû tiştên bi Kurdî hatine nivîsîn an veşêrin an binax bikin an jî bişewitînin. Ji ber vê yekê

di roja me ya îro bi xwe de jî hinek ji van helbestên Kurdî mîna gîyayê ku serê xwe ji bin axê nû derîne hêj nû nû derdikevin holê. Wek mînak, di sala 2022yan de şî'rekî ku berî niha nehatibû dîtin, hat tespîtkirin ku ji teref Mele Ehmedê Xasî ve li ser wefata Mele Muhemmed Selîmê Hezanî hatiye nivîsîn. Yek ji wan mersîyenûsên ku nû hat tespîtkirin Şêx Heybetullah Abirî ye. Wî li ser 2 şêxan 2 mersîye nivîsîne. Lêbelê ev yek hêj nû hat tespîtkirin. Wekî din ji ber ku hinek alim helbestên ku nivîsîne nedane çapkirin an jî hewce nedîtine bi kesî re parve bikin; di dema amadekirina vê xebatê de hinek mersîye bi derengî bi hinek wasitayan hatin dîtin. Çend caran piştî ku me niyet anî dawî li xebata xwe bînin çend mersîyeyên bi vî awayî hatin dîtin. Ev yek bû sedem em xebata xwe ji serî heta bînî di warê tablo, grafîk, senifandin, dabeşkirin û hwd. de biguherînin.

6.Hîpoteza Tezê û Pirsên Wê

Mersîye di edebiyatên klasîk ên gelên Rojhilata Navîn de cihekî girîng digire û bi curbicur teşeyên nezmê li ser mirina kesekî yan jî dûrketina ji welatekî gelek mersîye hatine nivîsîn û tê de qala wê êş û elema ku tê kişandin hatiye kirin. Ev tradîsyona mersîyeyê di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî xwedîyê cihekî girîng e. Digel ku ev yek xwedî cihekî muhîm be jî li Bakur heta niha bi zimanê Kurdîya Kurmancî di warê mersîye û mersîyenûsîyê de kêr xebat wek gotar hatine amadekirin û weşandin; ev xebat jî di warê destnîşankirina dewlemendîya mersîyenûsîya Kurdî de ne bes in. Vêca ji ber ku di vî warî de xebat kêr in ev rewş dibe sedem berê lêkolîneran bikeve vê 'erda beyar û neajotî. Ev valahiya ku di vê sehaya xebata Kurdî de heye bû wesîle ku em berê xwe bidin vê sehayê û derheqê gencîneya mersîyenûsîyê ya di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de bi şiklekî hûr û kûr lêkolînekê bikin.

Xebat û lêkolînen zanistî yên ku heta îro hatin kirin tev bi meroqê an jî bi pirsan dest pê dikin. Vêca lêgerîna bersiva wan pirsan û ji holê rakirina wê meroqa ku derketiye holê, ew xebat û lêkolîna zanistî derdixe holê û dibe wesîle ku xebatek bê amadekirin.

Ji bo xebata bi navê “*Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de*” a ku hat amadekirin bi şiklekî hûr û kûr û her wisa berfireh bê lêkolînkirin, me di lêkolîna

xwe de vê hîpotezê danî li ber xwe: “*Di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de bi cûrbecûr teşeyên nezmê li ser kesên rûhber û bêrûh gelek mersîye hatine nivîsîn.*”

Îcar di bergeha vê hîpoteza xebatê de hewl hat dayîn bersivên pirsên mîna; di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de mersîyenûsî kengî û bi kîjan mersîyenûsî dest pê kir û di vî warî de di kîjan sedsalî de çend kesan çend mersîye nivîsîn, mersîyeyên hatine nivîsîn herî zêde li ser kîjan tebeqeyê hatine nivîsîn, mersîyeyên Kurdî ji hêla beşên mersîyeyêke klasîk ve di çi ast û rewşê de ne û di nivîsînîna mersîyeyan de herî zêde kîjan teşeyên nezmê, qaliba arûzê, cureyê serwayê û hunera edebî hatiye bikaranîn?

7.Çavkanîyên Tezê

Di pêvajoya amadekirina xebatê de ji aliyê peydakirina çavkanîyan ve me zehmetîyêke mezin kişand. Lewra di vî warî de hat dîtîn bes çar xebat hatine amadekirin. Dema ku em li van xebatên ku hatine kirin mêze dikin em dibînin ku Ahmet Seyarî bi xebatên xwe yê bi navê “*Mersiyeyên Mela Zahirê Tendûrekî ji Alîyê Tema, Ziman û Hunerên Edebî ve*” û “*Mersiyeyên Mela ‘Elîyê Baqûstanî Ji Alîyê Tema, Ziman, Teşe û Hunerên Edebî ve*” li ser çend mersîyeyên mersîyeyenûsên bi navê Mela Zahirê Tendûrekî û Mela ‘Elîyê Baqûstanî radiweste û mersîyeyên wan ji hêla tema, ziman, teşe û hunerên edebî ve dinirxîne. Lêkolînerê me yê dorê yê ku di vî warî de xebateke bi navê “*Ji Wida hetta Mele Muhemmed Gulnarê Miksî û Pêwendiya Helbestvan û Mîrên Miksê*” amade kiriye Sinan Hakan e. Hakan weke ku ji navê gotara wî jî diyar e di bergeha behsa patronajê de têkilîya helbestvan û mîrên Miksê nirxandiye û cî daye du mersîyeyên ku ji teref Weda‘î û Mela Muhemmed Gulnarê Miksî ve li ser mîrên Miksê hatine nivîsandin. Lêkolînerê din jî Mesûd Serfîraz e ku wî jî di vî warê mersîyeyê de xebateke bi navê “*Mersîye û Di Edebiyata Kurdî de Mersîye*” amade kiriye û di vê xebata xwe de qala pênaseya mersîyeyê kiriye û dû re li ser mersîyenûsîya di edebiyata Kurdî(Kurmancî) ya klasîk de rawestîyaye û qala çend mersîyenûsan kiriye. Ji xeynî van xebatan nehat dîtîn ku heta îro ti xebateke akademîk derbarê mersîyeyên Kurdîya Kurmancî de hatiye kirin. Ev xebatên navborî her yek ji wan li gor xwe di qada xwe de lê hêjayî ne û me ji wan jî îstîfade kir. Ji bilî van çavkanîyên navborî me ji bo vê xebatê di warê çavkanîyên teorîk de ji çend

çavkanîyên din jî îstifade kir. Em dixwazin wan çavkanîyên ku ji bo xebatê bûn çavkanîyên teorîk û girîng in, li vê derê bi rêz bikin.

Çavkanîyên sereke ew çavkanîyên edebî ne ku me ji bo analîza teknîka tezê û vekolîna edebî ji wan îstifade kir. Ew jî ev in: Di serî de pirtûkên Abdurahman Adak “*Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*” û “*Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*” di vê mijarê de ji bo me bûn xebatên bingeîn. Her wisa me ji teza masterê ya bi navê “*Lawandinewe li Şî‘rî Kurdî Kurmancî Xwar da*” ya ku ji teref Aşna Celal Refîq ve hatiye amadekirin, ji gotara bi navê “*Matemname Le Şî‘rî Kurdî Da*” ya ku ji teref Osman Deştî ve hatiye amadekirin û ji gotara bi navê “*Şî‘rê Şîwen li Edebî Kurdî da*” ya ku ji teref Hêmin Omer Xoşnaw ve bi zaravayê Soranî hatiye nivîsîn jî di pêvajoya xebatê de gelek sûd wergirt. Wekî din berhema “*Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*” ya Cem Dilçin ji bo vê xebatê pêşîya me ronî kir û ji me re bû alîkar û me di gelek waran de jê îstifade kir. Ji bo beşa tehlîlê jî dîsa me ji “*Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*” ya İskender Pala, ji bo hunerên edebî jî ji pirtûka “*Belagat (Beyan-Me‘anî-Bedî‘ İlimleri: Arap Edebiyatı)*,” a Nusreddîn Bolelli îstifade kir.

Çavkanîyên din ku em dikarin wan wek çavkanîyên kereste bi nav bikin ew çavkanîyên çapkirî bûn ku di warê peydakirina metnên mersîyeyan de me ji wan îstifade kir. Di lêkolîna ku li ser çavkanîyên bidestxistî hat kirin de hinek çavkanî ji ber ku serdema mersîyenûs lê jiyaye nediket çarçoveya teza me, li xebatê nehatin zêdekirin. Wek mînak Mela Ehmedê Xelatîyê ku zêdetirî 90 mersîye nivîsîbûn ji ber ku piştî sala 1923yan hatibû dinyayê xebat li ser wî nehat kirin. Lêbelê gelek çavkanî hatin tespîtîkirin ku di wan de mersîye hene û mersîyenûsên wan berîya 1923yan hatine dinyayê. Çavkanîyên bi vî awayî zêdetirî heftêyî ne û me ew tev di beşa çavkanîyan de yek bi yek da. Ji ber vê yekê em ê li vê derê bes qala hinek ji wan bikin ku me di pêvajoya xebatê de pir zêde ji wan îstifade kir. Hinek ji wan çavkanîyan yên ku di vî warî de me ji wan sûd wergirt ev in: Di serî de me ji xebatên Abdurrahman Adak yên bi navê “*Helbestvanên Klasîk Yên Herêma Hekarî, Analîz û Nirxandineke Giştî*”, “*Helbestên Kurdî Yên Li Ser Bedûzzeman Se‘îde Nûrsî Hatine Nivîsîn û Di 50 Salîya Wefata Wî de Sempozyuma Bedûzzeman Se‘îde Nûrsî*” û “*Siirt Şîrnak Silvan ve Lice Şa‘irleri*” pir sûd wergirt. Hinek berhem û xebatên din ên ku di vî warê peydakirina metnan de me ji wan sûd wergirt wisa ne: Vamîkiddin Aydın “*Kasideler ve 19 Risale*”, Zeynelabîdîn Amedî “*Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî‘uzzemân*”, Mela

'Elîyê Baqûstanî "*Dîwana Baqûstanî*", Cegerxwîn "*Ji Min Dil Bir Bi Carek*" û "*Ronahî Li Pey Tarî Ye*", Celîlê Celîl "*Keşkûla Kurmancî*", Tehsîn Îbrahîm Doskî "*Baxê Îrem, Geşte li Nav Şi'ra Kurmancîya Klasîk*", Seyid 'Elîyê Findikî "*Dîwan*", Mela Ebdulfettahê Hazroyî "*Dîwan*", Şêx Ehmedê Kor "*Dîwan*", Mela Ehmedê Nalbend "*Baxê Kurda, Dîwana Mela Ehmedê Muxlis Kurê Emînê Nalbedê Bamernî*", Mela Zahirê Tendûrekî "*Dîwan*", Seydayê Tîrêj "*Dîwan*", Marûf Xeznedar "*Mêjûyî Edebî Kurdî*", Zeynelabîdîn Zinar "*Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*", Mela Ezîzê Bidlîsî "*Dîwana Şeyda*", Kovara Hawarê. Ji bilî van berhem û xebatên ku navên wan hatin dayîn me ji gelek xebatên din jî sûdê wergirt û di warê peydakirina metnên mersîyeyan de me ji wan îstîfade kir.

Her weha ji ferhenga "*Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat*" a Ferit Develioğlu, "*Ferhenga Kurdî-Tirkî*" a Zana Farqînî û hin ferheng û çavkanîyên din jî ji bo vê xebatê ji wan sûd hatin wergirtin.

Ji bilî van kitêb û ferhengan di warê mersîyeyan de xebat li ser kovarên Kurdî jî hat kirin. Di vê bergehê de li ser 17 hejmarên Kovara Nûpelda, 56 hejmarên Kovara Kelhaamed, 57 hejmarên Kovara Hawar, 4 hejmarên Kovara Rojî Kurd, 17 hejmarên Kovara Nûbihar Akademî, 12 hejmarên Kovara The Journal of Mesopotamian Studies, 7 hejmarên Kovara Kurdîname, 38 hejmarên Kovara Nûdem, 46 hejmarên Kovara Nûbihar û li ser temamê hejmarên Kovara Hetawî Kurd û Jînê lêkolîn hat kirin û di warê metnên mersîyeyan de ji wan sûd hat wergirtin.

B.MERSÎYE Û PÊŞVEÇÛNA WÊ YA DI EDEBIYATA ROJHILAT DE

Însan, çawa ku ji dayik dibe û mezin dibe bi heman awayî dema ku wextê wî yê tayînkirî tê, bi rastîya "*Dê her nefis mirinê tehm bike*" ya ku di Qur'ana Kerîm de⁴ derbas dibe re rû bi rû dimîne û mirinê tehm dike. Pêxemberê Îslamê Hz. Muhemmed (s.x.l.) di hedîseke xwe de derbarê mirinê de dibêje: "*Wê mirina ku tehma devê meriv xera dike pir zêde bi bîr bînin.*"⁵ Mirin weke ku di ayetan de jî derbas dibe heqîqet e û weke ku di hedîsa şerîf de jî tê îzahkirin tehl e û tehma devê meriv xera dike. Bi

⁴*Qur'ana Kerîm û Meala Wê ya Kurdî*, Werger. Fikrî Amedî, Weş. Ensar, Ankara 2014, Sûreya 'Alî Îmran ayeta 185an, r.73.

⁵ İmam Nevevi, *Riyazüs Salihin*, (Tercüme:Prof. Dr. Emin Özafşar, Prof. Dr. Bünyamin Erul) Weş. Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 2020, c.2, r.36.

gotineke din meriv ji ber mirina kesekî ku ew jê hez dike êşê dikşîne û qebûlkirina vê heqîqeta mirinê jê re hêsan nayê. Dema ku nasê însanekî dimire û ger ew kesê ku mir jê bê hezkirin; wê demê êş û elema firaqa wî kesî dilan pir diêşîne û kezaban dişewitîne. Lewra barê mirinê giran e. Paul Velery derheqê vê êş û elemê de dibêje: “Bedena însên, cîhanê dike du beş: A ewil cîhana reng û xweşîyê û ya duyemîn jî cîhana êş û elemê.”⁶ David Le Breton jî derheqê êş û elemê de pênaseyeke wiha dike: “Êşa ku di nava bedena însên de cî girtiye, têkîliya mirov him ji dunyayê û him jî ji mirov bi xwe qut dike.”⁷ Ji bo vê êşa ku ji ber mirina kesekî bi însan re peyda dibe û tê gotin di nav Kurdan de navên mîna *lawij*, *xweşniyaz*, *xweşxwaz*, *dûrika mirîyan*⁸, *şîn*⁹ û mersîye hatiye bikaranîn.

Piştî van agahîyên derheqê mirin, êş û elemê de em ê derbasî pênaseya mersîyeyê bibin. Di edebiyata Îslamî de ji wan helbestên klasîk ên ku piştî mirina kesekî yan jî ji ber destçûyîna tiştekî bi qedr û qiymet tî nivîsîn re mersîye tê gotin. Di van helbestên ku ji wan re mersîye tê gotin de şîn ji bo kesê mirî tê girtin, pesnê wî tê dayîn û di‘a jê re tê kirin.

Mersîyeya (مرثیة pirjimara wê مرثی) ku koka wê رثی ye di Erebi de tê maneya girî û şingirtina li ser kesê mirî.¹⁰ Di ferhengên de derheqê mersîyeyê de pênaseyên wiha tî kirin: *Matema manzûmî*¹¹; *manzûmeya* ku li ser kesekî mirî hatiye nivîsîn¹²; *lawij*, *xweşniyaz*, *xweşxwaz*, *dûrika mirîyan*¹³; ew helbesta ku ji bo tê de pesnê kesê mirî bê dayîn û xemgînî û kovana ji ber mirinê bê nîşandan, hatiye nivîsîn¹⁴; *nezma* ku bi mebesta diyarkirina wesfên baş ên zilamekî ku mirîye an jî ji bo anîna zimên a ji wê êş û kerba ji ber mirina wî zilamî hatine nivîsîn¹⁵; *strana matemî* ya ku ji bo tê de pesnê kesê mirî bê dayîn hatiye nivîsîn, helbestên ku nexasim di wan merasîmên ji ber

⁶ David Le Breton, *Acının Antropolojisi* (Wergêr: İsmail Yerguz), Weş. Sel, İstanbul 2019, r.19.

⁷ H.b., r.19.

⁸ D.Îzolî, *Ferheng(Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî)*, Weş. Deng, İstanbul 2013, r.885.

⁹ Canser Kardaş, *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi(Dengbêjlik Ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme)*, Weş. Eğiten Kitab, Ankara 2017, r.150.

¹⁰ M. Faruk Toprak, *Endülüs Şiirinde Mersiye*, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doğu Dilleri Ve Edebiyatları Arap Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Teza Doktorayê, Ankara 1990a, r. 2.

¹¹ Mehmet Kanar, *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Weş. Say, İstanbul 2011, r.788.

¹² Ferit Devellioğlu, *Osmanlıca Türkçe Andisklopedik Lugat*, Weş. Aydın Kitap Evi, Ankara 2017, r.722.

¹³ Îzolî, h.b. r.885.

¹⁴ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, İstanbul 2014, r.306.

¹⁵ Şemseddin Sami, *Kamûs-i Türkî*, İstanbul 1978, r.1321. <https://www.pdfdrive2.com/kamus-i-t%C3%BCrki-d156729280.html> (Jêgirtin: 16.06.2021, Seat: 15.09.)

salvegera Hesên û Huseyînê lawên ‘Elî tèn tertîpkirin de tèn xwendin¹⁶ û bi girî hejmartina başî û qencîyên kesekî ku mirîye.¹⁷ Mersîye wek terîm jî, ew helbest in ku piştî mirina kesekî ji bo nîşandayîna xemgînîya ji ber mirina wî pêk hatiye tèn gotin.¹⁸ Ji bo mersîyeya ku di edebiyata Erebi de derketiye holê û ji wê derê jî di nav gelên Rojhilata Navîn de bi gotineke din di nav Faris, Kurd û Tirkan de belav bûye bê nivîsîn divê muheqqeq pêwendîya kesê nivîskar û mirî bi hev re hebe.¹⁹ Lewra ger ev pêwendî hebe wê demê nivîskar wê karibe wê êş û elemê di bedena xwe de hîs bike û bi terza mersîyeyê bîne ziman. Lêbelê ev qaîdeya ku me anî zimên carinan derbasdar nabe. Bi gotineke din mersîye li ser kesekî mirî yê ku têkilîya wî bi nivîskar re tune ye jî dikare bê nivîsîn. Lewra kesê ku mir ger di nav civakê de bê nasîn û jê bê hezkirin û yan jî rayedarê dewletê be wê demê ev nêzbûn û têkilî dibe yek alî.²⁰

Piştî van penaseyên ku ji bo mersîyeyê hatin kirin em ê wê mersîyeya yekem tehqîq bikin. Ji ber ku li ber destan di warê yekem mersîyeya ku hatiye nivîsîn de çavkanîyeke tekûz tune ye meriv nikare tiştekî eseh bibêje. Lêbelê li gorî hinek çavkanîyan mersîyeya yekem a ku însan ji ber êş û elema firaqa mirinê gotiye ya Hz. Adem e. Wî ji ber mirina lawê xwe Habîl ku Qabîl ew kuştîye pir zêde şîn girtiye²¹ û li ser wî mersîyeyek gotiye. Latîfî di berhema xwe de derheqê mersîyeya yekem de agahîyeke wiha dide:

“ *Di wan kitêbên dîrokî de veşartî ye û di qisseyên wan kesên ku xwedî lîsan in û ehlê karê xwe ne de eşkere ye ku Hazretî Adem; bavê însanan e, melekên muqarrebîn jê re çûne secdê û ferhenga axavtinê cara yekem jê re hatiye daxistin û ew yekem kes e ku kelama bi qafîye kiriye. Û ji dema wî vir ve ev kelama bi qafîye hat gotin û her ku çû zêdetir bû. Dema ku Qabîl birayê xwe Habîl qetil kir, ji dilê pak û paqij a Adem(a.s) rehetî û kêfxweşî koç kir û di çavên wî de*

¹⁶ Sir James W. Lexicon Redhouse, *Turkish And English Lexicon, Weş. Pirtûkxaneya Libnanê, Beyrûd 1987, r.1805.* <https://www.google.com/webhp?hl=tr&sa=X&ved=0ahUKEwj2o-yvolz3AhVxiv0HHV45DyEQPAGl> (Jêgirtin:22.06.2021, Seat:16.06.)

¹⁷ Muallim Naci, *Lugat-ı Nacî*, Weş. Asr, İstanbul, 1990, r.602. <https://ia802907.us.archive.org/26/items/lgatnaci0001na/lgatnaci0001na.pdf> (Jêgirtin: 22.05.2021, Seat:21.57.)

¹⁸ Mustafa İsen, *Dile Duran Ölüm*, Weş. Kapı, İstanbul 2012a, r.4.

¹⁹ *H.b.*, r.4.

²⁰ Rıdvan Canım, *Divan Edebiyatında Türler*, Weş. Grafiker, Ankara 2010a, r.130.

²¹ Ji bo agahîyên zêdetir ên derheqê meseleya kuştina Habîl de binêrin:

Jewish Encyclopedia, New York, London, 1905, c. I, r.48- 49.

<https://jewishencyclopedia.com/articles/216-abel> (Jêgirtin:01.12.2021, Seat:15:03.)

ji ber vê qetlê nûr nema. Lewra Habîl him lawê wî û him jî dostê wî bû. Ji ber vê yekê ew perîşan bû û her tim van çend beytên²² ku di terza mersîyeyê de bûn bi deng dikir û dixwand.”²³

Piştî agahîyên derheqê pênasaya mersîyeyê û mersîyeya ewil a ku hatiye nivîsîn em dikarin qala wan kesên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn bikin. Mersîye exleb li ser kesekî nas, alimekî navdar, mîrekî herêmê, padîşahê welatekî, şêx û mela, endamên malbatê û şehîdên Kerbelayê hatine nivîsîn. Her çî qas mersîye di destpêkê de li ser mirina însanan hatibin nivîsîn û gotin jî bi demê re lehengê ku li serê mersîye hatiye nivîsîn guherîya û ji xeynî însanan hinek mersîye li ser bajarên ku ji dest derketine yan jî li ser heywanekî ku pir jê tê hezkirin hatine nivîsîn. Ev guhartina naveroka mersîyeyê bi demê re çêbûye. Rıdvan Canım, di xebata xwe de derbarê vê yekê de wisa dibêje:

“Tê dîtin ku mersîye bi demê re bi hinek guhartinan re rûbirû mane û ew mersîyeyên ku di destpêkê de ji bo kişandina êş û elema ku ji ber mirina kesekî dihatin nivîsîn piştî qonaxekê libasa feryad û fixana ku ji ber bobelat û felaketên neteweyî tînin kişandin li xwe kirine. Nimûneyên wê pir zêde tunebin jî geh li ser axên ku ji dest derketine mersîyeyên bajarên û geh jî li ser heywanekî ku jê dihat hezkirin û miriye mersîyeyên heywanan hatine nivîsîn.”²⁴

Di beşên pêş de dê qala vê guherîna ya di edebiyata klasîk de bê kirin. Lêbelê li vê derê wek nîşe lazim e bê gotin ku ev guherîn di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî xwe nîşan daye. Lewra tê dîtin ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî mersîye li ser bajêr, welat û heywanan hatine nivîsîn. Me di beşên pêş de qala vê guherîna kir û ji bo wan mînak jî da.

Piştî van agahîyan divê em qala naveroka wê mersîyeyê bikin ku tê de qala başîyên kesê mirî tê kirin û li serê şîrînê girêdan. Lewra mersîyeyên klasîk tev ne wek hev û yek bin jî di nav xwe de hinek beşên cuda dihewînin. Yek ji van beşên sereke ya ku di nav mersîyeyan de cihê xwe digire êş û elema ku tê kişandine. Em dikarin vê yekê wek beşa şîngirtinê û girîyê bi nav bikin. Ev yek ji ber fîraqa kesê jê hezkirî tê kirin. Lewra windakirina nasekî tesîreke zêde li ser meriv dihêle û însan dizane kesê

²² “Wargeh û ew kesên ku li wan deran dijîyan hatin guhartin, însanên ku li ser rûyê erdê dijîyan pir qebe bûn. Heyfa Habîl e ku ew bi zilmê hat kuştin û hat xistin bin axê.”

Rıdvan Canım, *Latîfî Tezkiretû’ş-Şu’arâ ve Tabsîratü’n-Nuzamâ*, T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayınlar Genel Müdürlüğü, Ankara 2018b, r.46.

²³ H.b.,2018b, r.12.

²⁴ H.b. r.130.

mir êdî nema tê dinyayê. Ji ber vê yekê beşa şingirtin û girî di mersîyeyan de beşeke muhîm û sereke ye. Ji xeynî girî kategorîyên mîna: dayîna pesnê²⁵ kesê mirî, fanîbûna dinyayê, ji felekê re sitem, daxwazkirina sebrê, kirina di‘ayê û hwd. di mersîyeyan de cî digirin. Ev beş di her mersîyeyê de ne wek hev in. Car caran mersîyeyek bi pesnê dest pê dike carina jî bi sîtema ji felekê re yan jî bi feryad û fixanê dest pê dike û bi di‘aya ku tê kirin bi dawî dibe. Lêbelê hinek mersîye, ne di nav de beşa dawî ya tamamê mersîyeyan bi di‘a û temennîyan bi dawî dibe.²⁶ Divê bê destnîşankirin, Meriv dikare helbestên ku wek mersîye hatine nivîsîn wek cihê lêgerîna derd û kulan û tesellîkirina dilê ku ji ber firaqa êş û elemê dikşîne bi nav bike. Lewra vegera kesê mirî ne mimkûn e. Ev heqîqet ji teref însanan ve pir baş tê zanîn. Ji ber vê yekê helbestvan ji bo barê dilê xwe parîkek be jî sivik bike tiştên di dilê xwe de di helbestê de tîne zimên. Bi vê yekê huzna ji ber windakirina kesê ku jê tê hezkirin di van kelîmeyên mersîyeyê de dibin xwedî ruh.²⁷ Helbestkar dema ku vê yekê dike exleb di destpêkê de huzn û xemgînîya xwe tîne zimên. Piştî vê yekê kesê şa‘ir dest bi di‘ayan û daxwazkirina sebrê dike. Lewra kesê bawermend dizane ku Xweda di Qur’ana Kerîm de dibêje: *“Qesem be! Em ê we piçekî bi tirs û birçîbûnê; bi kêmkirina mal û can îmtîhan bikin. Mizgînê bide wan kesên ku sebir dikin. Ew, dema ku tiştek tê serê wan dibêjin ‘Em ji bal Xwedê hatin û em ê vegerin bal wî.’”*²⁸ Ji ber vê yekê kesê ku mersîyeyan li ser mirîyekî dinivîse digel şînê serî li sebr û di‘ayê dide. Breton di berhema xwe de derheqê çareserîya êş û elemê de dibêje: *“Însanê bawermend divê bi sebir be û li ber xwe bide... Ji bo kesê bawermend dermanê ewil îbadet û di‘a ye.”*²⁹ Însan ji ber êşa ku dikşîne sebir dike, lêbelê digel vê sebrê carina di mersîyeyan de ji ber mirina kesekî ji felekê re sitem tê kirin û gazin û gilî jê tê kirin.³⁰ Ji bilî vê yekê ger ji mirinê re kesek bûbe sedem di şûna felekê de ji wî kesî re bertek tê nîşandan û

²⁵ “Beytên ku tê de pesn û wesfê kesê mirî tê dayîn exleb bi mubalaxe ne. Ji ber vê yekê geh geh vegotin tevlihev dibe û famhkirina wê bi zehmet dibe.” Mine Mengi, *Eski Edebiyatımızın Mersiyelerine Toplu Bir Bakış*, Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi II, Prof. Dr. Harun Tolasa Özel Sayısı, İzmir 1983, r.100.

²⁶ Cafer Gariper, *Akif Paşa Ve Torunu İçin Yazdığı Mersiye Üzerine Bir Değerlendirme*, Hacettepe Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları, s. 2, h.3, Ankara, Payîz 2005, r. 55.

²⁷ Yakup Göçemen, *Cahiliyeden Endülüsün Yıkılışına Kadar Arap Edebiyatında Şehir Mersiyeleri*, Kilis 7 Aralık Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi 2020/1, c.7, h:1, r.282.

²⁸ *Qur’ana Kerîm û Meala Wê ya Kurdî*, Werger. Fikrî Amedî, Weş. Ensar, Ankara 2014, *Sûreya Baqarayê*, Ayeta 155-156an, r.23.

²⁹ Le Breton, *h.b.*, r.88.

³⁰ Mesut Bayram, *Enderunlu Fazıl’ın III. Selim Mersiyesi (İnceleme-Metin)*, Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, c. 21, h.39, Haziran 2018, r.19.

nifir li wî kesê musebbîb tê kirin³¹ û bi vî awayî ji bo nifşên bê ew mersîye di warê yadkirin û bîranînê de dibin amûreke muhîm³² û di nav civakê de cihekî muhîm digirin û însanan dikin bin tesîra xwe. Ew mersîyeyên ku di nav xwe de hinek beşên cuda dihewînin bi teşeyên nezmê yên mîna muxemmes, qesîde, mesnewî, museddés, tercî' bend, terkîbbend û hwd. hatine nivîsîn. Abdurrahman Adak derheqê teşeyên nezmê yên mersîyeyan de agahîyeke wiha di xebata xwe de parve dike: "*Di edebiyatên Îslamî de mersîye herî zêde bi teşeyên qesîde, terkîbbend û tercî' bendê hatine nivîsîn.*"³³ Lêbelê ev yek li gorî edebiyatên neteweyan tê guhartin. Wek mînak: Di edebiyata Kurdî de mersîye kêm caran³⁴ bi teşeya terkîbbend û tercî' bend hatine nivîsîn; lêbelê di edebiyata Tirkî de mersîye exleb bi terkîbbend û tercî' bendê³⁵ hatine nivîsîn.

Piştî van agahîyên derheqê mersîyeyê de em ê vêca jî beş bi beş li ser kevneşopîya mersîyeyê ya di edebiyata Erebi, Farisî û Tirkî ya klasîk de rawestin.

1. Mersîye di Edebiyata 'Erebî de

Her çi qas mersîyeya ewil a ku hatiye nivîsîn ne bi zimanê Erebi be jî wek gelek teşeyên nezmê yên din mersîye jî di edebiyata Erebi de derketiye holê û ji wê derê jî di nav edebiyata Îslamî de belav bûye. Di mersîyeya klasîk a Erebi de sê beşên sereke hene. Ev beş wiha ne: *Beşa girîyê (nedb-nehv) ya ku tê de êş û elema ku ji ber mirinê pêk hatiye tê gotin, beşa pesindayînê (te' bîn) ya ku tê de wesfê mirî tê dayîn û beşa tewsiyeyan (sabir, aza') a ku tê de ji bo li hember êş û elema ku tê kişandin tehemmul kirin.*"³⁶ Destpêka kevneşopîya mersîyeyê ya di nav Ereban de ji wan merasîmên cenazê yên dewra cahilîyê dest pê dike. Faruk Toprak, derbarê vê yekê de di xebata xwe de agahîyeke wiha dide: "*Destpêka mersîyeyê ya di edebiyata Erebi de digihêje wan gotinên bi qafîye û bi aheng ên ku di dewra cahilîyê de ji teref jinan ve di*

³¹ Ali Yörür, *Hasan Daniş Bey'in Kerbela Mersiyesi*, Hikmet Edebiyat Dergisi, Prof. Dr. Ali Nihad Tarlan Özel Sayısı, s:4, Aralık 2018, r.681.

³² Seyfullah Korkmaz, *Tokatlı Sâir Rızâî Ishâk b. Hasan'ın Bir Mersiyesi*, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi h: 12 s: 2002, r.189.

³³ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, İstanbul 2019a, r.143.

³⁴ Di beşa teşeyên nezmê ya tezê de rêjeya ku bi xebata ku hatiye amadekirin re têkildar e hat diyar kirin.

³⁵ Mustafa İsen, *Acıyı Bal Eylemek, Türk Edebiyatında Mersiye*, Weş. Akçağ, Ankara 1994b, r.13.

³⁶ M. Faruk Toprak, "Mersiye", Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004b, c. 29, r.215.

merasîmên cenazeyê de dihatin gotin.”³⁷ Di dewra cahilîyê de di nav Ereban de dema ku kesek dîmir adet bû ku pîrek li ser mirî şîn girê bidin, bigirîn û pesn û wesfê mirî bidin. Ji ber vê yekê di dewra cahilîyê de karektera ku di warê mersîyeyan de bi ser ketine jin in. Lewra jin ji hêla fitratê ve nazik in, li dijî zehmetîyan pir zû ditirsin û dema ku bi bûyereke mîna mirinê re rûbirû dimînin gelek zêde dilzîz û hestiyar dibin. Ji ber vê rewşê jin a di dilê xwe de bi şiklekî herikbar û hêsantir dikarin bînin ziman û dikarin gotinan xweş li hev bînin. Sedema yekem a serkeftina jinan a di vî warî de ev bû. Di vî warî de sedema duyemîn a serkeftina jinan bi paşve vekişîna mêran bû. Lewra mêr di dewra cahilîyê de di pey mirîyên xwe de şîn girê nedidan. Athraa Abdullah Abed Abed derheqê sedema şîngirênedana zilaman de dibêje: “*Ev yek wê dewrê ‘eyb dihat hesibandin. Ji ber ku adeteke wisa wê dewrê di nav Ereban de tunebû, dema ku Newwaraya xanima Ferazdaqî mir, wî li ser xanima xwe mersîye negot.*”³⁸ Ji ber van sedeman di edebiyata Erebi de mersîye di dewra cahilîyê de bi saxîya merasîmên şîngirêdanê derketiye holê û pêşve çûye. Di wê dewrê de; ji bo kesê ku mersîye dibêje, ji civîna pîrekan a ji bo girîna li ser mirî dihat kirin û ji pîreka ku porê xwe kaş dikir û xwe kurr dikir re navên taybet dihatin bikaranîn. Ev yek jî dewlemendiya wê dewrê ya di warê mersîyeyê de nîşanî me dide. Li gorî malûmatên ku Toprak, di xebata xwe de dide: “*Ji wê pîreka ku li ser mêrê xwe yan nasê xwe digirîya re Newwahe dihat gotin û Newwahe bi navên Rassa’a û Rassaya dihat binavkirin. Ji wê civîna ku pîrek ji bo li ser mirî bigirîn dikirin re jî Manaha dihat gotin. Ji wê pîreka ku ji ber mirinê porê xwe kaş dikir û xwe kurr dikir re jî Halîka dihat gotin.*”³⁹

Di edebiyata Erebi de yek ji temsîlkara herî kevnar û muhîm a mersîyeyê, Xensa(m. 24/645) ye.⁴⁰ Wê mersîyeya xwe li ser du birayên xwe yên ku di şer de hatine kuştin nivîsiye. Xensayê dema ku birayê wê yê bi navê Muawîye di şerekî de tê kuştin, li ser wî şîn girê daye û rondik barandine. Piştî kuştina Muawîye, di şerekî din de jî

³⁷Toprak, *h.b.*, 2004b, c. 29, r.215.

³⁸Athraa Abdullah Abed Abed, *El-Ferazdak’ın Şiirinde İslam’ın ve Ehl-i Beyt Sevgisinin Etkisi*, T.C. Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı Arap Dili ve Belagati Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, 2019 Kayserî, r.48.

³⁹ Toprak, *h.b.*, 1990a, r. 2.

⁴⁰ Omer Ferrûx, *Tarîxu’l-Edebi’l-‘Arabî, Daru’l-‘İlm lî’l-Melayîn*, Beyrud 1981, c.I, r. 317. (Neqilkar: Zahraa Mawaldî, *Endülüs Döneminde Şehirler Hakkında Yazılan Mersiyeler*, T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Anabilim Dalı Arap Dili Ve Belâgati Bilim Dalı, Teza Lîsana Bilind, Konya 2020, r.35.)

birayê wê yê din ê bi navê Sahr, dema ku hewl dida tola birayê xwe hilîne tê kuştin. Mersîyeya ku Xensa li ser kuştina du birayên xwe nivîsîye bi derketina rojê dest pê dike ku ev menzere wan birayên wê yên ku di şan û şerefê de dişbihin tavê bi bîra wê dixê.⁴¹ Di dewra cahilîyê de dema ku pîrek şîn digirtin; porê xwe kurr dikirin, li sînga xwe didan û carinan bi roj û heftîyan û carinan jî bi salan şîn digirtin. Lêbelê bi hatina Îslamê re ev adet bi hedîsên mîna: *“Ne bi deng (matem) û ne jî bi agir di pey cenazeyê de neçin”*⁴² û *kesê/a ku dema li ser kesê/a mirî şîn girt bi destên xwe li rûyê xwe bide, cilên xwe biçirîne û li gor adetên cahilîyetê tevbigere ne ji me ye*⁴³ hat guhartin. Bi vî awayî bi hatina Îslamîyetê adet û kevneşopîya cahilîyetê hat terkkirin û di mersîye û ta‘zîyeyan de serî li ber qeza û qederê hat tewandin ku ew ji teref Xwedê ve hatiye tayînkirin. Her çî qas bi hatina Îslamê di naveroka mersîyeyê de hinek guherîn çêbûbin jî hinek tişt wek xwe man û hebûna xwe ya di nava mersîyeyê de domandin. Wek mînak temaya tolhildanê him di dewra cahilîyê de him jî di dewra Îslamê de di mersîyeyan de dihat bikaranîn. Toprak derheqê vê mijarê de wiha dibêje: *“Di dewra cahilîyê de û di destpêka hatina Îslamê de di wan mersîyeyên ku hatin nivîsîn de sonda tolhildana kesê ku hatiye kuştin dihat xwarin û cî dihat dayîn temaya tirsandina dijmin.”*⁴⁴

Di dewra Îslamê de jî wek yên dewra cahilîyê gelek mersîye hatine nivîsîn. Dema ku Mut‘îm bin Adîyy mir Hesên bin Sabît,⁴⁵ dema ku di Herba Mûteyê de çend Mislîman şehîd dikevin Hesên bin Sabît û Kab bin Malîk li ser şehîdan mersîye⁴⁶ gotine. Di dewra Îslamê de mersîyeya ewil li ser Hz. Hemzayê ku di Herba Uhudê⁴⁷ de şehîd ket hatiye nivîsîn. Dema ku Hz. Hemza di wê herbê de şehîd dikeve Kab bin Malîk li ser wî mersîyeyek gotiye û tê de huzn û xemgînîya xwe anîye zimên.⁴⁸ Heta ku Pêxemberê Îslamê Hz. Muhammed (s.x.l) sax bû li ser gelek şehîdên Îslamê gelek

⁴¹ İsen, *h.b.*, 1994b., r.5.

⁴² İbrahim Canan (Tercüme ve Şerh), *Hadis Ansiklopedisi, Kütüb-i Sitté*, Weş. Akçağ, Ankara 2019, c.15. r.268.

⁴³ Muhyiddin en-Nevevî, *Riyâzü’s-Sâlihîn -Metin ve Çevirisi-*, Çeviri: Prof. Dr. M. Emin Özafşar- Prof. Dr. Bünyamin Erul, Weş. Diyanet, Ankara 2021, r.233.

⁴⁴ Toprak, *"Mersiye"*, *h.b.*, 2004b, r.215.

⁴⁵ Muhammed İbni Hişam, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.2, r.26.

⁴⁶ Muhammed İbni Hişam, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.4, r.34-38.

⁴⁷ Abidin Güzel, *İbni Abdîrabbîhin el-İkdul Ferid Adlı Eserinde Taziye ve Mersiye*, T.C. İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlahiyat Fakültesi Temel İslâm Bilimleri Arap Dili ve Belagati Anabilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Malatya 2020, r.31.

⁴⁸ Muhammed İbni Hişam, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.3, r.196.

mersîye hatin gotin. Dema ku Hz. Pêxember wefat kir di serî de qîza wî Fatima û her wisa kesên bi navê Hz. Erwa, Hz. Safîyye, Hz. Ebu Bekir, Hz. Omer û gelek kesên din li ser Hz. Muhammed (s.x.l.) gelek mersîye gotin.⁴⁹ Ji xeynî van mersîyeyan, di dewra Ebbasî û Emewîyan de li ser şehadeta Hz. Huseyîn, li ser heywan û bexçeyan, li ser ji destçûna Endulus, li ser daxwaza kesekî û li ser mirina xwe bi xwe jî mersîye hatine nivîsîn.⁵⁰ Bi vî awayî kevneşopîya mersîyeyê ya di nav Ereban de berdewam kir. Lê divê di vir bal bê kişandin li ser mijareke muhîm. Mersîyeyên ku di dewra cahilîyê û Îslamîyetê de li ser însanan dihatin nivîsîn di demên pêş de weke ku li jorê hat destnîşankirin êdî ji xeynî însanan li ser; heywan, bajêr, bexçe û hwd. hatin nivîsîn. Fuat Köprülü (m.1966) di xebeta xwe de derbarê vê guherînê de agahîyeke wiha dide: *“Di pêvajoyê de xelesa mersîyeyê berfireh bû û mersîyeyên ji bo felaket û bobelatên ku dihatin serê însên dihatin gotin libasa matem û şînen neteweyî li xwe kirin û bûn xwedîyê şiklê qerîna bi kovan.”*⁵¹

2. Mersîye di Edebiyata Farisî de

Kevneşopîya mersîyeyê ya ku di edebiyata Erebi de derket holê, pêşve çû û gihaşt lûtkeya xwe digel temamê taybetmendîyên xwe derbasî edebiyata Farisî bû û her ku çû pêşve çû û dewlemendtir bû. Nîqaşên ku li ser tespîtîkirina yekemîn helbesta ku bi şiklê mersîyeyê di edebiyata Farisî de hatiye nivîsîn heta îro berdewam dikin. Li gorî çavkaniyan, kevneşopîya mersîyeyê di edebiyata Farisî de di sedsala VIIIem de dest pê kiriye.⁵² Tê diyarkirin Rûdekî (m.940) him şa'irê ewil e ku bi Farisîya nû nivîsîye⁵³ û him jî mersîyenûsê ewil e ku wî mersîyeyek li ser Ebu'l Hesenê Muradî (m.914) û mersîyeyek jî li ser Şehîdê Belxî (m.935) nivîsiye.⁵⁴ Em dikarin edebiyata Farisî wek ya Erebi di warê mersîyenûsîyê de bikin du qonax û mersîyeyên ku di van qonaxan de hatine nivîsîn binirxînin. Derheqê kevneşopîya mersîyeya Farisî ya berîya

⁴⁹ M. Asım Köksal, *İslam Tarihi-Peygamberler Peygamberi Hazreti Muhammed ve İslamiyet*, Weş. Işık, İzmir 2011, c.7-8, r. 813.

⁵⁰ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Bilal Çelik, *Hafız İbrahim'in Divanındaki Mersiye ve Tercümelere*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri Anabilimdalı, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul 2019, r.31-32-33-34.

⁵¹ Fuat Köprülü, *Bizde Mersiye ve Mersiyeciler*, Yeni Mecmua, 1917, h.17, r.328.

⁵² Nasrallah İmamî, *Mersîyeserayî Der Edebiyatê Farisî İnan*, Weşanxaneyê Deftera Navendî ya Cihadê Danişgahî, Tehran 1369, r.9.

⁵³ Hellmut Ritter, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi Karşılaştırmalı Edebiyat Metinleri*, Edîtor: Mehmet Kanar, İstanbul 2011, Weş. Ayrıntı, r.102.

⁵⁴ Ersin Selçuk, *İnan Edebiyatında Mersiye Türleri*, Doğu Araştırmaları Dergisi, s:2, s.5-22, 2013

Îslamê de em dikarin bibêjin ku ji çend agahîyên hejmartî pêve tu agahî nehatin dîtin. Nasrallah Îmamî di xebata xwe de derbarê mijarê de agahîyeke wiha bi me re parve dike: *“Li gorî gotin û rîwayetan di dewra berîya Îslamê de mersîyenûsî, di edebiyata Farisî de di rewacê de bûye. Yek ji wan mersîyeyên wê dewrê yê ku tê zanîn bi zimanê Pehlewîyê Eşkanî ye û li ser mirina rêberekî manewî yê bi navê Merzkû hatiye nivîsîn.”*⁵⁵ Çawa ku bi hatina Îslamê di edebiyata Erebî de qonaxeke nû vebûbe bi heman awayî di edebiyata Farisî de jî qonaxeke nû vebûye û helbestvanên Faris di vê qonaxê de karê nivîsîna mersîyeyê domandine. Li gorî Îmamî, mersîyeya herî kevin a ku di qonaxa Îslamî de hatiye nivîsîn a Ebûl Yenbexî (m.?) ye ku wî mersîyeya xwe derbarê wêranbûna Semerqandê de nivîsîye.⁵⁶ Ev mersîye di berhema bi navê *el-Mesalîk vel-memalîk* a Îbn Hurdazbîh (m.912-3) de heye.⁵⁷ Di vê qonaxê de mersîyeya duyemîn jî ji teref Muhemmed bin Wasîf Sîstanî (m.?) ve hatiye nivîsîn. Wî mersîyeya xwe bi Darîya Farisî û bi teşeya qesîdeyê li ser dîroka Sîstanê hûnandiye.⁵⁸ Zeynel ‘Abidîn Mu‘temen di berhema xwe ya bi navê *Şi‘r û Edebê Fairisî* de derheqê yekemîn mersîyeya bi Farisî de agahîyeke wisa bi me re parve dike :

*“Şa‘irê yekemîn ê ku hatiye tespîtîkirin mersîye nivîsîye Rûdekî ye û nediyar û nehatiye dîtin ku helbestvanên berî wî û hevdemê wî mersîye nivîsîne yan na. Helbestên ewil ên ku bi teşeya mersîyeyê hatine nivîsîn ji teref Rûdekî ve hatine nivîsîn. Hatiye dîtin ji wî sê mersîye mane. A ewil Rûdekî li ser helbestvanê bi navê Ebûl Hesên Muradî ku hatiye tespîtîkirin jê re Senayî jî tê gotin mersîyeyek nivîsîye. Rûdekî mersîyeya xwe ya duyemîn jî li ser helbestvanê bi navê Şehîd Belxî nivîsîye. Mersîyeya dawî ya Rûdekî ya ku li ber destan e nediyar e li ser kî hatiye nivîsîn.”*⁵⁹

Nasır Mohseni Neya- Arezou Porizdan Penah Kırmani jî derbarê vê mijara yekem mersîyeya bi Farisî de piştgirî didin gotina Mu‘temen û dibêjin: *“Mersîye di edebiyata Farisî de xwedîyê cihekî taybet e û cara ewil di dewra şa‘irên ewil ên Farisî de hatiye dîtin. Yanî di dewra Rûdekî de. Mersîye îro jî tesîra xwe bi helbestên dewra me nîşan dide.”*⁶⁰ Gelek lêkolînerên din jî di vî warî de tînin zimên ku di edebiyata

⁵⁵ Îmamî, *h.b.*, r.20.

⁵⁶ *H.b.*, r.23.

⁵⁷ Çetin Kaska, *Fars Edebiyatında İlk Mersiyeler*, Rümelide Dil Ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, s. 2019, h.145, r.254.

⁵⁸ Îmamî, *h.b.*, r.24.

⁵⁹ Zeynel ‘Abidîn Mu‘temen, *Şi‘r û Edebê Fairisî*, Weş. Kitêbxaneya Îbnî Sîna, Tehran 1333, r.47.

⁶⁰ Nasır Mohseni Neya- Arezou Porizdan Penah Kırmani, *Mersîyeserayî Der Edebê Farisî û ‘Erebî*, Edebiyatê Tetbîqî, s.2, h.8, r.178.

Farisî de mersîyenûsê ewil Rûdekî ye. Lêbelê lêkolînerê bi navê Nasrallah Îmamî li dijî vê tespîta ku hatiye kirin derdikeve û dibêje:

“Ji ber ku îro êdî derket holê û tê zanîn berîya Rûdekî jî gelek helbestvanên Faris ên mîna Şehîd, Muradî, Ebû Şekûr hene, meriv nikare bibêje ku di edebiyata Farisî de şî‘ir bi Rûdekî dest pê kiriye. Çawa ku helbesta Farisî bi Rûdekî dest pê nake bi heman awayî di edebiyata Farisî de kevneşopîya mersîyeyê jî bi Rûdekî dest pê nake. Derbarê vê yekê de rehmetyê Se‘îd Nefîsî dibêje: ‘Helbestvanên Faris ên ku berîya Rûdekî jiyana mersîye nenivîsîne.’ Ev gotina Nefîsî ne tenê ya neqebûlîkirinê bi heman awayî tişteki pir ecêb e. Lewra şa ‘irên berîya Rûdekî di warê mersîyenûsîyê de bêtecrûbe nebûn...’⁶¹

Di edebiyata Farisî de nimûneya duyemîn a mersîyeyê aîdî Ebûl Abbas Fazil bin Abbas (m.?) e.⁶² Wî ev mersîyeya xwe ji bo Nasir bîn Ehmed Samanî (m.943) nivîsîye. Piştî van agahîyan em dikarin qala mijara senifandina mersîyeyan û mijara mersîye di edebiyata Farisî de exleb bi kîjan teşeya nezmê hatine nivîsîn bibin. Kesên ku di vî warî de xebat kirine di edebiyata Farisî de mersîye dikin sê beş. Lê carinan hinek ji wan hinek beşên din jî li wan zêde dikin. Wek mînak, Mu‘temen dibêje: *“Mersîye dibin sê beş: Mersîyeyên ku li ser padîşah û mezinên dewletan hatine nivîsîn, mersîyeyên ku li ser şexs û malbatê hatine nivîsîn û mersîyeyên mezhebî.”*⁶³ Lêbelê kesên mîna Abdulrîza Efemrî Kerbanî beşeke din li ser vê listeyê zêde dikin û dibêjin mersîyeyên ku di warê welat de jî hatine nivîsîn hene.⁶⁴ Di edebiyata Farisî de mersîyeya ewil a ku li ser şexsên muhîm û navdar, bi gotineke din li ser padîşah an jî birêveberekî hatiye gotin a Ferrûxî (m.1037-1038) ye. Wî mersîyeya xwe li ser mirina Sultan Mahmud (m.1030) nivîsîye.⁶⁵ Wekî din Mu‘izzî (m.1124-1127), Sa‘dî (m.1210), Enwerî (m.1189), Xaqanî (m.1199), Cemaleddîn Îsfehanî (m.1192)⁶⁶ jî li ser mezinên dewletê mersîye nivîsîne. Di edebiyata klasîk a Farisî de cûreyeke din a mersîyeyê, ew mersîye ne ku li ser şexsan bi gotineke din ew mersîye ne ku li ser endamekî malbatê hatine nivîsîn. M. Zeliha Stebler Çavuş ji bo vê beşê dibêje, di nav mersîyeyên ku bi Farisî hatine nivîsîn de mersîyeyên li ser zarokan hatine nivîsîn

⁶¹ Îmamî, *h.b.*, r.85.

⁶² Mu‘temen, *h.b.*, r.48.

⁶³ *H.b.* r.50.

⁶⁴ ‘Abdulrîza Efemri Kerbani, *Nigerîş bi Mersiyeserayi Der Îran*, 1371 Weş. Ittilaat r.16.

⁶⁵ Tahsin Yazıcı, *Mersiye(Fars Edebiyatı)*, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004, c.29, s. 218.

⁶⁶ Mu‘temen, *h.b.*, r.51

cihekî pir muhîm digirin.⁶⁷ Mu'temen jî di xebata xwe de derheqê mijarê de agahîyeke wiha bi me re parve dike:

*"Fîrdewsî (m.1020) dema ku 65 salî bû lawê wî di 37 salîya xwe de wefat kir. Wî li ser lawê xwe mersîyeyek nivîsî, Mes'ûd Sa'd (m.1121) li ser mirina lawê xwe Salih bi teşeya rubaî' mersîyeyek nivîsî, Xaqanî dema ku 50 salî bû lawê wî yê 20 salî Reşîduddîn mir ku wî li ser wî mersîyeyeke bi terza qesîdeyê nivîsî. Wekî din jî helbestvanên yên wê dewrê yên bi navê Kemaluddîn Îsfehanî (m.1240) li ser lawê xwe û bavê xwe, Sa'dî li ser lawê xwe, Hafîz (m.1390), Emîr Xusrewî Dehlewî (m.1375) li ser dê û birayê xwe, Molla Camî (m.1492) li ser lawê xwe û Muhteşem Kaşî (m.1588) li ser birayê xwe û lawê xwe mersîye nivîsîne."*⁶⁸

Di edebiyata Îranê de di van çend sedsalên dawî de ji van her sê beşan, mersîyeyên mezhebî pir zêde derkevin pêş û niha jî balan dikşînin li ser xwe. Ev mersîye, piranî li ser Hz. Huseyîn û ehlê wî hatine nivîsîn ku ew Hicrî di 10ê Muharrema sala 61ê (Miladî: 10 Cotmehê sala 680î) de li Kerbelayê hatin qetilkirin.⁶⁹ Ji ber vê yekê ji bo van mersîyeyên mezhebî navê Maqtelê Huseyn⁷⁰ jî tê bikaranîn. Di warê mersîyeyên Kerbelayê de berhema mensûr a herî kevnar di sedsala IXemîn⁷¹ de ji teref Molla Huseyîn Kaşîfî (m.1504) ve hatiye nivîsîn ku navê vê berhema wî *Rawzatu 'ş- Şuheda* ye. Di vê kitêba ku ji çend rawzayan pêk tê de qala wê musîbeta ku hatiye serê Hz. Huseyîn û ehlê wî tê kirin.⁷² Ji heyama Safewîyan pêve di warê mersîyeyên mezhebî de gelek zêde mersîye hatine nivîsîn. Lewra di dewra Safewîyan de Şîfî bûbû mezheba fermî ya dewletê. Ji ber vê yekê di vî warî de gelek şa'ir mersîye nivîsîn⁷³ û ev kevneşopiya mersîyeyên ku derheqê meseleya Kerbelayê de hatin nivîsîn hebûna xwe heta roja me ya îro bi şiklekî xurt domandin. Her sal di 10ê Muharremê de li Îranê ji bo Hz. Huseyîn û ehlê wî bîranîn merasîmên bi navê sînezen tîrî tertîpkirin û li ser şehadeta wan mersîye tîrî gotin, şîna wan tîrî girtin û li ser wan rondik tîrî rijandin. Ji bilî van mijaran di edebiyata Farisî de li ser mijarên

⁶⁷M. Zeliha Stebler Çavuş, *Türk Edebiyatında Mersiye*, Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Erzurum 2008, h.38, r.135.

⁶⁸ Mu'temen, *h.b.*, r.54-55.

⁶⁹ Abdu'l-Rizâ Efserî Kirmanî, *Nigerîşî be Mersiye-serâî der Irân*, Weşanxaneyê Ittila'at, Tehran 1371, r.104.

⁷⁰ Abdullah Muaz Güven, *Sahâbe-i Kirâm'ın Hz. Peygamber İçin Yazdıkları Mersiyeler*, T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslâm Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı Türk-İslâm Edebiyatı Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Konya 2017, r.36.

⁷¹ Ev dîrok a hicrî ye, ger em vê yekê wek ya miladî binivîsînin teqabûlî sedsala XVem dike.

⁷² Efserî Kirmanî, *h.b.*, r.110.

⁷³ Yazıcı, *h.b.*, r.218.

mîna lehî, nexweşîyên giran, erdhej û komkujîyan jî mersîye hatine nivîsîn.⁷⁴ Di edebiyata Farisî de tê dîtin mersîye dibe ku bi her teşeya nezmê hatibe nivîsîn. Lêbelê exleb bi teşeya qesîde, qita, tercî‘bend, terkîbbend û carinan jî bi teşeya xezel, rûbaî û mesnewîyê mersîye hatine nivîsîn. Lêbelê li gorî tespîta ku ji teref Mu‘temen ve hatiye kirin di edebiyata Farisî de mersîyeyên ewil bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Di pêvajoyê de kesên ku bi teşeya mesnewîyê nivîsîne jî derketine. Digel vê yekê hinek şa‘îr çend qalibên din bi kar anîne ku em dikarin ji vê yekê re Fîrdewsî û Hafîz mînak bidin. Hafîz bi teşeya xezelê û Fîrdewsî jî bi teşeya mesnewîyê mersîyeyên xwe nivîsîne.⁷⁵ Divê bê diyarkirin di edebiyata Farisî de kêma carnan be jî bi teşeya nezmê ya xezelê mersîye hatine nivîsîn.⁷⁶

3. Mersîye di Edebiyata Tirkî de

Piştî ku mersîye wek cureyekê nezmê di nav edebiyata Erebî de derket holê û derbasî edebiyata Farisî bû bi demê re di nav edebiyatên gelên din jî cî girt û pêşve çû. Yek ji van edebiyetan, edebiyata Tirkî ya klasîk e. Di qada edebiyata Tirkî ya klasîk de nimûneya ewil a mersîyeyê di sedesela XIVem de hatiye dîtin. Berî ku em derbasî nimûneyên ewil ên mersîyeyên di edebiyata Tirkî ya klasîk de bibin divê wek beşeke taybet em qala tradîsyona şingirtinê ya li ser mirîyan a di nav civakên Tirkan de bikin. Berîya Îslamê di civakên Tirkan de dema kesek dîmir li ser wî kesî saguyên ku tê wateya zêmar⁷⁷ û mersîyeyê dihatin gotin. Di van helbestan de pesnê mirî dihat dayîn û qala mêranîya wî kesî dihat kirin.⁷⁸ Ev cur helbest di helbesta gel a Tirkî de bi navê ağıtê(zêmar) tê binavkirin û di vî warê de yek ji wan cureyên herî qedîm e.⁷⁹ Li gorî Köprülü, mersîyeyên ku di edebiyata Tirkî ya qedîm de jê re sagu dihat gotin, şiklê herî dewlemend û bi qiymet a helbesta Tirkî bû.⁸⁰ Divê bê destnîşankirin zêmar di edebiyata Tirkî de xwedîyê kevneşopîyê gelek qedîm e. Zêmara ku ji bo Alp Er Tunga li ser stûnên Orhun hatiye nivîsîn û di berhema *Divani Lugati`t Türk* de hatiye

⁷⁴ Kaska, *h.b.*, r.256.

⁷⁵ Mu‘temen, *h.b.*, r.49.

⁷⁶ Yazıcı, *h.b.*, r.218.

⁷⁷ “Zêmar(Ağıt) ji wan helbestên ku tê de qala êş û elema ji ber mirina kesekî/ê tê kişandin, tîn kirin re tê gotin. Digel anîna zimên a êş û elemê tê de qala qencî û wesfên kesê/a mirî jî tê kirin.” Çavkanî: Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2016, r.348.

⁷⁸ Ensar Aslan, *Türk Halk Edebiyatı*, Weş. Maya Akademi, Ankara 2010, r.104.

⁷⁹ *H.b.*, r.161.

⁸⁰ Fuat Köprülü, *Bizde Mersiye ve Mersiyeciler*, Yeni Mecmua, İstanbul 1917, h.16, r.305-306.

nîşandan ji bo vê cureyê ya ewil e. Di wê dewrê de zêmar ekserîyet ji teref pîrekan ve bi wezna heceyê hatine gotin.⁸¹ Li gorî Îskender Pala di edebiyata Tirkî de zêmara ku di *Kutadgu Bilîg* de li ser Alp Er Tunga(b.m.624) hatiye nivîsîn pir bi nav û deng e.⁸² Di edebiyata Tirkî de meriv dikare tradîsyona şîngirtinê wek sê qonaxan bisenifîne: edebiyata Tirkî ya berîya Îslamê, edebiyata gel a ku di bin tesîra Îslamîyetê de maye û edebiyata Tirkî ya klasîk. Cevat Yerdelen ji bo terîma şînê ya ku di van her sê qonaxan de hatiye bikaranîn, agahîyeke wiha bi lêkolîneran re parve dike:

*“Ji van helbestên bi vî awayî re angî ji bo şîngirêdanê hatine nivîsîn di edebiyata Tirkî ya berîya Îslamê de ‘sagu’, di edebiyata gel a ku di bin tesîra Îslamîyetê de maye de ‘ağıt’ û di edebiyata Tirkî ya klasîk de jî ‘mersîye’ tê gotin.”*⁸³

Ahmet Talat Onay jî dema ku helbestên van her sê qonaxan dide ber hev dibêje: *“Wekî helbestvanên arûzê bi heman awayî helbestvanên saz û gel jî di dîwanên xwe de piştî ilahî, munacat, na`t û tewhîdê di vê beşê de helbest nivîsîne. Navê wê mersîye ye û exleb bi arûzê tê nivîsîn.”*⁸⁴ Di navbera wan zêmaren ku di edebiyata gel de dihatin gotin û mersîyeyan de wekhevîyek heye. Ev wekhevî di warê mijarê de ye. Angî ji hêla naverokê ve li hev digirin. Lewra di her du cureyan de jî ji ber mirina kesekî şîn tê girtin û tê de pesnê kesê mirî tê dayîn û qala wesfên wî tê kirin. Di edebiyata Tirkî de zêmaren ku li pey mirîyan dihatin gotin dibin du beş: Ên ku kesê gotiye diyar e ku ev helbest ji teref aşiqan ve dihatin gotin û ên ku kesê gotine nediyar e.⁸⁵ Piştî agahîyên di her du heyamên ewil ên edebiyata Tirkî ya derheqê şînê de vêca jî em dikarin derbasî kevneşopîya mersîyeyê ya ku ber dewama tradîsyona şîngirtinê ye û di edebiyata Tirkî ya klasîk de cî girtiye bibin. Li Anatolîyayê di warê mersîyeyê de helbesta ewil di sedsala XIVem de ji teref Ahmedî (m.1413) ve li ser mirina Suleyman Şahê (m.1387) Begê Germîyanan hatiye nivîsîn.⁸⁶ Piştî wî di wê qonaxê de Şeyxî (m.1431) bi teşeya tercî`bendê mersîyeyek ji Yaqubê Duyemîn (m.1431) re

⁸¹ Saad Yousif Jasim, *Endülüs Mersiyesi'nin Tercüme Ve Tahlili*, T.C. Erzincan Binali Yıldırım Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Erzincan 2019, Lîsansa Teza Bilind, r.20.

⁸² Pala, *h.b.*, r.307.

⁸³ Cevat Yerdelen, *Azmizade Haleti'den Bir Mersiye*, A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Erzurum 1999, h.12, r.133.

⁸⁴ Ahmet Talat Onay, *Türk Halk Şiirinin Şekil ve Nev'i*, Amd. Prof. Dr. Cemal Kurnaz, Weş. Akçağ, Ankara 1996, r.306.

⁸⁵ Kardaş, *h.b.*, r.100.

⁸⁶ Çavuş, *h.b.*, r.136.

nivîsiye ku ew ji mala Germîyanan e.⁸⁷ Şa‘irên mîna Kemal Ummî (m.1475), Ahmet Paşa (m.1497), Cem Sultan (m.1495), Cafer Çelebî (m.1514), Firdewsî (m.1513), Mesihî (m.1512), Aynî (m.1490) û Necatî (m.1508) jî di warê mersîyeyê de helbest nivîsîne.⁸⁸ Di edebiyata Tirkî de ji ber tesîra patronajê ango ji ber ku padîşah û kesên mîna wî ji şa‘iran re xwedîtî dikirin mersîyeyên ku li ser padîşah û şehzadeyan hatine nivîsîn zêdetir derdikevin pêş. Abdullah Muaz Güven di xebata xwe de mersîyeyên Kerbelayê yên bi navê “*Muharramîye*” û “*Maqtel*”⁸⁹ jî li wan mersîyeyên ku di edebiyata Tirkî de herî zêde hatine nivîsîn zêde dike.⁹⁰ Li gorî Cemil Çiftçi, nimûneya ewil û muhîm a mersîyeya klasîk a derheqê Kerbelayê de ji teref Yazıcıoğlu Mehmed (m.1451) ve hatiye nivîsîn. Mersîyeyên ku di warê hedîseya Kerbelayê de hatine nivîsîn di sedsalên XVI, XVII û XVIIIem de hejmarê wan li gorî mersîyeyên din zêdetir e.⁹¹ Li gorî malûmata ku Ali Yörür dide mersîyeya herî qedîm bi navê *Maqtel* a ku wek berhemeke mustaqîl hatiye nivîsîn a Şazîyê Kastamonî (m.1362) ye. Wî, ev mersîyeya xwe di sedsala XIVem de nivîsiye.⁹² Di edebiyata Tirkî ya klasîk de bes di sedsala XVan de tenê 16 heb mersîye hatine nivîsîn⁹³ û digel pêşveçûn û bihêzbûna dewleta Osmanî kevneşopîya ji mezinên dewletê re nivîsîna mersîyeyan jî pêşve çûye. Ji ber vê yekê di sedsala XVIem de mersîye him ji hêla naverokê û him jî hêla hejmarê ve derketîye lûtkeya xwe û di sedsala XVIem de tevde 68 mersîye hatine nivîsîn.⁹⁴ Çavuş, dibêje ku di vê sedsala XVIem de şa‘irên mîna; Revanî (m.1523), Turabî (m.1524), Usûlî (m.1538), Mahremî (m.1536), Kemal Paşazade (m.1533), Lami‘î (m.1532), Hayretî (m.1534), Yetîm (m.1553), Aşqî (m.1551), Nazmî (m. piştî 1555an), Arşî (m.1551), Fazlî (m.1564), Xeyalî (m.1570), Şewqî, Qadirî (m.1548), Baqî (m.1600), Manî(1598-1599), Fevrî (m.1571), Ubeydî (m.1573), Nev‘î (m.1600), Nisayî, Ulvî (m.1575), Rahmî (m.1568), ‘Alî (m.1600), Rûhî (m.1605), Fununî (m.1600), Mu‘înî (m.1591), Selîmî (m.1520) û Samî mersîye nivîsîne û di vê sedsalê de exlebe ji padîşah, şehzade û rayedarên dewletê re mersîye hatine nivîsîn.⁹⁵ Li gorî

⁸⁷ İsen, *h.b.*, 1994b, r.8.

⁸⁸ Çavuş, *h.b.*, r.136.

⁸⁹ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Şeyma Güngör, “*Maktel-i Hüseyin*”, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2003, c. 27, s.456-457.

⁹⁰ Güven, *h.b.*, r.37.

⁹¹ Cemil Çiftçi, *Divan Şiirinde Kerbela Ağıtları*, Weş. Kevser, İstanbul 2008, r.16.

⁹² Yörür, *h.b.*, r.681.

⁹³ İsen, *h.b.*, 1994b,r.9.

⁹⁴ *H.b.*, r.9.

⁹⁵ Çavuş, *h.b.*, r.136.

Mustafa İsen jî di vê sedsalê de herî zêde li ser Şehzade Mustafa mersîye hatine nivîsîn ku hejmara van mersîyeyan 16 e.⁹⁶ Dema ku dîrok sedsala XVIIem nîşan dida di dewleta Osmanîyan de dewra paşveçûyînê dest pê kir. Digel paşveçûyîna siyasî di warê çand û hunerê de pêşveçûyîn berdewam kiriye; lêbelê di vê sedsalê de li ser şehzadeyan qet mersîye nehatine nivîsîn. Dîsa di vê qernê de hejmara mersîyeyên ku li ser padîşahan hatine nivîsîn kêr bûne û ger padîşahêk bi şiklekî derasayî û ecêb miribe li ser wî mersîye hatine nivîsîn.⁹⁷ Dema ku em bi giştî li vê qernê mêze dikin em dibînin ku di vê qernê de exlebe li ser endamên malbatê⁹⁸ mersîye hatine nivîsîn. Di vî warî de şa'irên mîna: Nevizade 'Atayî (m.1635), Ramî Abdurrahman Çelebî (m.1640), Nergisî (1635), Ramî (m.1654), Haletî (m.1635), Riyazî (m.1644) û kesên mîna wan derdikevin pêş.⁹⁹ Di sedsala XVIII û XIXem de jî hejmara kesên ku mersîye nivîsîne pir zêde kêr dibe û di vî warî de bes navên şa'irên mîna Hamî (m.1747), Kanî (m.1791), Şêx Galîb (m.1799), Leyla Xanim (m.1847), Şeref Xanim (m.1861) û Yenişehirlî Avnî (m.1883) tê zikiririn.¹⁰⁰

Çawa ku di edebiyatên din ên mîna Erebi û Farisî de li ser bajêr û heywanan mersîye hatibin nivîsîn, bi heman awayî di edebiyata Tirkî ya klasîk de jî mersîye li ser heywan û bajarên hatine nivîsîn. Di vî warî de mersîyeya ewil a ku li ser heywanan hatiye nivîsîn a Necatî (m.1509) ye ku wî li ser hêstirê xwe yê ku mirîye mersîyeyeke bi navê *Mersîye-î Ester*¹⁰¹ û Me'alî jî li ser pisîka xwe mersîyeyeke bi navê "*Hirrename*"¹⁰² nivîsîye. Dîsa di edebiyata Tirkî de ji bilî mersîyeyên ku li ser şexsan hatine nivîsîn mersîyeyên ku li ser bajarên hatine nivîsîn jî pir zêde hene. Wek mînak mersîyeyeke bi navê *Weten* ji teref Asim û Namik Kemal (m.1888) ve hatiye nivîsîn.¹⁰³ Kevneşopîya mersîyeyê ya ku di sedsala XIVem de di edebiyata Tirkî de derket holê

⁹⁶ İsen, *h.b.*, 1994b, r.10.

⁹⁷ *H.b.*, r.10.

⁹⁸ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Yasemin Karakuş, *Seyyid Nizamoğlu Mersiyelerini İçeren Bir Şiir Mecmuası: Mecmû'a-i Kasaid*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, İstanbul 2014, Teza Lîsansa Bilind, r.12.

⁹⁹ Akram Baqer İbrahim, *Irak Türkmen Mersiyelerinin Halk Bilimi Açısından İncelenmesi*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı Türk Halk Edebiyatı Bilim Dalı, Teza Doktorayê, İstanbul 2019, r.18.

¹⁰⁰ İsen, *h.b.*, 1994b, r.14.

¹⁰¹ Çavuş, *h.b.*, r.137.

¹⁰² Mehmet Yalçın Yılmaz, *Türk Din Musikisinde Mersiyeler ve Mersiyehanlar*, T.C. Marmara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlahiyat Anabilim Dalı İslam Tarihi ve Sanatları Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul 2006, r.9.

¹⁰³ Pala, *h.b.*, r.307.

û di dema Osmanîyan pêşve çû, piştî sedsala XVIIIem jî hebûna xwe di edebiyata Tanzîmat û Servetî Funun¹⁰⁴ de domand.



¹⁰⁴ Mustafa İsen, *Mersiye(Türk Edebiyatı)*, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004c, c. 29, r.219.

BEŞA YEKEM

DESTPÊK Û PÊŞVEÇÛNA KEVNEŞOPÎYA MERSÎYEYÊ DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK DE

Di edebiyata Kurdî de hinek peyv û têgeh hene ku gelê Kurd berê pê êş û elem, keser û kovan an jî xemgînîyên xwe anîne zimên. Di roja me ya îro de jî bi van peyv û têgehên gelê Kurd êşa xwe tîne zimên. Ev yek carina ji ber mirina kesekî an jî heywanekî ku jê tê hezkirin, carina ji ber destçûna welatekî an jî dûrbûna ji welêt û carina jî ji ber êş û elema nexweşîya ku mirinê tîne bîra mirov wek gotin xwe nîşan daye. Dema ku em li edebiyata Kurdî mêze dikin em dibînin ku di zaravayê Kurmancî, Soranî û Zazakî de hinek peyv û têgeh ji bo destnîşankirina vê êş û elemê hatine bikaranîn. Di edebiyata Soranî de ji bo vê yekê *lawandin*, *şîwen*, *matemî*; di edebiyata Kurmancî de *mersîye*, *zêmar* û *şîn* û di edebiyata Zazakî de jî peyvên *mîna lornayîş*, *dîma bermayîş* û *mersîye* hatiye bikaranîn.

Em dixwazin berî ku dest bi mijara xwe ya esil bikin, pêşî qala van peyvên *mîna lawandin*, *şîwen*, *zêmar*, *şîn*, *lornayîş* û *dîma bermayîş* bikin. Lewra tradîsyona mersîyeya klasîk a ku mijara teza me ye li ser vê hîma *şîn* û *şîngirtinê*, *kişandina êş* û *elemê hatiye avêtin*.

Şîn, wek peyv di ferhenga Zana Farqînê ya Kurdî-Tirkî de bi wateya xwe ya Tirkî yas, matem hatiye pênasekirin.¹⁰⁵ Her wisa heman peyva *şîn* di ferhenga D. Îzolî ya Kurdî-Tirkî de bi wateya xwe ya Tirkî matem, yas û keder hatiye pênasekirin.¹⁰⁶ Ev yek pênaseya ferhengî ya peyva *şînê* ye. Heman peyva *şîn* ji hêla têgehê ve tê maneya li ser kesekî ku wefat kiribe *şîngirêdan* an jî ji ber vê yekê *xemgînbûyîn*. Peyva *zêmarê* jî di ferhengan de tê maneya; ew stranên ku di nav xwe de êş û elemê dihewînin,¹⁰⁷ *mersîye*, *matemînî*, *lawikê mirîyan*, strana ku li ser kesekî mirî hatiye gotin, nivîsa ku bo bibîranîna kesek mirî hatiye nivîsîn, *rêşgirêdan*.¹⁰⁸ Bi kurtasî *şîn* û *zêmar* bi maneya xwe ya giştî tîna wateya gotinên ku di serî de ji ber mirina kesekî û her wisa ji ber

¹⁰⁵ Zana Farqînî, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Enstîtuya Kurdî ya İstanbulê, İstanbul 2011, r. 638.

¹⁰⁶ Îzolî, *h.b.*, r.564.

¹⁰⁷ *H.b.*, r.664.

¹⁰⁸ *Şîn*, <https://ku.wiktionary.org/wiki/z%C3%A4mar>, (Jêgirtin: 15.02.2023. Seat: 12.03.)

bûyerên mîna fîraq, qeza, bobelatên sirûştî, oxirkirina li leşkerîyê û veqetîna bûkê ya ji malê re tîn gotin.¹⁰⁹

Di edebiyata Soranî de jî ji bo destnîşankirina xem, êş û elemê bi giştî peyva lawandin/lawandinewe û şîwen tê bikaranîn. Peyva lawandin di ferhengan de tê maneye: pesindayîn, matemname, şanazî û medhkirina mirîyan,¹¹⁰ girîna li ser mirî, ji bo mirî şîn girtin,¹¹¹ zêmar, awazakî xemnak,¹¹² pesindayîn û li ser mirî girî, serdolke, li ser mirîyan helbest ristin, bi ser mirîyan de bi deng girîn.¹¹³ Lawandin bi giştî jî tê maneya; li ser kesekî mirî girîn an jî dilşewitandin û êş kişandin.¹¹⁴ Di edebiyata Soranî de peyveke din heye ku ew jî wek lawandinê xwedîyê heman wateyê ye. Ew peyv peyva şîwen e. Hêmin Omer Ehmed di nivîsa xwe ya ku li ser şîwenê amade kiriye de derheqê pênaseya beşa şîwenê ya ku dibe mijara helbestan bi xwe de wisa dibêje: “*Hemî nivîsên helbestî yên ku li ser dûrbûn, veqetandin û mirinê hatine amadekirin.*”¹¹⁵

Di edebiyata Zazakî de jî ji bo şîn, şîngirtin û nîşandana xem û kovana ji ber mirina kesekî peyvên mîna lornayîş, dima bermayîş, şîn û mersîye tîn bikaranîn. Lornayîş wek peyv di ferhenga Rosan Hayig a Tirkî-Zazakî de bi wateya xwe ya Tirkî ağıt söylemek (zêmar gotin), hatiye pênasekirin. Peyva dima bermayîşê jî di heman ferhengê de wek peyv bi wateya xwe ya Tirkî ağıt yakmak (lorandin, lorîn, lawandin) hatiye pênasekirin.¹¹⁶ Peyva şînê jî wek peyv di ferhenga Şaban Şenates a Dimilî-Kurmançî-Tirkî de bi wateya xwe ya Tirkî wek taziye û yas,¹¹⁷ hatiye pênasekirin. Di Zazakî de ji bilî van peyvên peyveke din heye ku ji bo wan helbestên klasîk ên ku piştî wefata kesekî hatine nivîsîn tê bikaranîn. Ew peyv jî mersîye ye. Mela Ezîz Beki ji bo helbesta xwe ya ku piştî wefata bira û kurapê xwe nivîsîye peyva mersîye bi kar

¹⁰⁹ Kardaş, *h.b.* r.150.

¹¹⁰ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.1 r.172.

¹¹¹ Lawandin,

<https://bradost.net/ferheng/?name=%D9%84%D8%A7%D9%88%D8%A7%D9%86%D8%AF%D9%86> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat:00.47.)

¹¹² Lawandin, <http://mb-soft.com/believe/tasm/lamentat.htm> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat:00.47.)

¹¹³ Ji bo agahiyên zêdetir lê binêrin: Aşna Celal Refîq, *Lawandinewe li Şîrî Kurdî Kurmançî Xwar da*, Fakulteya Ziman a Zanîngeha Silêmanîyê, Teza Masterê, 2011 Silêmanîyê, r.3.

¹¹⁴ Ferhengî Anahîta, *Lawandinewe*, <https://ferheng.info/alfba/39199/> (Jêgirtin:29.03.2023, Seat:00.47.)

¹¹⁵ Hêmin Omer Xoşnaw, *Şîrê Şîwen li Edebî Kurdî da*, Kovara Taybetî Şîr û Rexne, <http://zaan.blogfa.com/post/179> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat: 00.56.)

¹¹⁶ Rosan Hayig, *Zazaca-Türkçe Sözlük ve Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi*, Weş. Tij, İstanbul 2012, r.321.

¹¹⁷ Şaban Şenates, *Ferhengê Zazakî Dimilî-Kurmançî-Tirkî*, Weş. Nûbihar, 2022 İstanbul, r.1847.

anîye.¹¹⁸ Ev her du peyvên Zazakî yên ku li jorê hatin dayîn bi giştî tèn maneya li pey kesekî ku wefat kiriye û an jî jê dûr hatiye mayîn gotine stran û helbestên bi xem û kovan.

Kişandina êş û elemê ya ji ber kesekî yan jî ji ber tişteki din di her sê zaravayên Kurdî de bi cûrbecûr kelîmeyan hatiye îfadekirin. Ev kelîme tev bingeha mersîyeya ku mijara teza me ye pêk tînin. Ji ber girîngîya mijarê lazim e ku em bi şiklekî hûrgilî qala tradîsyona şîn û şîngirtinê ya di nav civaka Kurd de bikin.

1. Şîn û Şîngirtin di Nav Civaka Kurdan de

Meriv dikare bibêje ku dîroka şîn û zêmaran û şîngirtinê bi qasî dîroka însanîyetê kevnar e. Lewra şîn wek gelek rîtuêlên civakî encama bihevrebûna mirovan e û bi qasê dîroka jiyana kolektîf jî kevin e.¹¹⁹ Çawa ku dîroka şîn û şîngirtinê di nav qewmên din de pir zêde kevnar û qedîm be, bi heman awayî di nav Kurdan de jî qedîm û kevnar e û xwedîyê dîrokek e. Ji mêj ve di nav Kurdan de ji bo êş û elema ku ji ber tişteki elemnak tê kişandin peyvên mîna; zêmar, şîn, lawandin, şîwen, lawij, lornayîş, dima bermayîş û hwd. hatin bikaranîn. Ayhan Yıldız derheqê pênaseya zêmar û şîna ku bingeha tradîsyona mersîyeyan bi xwe ye de agahîyeke wiha bi me re parve dike:

“Ew cûre berhemên devkî ne ku di terzê kilaman de tèn strandin. Bi giştî di pey mirina/kuştina mêran de tèn gotin. Hilberînera wan bi pîranî pîrek in. Li hin herêman – weke Batman- ji van cûre berhemên re “gerandin” jî tê gotin. Di edebiyata klasîk a nivîskî de navê vî cûreyî “mersîye” ye.”¹²⁰

Ev kevneşopîya şîngirtinê di nav Kurdan de xwedîyê rîtuêlekê taybet e. Mela Mehmûdê Bayezîdî di berhema xwe ya bi navê *Adat û Rusûmatnameê Ekradîyeyê* de derbarê mijara şîngirtinê de agahîyên balkêş parve dike û rewş û tabloya şîngirtinê ya di nav Kurdan de nîşan dide:

“Li mewta (mirina) ciwanan zêde şîn û matem (şîn) digirin. Libasêd (cil û kincê) reş werdigirin û serêd xwe reş girê didin û jin û keç û xweh, guliyêd xwe jê dikin, qewî zêde matem şînê dikin.

¹¹⁸ Mela Aziz Beki, *Diwon Cebexçuri*, (Edt. Murat Varol) Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2015, r.414.

¹¹⁹ Cihan Kaynar, *Di Dengbêjîyê De Li Dor Temaya Şer û Kuştinê Nirxandina Klamên Şînê*, The Journal of Mesopotamian Studies, c.3/2 Summer: 2018, r.70.

¹²⁰ Ayhan Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî-1*, Weş. Lorya, İstanbul 2017, r.181.

*Eger ew mirî mêr e û xweyî hesp û çek û taxim e, hespêd wî dixemilînin û çek û silhêd (wî) li ser hespan girê didin, ewan hespan li berayikê cenazeyî dikêşin. Û ew jin û keç da (dayik) û xwehêd wî delo (de lo yan ji de lawo) lawjek dibêjin: 'Wî li min babo, wî li min bira! Wî li min pismam' dibêjin û digirîn û deng û sedaya bavo bavo ya wan diçite felekê... Û ew libasêd reş heta şeş mehan û yaxo salekê li ser ehlê (xizmê) meyyîtî dimînin."*¹²¹

Ji agahîyên ku ji teref Bayezîdî ve hatine ragihandin jî tê famkirin di nav Kurdan de jî ji merasîmên şingirtin an jî şingirêdanê re wek yê Ereban, jin pêşîvantîyê kirine. Dema ku di nav civaka Kurdan de şîn tê girtin hinek alamet û kar hene ku ew jî asta zêdebûn û giranbûna êş û elema tê kişandin nîşanî me dide. Mehrdar R. Izady derbarê vê yekê de wiha dibêje: "*Pîrek her tim neperûçkan ji rûyê xwe didin û xwîne ji enî û hinarikên xwe tînin. Di van merasîman de sehneyeke ji wan sehneyên herî tesîrdar heye ku tê de herî yan jî tişteki mîna herîyê di ser xwe de didakin.*"¹²² Rîtuela şingirtinê ya bi vî halî ne bi şiklekî xwerû, ango bêdeng bû. Lewra dema ku ev şîn di nav civaka Kurdan de dihat girtin di ber şînê re zêmar jî dihatin gotin ku ev zêmar bi gelemperî li gorî ku Bayezîdî neqil dike ji teref jinên dengbêj ve tînin gotin û ew di vê pêvajoyê de dikin hewar û gazî.¹²³ Canser Kardaş derbarê dengbêjîya pîrekan a di merasîma şînê de agahîyek muhîm tîne zimên: "*Li hinek herêman dengbêjên pîrek bi heqê xwe yan di bergîdana xelatekê de şîn digirtin û dilobandin. Fato Korê ya ku li Cizîrê jiyaye di bedela xelatan de di şînan de lobandiye.*"¹²⁴ Ji bilî dengbêjên jin, dengbêjên mêr jî li ser gelek meseleyên mîna şer, kuştin, bobelatên sirûştî û mijarên mîna wan stranên şînê lobandine. Her wisa ew, wek yê jin, êş û elema ku tê kişandin destnîşan kirine. Wek mînak; Dengbêj Mahmud Kizil li ser mirina Dr. Yusuf Azîzogluyê ku di sala 1960î de Wezîrtîya Tendurîstîyê kiriye û miriye, strana *Lîdero*¹²⁵ gotiye. Di vî warî de bi heman awayî ji teref çend dengbêjên din ve jî *Klama Şahîno, Qasimo, Silêmanê Emer*,¹²⁶ hatine strandin ku di wan tê de qala kuştina şexsan û êş û elemê tê kirin.

Ev agahîyên ku heta niha em gihaştin wan bi me didin famkirin ku di tradîsyona girtina şînê de dengbêj xwedîyê cihekî muhîm in. Lewra di girtina şînê de kesê/a ku

¹²¹ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradîyeyê*, Lêkolîn: Jan Dost, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012, r.52-53.

¹²² Mehrdar R. Izady, *Bir El Kitabı Kürtler*, Weş. Doz, İstanbul 2013, r.424.

¹²³ Bayezîdî, *h.b.*, r.112

¹²⁴ Kardaş, *h.b.*, r.150.

¹²⁵ *H.b.*, r.155.

¹²⁶ Kaynar, *h.b.*, r.65-94.

vê yekê bideng dike û ji nifşên piştî xwe re neqil dike dengbêj in. Dema ku em li dîroka Kurdan a civakî mêze dikin em dibînin ku dengbêj di nav Kurdan de her tim derdiketine pêş û ew muheqqeq bi mîrekî/axayekî/paşayekî ve girêdayî bûne û her tim hunera xwe di bin sîwana wan de meşandine. Remezan Alan derheqê meseleya girêdayîbûna dengbêjan a bi cihekî ve de dibêje:

“Kûrbûna karbeşîyê ji bo dengbêjê Kurd jî mîladek e. Qet nebe ji bo ku hunera xwe îcra bike û pê debara xwe bike, wesfê gerokî jî lê peyda dibe. Ji bo xwendina destan û stranên xwe ji serayê/qesrê diçe yeka din. Teweccuha mîrekî/begekî/axayekî jî bi vê pêvajoyê re rû dide. Ji vê pêwendîyê elbet dê aîdîyetek jî biwelide. Ev aîdîyet di devê gelek dengbêjan de dibe ez dengbêjê filanmîr/paşa/eşîrê bûm.”¹²⁷

Dengbêj di pêvajoya dîrokî de bi vî awayî hunera xwe îcra kirine û cihê xwe parastine. Hetta carinan ji şa'irên navdar ên ku ji edebiyata Kurdî ya klasîk re pêşîvanti kirine zêdetir hatine nasîn. Bedran Hîkmet di xebata xwe ya bi navê “*Dengbêj Geleneği*” de derheqê derketina pêş a dengbêjan de agahîyeke wiha bi me re parve dike:

“Digel ku ji sedsala 14-15em pêve edebiyata dîwanê cihê xwe girtibe jî di heman dewrê de dengbêj jî di rewacê de bûn. Hetta di wê dewrê de dengbêjê ku di nav gel de dihate nasîn wek mînak Evdalê Zeynikê¹²⁸ ji Ehmedî Xanî yan jî Melayê Cizîrî zêdetir dihatin nasîn.”¹²⁹

Ev nasîn û derketina pêş a dengbêjan heta dawîlêhatina mîrektîyên Kurd berdewam kir. Lêbelê çawa ku mîrektîyên Kurdan hatin rûxandin dengbêj jî derbeyeke dijwar xwarin. Alan, rûxandina mîrektîyan ji hêla dengbêjan ve wekî mîladekê dinirxîne û dibêje ji ber têkçûna mîrektîyên Kurdan (ku rastî sedsala 19em tê) ji bo dengbêj qedandina bohemyayê ye.¹³⁰ Dengbêj di nav civaka Kurdan de wan bûyerên bi huzn û elem ên ku civak şahidiya wan kirin ji nifşên bê re neqil kirin û ji dîroka civaka Kurd re bûn neynik û hêj jî hinek ji wan vê wezîfeya xwe didomînin.

¹²⁷ Remezan Alan, *Keşkûl*, Weş. Peywend, İstanbul 2019, r.66-67.

¹²⁸ Wek agahîyeke kurt em dikarin bibêjin ku duajoyên Evdalê Zeynikê yên di warê dengbêjîyê de ev kes in: Gulêya Fileh, Dengbêj Ferzê, Resoyê Gopalo, Dengbêj Şakiro. Çavkanî: Sedat Ulugana, *Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê*, Çavkanî: Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Weş. Avesta, İstanbul 2015, r.161-186.

¹²⁹ Bedran Hîkmet, *Dengbêj Geleneği*, *Berhem: Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, Berhevkar: Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2012, r.297.

¹³⁰ Remezan Alan, *Bendname*, Weş. Peywend, İstanbul 2013, r.252.

2. Mersîye Di Edebiyata Kurdîya Goranî, Soranî û Zazakî ya Klasîk De

Mersîye çawa ku di nav gelên Rojhilat û edebiyata wan a klasîk de cî girtibe û bi demê re pêşve çûbe bi heman awayî di nav jiyana Kurdan û edebiyata wan de jî cî girtiye û pêşve çûye. Dema em li wan helbestên klasîk ên ku bi Kurdîya Goranî, Soranî û Zazakî hatine nivîsîn mêze dikin em li rastî gelek mersîyeyên klasîk tên. Em ê di vê beşê de bi giştî li ser mersîyenûsîyê ya di edebiyata Kurdîya Goranî, Soranî û Zazakî a klasîk de birawestînin.

Yek ji wan zaravayên qedîm ê Kurdî zaravayê Goranî ye. Bi zaravaya Goranî ji teref gelek şa'iran ve li ser gelek kes û an jî tiştan mersîye hatine nivîsîn. Dema ku em li dîwanên wan şa'irên Goran an jî li berhemên din ên ku wek keşkûl hatine amadekirin mêze dikin em dîbin ku di vî warî de ji teref kesên mîna; Rencûrî, Mewlewî, Ehmed Begê Komasi, Elmas Xan, Mestûre Xanima Kurdistanî û Beseranî ve çendîn mersîye hatine nivîsîn.

Di warê yekemîn mersîyeya ku bi zaravayê Goranî hatiye nivîsîn de agahîyeke teqez nehat bidestxistin. Lêbelê ger em dîroka welidîn û wefata van mersîyenûsên Goran esas bigirin em dikarin mersîyeye ewil a ku bi zaravayê Goranî hatiye nivîsîn tespît bikin. Di encama xebata ku hat kirin de derket holê ku di vî warî de ji teref şeş şa'iran mersîyeya ku jê re lawandin, matemname, şîn û şîwen jî tê gotin hatine nivîsîn. Dîroka jidayikbûn û wefata van şeş şa'iran wisa ye: Beseranî (1643-1701), Elmas Xanê Kendoleyî (1702-1776), Rencûrî (1750-1809), Ehmed Begê Komasi (1795-1877), Mestûre Xanima Kurdistanî (1805-1844) û Mewlewî/Me'dûm (1806-1882). Ji dîrokên welidîn û wefata van şa'iran tê famkirin mersîyeye ewil a bi zaravayê Goranî di sedsala XVIIem de ji teref Beseranî ve hatiye nivîsîn. Lewra di nav van şa'iran de ê ku pêşî hatiye dinyayê û berî ku ew şa'irên din bînin dinyayê rehmet kiriye bes Beseranî ye. Piştî tespîtkirina mersîyeya ewil, em dikarin piçekî hûrgilîtir qala mersîyeyên van mersîyenûsên Goran bikin. Di vî warî de mersîyenûsê Goran ê ku herî zêde mersîye nivîsîne Mewlewî ye. Mewlewî tev de 28 mersîye nivîsîne. Hat dîtin ku Mewlewî ji van 28 mersîyeyan; 8 mersîye li ser xanima xwe Enber Xatûn, 7 mersîye li ser Ebdurrehmanê kurê Hacî Yarweys, 5 mersîye li ser Begzade Caf, 5 mersîye jî li ser kesên bi navê Şêx Samedî Xanega, Şêx Evdurrehmanê Talebanî, Şêx 'Elîyê Tewêle, Muhemmedî Kurê Xoy, Ehmed Begê Komasi û 2 mersîye jî li ser zanayekî

gewre û şêxekî gundê Pençe nivîsîye.¹³¹ Di vî warî de piştî Mewlewî, mersîyenûsê herî berhemdar Rencûrî ye. Rencûrî; li ser Welî Dîwane mersîyeyek¹³², li ser Silêman Axayê Zenginî mersîyeyek¹³³ û li ser Şêx Ehmedê Bonxweşî jî du mersîye¹³⁴ nivîsîne. Ji xeynî van her du mersîyenûsan, şa'irên bi navê Beseranî, Elmas Xan û Mestûre Mahşeref Xana Kurdistanî jî di vî warî de mersîye nivîsîne. Beseranî berî ku bimire li ser xwe du mersîye¹³⁵, Elmas Xan mersîyeyek li ser Mîrza Şefî' Mamê Zekî¹³⁶, Mestûre Mahşeref Xana Kurdistanî li ser Xusrev Xanê hevserê xwe du mersîye¹³⁷, şa'irê bi navê Qani' li ser welêt mersîyeyek¹³⁸ û Ehmed Begê Komasi' jî li ser xanima xwe mersîyeyek¹³⁹ nivîsîye.

Ji bo mersîyeya klasîk a ku bi zaravaya Goranî hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Qani'¹⁴⁰

1. Hewrî bextî Kurdistane şîwen û giryan eka
Nale nalî bê kesane cerg û dil biryan eka
2. Dengî qîj û hurî xelqe dêt le jêr çerxî zeman
Ahî mezlumanî birsî ' alemê wêran eka
3. Dûkelî qirçey derûnî bê cil û berg û jiyan
Bû be hewr û wa beser kêwanewe seywan eka
4. Hênde carî bû le çawî Kurdistan firmêskî xem
Bê temaşake hezaran tancero û sîrwan eka

¹³¹ Enwer Qadir Mihemed, *Lîrikay Şa'irê Gewreyê Kurd Mewlewî*, Weş. Serdamco, Silêmanîyê 2007, r.148-149.

¹³² Mela Omerê Zengine, *Dîwanî Rencûrî*, Weş. Afaq Erbeyt, Bexda 1983, r.209.

¹³³ *H.b.*, r. 202.

¹³⁴ *H.b.*, r.195, 200.

¹³⁵ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.2, r.47-50.

¹³⁶ *H.b.*, r.67.

¹³⁷ Mihemed 'Elî Qeredaxî, *Dîwanî Mestûre Mahşeref Xanimî Erdalanî*, Weş. Aras, Hewlêr 1998, r.50.

¹³⁸ Mersîyeya ku Qani' li ser welêt nivîsîye, *Şîwenî Nîştiman*, <https://books.vejin.net/nk/text/6989>, (Jêgirtin: 06.01.2023. Seat:21.06.)

¹³⁹ Ehmed Begê Komasi', *Dîwan*, Amd.Muhammed 'Elî Sultanî, (Wergêr: Gulsum Osmanpur) Weş. Viyan, Sine 2011, r.131.

¹⁴⁰ Mersîyeya ku Qani' li ser welêt nivîsîye, *Şîwenî Nîştiman*, <https://books.vejin.net/nk/text/6989>, (Jêgirtin: 06.01.2023. Seat:21.06.)

5. Bo  elal e mal  min ya bo i ferze ku tinim
Dek xecalet b  dirozin  on weha p lan eka
6. Kes nel  lafaw  awe aw  s r    we s r
Xw n  al  bend  cerge   wen  baban eka
7. Qani    fikir  becar  serf eka bo hozekey
Nek wek  yaro xeyal  serf   a   qilyan eka

Rew a mers yen s y  ya di zaravaya Goran  de bi gi t  wisa b . Dema ku em ber  xwe didin zaravaya Soran  em dib nin ku mers yen s  di edebiyata Soran  ya klas k de di sedsala XIXem de bi  a  ir n bi nav  Nal  (1791- 1855), Salim (1805-1869)   Kurd  (1812-1850) dest p  kiriye. Him ev  a  ir   him j  y n ku pi t  wan hatine him li ser xwe, zarok, bira, bav, d , hevser, hevr y n xwe¹⁴¹   him j  li ser serok,  a  ir, kesayet n navdar, ti t n b giyan,  ar, ni t man   ajalan gelek mers ye niv s ne.¹⁴²

Di encama xebata ku hat kirin de derket hol , di edebiyata Soran  de kes n m na Arif  Orf  (m.1961.),¹⁴³ Mewlew  (m.1882.)¹⁴⁴   Kurd  (m.1850.)¹⁴⁵ li ser mirina xwe bi xwe; kes n m na Goran (m.1962.)¹⁴⁶   Selam (m.1909.)¹⁴⁷ li ser zarok n xwe; kes n m na   x N r    x Sallah (m.1958.)¹⁴⁸     x  Ez z (m.?)¹⁴⁹ li ser biray n xwe; kes n m na Es r  (m.1962.)¹⁵⁰   Ex l (m.1988.)¹⁵¹ li ser bav n xwe; kes n bi nav 

¹⁴¹ Ref q, *h.b.* r.33-59.

¹⁴² *H.b.*, r.59-66.

¹⁴³ Om d Kaker  , *D wana  Arif  Orf *,  apxaneyaya Kamran , Sil man  1985, r.10.

¹⁴⁴ Mers yeya ku Mewlew  li ser mirina xwe niv s y , *Ney Gehwarey Dewr Tay Desraze Xem*, <https://books.vejin.net/ck/text/234>, (J girtin: 23.06.2022. Seat:22.05.)

¹⁴⁵ Mar f Xeznedar, *M j y  Edeb  Kurd *, Dezgeh  Aras, Hewl r 2001, c.3, r.192.

¹⁴⁶ Muhammed  Mela Ker m, *D wan  Goran*,  apxaney  Kor  Zanyar  Kurd, Bexda 1980, c.1, r.93.

¹⁴⁷ Om d Kaker  , *D wan  Selam*,  apxaneyaya El-Hewadis, Bexda 1990, c.2, r.219.

¹⁴⁸ Azad  Abdulweh d, *D wan    x N r    x Salih*, Dezgeh   ap   Belavkirin  ya Aras, Hewl r 2008, c.1, r.338.

¹⁴⁹ Ref q, *h.b.*, r.10.

¹⁵⁰ Kurdistan Mukr yan , *D wan  Es r*, P da  mewe   Berawird: Ehmed Teqane, We . Aras, Hewl r 2006, r.96.

¹⁵¹ Mers yeya ku ji teref Ex l ve li ser bav  xwe hatiye niv s n, * Heta Roj  Dex l  Min bi Seywan *, <https://allekok.ir/poet:33/book:1/poem:43>, (J girtin: 03.01.2023. Seat:12:05.)

Hezînexan (m.?)¹⁵² û Mîrza Xelîl (m.1923.)¹⁵³ li ser hevserên xwe; kesên bi navê Muhemmed Salih Dîlan (m.1990.)¹⁵⁴, Kamran Mukrîyanî (m.1986.)¹⁵⁵, Edîb(m.1932.)¹⁵⁶, Kakay Fellah (m.1990.)¹⁵⁷ û Şêx Riza Talabanî (m.1910.)¹⁵⁸ li ser kesên ku ji wan re dostanî û hevrêfî kirine mersîyeyên ku di Soranî de jê re lawandinew û şîwen jî tê gotin nivîsîne. Dema ku em li wan berhemên klasîk ên Soranî mêze dikin em li ser rasta hinek mersîyeyên din jî tên ku li ser hin kes û kesayetên muhîm an jî li ser heywan û bajêran an jî li ser tişteki ku nexwedî giyan e hatine nivîsîn. Di vê bergehê de hat dîtin ku Mela Mustafayê 'Asî li ser şehîdên Filistînê¹⁵⁹, kesên bi navê Muhemmed Salih Dîlan¹⁶⁰, Kamran Mukrîyanî¹⁶¹, Pîremerd (m.1950.)¹⁶², Bêkes (m.1948.)¹⁶³ Wefayî (m.1902.)¹⁶⁴, Salim (m.1869.)¹⁶⁵, Nalî (m.1855.)¹⁶⁶, Hejar Mukrîyanî (m.1991.)¹⁶⁷ û Şêx Nûrî Şêx Sallah¹⁶⁸ li ser kesên serok, şoreşger, mîr û paşa; kesên bi navê Şêx Nûrî Şêx Sallah¹⁶⁹, Goran¹⁷⁰, Kemalî (m.1974.)¹⁷¹, Hêmin

¹⁵² Kurdistan Gîwî Mukrîyanî, *Honrawey Afretî Kurd*, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr 1980, r. 37-38. Vgh: Hêmin Omer Xoşnaw, *Şîrê Şîwen li Edebî Kurdî da*, Zan, Kovara Taybetî Şîr û Rexne, <http://zaan.blogfa.com/post/179>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:12:05.)

¹⁵³ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.4. r. 542.

¹⁵⁴ Abdulla Agîrîn, *Dîwanê Şîrê Mehemed Salih Dîlan*, Weş. Çiwarçîr, Hewlêr 2013, r.209.

¹⁵⁵ Mersîyeya ku Kamran Mukrîyanî li ser hevrê/dostê xwe Hesên Tefwîq nivîsandiye, "*Şêweyê Cîwanet Hîwa û Taset*", <https://books.vejin.net/ck/text/3708>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:22:25.)

¹⁵⁶ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.5. r. 196.

¹⁵⁷ Mersîyeya ku Kakay Fellah li ser dostê xwe nivîsiye, "*Ey Mamoste we ey hewrê*", <https://allekok.ir/poet:56/book:1/poem:62>, (Jêgirtin: 06.01.2023. Seat:22.12.)

¹⁵⁸ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.4, r.309.

¹⁵⁹ Mersîyeya ku Mela Mustafayê 'Asî li ser şehîdên Filistînê nivîsiye, "*Muslimanan Temaşe Kin Leber Şîwen Felek Şîne*", <https://books.vejin.net/ck/text/25938>, (Jêgirtin: 04.01.2023. Seat:22.12.)

¹⁶⁰ Agîrîn, *h.b.*, r.190.

¹⁶¹ Mersîyeya ku ji teref Kamran Mukrîyanî ve li ser Şêx Mehmûd nivîsandiye, "*Şêx Mehmûdê Nemir*", <https://books.vejin.net/ck/text/3701>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12:25.)

¹⁶² Pîremerd, *Dîwan*, Latînzekirin: Newzad Hirorî, Weş. Nefel, Stockholm 2005, r. 125.

¹⁶³ Mersîyeya ku ji teref Faîq Bêkes ve li ser wefata Mehmûd Cewdet hatiye nivîsîn, "*Şînê Mehmûd Cewdet*", <https://books.vejin.net/ck/text/28944>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12:55.)

¹⁶⁴ Mihemed Elî Qeredaxî, *Dîwanî Wefayî -Mîrza Ebdulrehîmê Sablaxî-* Weş. Korî Zanyarî Kurd, Bexda 1978 r.58.

¹⁶⁵ *Dîwanê Salim -Abdurrehman Begê Sahîbkiran-* Saxkirdinewe û Lêkdanewe: Mela Abdulkêrîmê Muderrîs, Fatîh Abdulkêrîm, Mihemedî Mela Kerîm, Amd: Sidîq Salih, Weş.Binkey Jîn, Silêmanî 2010, c.1., r.507.

¹⁶⁶ Mela Abdulkêrîmê Muderrîs, *Dîwanî Nalî*, Weş. Selahaddîn Eyyûbî Navenda Weşanxaneyê Ferheng û Edebiyata Kurdî, Urmîyê 1976, r.370.

¹⁶⁷ Hejar Mukrîyanî, *Bo Kurdistan*, Dezgehê Çap û Belavkirinê ya Aras, Hewlêr 2001, r.539.

¹⁶⁸ 'Abdulwehîd, *h.b.*, c.1 r.345.

¹⁶⁹ *H.b.*, r.340.

¹⁷⁰ Kerîm, *h.b.*, c.1, r.83.

¹⁷¹ Elî Bapîr Axa, *Dîwanî Kemalî*, Amd.Mamoste Şekur Musetefî, Weş. Dezgehê Rewşenbîrî û Belavkirdinî Kurdî, Bexda 1986, r.28.

Mukrîyanî (m.1986.)¹⁷² û Qanî (m.1965)¹⁷³ li ser şa'irên Soran; kesên bi navê Beyxûd (m.1955.)¹⁷⁴, Bêkes,¹⁷⁵ Wefayî (m.1902)¹⁷⁶ Remzî Wehbî Silêmanî û Esîrî Kerkukî (m.1962.), Pîremerd, Şêx Selam û Şêx Nûrî Şêx Sallah,¹⁷⁷ li ser kesên navdar an jî rewşenbîr; kesên bi navê Mela 'Umerî Rencûrî (m.1809.)¹⁷⁸, Kemalî (m.1974)¹⁷⁹, Narî (m.1944)¹⁸⁰, Cewherî (m.1985)¹⁸¹, Mela Mustafayê 'Asî (m.1975.)¹⁸² Esîrî¹⁸³ û Wefayî¹⁸⁴ li ser şêxan; kesên bi navê Salim¹⁸⁵, Hemdî (m.1936.)¹⁸⁶, Reşîd Necîb¹⁸⁷, Muftî Pêncwênî¹⁸⁸, Wefayî¹⁸⁹ û Hecî Qadirê Koyî (m.1897.)¹⁹⁰ li ser dûrbûna ji war û welat; kesên bi navê Salim¹⁹¹, Hemdî¹⁹², Pîremerd¹⁹³ û Exûl¹⁹⁴ mersîyeyên ku mijara

¹⁷² Mersîyeya ku ji teref Hêmin Mukrîyanî ve li ser Goran hatiye nivîsîn, "*Şînî Goran*", <https://books.vejin.net/ck/text/1203> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:15:15.)

¹⁷³ *Dîwanî Qanî*, Helbest: Şêx Mihemed Kabulî, Berhevkirin: Burhan Qanî, Weşanxaneya Panîz, Tehran 2014, r.392.

¹⁷⁴ Muhammedî Mela Kerîm, *Dîwanê Bêxûd*, Weşanxaneya Kurdistan, Sine 1386, c.1, r.73.

¹⁷⁵ Mersîyeya ku ji teref Faîq Bêkes ve li ser Mihemed Emîn Zekî Beg hatiye nivîsîn, "*Şînî Mihemed Emîn Zekî Beg*", <https://books.vejin.net/ck/text/29026> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:15:12.)

¹⁷⁶ Mersîyeya ku ji teref Wefayî ve li ser Şêx Ubeydullah Nehrî hatiye nivîsîn, "*Derîxa Bayê Xezan Daye*", <https://books.vejin.net/ck/text/1784> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 13:13.)

¹⁷⁷ Ji bo agahiyên zêdetir binêrin: Osman Deştî, *Matemname Le Şîrî Kurdî Da*, Kovara Wêje û Rexne, h.2, s.2014, r.192.

¹⁷⁸ Mihemed Elî Qeredaxî, *Dîwanî Rencûrî*, Çapê Yekem, Weş. Afaqî Erebiyye, Bexda 1983. r.200.

¹⁷⁹ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.6. r. 202.

¹⁸⁰ Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.5. r. 214.

¹⁸¹ Mersîyeya ku ji teref Cewherî ve li ser şîna Şêx Evdilqadirê Nehrî û hevrêyên wî hatiye nivîsîn, *Refêqan Ba Bîkeyn Şîwenke Wextî Hicrî Yarane*, <https://books.vejin.net/ck/text/3112>, (Dîroka Jêgirtinê: 25.06.2022. Seat: 15:13.)

¹⁸² Mersîyeya ku ji teref 'Asî ve li ser Şêx Mahmud hatiye nivîsîn, *Felek Şîn e Le Ber Şîwen Melek Pir Zar e Lem Zar e*", <https://books.vejin.net/ck/text/25930>, (Jêgirtin: 12.05.2022. Seat: 21:13.)

¹⁸³ Mersîyeya ku ji teref Esîrî ve li ser Şêx Muhammed 'Elî hatiye nivîsîn, *Mirdin Êsteka Lekwêy Deysawere*, <https://books.vejin.net/ck/text/23528>, (Jêgirtin: 12.05.2022. Seat: 21:13.)

¹⁸⁴ Mersîyeya ku ji teref Mîrza Ebdurrehîmî Wefayî ve li ser Şêx Ubeydullahê Şemzînî hatiye nivîsîn, *Derîxa Bayê Xezan*, <https://books.vejin.net/ck/text/1784> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:23:34.)

¹⁸⁵ Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser bajêr hatiye nivîsîn, *Elweda' Ey Mulkê Baban Elweda'*, <https://books.vejin.net/ck/text/4073>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 00:12.)

¹⁸⁶ Mersîyeya ku ji teref Hemdî ve li ser bajar hatiye nivîsîn, *Salî Carê Her Debê Em Şare Bête Mezbele*, <https://books.vejin.net/ck/text/4557>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:23:33.)

¹⁸⁷ Omêd Aşna, *Jiyan û Berhemakanî Reşîd Necîb Dîwan*, Weş. Aras, Hewlêr 2001, c.1., r. 24.

¹⁸⁸ Mersîyeya ku ji teref Muftî Pêncwênî ve li ser dûrbûna welat hatiye nivîsîn, *Pêncwên bebê to nêzîke mergim*, <https://books.vejin.net/ck/text/3037>, (Jêgirtin: 01.01.2023. Seat:03:33.)

¹⁸⁹ Mersîyeya ku Wefayî li ser dûrbûna ji welêt nivîsandiye, "*Nîgara Dilbera Namîhreban*", <https://books.vejin.net/ck/text/1074>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 15:34.)

¹⁹⁰ Pîremerd, *h.b.*, r.135.

¹⁹¹ Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser niştîman hatiye nivîsîn, *Lême Gerîm Ba Girye Kem Dîdem Be Dîdeî Xûnefsan*, <https://books.vejin.net/ck/text/4104> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12:12.)

¹⁹² Mersîyeya ku ji teref Hemdî ve li ser niştîman hatiye nivîsîn. "*Çûn Zemanî Xame*" <https://books.vejin.net/ck/text/4550> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:12:34.)

¹⁹³ Mersîyeya ku ji teref Pîremerd ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, "*Hatin Şehîdekan be Cilî Sorî Xwînewe*", <https://books.vejin.net/ck/text/35231> (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 23:45.)

¹⁹⁴ Mersîyeya ku ji teref Exûl ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, "*Be Carê Malî Wêranîm Silêmanî Xiroşawe*", <https://books.vejin.net/ck/text/3501>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 11:12.)

wan niştîman e; kesên bi navê Wîsalî (m.1973.)¹⁹⁵, Şêx Riza û Nalî li ser heywanan û Pîremerd jî li ser tiştên nejîndar ên mîna kovarê mersîye nivîsîne.¹⁹⁶

Ji bo mersîyeya klasîk a ku bi zaravaya Soranî hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Kamiran Mukrî¹⁹⁷

1. Bot elêm le dêrî şîwen
Dûr le wirdekarî û le fen
2. Kam wirdekarî, kam huner
Helbestî ciwanî wek gewher
3. Etwanê wesfî to hergîz
Binête ser qagez be rîz
4. Basî dil hî ew derûne
Ew bîr û bawere rûne
5. Ey koçkirdûy meşxel helgir
Natwanim bîkem be şî' ir
6. Xozge firîştêy şî' rî geş
Be dil eygirtime bawêş
7. Ey birdim bo lay xway witin
Dêrî ciwanî eda be min
8. Çend dêrêk wîrd bo yadî wa
Agir le naxî dil berda
9. Ey Şêx Mehmûy şanazî Kurd
Hemû be carê gewre û wîrd
10. Firmêskit bo erêjîn... dil
Bo koçî to hatote kul
11. Ba nimî eşkî Kurdistan
Lecêy medalyay qareman

¹⁹⁵ Cemal Muhammed Muhammed Emîn, *Dîwanê Wîsalî*, Çapxaney Darul Cahiv, Bexda 1986, r. 391

¹⁹⁶ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Refîq, *h.b.*, r.90-93.

¹⁹⁷ Mersîyeya ku ji teref Kamiran Mukrî ve li ser Şêx Mehmûdî hatiye nivîsîn.

<https://books.vejin.net/ck/text/3701>, (Dîroka Jêgirtinê: 20.04.2023, Seat: 13.32)

12. Bîkeyn bew singe paneda
Le sozî em giryaneda
13. Elêm û her witûme.... her!
Ey gewrekeman, ey serwer
14. Zîndanekani Hîndistan
Xolemêşî gerûy bazyan
15. Xwênawî çemî kenarwê
Zamî dujmin ke dête siwê
16. Aw barîkî dabêjraw
Be gulley desrêjî betaw
17. Etnasin gewrey koçkirdû
Ey têkoşerî nemirdû
18. Gewre pyawekey nîştiman
Hemîşe zerdexeney ciwan
19. Leser lêwî wek zîwî xaw
Ya wek giznigî xoretaw
20. Birîsk û horî bû şîrîn
Wekû nîşaney nebezîn
21. Le derbendî bazyan ke hat
Kilpey esend girî xebat
22. Betaw ke hêrşî ebird
Eynirkan û bangî ekird
23. Mirdin bo gel şanazîye
Dilim bew merge razîye
24. Estêrey ademî nişîn
Lecêy xoy wergerê betîn
25. Peraş peraş bê le tema
Ewsa, min elêm Kurd nema
26. Kurd bo azadîy wetenî
Xoy eka be sûtemenî

27. Giyanî min ke nextê gerd e
Boçî neybexşim bem Kurd e
28. Lenaw qûliy derûnewe
Lew dile pake rûnewe
29. Dengî rizgarîy Kurdistan
Ehate derê û eynirkan
30. Bangî ekird: Jiyan bo Kurd
Emrîn û elên giyan bo Kurd
31. Leber firmêskî lêl û xur
Xamekem herçend hate gur
32. Neytiwanî binûsê pitir
Bo yadî koçkirdûy nemir
33. Her ewende bilêm meger
Giyanî pîrozî têkoşer
34. Ewî alakeman pê da
Wa lenaw dilî êmeda
35. Êste le yad boy eçnîn
Wêneyekî ciwan û şîrîn
36. Axo key bê Kurd le gerher
Le yaqût boy bika peyker

Ev dewlemendîya mersîyenûsîyê ya di Kurdîya Goranî û Soranî de, di Kurdîya Zazakî de nayê dîtin. Di bergeha lêkolîna ku li ser mersîyeyên Zazakî hat kirin de derket holê ku di vî warî de bes du kesan mersîye nivîsîne. Yek ji wan Mela 'Elîyê Hûnî û yê din jî Mela 'Ezîz Bekî ye. Mela 'Ezîz Bekî li ser wefata kekê xwe Mela Mucahîd û li ser Mela Selîmê kurapê xwe mersîyeyeke hevpar¹⁹⁸ û Mela Mehemed 'Elî Hûnî jî li ser şhadeta Hz. Huseyn û Hesên 3 mersîye¹⁹⁹ nivîsîye. Em dikarin li gorî daneyên li ber destê xwe bibêjin tradîsyona mersîyenûsîyê ya di edebiyata Kurdîya Zazakî ya klasîk de di sedsala XXIem de bi van

¹⁹⁸ Bekî, *h.b.*, r.414.

¹⁹⁹ Mela Mehemed Elî Hûnî, *Mewlid, Yûsûf û Zelîxa&Qesîdeya Kerbela*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004. r.74-77.

helbestan dest pê kiriye û helbestvanên van mersîyeyan her du jî niha sax in. Her çî qas me lê kola be jî di vî warî de ji xeynî mersîyeyên van her du mersîyenûsan li rastî mersîyeyên din ên bi Zazakî -ger hatibin nivîsîn- nehatin. Em dîroka nivîsîne mersîyeya Mela ‘Ezîz Bekî ji helbesta wî dizanin ku ev mersîye an di sala 2005an de an jî piştî 2005an hatiye nivîsîn. Lêbelê em bi yê Mela ‘Elîyê Hûnî nizanin. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin di vî warî de mersîyeya yekemîn ê filan şa‘irî ye.

Ji bo mersîyeya klasîk a ku bi zaravaya Zazakî hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Mela ‘Ezîz Bekî²⁰⁰

1. Dî aştarê Cebaççuri Kehkeşon ra omê wari
Îqlim welat ma bî tari kuesşkê Cebaççur recifya
2. Nêw aşmê konuna peyin şerrê “hê za û qaf û gêyn
Ufuq beqa d’ şî awon Sin kuesşkê Cebaççur recifya
3. Hotay ruêj bad şewê ‘arûs Mim ir bi ruêj wuşlêt ‘arûs
Wa Mim û Sin bicuy ‘arûs qesrê Cebaççur recifya
4. Des nêw aşmê ‘edarê ma d’ serrê “hê qaf û gêyn û za” d’
Mim şî awon ufuq beqa d’ qesrê Cebaççur recifya
5. Şîma deştê Cebaççur id şîma sêr kuon û qil wari d’
‘Îrfon kerd vîla mon şar id kuesşkê Cebaççur kot şefa
6. În aştarê felekon i in aştarê kehkeşon i
În aştarê Hêremeyn i kuesşkê Cebaççur kot şefa
7. Yenê ilhom in aştaron kitab û sunnet û Qur‘on
Herkes yîm îr zaf biyo heyron kuesşkê Cebaççur kot şefa
8. Hewê Yesrib ci r’ biv’ heyat owkê zemzêm ci r’ biv’

²⁰⁰ Bekî, *h.b.*, r.414.

- Fırat Şewê ‘arûs ci r’ bi berat kueşkê Cebaçur kot şefa
9. Vist hırıs şerr ‘ilim ders da çoraş poncaş ‘irfon ders da
Hotay ponc şêrr imon ders da Cebaçur bi zê medresa
10. Şeş pêr ra ‘ilm kot Cebaçur des pêr ra nûr kot Cebaçur
Her cê yi bi yo kitle nûr kueşkê Cebaçur kot şefa
11. Zaf gul nêrue Cebaçur id zaf vıl cêde Cebaçur id
Bulbul kêrd wê Cebaçur id Cebaçur bi zê yo têkya
12. Per yo d’ feqi ‘ilm wonên per bin d’ şofi ‘irfon cuyên
Yo per id derwêş nêy cenên Cebaçur biv’ zê yo derga
13. Sêr bin Cebaçur nur don we her kueşê yi d’ ‘irfon don we
Medreson id edeb don we Cebaçur biv’ zê yo derga
14. Welat bı zê gul û ‘anber buê misk kerd vıla ta Xeyber
În țelebê xeyrul beşer kueşkê Cebaçur kot şefa
15. Dewê guri mon dewon id merdim yê mon merdımın id
Zê aştarê mon ‘ezmon id kueşkê Cebaçur kot şefa
16. Yi ‘aşiq fexri ‘alem i yi waris şahi ‘alem i
Yi sinayê Rêb ‘alem i dı aştarê ma şî hona
17. Xeberê wuşlêt Mim û Sin resa ‘ezmon resa zemin
Şar ma ci r’ zaf zaf bi hazin Cebaçur bi zê Kerbela
18. Çêrx Cebaçur pê din gêrên şar Cebaçur pê din cuyen
‘Alim zê aştarî êsên dı aştarê ma şî hona
19. Sêkaron kot matem bermen Neqşun kot siya hesron rışnen
Şencaq kot gem Şirnon nalen dı aştarê ma şî hona

20. Deştê Cebaçur mehzun a owkê Muradi Mecnûn a
Bulbulê gul zê Mem Zin a dı çilê ma tiyed şî hona
21. Feşlê wusar ha bermena aşmê ‘edar ha bermena
Aşmê konon ha nalena dı aştarê ma şî hona
22. Gul wusar piyêr gêrê bi zerd feşlê wusar gêra bi derd
Ina feşl ıd heyat bar kerd dı aştarê ma şî hona
23. Ez wusar bê Mim pê sêkir ez umnon bê Sin pê sekir
Ez payiz bê yin pê sêkir dı astarê ma şî hona
24. Medresê yin piyêr bi yetim kê ‘ilm û ‘irfon bi yetim
Bon luft û kerêm bi yetim dı aştarê ma şî hona
25. Ya Reb tu qê zati xu kir tu wurd bıron mı ‘ef bıkir
Pa famila rehmet bıkir tu ma piyerın bêr huriga
26. Tu qê hürmêt nomê xu kên tu qê hürmêt şifêt xu kên
Tu qê cemali zati xu kên tu Sin û Mim bêr huriga
27. Tı welat ma bê ‘ilm nêvêrd tı şar ma bê ‘irfon nêvêrd
Tı comi bê imom nêvêrd Cebaçur bicuy zê dêrga
28. Heta şuwê meşêr têra v’ qelemê tewhid minara v’
Awaz tewhid tera vıla v’ Cebaçur bicuy zê dêrga
29. Teşawuf bê ‘ilm bañıl teşawuf ‘ilim ken kamil
Wurd piya birê zê yo hamıl Cebaçur bicuy zê dêrga
30. Tı qê xañir Cemalê xu tı qê xañir Celalê xu
Tı ‘ef bıkir in kuelê xu tı ‘aziz ik bêrz horiga

3. Destpêk û Pêşveçûna Kevneşopîya Mersîyeyê di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de

Piştî ku me bi kurtasî qala kevneşopîya şîn û şîngirtinê û her wisa tradîsyona mersîyeyê ya her sê zaravayên Kurdî yên Soranî, Goranî û Zazakî kir, vêca jî em ê berê xwe bidin li ser mijara ku mijara sereke ya tezê ye. Em ê di vê beşê de li ser tradîsyona mersîyenûsîya di zaravayê Kurmancî de birawestînin. Di vê beşê de pêşî mersîyeya ewil a kî ye û li ser kî hatiye nivîsîn dê bê nirxandin û dûre jî mersîyeyên ku bi zaravaya Kurmancî hatine nivîsîn ji hêla sedsala ku mersîyenûs lê jiyane ve dê bînin dabeşkirin. Her wisa dê bê destnîşankirin ka di vê qada klasîk a Kurdî de kîjan mersîyenûsî çend mersîye bi zaravayê Kurmancî nivîsîne.

3.1. Mersîyenûsên ku di Sedsala XVI û XVIIem de Jiyane

Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat tespîtîkirin mersîyeya ewil a bi Kurmancî di sedsala XVIIem de ji teref Feqîyê Teyran (m.1632) ve hatiye nivîsîn. Ev mersîyeya ku bi şiklê qesîdeyê hatiye nivîsîn ji 24 malikan pêk tê.

Mersîyeya Feqîyê Teyran bi vê malikê dest pê dike:

Îro werin lêzim werin cîran û xelkê Hêşetê²⁰¹
Hûn rayekê li min bikin îro qewî girya me tê(1)

Û bi vê malikê bi dawî dibe:

“Mîm û Hê” şa ‘irkî pak e herkesê bi ruhê bû ji makê²⁰²
Hemîyan dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê(24)

Feqîyê Teyran vê mersîyeya xwe bi qaliba arûzê ya Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun û bi behra recezê nivîsîye. Ev mersîyeya ku di warê xwe de ya yekem e nediyar e li ser kî hatine nivîsîn. Bes di mersîyeyê de risteyeke bi vî awayî “*Heyf ‘eyn û lam bûne cudâ*” heye û nayê zanîn ev “*‘Eyn û lam*” kî ye yan jî kî temsîl dike.

²⁰¹ Xalid Sadî, *Feqîyê Teyran Jiyane, Berhem û Helbestên Wî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014a*, r.139.

²⁰² *H.b.*, r.145.

Lêbelê dema ku em li nivîs û lêkolînên ku li ser Feqîyê Teyran hatine amadekirin mêze dikin em dibînin ku hinek lêkolîner dibêjin ev mersîye li ser Melayê Cizîrî(m.1640) hatiye nivîsîn. Di vî warî de Celadet Bedirxan di Kovara Hawarê de bi navê muste'ar a Herekol Ezîzan dibêje ku li ber destê wî (Melayê Cizîrî) gelek feqeh perwerdehî dîtine ku şa'irê navdar Feqîyê Teyran jî, ji van feqîyên Melayê Cizîrî bû²⁰³ û ew li ser Melayê Cizîrî mersîyeya bi navê *Îro Gîrya Me Tê* nivîsîye.²⁰⁴ Ji bilî Bedirxan, Zeynelabîdîn Zinar jî destnîşan dike, Feqîyê Teyran helbesta bi navê “*Îro Gîrya Me Tê*” li ser şîna Melayê Cizîrî gotîye. Feqîyê Teyran dema rojekê diçe Cizîrî dibîne ku Cizîrî wefat kiriye û vê helbestê li ser wî nivîsîye.²⁰⁵ Zinar dîsa di xebata ya bi navê *Feqîyê Teyran* a ku di Kovara Nûdemê de hatiye weşandin de destnîşan dike ku Cizîrî û Feqîyê Teyran hevdemên hev in û Feqîyê Teyran li ser Melayê Cizîrî mersîyeyek (*Îro Gîrya Me Tê*) gotîye.²⁰⁶

Ji ber ku lêkolînerên wê demê belgeyên li ber destên wan kêman bûn destnîşan kirine ku Feqîyê Teyran piştî Melayê Cizîrî wefat kiriye û li ser Melayê Cizîrî vê mersîyeya xwe nivîsîye û derbarê vê yekê de fikra xwe anîne ziman. Lêbelê li gorî belgeyên ku nû derketin holê a rastî ne weke ku ew dibêjin e. Lewra dema em li dîroka wefata her du şa'iran mêze dikin em dibînin Melayê Cizîrî yan di sala 1640î de yan jî piştî vê salê rehmet kiriye. Lêbelê diyar e ku dîroka wefata Feqîyê Teyran 1632 ye. Heta demekê nêz jî di warê dîroka wefata Feqîyê Teyran de nezelalîyek hebû û dihat gotin ku Feqîyê Teyran piştî Melayê Cizîrî ango piştî sala 1640î rehmet kiriye û wî, ev mersîyeya xwe ya bi navê “*Îro Gîrya Me Tê*” li ser Melayê Cizîrî nivîsîye. Lêbelê di van salên dawî de li gundê Şandîsê ya ku meqbera Feqîyê Teyran lê ye hinek kêlên qebra Feqîyê Teyran hatin dîtin. Di encamên lêkolînên ku li ser wan kêlan hat kirin de hat tespît kirin ku Feqîyê Teyran di sala 1632yan de rehmet kiriye.²⁰⁷

Baş e ger ev mersîye ne li ser Melayê Cizîrî hatibe nivîsîn, naxwe ew kesê yan jî kesa ku bi mirina xwe bûye sebeb Feqîyê Teyran mehzûn û xemgîn bibe, êş û elemê bikşîne û vê yekê bi rêya helbestê bîne zimên kî ye? Di vir de divê em li temamê mersîyeya ku hatiye nivîsîn mêze bikin û mersîyeyê analîz bikin. Dema li mersîyeya ku hatiye nivîsîn mêze dikin em dibînin ku Feqîyê Teyran di helbesta xwe de du caran gotina “*Heyf Eyn û lam çûn hicretê*”²⁰⁸ bi kar

²⁰³ Herekol Ezîzan(Celadet Bedirxan), *Melayê Cizîrî*, Kovara Hawar, İstanbul 2012, Weş. Belkî, h.6, r.82.

²⁰⁴ Herekol Ezîzan(Celadet Bedirxan), *Klasîkên Me*, Kovara Hawar, İstanbul 2012, Weş. Belkî h.33, r.559.

²⁰⁵ Zeynelabîdîn Zinar, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Weş. Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm 1991a, r. 57.

²⁰⁶ Zeynelabîdîn Zinar, *Feqîyê Teyran*, Kovara Nûdem, s.1992c, h.3, r.85.

²⁰⁷ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Abdurrahman Adak, Yusuf Baluken, Hayrullah Acar, *Gora Feqîyê Teyran*, Kovara Nûbihar Akademî, İstanbul 2014, j.1, s.1. r.111-120

²⁰⁸ Sadînî, *h.b.*, 2014a, r.139-140.

tîne. Lê ne diyar ka “*Eyn û lam*” kî ye. Dîsa di seranserê helbesta xwe de du caran peyva dost “*Dost çûye çerxa adetê*” û “*Meqbera dost lê veşare*” û her wisa şeş caran jî peyva “*mehbûb*”²⁰⁹ bi kar tîne. Ji bilî van nîşaneyan wekî din remzeke din di helbestê de nayê dîtin. Vêca kesê/a ku rehmet kiribe kî dibe bila bibe ferq nake, Feqîyê Teyran ji bo hezkirina xwe û qedr û qiymeta wî/ê nîşan bide peyvên dost û mehbûb bi kar anîye û navê wî/ê wek “*Eyn û lam*” daniye. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin Feqîyê Teyran vê mersîyeya xwe li ser filan kesî nivîsîye. Di dawî de be jî hêja yî gotinê ye ku di vî warî de Se’îd Dêreşî agahîyeke balkêş parve dike û dibêje ku Feqîyê Teyran vê mersîyeya xwe li ser qîza Mîrê Hêşetê²¹⁰ nivîsîye. Îhtîmaleke zeîf be jî dibe ku rast be. Lê li ber dest di vî warî de agahîyeke mutleq tune ye. Ji ber vê yekê nikare bê gotin Feqîyê Teyran vê mersîyeya xwe li ser qîza mîrê Hêşetê jî nivîsîye.

Heger em mersîyeya bi navê “*Îro Gîrya Me Tê*” li ser navê Feqî Teyran bihesibînin, em dikarin bibêjin kevneşopîya mersîyeyê ya bi Kurdîya Kurmancî cara ewil di sedsala XVIIem de dest pê kiriye. Di bergeha lêkolînên ku hatin kirin de nehat tespît kirin ku di vê qonaxa sedsala XVI û XVIIem de ji xeynî Feqî ti kesî mersîye nivîsîye. Di vê qonaxê de digel ku bes mersîyeyek hatibe nivîsîn jî ev mersîye bi xwe ji bo destpêkê muhîm û xwediyê cihekî taybet e.

Lêbelê piştî tespît kirina mersîyeya ewil a bi Kurdîya Kurmancî hatiye nivîsîn pirseke ku divê bersiva wê bê dayîn derdikeve pêşîya me. Ew jî ev e: “Çima di sedala XVIem de bes mersîyeyek tenê bi Kurdîya Kurmancî hatiye nivîsîn?” Kurd piştî ku Îslamîyetê qebûl kirin li ser axên xwe gelek îdareyên ku bi dewletê Ereban ve girêdayîbûn damezrandin. Ji ber ku zimanê dîplomasî, perwerdehî û kitêban bi Erebî bû wê demê Kurd jî di bin tesîra vê yekê de man an jî mecbûr man ku berhemên xwe bi Erebî binivîsînin. Piştî ku di sala 1258an de Moxolan êrîş birin li ser Abbasîyan û ew hilweşandin Kurdan li ser axên xwe mîrektîyên xweser ava kirin. Lêbelê ev yek ji ber bêstîqrarîya ku hebû pêşîya perwerdehî û ilmê ya bi zimanê Kurdî girt û di vî warî de berhemên bi Kurdî nehatin dayîn. Ev yek heta Şerê Çaldêranê berdewam kir. Piştî Şerê Çaldêran a ku di sala 1514an di navbera Osmanîyan û Safewîyan de pêk hat bi navbeynkarîya Îdrîsê Bidlîsê mîrektîyên Kurdan bi Osmanîyan re tifaqek kirin û ew ji ber êrîşên Safewîyan hakimîyeta Osmanîyan qebûl kirin. Bi kirina vê tifaqê demajoya damezrandina mîrektîyan bi dawî bûbû. Piştî vê lihev kirinê li ser axên ku di bin îdareya mîrektîyên Kurdan de bûn digel êrîşên ku ji teref Safewîyan ve dihatin kirin û bêstîqrarîya

²⁰⁹ Sadînî, *h.b.*, 2014a,, r.140-145.

²¹⁰ *H.b.*, r.51-52.

mewcûd di bin sîwana mîrektîyan de medrese hatin vekirin û di van medreseyan de zimanê perwerdehiyê Kurdî bû. Bi vê yekê her çi qas di demeke nêz de nebe jî di sedsalên pêş de di warê berhemnivîsîna bi zimanê Kurdî de ji teref edîb û şa'îrên Kurdî ve gelek berhem bi zimanê Kurdî hatin nivîsîn.²¹¹ Adak di lêkolîna ku li ser mijarê kiriye de derheqê vê yekê de balan dikîşîne li ser tifaqa ku hatiye kirin û destpêk û pêşveçûna edebiyata klasîk a Kurdîya Kurmancî:

“Piştî vê tifaqê di navbera Kurd û Osmanîyan de mîrektîyên Kurdan heta bi dereceyekê gihîştin îstîqrareke baş. Vê yekê jî ji edebiyata Kurdîya Kurmancî re bîngeh û atmosfereke guncaw ava kir. Di vê serdemê de hijmareke gelekî zêde helbestvanên Kurd xuya dibin ku mirov dikare bêje edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk ji xwe di vê serdemê de derketiye meydana û aîdê wê ye. Lê ji bo ku ev rewşa nû fêkîyên xwe bide bi kêmasî derbasbûna niv qernî lazim bû.”²¹²

Di vê qonaxa derbasbûnê ango di sedsala XVIem de şa'îr û edîbên mîna Elîyê Herîrî, Mîr Ye' qûbê Zirkî, Mîr Îmadeddîn, Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran derketin holê ew ji edebiyata klasîk a Kurdîya Kurmancî re pêşîvanti kirin. Bes ji van şa'îr û edîban Feqîyê Teyran di warê mersîyeyan de berhemek li pey xwe hişt. Wekî din di vî warî de nehat tespîtîkirin ku şa'îr mersîye nivîsîne. Ger wê heyamê li ser wan axên ku Kurd lê îdareya xwe saz kiribûn mîrektîyên Kurdan bi şikleke kamil bi hêz bûba, îstîqrar heba dibe ku hejmara van şa'îran zêdetir bana. Muheqqeq ew ê wê demê hejmara berhemên ku di nav wan de mersîye jî hebin zêdetir bûba.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmara Mersîyeyên Wî	Li ser Kî Nivîsîye
Feqîyê Teyran	1567	1632	1	Nediyar e

Tablo 1: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVI û XVIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.2.Mersîyenûsên ku di Sedsala XVII û XVIIIem de Jiyane

²¹¹ Yakup Aykaç, *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Doktora Tezi, Diyarbakır 2020, r.305-308

Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014b, r.191-199.

²¹² Adak, *h.b.*, 2014b, r. 197.

Di vê qonaxê de em bes li rastî sê mersîyenûsên Kurd ên bi navê, Ehmedê Xanî (m.1709) û Axayokê Bêdarî (m. piştî 1727an)²¹³ û Mela Husenê Bateyî (m.1760) tên. Ehmedê Xanî li ser Mîrê Bazîdê Muhemmed Begê Purbelalî mersîyeyek²¹⁴, Axayokê Bêdarî li ser du lawên xwe yên ku li pey hev wefat kirine mersîyeyek²¹⁵ û Mela Huseynê Bateyî jî mersîyeyek li ser xwe²¹⁶ nivîsiye. Hejmara mersîyeyên ku di vê qonaxê de hatine nivîsîn tevde 4 heb in. Tê dîtin mersîyenûsên ku di van sedsalan de jiyane li ser mîr, law û li ser xwe mersîye nivîsîne. Wekî din nehat dîtin ku di vê qonaxê de ji teref mersîyenûsên Kurd ve bi zaravayê Kurmancî mersîye hatine nivîsîn.

Mersîyeya ku Ehmedê Xanî li ser Mîrê Bazîdê nivîsiye tev de ji 31 beytan pêk tê. Mersîye bi teşeya nemzê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn. Behra mersîyeya wî recez û qaliba wê jî Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun.

Beyta ewil û dawî ya mersîyeyê wisa ye:

Ji Ehmedê Xanî:

Kanê Muhemmed beg gelo? Ka Padişahê Serhedan?²¹⁷

Îro ji dil bigrîn dilo! Ka Padişahê Serhedan?(1)

Xanî! Tu jî, destan hilîn, her çend ku zêde dil kulîn²¹⁸

Îro ji mîrê sailîn, ka Padişahê Serhedan? (31)

Mersîyeya ku Axayokê Bêdarî jî li ser mirina her du lawên xwe nivîsiye. Ji mersîyeya wî tê famkirin ku her du lawên wî li pey hev wefat kirine. Mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmes/pêncîneyan hatiye nivîsîn û ji 8 bendan pêk tê. Behra mersîyeyê remel û qaliba wê jî Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun e.

²¹³ Derheqê dîroka wefata Bêdarî de tu malumat nîne. Lêbelê em dizanin ku Bêdarî mersîyeya xwe ya li ser du lawên xwe di sala 1728an de nivîsandiye ku ji ber vê yekê bes em dikarin bibêjin ku Bêdarî di sedsala XVIIIem de jiyaye.

²¹⁴ Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*, Weş. Keskesor, İstanbul 2002, r.336.

²¹⁵ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Baxê Îrem, Geşteki li Nav Şî'ra Kurmancîya Klasîk*, amd. M. Zahir Ertekin, Weş. Dara, İstanbul 2020a, r.42

²¹⁶ Sadîni, *h.b.*, 2014a r.124.

²¹⁷ Durre, *h.b.*, r.336.

²¹⁸ *H.b.*, r.338.

Benda destpêk û dawîyê ya mersîyeya ku ji teref Axayokê Bêdarî li ser her du lawên xwe hatiye nivîsîn bi vî awayî ye:

Ji Axayokê Bêdarî:

Şed mixabin vê cewabê ez ji dil nalan kirim²¹⁹
Taqet û qûwet nema min belkî ez bêcan kirim
Leşkerê derdan geha min ji 'eqlî talan kirim
Min nema qeç xew bi carek bêser û saman kirim
Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim(1)

Ĝeyn Elîf beske ji nal û zarî waha derûn²²⁰
Ew qezaya barî ye ma kes li wê çu kit bi rûn
Sa'etek texîrî nabîtin *wela yesteqdîmun*
Herçî heq kit ew heqq e *inna lillahî raci'un*
Lê ji derd û heşretan ez bê 'eded giryan kirim(8)

Mersîyenûsekî din ê vê qonaxê Mela Huseynê Bateyî ye. Mersîyeya ku Melayê Bateyî berî wefat bike li ser mirina xwe nivîsîye ji 16 çarîneyan pêk tê û bi şiklê murabbe'ê hatiye nivîsîn. Behra mersîyeyê hezec û qaliba wê jî Mefa'îlun Mefa'îlun e. Çarîna ewil û ya dawî ya mersîyeya wî wisa ye:

Ji Mela Huseynê Bateyî:

Ji çirya paşî pê da²²¹
Melayê Bateyî kanê?
Sefer kêşa bi Muksê da
Li ser weqtê zivistanê (1)

Duxan dê çîte Erwasê²²²
Eya Batey vexwey tasê
Tu serdarbûy me nen 'yasî

²¹⁹ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

²²⁰ *H.b.*, r.44.

²²¹ Sadînî, *h.b.*, 2013b r.124.

²²² *H.b.*, r.127.

Dixwazîn dad û emmanê(16)

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmara Mersîyeyên Wî	Li ser Kî Nivîsîye
Ehmedê Xanî	1650-1	1707/9	1	-Muhemmed Begê Purbelalî
Mela Huseynê Bateyî	1675	1760	1	-Xwe
Axayokê Bêdarî	1688	Piştî 1727an	1	-Du lawên xwe

Tablo 2: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVII û XVIIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

Ji bo van her du qonaxên navborî bi kurtasî em dikarin bibêjin di edebiyata Kurdî ya klasîk de kevneşopîya mersîyenûsîyê di sedsala XVIIem de bi Feqîyê Teyran dest pê kiriye di sedsala XVI-XVIIem de nûnerê tekane yê vê qadê Feqîyê Teyran bi xwe ye. Piştî wî, di vê qadê de 3 mersîyenûsên ku him di sedsala XVIIem û him jî di sedsala XVIIIem de jiyane derdikevin meydanê. Ew jî Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî û Axayokê Bêdarî ye. Ev her du qonax him di warê hejmara wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn û him jî hejmara mersîyeyên ku hatine nivîsîn ve lawaz e. Lêbelê ji bo destpêka vê kevneşopîyê xwedîyê xalekî girîng in.

3.3. Mersîyenûsên ku di Sedsala XVIIIem de Jiyane

Di vê qonaxa sedsala hijdehem de em li rastî 3 mersîyenûsên ku bi zaravaya Kurmancî mersîye nivîsîne tên. Ev her sê temsîlkarên vê serdemê yê mersîyenûsîyê; Xewsî, Mela Qasim û Evdilqadirê Hekkarî ye. Ji van her sê mersîyenûsan dîroka welidîn û wefata bes ya Xewsî tê zanîn. Xewsî di sala 1740î de ji dayik bûye û di sala 1784an de jî çûye rehma Xwedê. Lêbelê derheqê dîroka welidîn û wefata her du mersîyenûsên din de agahîyeke teqez nehat dîtîn. Bes tê zanîn ku Mela Qasim û Evdilqadirê Hekkarî di sedsala XVIIIem de jiyane.²²³

²²³ Ji bo agahîyên derheqê dewra ku Mela Qasim û Xewsî lê jiyaye de binêrin:

-Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Sê Klasîkên Me Yên Nenas: Mela Hesen û Qasim û Mela Şems*, Kovara Kurdîname, Jimar: 7 Mijdar 2022b, r.164.

-Abdurrahman Adak, *Helbestvanên Klasîk Yên Herêma Hekarî, Analîz û Nirxandîneke Giştî*, Uluslararası Zap Havzası Uleması Sempozyumu, Hakkari Üniversitesi, 21-23 Ekim 2022e, r.241.

Di vê qonaxê de ji teref 3 mersîyenûsan ve tevde 3 mersîye hatine nivîsîn. Dema ku em li van mersîyên ku hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin, Mela Qasim li ser kurê xwe yê bi navê Ebdullah û li ser birayê xwe yê bi navê Ehmed mersîyeyeke hevpar, Evdilqadirê Hekkarî li ser Mela Huseynê Bateyî mersîyeyek û Xewsî jî li ser Mîr Mustafa Beg mersîyeyek nivîsîye.

Di qonaxa borî ya ku wek “*Ên ku di Sedsala XVII û XVIIIem de Jiyane*” de hat dîtîn ku bes ji teref 3 mersîyenûsan ve 3 mersîye hatine nivîsîn. Di vê qonaxa bi navê “*Ên ku di Sedsala XVIIIem de Jiyane*” de jî tê dîtîn di warê mersîye û mersîyenûsîyê de guhartineke çênebûye û ji teref 3 mersîyenûsan ve bes 3 mersîye hatine nivîsîn.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmara Mersîyeyên Wî	Li ser Kî Nivîsîye
Mela Qasim	XVIII	XVIII	1	-Ebdullah û Ehmed
Evdilqadirê Hekarî	XVIII	XVIII	1	-Mela Huseynê Bateyî
Xewsî	1740	1784	1	-Mîr Mustafa Beg

Tablo 3: Mersîyenûsên ku di sedsala XVIIIem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.4. Mersîyenûsên ku di Sedsala XVIII û XIXem de Jiyane

Di vê qonaxa bi navê sedsala XVIII û XIXem de em dibînin li gor qonaxa borî hejmara mersîyenûsan bes kesek zêde bûye. Lêbelê dîsa tê dîtîn ku di warê mersîyeyên ku hatine nivîsîn de pêçveçûnek heye û hejmara mersîyeyên ku hatine nivîsîn zêde bûye. Di vê qonaxê de Şêx Ehmedê Kor (m.1856) li ser mirinê û wefata wan kesên ku li derdora wî rehmet dikin mersîyeyek, li ser Seyyîd Taha mersîyeyek û li ser Hz. Muhemmed jî 3 mersîye bi tevahî 5 mersîye nivîsîne. Wekî din di vê qonaxê de Şêx Muhemmed Xelîfe (m.1898) li ser Şêx Abdurrahmanê Taxî mersîyeyek, Şêx Abdurrahmanê Çoxreşî (m.1872) li ser Seyyîd Sibxatullah Erwasî mersîyeyek û Weda'î (m.1850) jî li ser Şêxê Begî mersîyeyek nivîsîye. Di vê qonaxê de şa'irê ku di warê mersîyenûsîyê de herî zêde berhem daye Ehmedê Kor e. Wî tevde 5 heb mersîye nivîsîne. Mersîyenûsên din jî her yek ji wan mersîyeyek nivîsîne.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmara Mersîyeyên Wî	Li ser Kî Nivîsiye
Şêx Ehmedê Kor	1771	1856	5	-Li ser mirinê û li ser mirina kesên li dora xwe -Resûlullah -Resûlullah -Resûlullah -Seyyîd Taha
Şêx Muhemmed Xelîfe	1775	1898	1	-Şêx Abdurrahmanê Taxî
Şêx Ebdurrahmanê Çoxreşî	1789	1872	1	-Seyyîd Sibxatullah Erwasî
Weda î	1790	1850	1	-Şêxê Begî

Tablo 4: Mersîyenûsên ku di sedsalên XVIII û XIXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.5. Mersîyenûsên ku ki Sed sala XIXem de Jiyane

Temsîlkarên me yên vê qonaxê Mela Meqsûd (m.sedsala XIX.)²²⁴, Ebdullahê Mexrîbî (m.sedsala XIX.)²²⁵, Şêx Selîmê Gêxî (m.1893.) û Şêx Hemze (m. sedsala XIX.)²²⁶ ye. Ji teref van mersîyenûsan ve di vê qonaxê de tevde 4 mersîye hatine nivîsîn. Mela Meqsûdê ku bi navê Esamî jî tê nasîn bi qasî ku ji naveroka mersîyeya wî tê famkirin mersîyeyek li ser hevsera xwe, Ebdullahê Mexrîbî li ser Hz. Muhemmed mersîyeyek, Şêx Selîmê Gêxî li ser Şêx Ehmedê Çanî mersîyeyek û Şêx Hemze Hîmmetullah jî li ser bavê xwe Sultan Memdûh Hîmmetullah mersîyeyek nivîsiye. Di vê qonaxê de jî di warê hejmara mersîyenûs û hejmara mersîyeyên ku hatine nivîsîn de pêşveçûneke li ber çavan nayê dîtin. Wekî din ji bilî ya Şêx Selîmê Gêxî derheqê dîroka welidîn û wefata mersîyenûsên din bi xwe de agahîyeke teqez nehat bidestxistin. Bes tê zanîn, her sê mersîyenûsên ku dîroka wan a welidîn û wefatê nayê zanîn di sed sala XIXem de jiyane.

²²⁴ Ji bo agahîyên derheqê sed sala ku Mela Meqsûd-Esamî lê jiyaye de binêrin: Doskî, *h.b.*, 2020a, r.191.

²²⁵ *H.b.*, r.186.

²²⁶ Derheqê wefata wî bi xwe de agahîyek nehat bidestxistin. Lê ji ber ku bavê wî di sala 1847an de rehet kiriye me, Şêx Hemze jî wek mersîyenûsên sed sala XIXem hesaband.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmar	Li ser Kî Nivîsîye
Esamî	XIX	XIX	1	Hevser
Ebdullahê Mexrîbî	XIX	XIX	1	Hz. Muhemmed
Şêx Hemza Hîmmedullah	XIX	XIX	1	Sultan Memdûh
Şêx Selîmê Gêxî	1813	1893	1	Şêx Ehmedê Çanî

Tablo 5: Mersîyenûsên ku di sedsala XIXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.6. Mersîyenûsên ku di Sed sala XIX û XXem de Jiyane

Di vê qonaxê de him di warê hejmara mersîyenûsan de û him jî di warê hejmara mersîyeyên ku hatine nivîsîn de pêşveçûneke li ber çavan heye. Di encama xebata ku hat kirin de derket holê ku di vê qonaxê de ji teref 38 mersîyenûsan ve tevde 101 heb mersîye hatine nivîsîn. Dema ku em li vê serdemê dinêrin em dibînin ku Şêx Mustafayê Sîsî(m.1914) li ser Şêx Ebdilqadirê Hezanî mersîyeyek; Mela Mihemedê Liceyî (m.1912) li ser Şêx Ebdulqadirê Hezanî 4 mersîye; Şêx Evdirrehmanê Aqtepî (m. 1907) li ser Hz. Huseyîn mersîyeyek; Şêx Esed Çoxreşî (m.1902) li ser kekê xwe Mela Xelîl mersîyeyek; Mela Ebdulezîzê Bidlîsî (m.1928) li ser Şêx Muhemmed Zîyaeddîn 3 mersîye, li ser Şêx Fethullahê Werqanîsî 2 mersîye, li ser Şêx 'Elaeddîn Oxînî mersîyeyek û li ser Şêx Ebdurrehmanê Taxî mersîyeyek bi tevahî 7 mersîye; Şêx Ebdilqadirê Hezanî (m.1908) li ser Şêx Evdirrehmanê Taxî mersîyeyek; Mela Mûsayê Mizî (m.Piştî 1924an) li ser Şêx Muhemmed Zîyaeddîn mersîyeyek; Mela Ehmedê Xasî (m.1951) li ser Şêx Selîmê Hezanî mersîyeyek; Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (m.1936) li ser Şêx Muhemmed Zîyaeddîn mersîyeyek; Şêx 'Eskerî (m.1952) li ser Muhemmed Kerbelayî mersîyeyek, Şêx Meczûb (m.1916) li ser Şêx Husamettîn mersîyeyek; Mela Ebdulkerîm Îbrahîm (m.Piştî 1963yan) li ser Ehmedê Nalbend mersîyeyek; Mela Ebdurrehmanê Hazrowî (m.1947) li ser Şêx Selîmê Hezanî mersîyeyek, Şêx Silêman (m.1971) li ser Şêx Zeynelabîdîn mersîyeyek; Mela Mehmûd (m.1945) li ser Şêx Hezîn mersîyeyek û li ser Mela Mistefa Barzanî mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Mela Zahirê Tendûrekî (m.1966) li ser Şêx Zîyaeddîn 24 mersîye û him li ser Şêx Zîyaeddîn û him jî li ser lawê wî Şêx Fethullah 3 heb mersîye bi tevahî 27 mersîye; Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî (m.1954) li ser dîn

mersîyeyek, li ser bavê xwe Şêx Mistefayê Sîsî 2 mersîye û li ser Şêx Muhemmed Çanî mersîyeyek bi tevahî 4 mersîye; Şêx Mihemed Kerbelayî (m.1939) li ser Hz. Huseyn mersîyeyek; Şêx Celaleddin Eskambevî (m.1973) li ser Şêx Zeynelabidinê Fersafî mersîyeyek, Evdirrehîm Rehmî Hekkarî (m.1958) li ser welat mersîyeyek û li ser Hemzeyê Miksî mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Şêx Xiyaseddîn (m.1944) li ser mala Bedirxanan mersîyeyek; Mela Ehmedê Nalbend (m.1964) li ser Şêx Xiyaseddîn mersîyeyek, li ser xanima xwe Seyyîd Fehîma 2 mersîye, li ser Şêx Tahayê Mayî mersîyeyek û li ser lawê xwe Muhemmed 8 mersîye bi tevahî 12 mersîye; Şêx Heybetullah Abirî (m.1965) li ser Şêx Fethûllahê Hamîdî mersîyeyek û li ser Şêx Seyfeddînê Hamîdî mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Molla Îsamuddîn (m. Piştî 1892yan) li ser kalikê xwe Şêx Hezîn mersîyeyek; Mela Muhemmedê Seyda (m.1975) li ser Şêx Ebdullah mersîyeyek; Mela Ebdulfettahê Hezroyî (m.1975) li ser Şêx Zîyaeddîn Muhemmed 6 mersîye, li ser Şêx 'Evdilqadirê Hezanî mersîyeyek, li ser Xoce Se'îd mersîyeyek û li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî mersîyeyek bi tevahî 9 mersîye; Seyid 'Eliyê Findikî (m.1967) li ser Se'îdê Nûrsî mersîyeyek û li ser Şêx Îbrahîm Heqqî 3 heb mersîye bi tevahî 4 mersîye; Celadet Bedirxan (m.1951) li ser Şêx Evdirrehmanê Garisî mersîyeyek; Mela Nûranî (m.1983) li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî mersîyeyek; Seydayê Mela 'Omer (m.1977) li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî mersîyeyek; Kamiran Bedirxan (m.1978) li ser Şêx Evdirrehmanê Garisî mersîyeyek; Mela Zubeyr Bildîrîcî (m.1956) li ser Şêx Muhemmed Zîyaeddîn mersîyeyek; Şêx Abdurrahmanê Şawurî (m.1976) li ser Şêx Îbrahîmê Heqqî mersîyeyek; Seyid Qedri Haşimî (m.1961) li ser Şêx 'Elî Husamettîn mersîyeyek; Molla Reşîd Comanî (m. Piştî 1906an) li ser Şêx Evdilqahhar mersîyeyek; Mela Ruşdî Efendî (m. Piştî 1912yan) li ser Seyda Muhemmed Hadî mersîyeyek; Mela Muhemmedê Saricanî (m. Piştî 1914an) li ser Şêx Mustafayê Sîsî mersîyeyek û Silêman Bedirxan (m. Piştî 1911an) jî li ser welêt mersîyeyek nivîsîye.

Di vê qonaxê de li ser şêxan 74 mersîye, li ser endamên malbatê 15 mersîye û 12 mersîye jî li ser kesên din ên mîna Mela Mistefa Barzanî, Se'îdê Nursî, Hz. Huseyîn, Hemzayê Miksî û welat hatine nivîsîn. Li gorî dane û agahîyên vê qonaxê em dikarin bibêjin edebiyata Kurdî ya klasîk him di warê hejmarê mersîyeyên ku hatine nivîsîn him jî kesên li ser wan mersîye hatine nivîsîn de di vê qonaxê de li gorî wan qonaxên din pêşve çûye û dewlemendtir e. Lewra di wan pênc qonaxên navborî de ji teref 15 mersîyenûsan ve tevde 30 heb mersîye hatibû nivîsîn. Lêbelê em dibînin ku bes di vê qonaxa “*Mersîyenûsên ku di Sedsala XIX û XXem de Jiyane*” hatiye binavkirin de ji teref 38 mersîyenûsan ve tevde 101 mersîye hatine nivîsîn.

Tê dîtin di vê heyamê de ji 38 mersîyenûsan, ê ku herî zêde mersîye nivîsîne Mela Zahirê Tendûrekî ye. Wî tevde 27 mersîye nivîsîne. Piştî wî bi 12 mersîyeyan Mela Ehmedê Nalbend dû re jî bi 9 mersîyeyan Mela Ebdulfettahê Hezroyî tê.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmar	Li ser Kî Nivîsîye
Şêx Mustafayê Sîsî	1848	1914	1	Şêx Ebdulqadirê Hezanî
Mela Mihemedê Liceyî	1852	1912	4	Şêx Ebdulqadirê Hezanî
Şêx Evdirrehmanê Aqtepî	1853	1907	1	Hz. Huseyîn
Şêx Esed Çoxreşî	1853	1902	1	Mela Xelîl
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	1856	1928	7	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn -3
				Şêx Fethullahê Werqanisî-2
				Şêx `Elaeddîn Oxînî-1
				Şêx Ebdurrehmanê Taxî -1
Şêx Evdilqadirê Hezanî	?	1908	1	Şêx Evdirrehmanê Taxî
Mela Mûsayê Mizî	p.1864an	?	1	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn
Mela Ehmedê Xasî	1866/7	1951	1	Şêx Selîmê Hezanî
Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	1866	1936	1	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn
Şêx `Eskerî	1868	1952	1	Muhemmed Kerbelayî
Şêx Meczûb	1873	1916	1	Şêx Husamettîn
Mela Ebdulkerîm Îbrahîm	1874	?	1	Ehmedê Nalbend
Mela Ebdurrehmanê Hazrowî	1875	1947	1	Şêx Selîmê Hezanî
Şêx Silêman	1876	1971	1	Şêx Zeynelabîdîn
Mela Mahmud	1877	1945	2	Şêx Hezîn Mela Mustefa Barzanî
Mela Zahirê Tendûrekî	1882	1966	27	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn -24 Şêx Muhemmed Zîyaeddîn û Fethullah-3

Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî	1884	1954	4	Dîne Îslamê-1 Şêx Mistefayê Sîsî-2 Şêx Muhemmed Çanî -1
Şêx Mihemed Kerbelayî	1886	1939	1	Hz. Huseyn
Mela Xelîlê Mişextî	1888	2007	1	Hêmin Mukrîyanî
Şêx Celaeddîn Eskambevî	1888	1973	1	Şêx Zeynelabidinê Fersafî
Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî	1890	1958	2	Welat Hemzeyê Miksî
Şêx Xiyaseddîn	1890	1944	1	Bedîrxan
Mela Ehmedê Nalbend	1890	1964	12	Şêx Xiyaseddîn-1 Seyyîd Fehîma-2 Muhemmed-8 Şêx Tahayê Mayî-1
Şêx Heybetullah Abirî	1891	1965	2	Şêx Fethûllahê Hamîdî Şêx Seyfeddînê Hamîdî
Molla Isamuddîn	b.1892an	?	1	Şêx Hezîn
Mela Muhemmedê Seyda	1892	1975	1	Şêx Ebdullah
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	1892	1975	9	Şêx Zîyaeddîn Muhemmed-6 Şêx `Evdilqadirê Hezanî-1 Xoce Se`îd -1 Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî-1
Seyid `Eliyê Findikî	1892	1967	4	Se`îdê Nûrsî-1 Şêx Îbrahîm Heqqî-3
Celadet Bedîrxan	1893	1951	1	Şêx Evdîrrehmanê Garisî

Mela Nûranî	1894	1983	1	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî
Seydayê Mela Omer	1895	1977	1	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî
Kamiran Bedirxan	1895	1978	1	Şêx Evdirrehmanê Garisî
Mela Zubeyr Bildirici	1898	1956	1	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn
Şêx Abdurrahmanê Şawurî	1899	1976	1	Şêx Îbrahîmê Heqqî
Seyid Qedrî Haşimî	1898	1961	1	Şêx `Elî Husamettîn
Molla Reşîd Comanî	XIX	XX	1	Şêx Evdilqahhar
Mela Ruşdî Efendî	b.1912an	p.1912an	1	Seyda Muhemmed Hadî
Mela Muhemmedê Saricanî	b. 1914an	p.1914an	1	Şêx Mustafayê Sîsîyê
Silêman Bedirxan	b.1911an	p.1911an	1	Welat

Tablo 6: Mersîyenûsên ku di sedsalên XIX û XXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.7. Mersîyenûsên ku di Sed sala XXem de Jiyane

Piştî wan mersîyenûsên ku di sed sala XIX û XXem de jiyane vêca em derbasî qonaxa wan “*Mersîyenûsên ku di Sed sala XXem de Jiyane*” dibin. Di vê qonaxê de ji teref 14 mersîyenûsan ve tevde 38 mersîye hatine nivîsîn. Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat tespît kirin; Mirad `Elî (m. Piştî 1900î) li ser xanima xwe mersîyeyek û li ser nexweşîya xwe mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Cegerxwîn (m.1984) li ser welat 5 heb mersîye, li ser bajara Amedê mersîyeyek, li ser Hişyar mersîyeyek, li ser Osman Sebrî mersîyeyek, li ser Qasim Leyla mersîyeyek, li ser Stalîn mersîyeyek, li ser Şêx Kemal mersîyeyek û li ser lawê xwe yê bi navê Xurşîd mersîyeyek bi tevahî 12 mersîye; Mela Yasîn Yusrî (m.1994) li xanima xwe mersîyeyek; Ehmedê Namî (m.1975) li ser Haco Axa mersîyeyek; Mela `Ebdussemed Comanî (m.1993) li ser Se`îdê Nursî 2 mersîye; Şêx Îsmetullahê Karazî (m.1996) li ser Şêx Abdilqadirê Hezanî 2 mersîye, li ser Şêx Yahyayê Çoxreşî 2 mersîye, li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî mersîyeyek û li ser Sibxetullah Erwasî jî mersîyeyek bi tevahî 6 mersîye; Mela Hesênê Qerenazî (m.1989) li ser Şêx Masûm mersîyeyek û li ser Şêx Maşûq 2 mersîye bi tevahî 3 mersîye; Fehmî Begê Pêçarî (m.1969) li ser Şêx Se`îd mersîyeyek, li ser Hz. Huseyîn mersîyeyek, li ser birayê xwe Cewdet mersîyeyek û li ser qîza xwe Fikrîya mersîyeyek bi tevahî 4 mersîye; Qedrî Can (m.1972) li ser Mehemedê Seyda mersîyeyek û li ser Şêx Abdurrehmanê Garisî mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Mela Xelîlê Zoqeydî (m.1963) li ser Şêx Mahmudê Karakoyî mersîyeyek; Mela Hesênê Kaçkarî (m. Piştî 1975an) li ser Şêx Maşûq mersîyeyek;

Şêx Bahaeddîn (m. Piştî 1928an) li ser kurapê xwe Şêx Zeynelabîdîn mersîyeyek; B.Ferîdun (m.Piştî 1934an) li ser Şêx Evdirrehmanê Garisî mersîyeyek û Mela Sidîq (m.Piştî 1936an) li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî mersîyeyek nivîsîye.

Dema ku em li van 38 mersîyeyên ku hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin ku ji van 38 mersîyeyan ;14 heb li ser şêxan, 5 heb li ser endamên malbatê, 6 heb li ser welat û bajêr û 13 mersîyeyên din jî li ser dost û hevalan, nexweşî, meseleya Kerbelayê, welat, bajêr û li ser kesayetên din hatine nivîsîn. Tê dîtin di vê heyamê de ji 14 mersîyenûsan, ê ku herî zêde mersîye nivîsîne Cegerxwîn e. Wî tevde 12 mersîye nivîsîne. Piştî wî bi 6 mersîyeyan Şêx Îsmetullahê Karazî û dû re jî bi 4 mersîyeyan Fehmî Begê Pêçarî tê. Di vê qonaxê de tê dîtin li gorî qonaxa borî him di warê hejmara mersîyeyan de him jî di warê mersîyenûsan de kêmbûnek çêbûye.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmar	Li ser Kî Nivîsîye
Mirad 'Elî	1900	?	2	Xanima xwe Li ser nexweşîya xwe
Cegerxwîn	1903	1984	12	Welat-5 Bajar-1 Hişyar-1 Osman Sebrî-1 Qasim Leyla-1 Stalîn-1 Şêx Kemal-1 Xurşîd-1
Mela Yasîn Yusrî	1906	1994	1	Hevser
Ehmedê Namî	1906	1975	1	Haco Axa
Mela 'Ebdussemed Comanî	1907	1993	2	Se'îdê Nursî

Şêx Îsmetullahê Karazî	1908	1996	6	Şêx Ebdilqadirê Hezanî -2 Şêx Yahyayê Çoqreş- 2 Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî-1 Sibxetullah Erwasî -1
Mela Hesenê Qerenazî	1909	1989	3	Şêx Masûm-1 Şêx Maşûq-2
Fehmî Begê Pêçarî	1910	1969	4	Şêx Se'îd Hz. Huseyîn Cewdet Fikrîya
Qedrî Can	1911	1972	2	Mehemedê Seyda Şêx Ebdrehmanê Garisî
Mela Xelîlê Zoqeydî	1911	1963	1	Şêx Mahmudê Karakoyî
Mela Hesenê Kaçkarî	1920	?	1	Şêx Maşûq
Şêx Bahaeddin	b.1928an	p.1928an	1	Şêx Zeynelabîdîn-kurap
B.Ferîdun	b.1934an	p.1934an	1	Şêx Evdirrehmanê Garisî
Mela Sidîq	b.1936an	p.1936an	1	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî

Tablo 7: Mersîyenûsên ku di sedsala XXem de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.8. Mersîyenûsên ku di Sedsala XX û XXIem de Jiyane

Di bergeha lêkolîna ku li ser vê qonaxê hat kirin de hat dîtin ku ji teref 5 mersîyenûsan ve tevde 25 mersîye hatine nivîsîn. Ji van 5 mersîyenûsan Mela 'Ebdulhadiyê Comanî (m.2003) li ser Se'îdê Nûrsî mersîyeyek û li ser Molla Muhyeddîn mersîyeyek bi tevahî 2 mersîye; Mela 'Eliyê Baqûstanî (m.2002) li ser lawê xwe Wehîd mersîyeyek, li ser Şêx Seyfeddîn mersîyeyek, li ser Şêx Seyfeddînê Ehmedî mersîyeyek, li ser Elî bîn Mela Muhemmed mersîyeyek, li ser Şêx Seydayê Cizîrî mersîyeyek, li ser Şêx Seyfeddînê Mardînî mersîyeyek û li ser Seydayê Helîm mersîyeyek bi tevahî 7 mersîye; Mela Nûrullahê Godîşkî (m.2003) li ser Adnan

Menderes 3 mersîye, Seydayê Tîrêj (m.2002) li ser Mela Mistefa Barzanî mersîyeyek, li ser Qenatê Kurdo mersîyeyek, li ser Îdrîsê Barzanî mersîyeyek, li ser Leyla Qasim mersîyeyek, li ser Tahsîn Taha mersîyeyek, li ser Mihemed Şêxo mersîyeyek, li ser Kemalê Ehmed mersîyeyek, li ser Rewşen Bedirxan mersîyeyek, li ser Mihemed 'Elîyê Şiwêş mersîyeyek, li ser Ehmedê Menco mersîyeyek û li ser Şêxmûsê kurê Se'îdoyê Gaso mersîyeyek bi tevahî 11 mersîye û Mela Tahayê Mayî (m.2000) jî li ser Şêx Se'îd mersîyeyek nivîsîye.

Ji van 25 mersîyeyên di vê serdemê de, 5 heb li ser şêx û melayan, 3 heb li ser kesên ku di nav gelê Kurd de wek rêber û pêşewa tîn qebûlkin, mersîyeyek li ser endamên malbatê, 5 heb li ser siyasetmedaran, 2 heb li ser hunermendan, 6 heb li ser dost û hevalan û 2 heb jî li ser rewşenbîrên Kurd hatiye nivîsîn. Mersîyenûsê herî berhemdar ê vê qonaxê Seydayê Tîrêj e ku wî tevde 11 heb mersîye nivîsîne. Piştî Tîrêj ê ku di vê heyamê de herî zêde mersîye nivîsîne Mela 'Elîyê Baqûstanî ye ku wî tevde 7 mersîye nivîsîne.

Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmar	Li ser Kî Nivîsîye
Mela 'Ebdulhadiyê Comanî	1917	2003	2	Se'îdê Nûrsî Molla Muhyeddîn
Mela 'Elîyê Baqûstanî	1917	2002	7	Wehîd Şêx Seyfeddîn Şêx Seyfeddînê Ehmedî 'Elî bîn Mela Muhemmed Şêx Seydayê Cizîrî Şêx Seyfeddînê Mardînî Seydayê Helîm
Mela Nûrullahê Godîşkî	1918	2003	3	Adnan Menderes
Seydayê Tîrêj	1923	2002	11	Mela Mistefa Barzanî Qenatê Kurdo Îdrîsê Barzanî Leyla Qasim Tahsîn Taha

				Mihemed Şêxo Kemalê Ehmed Rewşen Bedirxan Mihemed 'Elîyê Şiwêş Ehmedê Menco Şêxmûsê kurê Se'îdoyê Gaso
Mela Tahayê Mayî	1924	2000	1	Şêx Se'îd

Tablo 8: Mersîyenûsên ku di sedsalên XX û XXI'an de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

3.9. Mersîyenûsên ku di Sedsalên XIX û XXI'em de Jiyane

Temsîlkarê tekane yê vê qonaxê Mela Xelîlê Mişextî ye. Wî mersîyeya xwe li ser wefata rewşenbîrê Kurd ê bi navê Hêmin Mukrîyanî nivîsîye. Nehat dîtin ku di vê qonaxê de ji bilî Mişextî, şa'îrekî din mersîye nivîsîye.


Agahîyên derheqê mersîyenûsên di vê qonaxê de û agahîyên wan kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn wisa ye:

Navê Helbestvan	Welidîn	Mirin	Hejmar	Li ser Kî Nivîsîye
Mela Xelîlê Mişextî	1888	2007	1	Hêmin Mukrîyanî


Tablo 9: Mersîyenûsên ku di sedsalên XIX û XXI'em de jiyane û hejmara mersîyeyên wan.

Ji bo van neh qonaxên ku mersîyenûs lê jiyane û tê de mersîye nivîsîne dikare bê gotin, ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XVI û XVII'em de jiyane ve mersîyeyek; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XVII û XVIII'em de jiyane ve 3 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XVIII'em de jiyane ve 3 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XVIII û XIX'em de jiyane ve 8 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XIX'em de jiyane ve 4 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XIX û XX'em de jiyane ve 101 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XX'em de jiyane ve 38 mersîye; ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XX û XXI'em de jiyane ve 25 mersîye û ji teref mersîyenûsên ku di sedsala XIX û XXI'em de jiyane ve ji mersîyeyek hatiye nivîsîn. Di van sedsalên ku navên wan hat zikirin de tevde 183 mersîye hatine nivîsîn û hejmara şa'îrên ku ev mersîye nivîsîne jî 73 ye.

Reqem û rêjeya hejmara mersîyeyan û mersîyenûsan wek grafîk hatiye dayîn:



Grafîk 1: Hejmara Mersîyeyan li gorî Sedsalan



Grafîk 2: Hejmara Mersîyenûsan li gorî Sedsalan

Wefatname-Lanetname

Piştî ku qala mersîye û kevneşopîya mersîyeyenûsîya di Kurdî de hat kirin û mînakên wê hatin dayîn, em dixwazin hinekî qala wan helbestên ku gelek zêde dişbihin mersîyeyan bikin. Her çîqas ev cûreya ku di edebiyatê de wek *Wefatname* û *Lanetname* hatine binavkirin pêşve neçûbin û mînakên wê zêde tunebin jî me pêwîst dît ku em hinekî qala wan bikin.

Hinek berhemên ku li ser wefata yekî hatine nivîsîn hene dema ku mirov wan dixwîne yan jî guhdar dike, zen dike ev berhem jî bi şiklê mersîyeyê hatine nivîsîn. Lê di eslê xwe de ev berhem ne mersîye ne. Ji van berhemên ku bi vî awayî hatine nivîsîn re di edebiyatê de *Wefatname* tê gotin. Di van berhemên ku bi navê *Wefatname* tên binavkirin de qala wefata Pêxemberê dînê Îslamê Hz. Muhemmed(s.x.l.) tê kirin. Di edebiyata Kurdî ya kasîk de bi vî cûreyê kesên mîna; Seydayê Mela ‘Elîyê Êrsî, Ebdullah Atabey,²²⁷ Mela Nûrûllahê Godîşkî²²⁸ û Nûrî²²⁹ berhem dane.

Ev berhemên ku li ser wefata Hz. Muhemmed hatine nivîsîn her çî qas mersîye xuya bikin jî di rastîyê de ne mersîye ne. Ev berhemên manzum ên ku wek *Wefatname* tên binavkirin ji alîyê naverokê û cûreyê ji mersîyeyan cuda dibin. Dema ku em edebiyata klasîk mêze dikin em dibînin ku gelek cûreyên nezmê yên ku pê berhem li ser Hz. Muhemmed hatine nivîsîn hene. Wek mînak: Mewlid, na‘t, mî‘racîyye, hicretname, risaletname, şemaîl, hîlye, tercumeyên çil û sed hedîsan, mucîzati nebî, esma-i Nebî û wefatname.²³⁰ Ji van berhemên wefatname û mersîye wek hev xuya dikin. Lêbelê bi awayekî gelemperî di mersîyeyan de behsa li ber ketina mîrî te kirin, pesnê wî tê dayîn û tesellîkirin heye.²³¹ Wekî din di mersîyeyan de ji serî heta bînî şîrî tê girêdan, di‘a tê kirin, pesnê kesê mirî tê dayîn, rondik tê rijandin û ji bo ehlê mirî sebir tê daxwazkirin û ji Xwedê tê lavayîkirin da ku kesê cihê wefatkirî bibe cennet. Lêbelê em di wefatnameyan de li rastî van beşan nayên. Di wan nezmên ku wek *Wefatname* hatine nivîsîn de bi giranî qala wefatê tê kirin. Ji ber vê yekê ev berhem ji hêla cûreyê ve ne mersîye, wek wefatname hatine binavkirin.

Yek ji wan cûreyên nezmê yên ku dişibihin mersîyeyan la‘netname ne. Di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya klasîk de heta niha bi tevahî 4 la‘netname hatine nivîsîn. Ji van 4 la‘netnameyan a ewilî ya Şêx Evdirrehmanê Aqtepe ye. La‘netnemeyên din jî yên Mela Es‘edê

²²⁷ M. Edib Çağmar, *Seydayê Mela Elî û Nirxandina Wefatnameya Wî ji Alîyê Hunerên Edebî ve*, Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî, h:4, Nîsan 2021, r.26.

²²⁸ Fahrî Tîtîz, *El-Cewahîru‘r Reşadîye Fî Sîretî‘nNebewîyye Ya Mela Nûrûllahê Godîşkî (Metn û Lêkolîn û Ferheng)*, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî Teza Lîsansa Bilind, Bîngol 2020, r.494.

²²⁹ M. Zahir Ertekin, *Kürtçe Siyer Yazıcılığı*, Weş. Siyer Akademi, İstanbul 2022, r.6.

²³⁰ Nafizade Ahmed Esad, *Mî‘rat-i Muhammedi Divan Şiirinden Na‘t Örnekleri*, amd. Ahmet Tanyıldız Mehmet Büküm, Weş. Dün Bugün Yarın Yayınları, İstanbul 2020, r.10

²³¹ Çağmar, *h.b.*, r.26.

Çoxreşî,²³² Mela Huseynê Balekî²³³ û ya Şêx Eskerî ye.²³⁴ Şêx Evdirrehîmê Aqtepî û Şêx Esedê Çoxreşî meseleya Kerbelayê ji helbesta xwe re dikin navend û la'netê li ser Yezîd û hevalbendên wî dixwînin. Her wisa di la'netnameya ku ji teref Mela Huseynê Balekî ve hatiye nivîsin de la'net li şeytên tê xwendin. Di la'netnemeya dawî de ku ji teref Şêx Eskerî ve hatiye nisîvîn jî di çend beytan de la'net li Yezîd tê xwendin. Ji van la'netnameyên navborî ya ku ji teref Şêx Evdirrehman Aqtepî ve hatiye nivîsîn pir zêde dişbihê mersîyeyê. Lêbelê ew di eslê xwe de ne mersîye recmîye/la'netname ye. Di seranserê vê helbestê de ji ber şehîdkirina Hz. Huseyîn û ehlê wî şîn tê girtin, rondik tê barandin û bang li Mislîmanan tê kirin û Aqtepî dixwaze wê barê êş û elema li ser piştta xwe sivik bike. Ev xalên ku di vê la'netnameyê de tên dîtin tev taybetîyên mersîyeyeke klasîk in. Lêbelê dema ku li beytên ewil û yên dawî û her wisa li seranserê helbestê mêze dikin tê dîtin ku her çî qas ev helbest di nav xwe de taybetîyên mersîyeyeke klasîk bihewîne jî ji hêla cûreya nezmê ve ne mersîye, la'netname ye. Lewra Aqtepî helbesta xwe bi la'netxwendinê dide destpêkirin û bi la'netxwendinê jî dide qedandin. Wekî din ew di ekseriyeta helbestê de 12 caran peyvan la'netê bi kar tîne. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin ku helbestên wek la'netname hatine nivîsîn mersîye ne. Lewra di vî warî de Aqtepî dîsa li ser Hz. Huseyîn û ehlê wî helbesteke din nivîsiye û sernavê mersîyeyê li wê helbesta xwe kiriye û me di xebata xwe de jî cî da vê mersîyeyê. Lêbelê Aqtepî bi xwe her çî qas vê helbestê li ser Hz. Huseyîn nivîsibe jî navê *recmiyyeyê* li helbesta xwe kiriye û vê yekê di beytên dawî ya la'netnameyê de diyar dike.

Mînak:

Ji la'netnameya Şêx Evdirrehîm Aqtepî²³⁵

Derdê min dûr û diraz e naêtin hedd û hîsab

Lew evê recmiyyeê înşa dikim hinde medîd (22)

M. Zahir Ertekîn di xebata xwe ya ku li ser mijara la'netnameyê kiriye de derbarê çima ev helbest nikare wek mersîye bê hesabandin de nirxandineke wisa dike:

²³² Mele Es'edê Çoğreşî, *Qesîdeyên Mala Seydayê Mele Es'edê Çoğreşî*, (Amd. Mele Muhammedê Çoğreşî), Mîrgemîr Yayınları, İstanbul 2005, r. 11-12.

²³³ Zafer Atlı-Şerif Güzel, "Mela Huseynê Balekî û Çend Helbestên Wî", Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Bingöl 2016, c.2, h.3, r. 169.

²³⁴ Şêx Eskerî, *Keşkol*, Weş. Doz, Wergera Ji Tîpên Erenî: Zeynelabîdîn Zinar, İstanbul 2009, r.49.

²³⁵ M. Zahir Ertekin, *Recmiyye/Le'netname Wek Cureyek Nezmê û Le'netnameya Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî*, Şarkiyat, c.11, h.1, s.2019, r.49.

“Helbesta xwe ya bi navê Sed hezar le‘net muda‘ef him bi şêwezariya xwe û him bi navlêkirana şa‘irî ji sînorên mersiyeyê derdikeve. Dema ku em mersiyeya Aqtepî û vê helbestê didine ber hev, bi terz, şêwe vegotin û mijarê ve cudahiyên mezin derdikevin. Ji bilî van taybetiyên ciyawaz, çawa ku di mersiyeya wî de, wî bi xwe navê mersiyeyê eşkera kiribû, di le‘netnameya Aqtepî ango helbesta Sed hezar le‘net muda‘ef de jî şa‘ir bi xwe navê recmiyyeyê li helbesta xwe dike”²³⁶

Ji ber van sedemên ku me ji ser mersîye û la‘netnameya Aqtepî anî zimên em dikarin bibêjin, ew helbestên ku ji hêla cûreya nezmê ve la‘netname ne ji ber taybetiyên xwe ciyawaz û cihêreng ne mersîye ne.



²³⁶ Ertekin, *h.b.*, r.41-42.

BEŞA DUYEM

VÊKOLÎNA MERSÎYEYAN JI ALIYÊ RUXSARÎ VE

Di vê beşê de mersîyeyên ku hatibûn berhevkerin ji hêla ruxsarî ve hatin vekolînkirin. Pêşî ew mersîyeyên Kurdî yê hatine berhevkerin ji aliyê teşeyên nezmê ve hatin nirxandin. Di encama vê nirxandinê de teşeyên nezmê yê mersîyeyan wek; qesîde, mesnewî, xezel, murebbe' û hwd û nimûneyên wan hatin tespîtînkirin, hejmar û daneyên wan hatin diyarkirin û ji bo her yekî ji metnên transkîrîbîkirî yê mersîyeyan mînak hat dayîn. Her wiha, digel behra 183 mersîyeyan weznên wan jî yek bi yek hatin dîtin û ka kîjan ji wan çiqas hatine bikaranîn, hat nîşandan.

Her wisa mersîye ji aliyê îmale, med, zihaf û cureyên mîna wan ve jî hatin nirxandin û bi mînakên ve hatin ravekirin. Ji bilî vê yekê, di heman beşê de mersîye ji aliyê serwa û paşerwayê ve bi mînakên hatin tehqîqînkirin û rêjeya bikaranîna wan wek grafik hat dayîn.

1. Teşeyên Nezmê

Di edebiyata klasîk de ji wan taybetî û xusûsiyetên nezmê yê ku ji derve tî xuyakirin re teşeya nezmê tê gotin. Ev taybetî: Keşeya ku hatiye bikaranîn, hejmara komristeyan/bendan, hûnandina serwayê, yekeya nezmê û hwd. in. Ev tev, teşeya nezmê dîyar dîkin.²³⁷ Di edebiyata Kurdî ya klasîk de bi gelek teşeyên nezmê mersîye hatine nivîsîn.

Di encama lêkolîna hat kirin de hat tespîtînkirin; 2 mersîye bi teşeya muselles, 1 mersîye bi teşeya museddes, 92 mersîye bi teşeya qesîde, 29 mersîye bi teşeya murebbe', 15 mersîye bi teşeya muxemmes, 18 mersîye bi teşeya mesnewî, 17 mersîye bi teşeya xezel, 8 mersîye bi teşeya tercî' bend û 1 mersîye bi teşeya terkîbbend hatine nivîsîn.

²³⁷ Edip Saydun, *Teşe û Ciwankarîyên Wêjeyî Di Dîwana Feqîyê Teyran de*, K.T. Zanîngeha Wan Yûzûncû Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind Wan 2018, r.38-39.

1.1.Qesîde

Qesîde teşeyek nezmê ye ku her du misrayên beyta yekem di nav xwe de bi serwa ne, lê di beytên din de ji aliyê serwayê ve misraya yekem serbest, misraya duyem jî bi beyta yekem re hevbeş e.²³⁸

Ji bo hejmara malikên qesîdeyê rêzikeke ku hemû helbestvan pê ve hatibin girêdan tune ye. Di edebiyeta Kurdî de qesîde bi giştî ji pênc-heft beytan heta derdora 20-30 beytî pêk tê.²³⁹ Di edebiyata Kurdî de hinek qesîdeyên ku ji 30 beytî dirêjtir in jî tên dîtin. Mirov dikare ji bo vê yekê qesîdeya *Ellah Sehergeha Ezel* a Melayê Cizîrî wek mînak bide ku ev qesîdeya Melayê Cizîrî tev de ji 284 malikan pêk tê.²⁴⁰

Di xebata ku me kir de hat dîtin tevde 92 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Dema ku em li van 92 qesîdeyên bi şiklê mersîyeyê hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin, mersîyeya herî dirêj a bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn a Mela Ehmedê Nalbend e. Wî ev mersîyeya xwe li ser Şêx Xiyaseddîn nivîsîye. Ev mersîye tevde ji 87 malikan pêk tê. Di nav mersîyenûsên ku bi teşeyan nezmê ya qesîdeyê mersîye nivîsînî de mersîyenûsê herî berhemdar Mela Zahirê Tendûrekî ye. Wî tevde 21 mersîyeyên xwe bi teşeya nezmê ya qesîdeyê nivîsîye.

Navê 38 mersîyenûsan û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatin nivîsîn:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya qesîdeyê hatin nivîsîn
Feqîyê Teyran	1
Ehmedê Xanî	1
Şêx Ehmedê Kor	5
Şêx Abdurrahmanê Çoxreşî	1

²³⁸ Adak, *h.b.*, 2014b, r. 405.

²³⁹ *H.b.*, r. 405.

²⁴⁰ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, amd.Tehsîn Îbrahîm Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012, r. 56.

Weda'î	1
Şêx Selîmê Gêxî	1
Şêx Esed Çoxreşî	1
Şêx Evdilqadirê Hezanî	1
Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	1
Şêx 'Eskerî	1
Şêx Meczûb	1
Şêx Silêman	1
Mela Zahirê Tendûrekî	21
Şêx Hadîyê Qewmanî	3
Şêx Mihemed Kerbelayî	1
Şêx Celaeddîn Eskambevî	1
Şêx Xiyaseddîn	1
Mele Ehmedê Nalbend	6
Molla Isamuddîn	1
Mela Abdulfettahê Hezroyî	6
Seydayê Mela Omer	1
Mela Zubeyr Bîldîrîcî	1
Seyid Qedrî Haşimî	1
Molla Reşîd Comanî	1
Mele Ruşdî Efendî	1

Mirad `Elî	1
Cegerxwîn	5
Mela Sidîq	1
Mela Yasîn Yusrî	1
Şêx Îsmetullahê Karazî	3
Mela Hesenê Qerenazî	1
Fehmî Begê Pêçarî	4
Qedrî Can	1
Şêx Bahaeddîn	1
Mele Xelîlê Zoqeydî	1
Mela `Eliyê Baqûstanî	5
Mela Nûrullahê Godîşkî	3
Seydayê Tîrêj	4

Tablo 10: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mele Ehmedê Nalbend²⁴¹

Fa`ilatun Fa`ilatun Fa`ilatun Fa`ilun

– + – – / – + – – / – + – – / – + –

1. Ey felek şed ax ji ber te wek te ma zalim hene

²⁴¹ Mele Ehmedê Nalbend, *Baxê Kurda, Dîwana Mela Ehmedê Muxlis Kurê Emînê Nalbedê Bamernî*, Berhevkar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Berhema Hêj Neçapkirî, r.35.

Bê wefa û 'ehden ev gerhan û dewr û çerxe ne

2. Dewrelê keyfa me bînî bîst çerxa cizîn
Lew ji dest fi'lan te 'alem dilkul û ne dibiste ne
3. Çerxela te min serê xo rakir û biste kenîm
Şed duşed çerxa gerîm û her me tirs û lerze ne
4. Ev roke mistek muşîbet nê te ya li difna me day
Hate ser qelbê me ev lêmşit û befîr û bare ne
5. Min nizanî ka çewa 'umrê xo min borand û çû
Ni'met û xoşî hemî ji destê te le'ib û hîle ne
6. Lazim e ji destê te wek marî bitirsîn ey felek
Ma wekî qayidê te hoye kaç lezzet hewce ne
7. Min li bağî kir nezer pir çiçek û reyhan û gul
Evro çûm seyr û temaşe gul bi setir û perde ne
8. Tasekî avê ji ava kevşerê min xoş vexwar
Weqtê gafil ez di bacî da çerîm bû fertene
9. Min li nav tozê xo dît û dergehê bağî li me girt
Min berê texmîn nekir ku jehr e ev keyf û kene
10. Keftibû destê me dewrek ew beheştê sermedî
Axiret û dunya û dîn her sê me got her bû mene
11. Min nezanî dê wekî bab ademî jê derkevîm
Lezzet û ni'met li vî milkê fena ev madde ne
12. Cumle dunya lehzekê min bê dewra xo qeç nedît
Lew hero hâlê me ah û nalî û gazinde ne

13. Ma niho ka ez çi bêjim yan ji kê gazinde kem
Fayde naket şed kul û kovan di dil da min hene
14. Seyda ‘alî şeref dewra şedef ew çû telef
Min neman qeṭ naz û gef lew roj û şev hebsa men e
15. Paştî wê roja ruhin dunya li min tarî bûwe
Piştî wê min şed hezar xoşî hebin bê fayde ne
16. Careka dî ez çewa dê çim vê Xişxaşa bi tenê
Evroke wê ez bi hemya nadem û ew çûnnene
17. Muhrika qîmet du filis e evroke hat şûna dûrê
Kesb û kar wê dina bê ‘ehd her ew xusse ne
18. Ma mizanî dê ewê tîrê Xudê li cergê me det
Yan bê iqbalek wekî min hinde tehlî wî hene
19. Da şew û roja li def bim min çû nedixwar û wexwar
Çunke êş û qehir û gem hindî heban her hinde ne
20. Evroke şed car şukirdarim ji fermana Xudê
Keyf û gem dan û birin Rebbî hemî emrê te ne
21. Wey xuzî min careka dî ew cewahir dîtiba
Ka çewan in ew nîşan û xeṭṭ û dêm û gerde ne
22. Emrekê avazê geybê hat guhê min weqtekê
Careka dî bo te lazim bînedan ev keyfe ne
23. Dergehek min girt û êk dî belke çêtir ez vekim
Çunke emrê min çi bîtin ser hewe faydê we ne

24. Eħmeda dana Xudê li ser ‘alem ê ya mexfî ye
Belke êk wek wê bidet te pir gul in ev baĝe ne

1.2. Xezel

Xezel ji teşeyên nezmê ya wêjeya dîwanê teşeyek e, tê wateya peyva aşiqane û xweşik. Hejmara malikên wê di navbera 5-12 malikan de ye. Ji xezelên ku ji 12 malikan zêdetir hatine nivîsîn re xezela muzeyyel an jî dirêjkirî tê gotin.²⁴² Di xezelan de her du risteyên malikên ewil di nav xwe de bi serwa ne û risteya yekemîn a malikên din serbest a duyem jî bi risteya duyemîn a malika yekem re bi serwa ne. Mijara sereke ya xezelê eşq e. Lêbelê xezel li gorî naveroka xwe navên cuda digirin li ser xwe. Wek mînak; heger mijara xezelê tesewif be jê re “*xezela sufiyane*”, heger mijara wê zewq û sefayên dinyayê bin jê re “*xezela rindane*”, heger mijara wê hikmet û felsefe be jê re “*xezela şûxane*” û heger mijara wê kêf û izdaraba ku mirov ji ber işqê dikşîne be wê demê jî jê re “*xezela aşiqane*” tê gotin. Lêbelê di edebiyata Kurdî ya klasîk de ji bilî van mijaran li ser wefata yekî jî bi teşeya nezmê ya xezelê helbest hatine nivîsîn ku cureyê wan mersîye ne. Hat dîtin ji 183 mersîyeyên ku hatin berhevkerin tevde 17 mersîye bi şiklê xezelê hatine nivîsîn. Navê 8 mersîyenûsan û hejmara mersîyeyên ku ew wek xezelê nivîsîne li jêrê wek tablo hat nîşandan.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya xezelê hatine nivîsîn:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya qesîdeyê hatin nivîsîn
Esamî	1
Mele Ebdulezîzê Bidlîsî	4
Mela Zahirê Tendûrekî	2
Mele Ehmedê Nalbend	2
Seyid ‘Eliyê Findikî	4

²⁴² Pala, *h.b.*, r. 165.

Cegerxwîn	2
Mela 'Ebdussemed Comanî	1
Mele Xelîlê Mişextî	1

Tablo: 11:Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya xezelê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Seyîd 'Elîyê Findikî²⁴³

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

– + – – / – + – – / – + – – / – + –

1. Ey dilê meskenê derda ma tu zanî ku çi bî
Ew Se'îdê canfida j' dînê me ra j' kîsê me bî
2. Beyreqa ku wî hilanî ji bo vî dînê mûbîn
Me çîqa pirsî û seğ kir vê demê kes dî nebî
3. Çepera dîn girtibû pakî ji keskî nedikir
Heq dizanî heq digot û heq dikir herdem we bî
4. Ew dikana ku wî danî ew meta'ê difiro
Ew li Şam û Mişr û Beğdayê nihû peyda nebî
5. Çû wefat kir çi mûşîbet şed hezar reğmet li ser
J' ehlê vî dînê mûbîn ra çi numûnek taze bî
6. Sêşed û heftê w nehê piştî hezarê hicretê
Dergehê bağê bihiştê keremê l' ber wî vebî

²⁴³ Seyid 'Elîyê Findikî, *Dîwan*, amd. Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014, r.227.

7. Ew li Nûrsê hate dunyê wî li Urfayê wefat kir
Ew Şehîr bû ew Bedî' bû ez çî bêm serdeste bî
8. Ey Se'îdê her du dunya dîtina te bû keder
Em j' Xudayê xwe dixwazin l' axretê em l' cem te bî
9. Ey 'Elî ger çî Se'îd çû lê risalê nûr neçûn
Şed emanet min li te da tu ji wan mehrûm nebî

1.3. Mesnewî

Mesnewîya ku ji malikan pêk tê çawa ku di edebiyata klasîk a Rojhilat de pir zêde hatibe bikaranîn bi heman awayî di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî gelek zêde hatiye bikaranîn û pê gelek mersîye hatine nivîsîn. Her malikeke mesnewîyê di nav xwe de hemserwa ye. Ji ber ku di mesnewîyan de du risteyên her malikê di nav xwe de hemserwa ne ji vê cûreyê re mesnewî tê gotin. Lewra peyva mesnewîyê di zimanê Erebî de tê wateya dido dido.²⁴⁴ Her beytên wê bi serwaya cuda tên nivîsîn û bi qalibên kurt ên arûzê tên nivîsîn. Ji bo mersîyeyan, di warê dirêjbûnê de sînora tune ye û şiklê serwaya mesnewîyê jî bi şiklê aa/bb/cc/dd... ye.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de berhemên menzûm ên bi navê Yusif û Zuleyxa û Leyla û Mecnûna Harisê Bedlîsî, Yusif û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Leyla û Mecnûna Mela 'Ebdulfettahê Hezroyî, Mewlûda Kirdkî ya Mela Ehmedê Xasî, Mewlûda Kirdkî ya Osman Babij Efendî, Mersîyenameya Mela Muhammed Nûrî, Kerbela Meşheda Îmam Huseyn a Burhaneddînê Feqîr û gelek berhemên mîna van bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn. Di van berhemên menzûm ên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn de berhemên mîna *Mersîyename* û *Kerbela Meşheda Îmam Huseyn* dirûva mersîyeyan li wan dikeve. Lêbelê ev berhem di eslê xwe de ne mersîye ne. Ji ber ku berhemên bi vî awayî yên ku dişbihin mersîyeyan lê ne mersîye ne nediketî nav sînora teza me, me ew berhem li xebata xwe zêde nekîr. Ji bilî berhemên bi vî awayî, gelek şî'rên ku wek mersîye û bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn jî hene. Dema ku em li wan mersîyeyên ku hatin berhevkerin mêze

²⁴⁴ Adak, *h.b.*, 2014b, r.417.

dikim em dikarin bibêjin ku ji 183 mersîyeyên ku ji hêla teşeyên nezmê ve hatin nirxandin tevde 18 mersîye bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn.

Li jêrê navê 13 mersîyenûsan û hejmara mersîyeyên wan wek tablo hatiye dayîn.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya mesnewî hatine nivîsîn:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn
Şêx Evdirrehmanê Aqtepî	1
Molla Mahmud	1
Evdirrehîm Rehmî Hekkarî	1
Mela Hadîyê Qewmanî	1
Mele Muhemmedê Seyda	1
Celadet Bedirxan	1
Kamiran Bedirxan	1
Şêx Ebdurrahmanê Şawurî	1
Mela Muhemmedê Saricanî	1
Ehmedê Namî	1
B.Ferîdun	1
Seydayê Tîrêj	6
Mela Tahayê Mayî	1

Tablo: 12: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mela Muhemmedê Saricanî: ²⁴⁵

Mef'ûlu Fa'îlatun Mef'ûlu Fa'îlatun

- - + / - + - - / - - + / - + - -

1. Dîsa felek ku îro rabû li me weha kir
Wî şeyxê pakê nûrî girt û li me cuda kir
2. Şeyxê bi nav û nîşan hîna ku çû wefat kir
Agir ketî qulûban derdê dilê me rakir
3. Derdê dilê me rabû b'wî her du nazenînan
Hâlê me dê çewa bû ser da şîn û birînan
4. Weqta ku çûye qebrê bû şed fiğan û gazî
Ya Reb! Bide tu şebrê bi şeyxê serfirazê
5. Der 'Eyn û Ğeyn û Şîn e çû Hezreta liqayê
Dûr e ji 'Eyn û Şînê îdî çi bêm şenayê
6. Azî çi xweş 'eşîr e wî şeyxê pakê nûrîn
Birye bi bal xwe mîr e wî şeyxê zate şîrîn
7. Ya Reb! Bi xizmeta wî wana hemî 'efû kî
Der feyz û nîsbeta wî wan serfiraz birê kî
8. Winda bû şahê 'alî ew çû di nav hebîban
Dûrr'un-nu'ûte 'alî şed hep ji bo wî qurban
9. Şed heyf û heyf û heyf e heyfa ewan ciwanan
Ew bûn li qebrê deyf e bi zar û şîn û giryan

²⁴⁵ Qewmanî, *h.b.*, r.54.

10. Ğaib bû mewzû‘ê ‘ilm zuhd û şelaḥ û were‘

Teqwa û suḥbet û şer‘ bo wî lîbas û dere‘

11. Hadî bes e nebêje van şe‘rê we perîşan

Qelbê te bû qirêj e nîne ji bo te derman

12. Derman ke Şahê Qewman belkî evan birînan

Nema kesek li erdê hilîne van zulmetan

13. La teḥsebenne ğafil ennellezî ‘eleyna

Elxiḍmetû lîlfaḍil meqbûletun ‘eleyna

1.4. Murebbe‘

Menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji çar misrayan pêk tên û ji aliyê helbestvanekî ve bi heman kêşê û bi awayekî pirserwa hatine nivîsîn wek “murebbe‘” tên binavkirin.²⁴⁶ Şiklê serwaya wê aaaa- bbba- ccca- ddda... ye. Sê misrayên benda ewil dibe ku di nav xwe de bi serwa bin. Wê demê şiklê serwayê wisa ye: bbba- ccca- ddda- eeea...²⁴⁷ Ji murebbe‘ên ku misrayên wan ên li dawîya bendan tê dubarekirin re murebbe‘ên mutekerrîr û ji yên nayên dubarekirin re jî murebbe‘ên muzdewîc tê gotin.²⁴⁸

Di xebata ku hat kirin de hat tespîtîkirin, tev de 29 mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe‘ê hatine nivîsîn. Ji van a herî dirêj ji 29 çarîneyan pêk tê. Murebbe‘a herî dirêj ji teref Mela Ehmedê Nalbend ve derheqê lawê xwe Muhammed de hatiye nivîsîn. Qaliba wê Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilun û behra wê jî remel e. Murebbe‘a herî kurt jî ji teref Mela Zahirê Tendûrekî ve li ser Şêx Muhammed Zîyaeddîn hatiye nivîsîn. Qaliba wê Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun û behra wê jî recez e.

Navê 23 mersîyenûsan û hejmara mersîyeyên ku bi teşeya nezmê ya murebbe‘ê hatine nivîsîn wek tablo wisa ye:

²⁴⁶ Adak, *h.b.*, 2019a, r.371.

²⁴⁷ Dilçin, *h.b.*, r. 212.

²⁴⁸ M. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, Gökkube Yayınları, İstanbul 2012, r.111.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya murebbe´ hatine nivîsîn:

Navê Mersîyenûs	Hejmara Mersîyeyan ên ku bi teşeya murebbe´ hatin nivîsîn
Mela Huseynê Bateyî	1
Mela Qasim	1
Ebdullahê Mexrîbî	1
Evdilqadirê Hekarî	1
Xewsî	1
Şêx Muhemmed Xelife	1
Şêx Hemza Hîmmetullah	1
Şêx Mustafayê Sîsî	1
Mela Mihemedê Liceyî	1
Mele Ebdulezîzê Bidlîsî	1
Mele Ehmedê Xasî	1
Mele Ebdulkerîm Îbrahîm	1
Mela Ebdurrehmanê Hazrowî	1
Mela Zahirê Tendûrekî	2
Mele Ehmedê Nalbend	3
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	2
Cegerxwîn	1

Şêx Îsmetullahê Karazî	1
Mela Hesenê Qerenazî	2
Qedrî Can	1
Mele Hesenê Kaçkarî	1
Mela `Ebdulhadiyê Comanî	2
Seydayê Tîrêj	1

Tablo 13: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya murebbe`ê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Xasî²⁴⁹

Mefa`îlun Mefa`îlun Fe`ûlun

+ --- / + --- / + ---

1. Felek dîsa li min ker kir fûad e
Di eşrê ewwelê şehre muharrem
Ji xatir derketin ke`b û wişal e
Wekî Leyla û Mecnûnê mukerrem

2. Te rihet kir di qirba istiwayê
Bi bal qindîlê `erşê istiwayê
Tecerrud kir (li) kullê masiwayê
Wekî Seyda û Şeyx û Ğewşê E`zem

3. Yetîm hiştin mirîd û ehl û ewlad
Li afaqan bela kir ah û feryad
Dibên kanî celîsê textê irşad

²⁴⁹ M. Zana Karak, *Helbesta Şîna Şêx Selîm a Seydayê Xasî*, Kovara Nûbiharê, İstanbul 2021c, h.156, r.82.

Kû mewrûs e Ibrahîmê Edhem

4. Di piştî rişleta Seyda û Şêx e
Hezar ateş di dilda bîne vêxe
Bi çakûç û kulingan her tu lêxe
Tune te'şîr ji ber dağa muqeddem
5. Nîzama mulk û millet bû ku seyda
Qewama dîn û dewlet bû ku seyda
Tebîbê cumle 'ilet bû ku seyda
Li ber şermê dibûn kusra' û hatem
6. Muhîtê her du 'ilman bû ku seyda
Hekîmê dağ û derdan bû ku seyda
Beşîrê cumle emran bû ku seyda
Bi wî îhya dibûn e'ma û ebkem
7. Xeşîbu'l-ewliya ceddê Hefîd bû
Emîru'l-ezkiya ceddê Hefîd bû
Sefîru'l-eqwiya ceddê Hefîd bû
Bi wî me'mûr dibûne her du 'alem
8. Hezan bû hezeyan piştî Selîm e
Welakin Rebbê 'alem pê 'elim e
Ewe hafîz ji bo tewra qedîm e
Bi isti'salekî bê keyf û bê kem
9. Fe inne's-şeyfe be'de's-selli yelme'
We yuţfî kulle narîn heysu tefce'
Keza men şanehullahu fe yenfe'
Cemi'el-ehli we'l-ewladî fe'lem
10. Heqî yû Salim û Me'sûm û Baqî
Îlahî wan digel hafîz bê waqî

Bidî wan suhbeta şêxê firaqî
Bikî her yek ji wan şahek mu‘ezzem

11. Eya Xasî bi vî qelbê qirêj e
Tu bes ewşafê sulţanan bibêje
Ewe zehra di dil da tu birêje
Heya nakî ji vê teqwîmê adem

12. Seher Xasî ji ber narê firaqê
Bi ahan ker kirî goyê di faqê
Kû bazullahê eşheb bê ji ‘Iraqê
Li van dağ û birînan deyne merhem

13. Îlahî tu bi heqqê Muştefa kî
Bi cahê enbiya wû ewliya kî
Dilê Xasî yû Fethiyê xwe şa kî
Bi fethek nagihanî ji ‘erşê e‘zê

1.5. Muxemmes

Ji helbestên ku her bendeke wê ji pênc risteyan pêk tê û ji aliyê helbestvanekî vê hatine nivîsîn re “muxemmes” tê gotin.²⁵⁰ Ger misreya çar an pêncemîn an jî tenê ya pêncemîn a benda ewil di dawiya bendên din de bê dubarekirin jê re muxemmesa mutekerrîr tê gotin. Ger neyê dúbarekirin jê re muxemmesa muzdewîc tê gotin.²⁵¹ Di edebiyata Kurdî de kesên wekî Melayê Cizîrî, Macin, Weda‘î bi teşeya muxemmesê helbest nivîsîne.²⁵²

Di xebata ku hat kirin de hat dîtin ku ji teref 11 mersîyenûsan ve tevde 15 mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatine nivîsîn. Ji van mersîyeyan a herî dirêj ji 16 pêncîneyan û a herî kurt jî ji 3 pêncîneyan pêk tê. Ji 15 mersîyeyên ku hatine tespît kirin bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatine nivîsîn; 2 mersîye muxemmesa mutekerrîr a cot a asayî ne. Di vê şeweya navborî de her pênc misrayên benda yekem hemserwa ne, di bendên din de her sê misrayên pêşî

²⁵⁰ Adak, *h.b.*, 2014b, r.429.

²⁵¹ Dilçin, *h.b.*, r. 217.

²⁵² Adak, *h.b.*, 2014b, r.429.

bi awayên cuda hemserwa ne, her du misrayên dawî jî dubareya her du misrayên dawî yê benda yekem in.²⁵³ Muxemmesa herî dirêj a ku hatiye nivîsîn a Mela Mihemedê Liceyî ye. Liceyî vê mersîyeya xwe li ser Şêx Ebdulqadirê Hezanî nivîsîye. Qaliba wê Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun û behra wê jî hezec e. Muxemmesa herî kurt jî ji teref Şêx Heybetullah Abirî ve hatiye nivîsîn. Ev mersîye ji 3 bendan pêk tê. Ev mersîyeya ku Abirî li ser Şêx Fethullahê Hamîdî nivîsîye qaliba wê Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun û behra wê jî remel e.

Navê 11 mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatiye nivîsîn:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya muxemmesê hatin nivîsîn
Axayokê Bêdarî	1
Mela Mihemedê Liceyî	2
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	2
Mela Mûsayê Mizî	1
Mela Mahmud	1
Şêx Heybetullah Abirî	2
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	1
Mirad 'Elî	1
Cegerxwîn	1
Mela 'Ebdussemmed Comanî	1
Mela 'Eliyê Baqûstanî	2

Tablo 14: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatine nivîsîn.

²⁵³ H.b., r.416.

Nimûne:

Ji Mela ‘Elîyê Baqûstanî:²⁵⁴

Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilatun

– + – – / – + – – / – + – – / – + –

1. Gelo çawa gem û derdê vî Wehîdî e’j’bîr bikim
Êş û derd û nale nalan ez ji qelba wenda bikim
Hema çawa van seroman ez niha jê qut bikim
Herdû çavê wî belek jî ez niha qapat bikim
Ev qeder bû li me danî bê hisab kir kerb û şîn
2. Ew Wehîdê ku cuwan bû hema hêj jî ew gulam
Têne bîra me dewamî suhbet û şîrîn kelam
Lew ku ahîn tim li ser tîn pur ji huzna wî dewam
Hem ji şewta wî hezîn û hem jî mewzûn bittemam
Ew ji dost û ji hevala ra dibû daîm gemrevîn
3. Cewherek ‘alî ‘enaşir ez dibêjim ew Wehîd
Timmî şakir hem jî şabir ew ji Rebbê xwey hemîd
Qet ji Rebbê xwe yê şafî nebû carek bê omîd
Ah ji şewta wî hezîn û ku di şî‘rê da mezîd
Bike îhsan tu ji lutfê nî‘me ecrul-muhsînîn
4. Wî ji êşa ku di mîdê timmî gazin pur dikir
Wan hekîmên purî zana jê ‘îlacan lê dikir
Qetî suret yek îlaca hema fayde jêr nekir
Wî ji razan hem ji xwarin hem sikûnê qut dikir
Zêde bû lê derd û êş û lew ku daîm pur enîn
5. Li vê dunê tu dinêrî ku dewamî dewr dike
Ew bi xatir hem bi ni‘met ew ji hinka’r pur dike
Bi libas û hem bi ni‘met hem jî maldar keyf dike

²⁵⁴ Mela ‘Elîyê Baqûstanî, *Dîwana Baqûstanî*, Metn û Lêkolîn: M. Zahir Ertekîn, Weş. Zankoya Soran, Bîngol 2017, r.60.

Hin bi renc û purî zor û hem bi zillet ew dike
Tu me gafil nekî ya Reb tuwî Rebbil‘alem îh

6. Tu yî geffarê zunûban timm û daîm jêr bike
Ji quşûrên ‘aliyata jêr nesîb û cî bike
Hûr û wildanan li ser wî timm û daîm kom bike
Hem ji emn û ji selamet tu ji wî re gas bike
Hêvî û qeşda me ye tim jî tu yî Rebbil‘alem îh

7. Huzn û şînê hem girî qeş yek ji we ser wî nekin
Ji qena‘et hem ji şebrê hûn dewamî jêr bikin
Xwe li qarşî Rebbê ‘alî bi guneha mehcûb nekin
Pur ji xewf û ji recaê tim û daîm jî bikin
Û tewekkul tim li ser wî ew e daîm ê mu‘în

8. Ew di nehşed û not û hem di pêncê mîladê da
Hem jî sêşenbê ji roja diduwê gulanê da
Ew di nava ‘aile û di qezaê mala xwe da
Kirye teslîm wî emanet rûhê şîrîn bo Xweda
Rûhê wî jî çû semawata meqamê aminîn

9. Gelî dost û ji muhibba vî Wehîdî ji bîr mekin
Hem di rewza wî de daîm dilê wî jî xweş bikin
Hûn ji xeyr û ji duayan pur ji wî re tim bikin
Hem Xwedayê wî yê rehîm hûn ji wî razî bikin
Fatîha jî tim dewamî hûn bi hevra tim bixwîn

1.6. Muselles

Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wê ji sê misreyan pêk tê û ji teref helbestvanekî ve hatine nivîsîn re “muselles” tê gotin.²⁵⁵ Di musellesan de misreyên di benda ewil de di nav xwe

²⁵⁵ Adak, *h.b.*, 2014b, r.429.

de hemserwa û di bendên din jî du risteyên ewil di nav xwe de risteya sêyemîn jî bi risteyên benda ewil re hemserwa ye. Serwaya musellesê: aaa/bba/cca ye.

Di encama xebata ku hat kirin de hat dîtin, ji teref du mersîyenûsan ve 2 mersîye tenê bi şiklê musellesê hatine nivîsîn. Yek ji wan Mele Nûranî ye ku wî, ev mersîyeya xwe li ser wefata Şêx Muhemmed Selîm nivîsîye. Qaliba vê mersîyeyê Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun û behra wê jî hezec e. Yê din jî Şêx Îsmetullahê Karazî ye ku wî jî ev mersîyeya xwe li ser Sibxetullah Erwasî nivîsîye.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya musellesê hatine nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya musellesê hatin nivîsîn
Şêx Îsmetullahê Karazî	1
Mela Nûranî	1

Tablo 15: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya musellesê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Şêx Îsmetullahê Karazî:²⁵⁶

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'etter misk û mawerde
Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe' û perde
2. Niqab û perde avêtin ji sîma 'arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekteb î weya hûrî

²⁵⁶ M. Zana Karak, *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî* (Metn û Lêkolîn), K.T. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2020a, r.269.

Bi telîfa xwe em kuştin ji bu'd û geflet û dûrî

3. Ji cewra şûmê ehwa' an be'îdhal im di gërbê da
Tulû'a necmê rû-mahan dike hûkmê di şerqê da
Veke zencîrê van qeydan rûhê nazîk di xiyalê da
4. Tu Necmeddînê şanî her li rûhim ke tecella'ê
Ji qeyda gurbetê bider bi meqşûda xwe zana'ê
Kerîman her ew e rehber meded ya Ğewsê Begda'ê
5. Kerîman lew bedel navê 'etara her di îhsan in
Tu rojê neqşekî davê li mafûra ji riqwan in
Qe inşaf ez li ber tavê te gulşen bağ û reyhan in
6. Di 'etş û Kerbela mame 'içal in dest û pa'ê min
Di îhdaqa nezêr mame şikestin çenk û balê min
Yetîmê meqrebe mame ne zad û mal û cahê min
7. Hêkîmane didî ulfê bi her eħbab û eğyaran
Nekî meħrûm ji wê lutfê min ê miskîn û bedħalan
Xelaş ke me ji vê recfê ji penc û rencê şehmaran
8. Ji emrazê me xof peyda remed çeşmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Ğeyda bi Norşîn daye serbestî
Ji yumna Hëzret û Seyda dixwazim 'işq û sermestî
9. Ji 'işqa wan şîrînkaran me ħub sermaye' û quşwa
Bi rewda Çoqreşa rindan me iltica ye xweş me'wa
Şebîhê 'Arifê Qeşran ku mehbetgahê her cedwa
10. Tu çi d'kî ji 'İşmetê 'Aşî? fena ħal e we xûd kerde
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde

1.7. Museddes

Museddes di edebiyata klasîk de ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê ji şeş misrayên hemwezn pêk tê. Bi giştî di navbera 5 û 7 bendan de hatine nivîsîn.²⁵⁷ Museddes û tesdîs ji hêla teşeyê ve dişbihin hev. Lêbelê di navbera her duyan cudahîyeke sereke heye: Şeş risteyên museddesê tev ê helbestvanekî ne, lêbelê yên tesdîsê ne yên heman helbestvanî ne. Bi gotineke din şa'îrek 4 risteyan dema ku li ser beyta helbestvanekî zêde bike tesdîs derdikeve holê.

Museddes bi piranî bi şêweya "aaaaaa, bbbba, cccca..." û carinan jî bi şêweya "aaaaab, ccccb, ddddb..." tê serwakirin.²⁵⁸

Di xebata ku hat kirin de, hat dîtin ku tevde 1 mersîye heye ku bi şiklê museddesê hatine nivîsîn. Ev mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê museddes e ji teref Mela Zahirê Tendûrekî ve li ser mirina Şêx Muhemmed Zîyaûddîn hatiye nivîsîn. Qaliba vê mersîyeyê Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun û behra wê jî recez e. Ev mersîye tev de ji 8 bendan pêk tê.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya museddesê hatiye nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya museddesê hatin nivîsîn
Mela Zahirê Tendûrekî	1

Tablo 16: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya museddesê hatiye nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mela Zahirê Tendûrekî²⁵⁹

Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun

-- + - / - - + - / - - + - / - - + -

²⁵⁷ Yunus Demir, *Dîwana Namî(Fehmî Begê Pêçarî): "Meğmuru'd Dewawîn"*, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Turkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2019, r.80.

²⁵⁸ Adak, *h.b.*, 2019a, r.425.

²⁵⁹ Mela Zahirê Tendûrekî, *Dîwan*, amd. Mela Abdurrahman Biçici, Weş. Nûbihar, İstanbul 2007, r.207.

1. Îro tu şahê Serhed î xemîs û leşker bê hedî
Lewra di cengê eşed î derba li kîsra e 'da didî
Der cengê mişlê Xalid î lewra 'ed û ser ma serî'
Luţfek bike ji bona Xudê da em nemînin der xwedî
'Eceb ji luţf a te me dî anîne rê te her bedî
Bûd û şîtab me têr nedî lewra şerab bo me derî'

2. Lewra me tehl e her şîrîn nageh ji dil fereh revîn
Mame bi tenê mam bê evîn der darê gurbet dilbirîn
Îro ji 'alem em revîn belkî bê sûyet weşilîn
Dildağ di kul da bilbilîn daîm bimatem gulğulîn
Îro ji çûna Rikniddîn ruhem û fida Zîyaeddîn
Bêruh cesed kî dî bijîn lewra di îdbarê serî'

3. Da me 'ulûman her ku puşt lew çû Zîya nemaye tişt
Cem'a qulûban qeţ nehişt lewra xelef ra her dikuşt
Danî di qelban tîr û xişt lewra ku mane ser tenişt
Bêsûdî bûd an ra nivişt lewra biateş dil perişt
Elîm e ew rîşa ku zişt pê muhtela ne em ku gişt
Hûr hûr kirin manenda rişt lewra ku man em dilfezî'

4. Lewra ku man em dil bidam der hicreta şahê ku Şam
Tê da tijî jê re gulam saqî bide qerqef mudam
Dunya debab e pur gumam te' cîl bike bîne peyam
Furşet nema nîz e qîyam weqt bû xirab wîran heyam
Daîm ji me yûzbîn selam bin li Hezrete şîrîn kalam
Hem Ehlî Beyt eşhab tamam da em nebîn ji wan dil qeţî'

5. Da em nekin qeţ'a dilan ji gulşenan û hem gulan
Nalîn biken wek bilbilan lê j'ber çûna zulf sunbulan
Pişt da dinê şeyx û melan lewra bi dil me fetîlan
Mirin bi nîz me qewîlan derdê bi zehrê 'emilan
Sist kir li şec'anana milan der exzê ruh xûdwekîlan
Dayî me rûh ji hubba dilan lewra di mewtê bûne şecî'

6. Mewta di erdê pur bi nûr nisbet bi eşer tê zuhûr
 Tê da nema tişteq quşûr jê menqeset haşa ye dûr
 Lew daîma sirra Ğefûr tê da tijî esrarê hûr
 Raħet e ew rewze ye gor ya Reb ji me dûr kî ğerûr
 Da bîr nekin ħalê qubûr fanî dine ğaîb surûr
 Xuda Kerîm e hem Şekûr Xuda ‘Elîm e hem Semî’
7. ‘Alem di pê wî bûn esîr ‘eyşê di wan mane ‘esîr
 Bê murşid man hem bê nezîr winda li wan bû her ku pir
 Ya Reb tu çêkey destegîr da bit ‘eşakêş bo ðerîr
 Ji bona murîdan bit zehîr derman bikit cerħa bi tîr
 Da bit ji bo meksûr cebîr hem cebrê kit ‘îzwê kesîr
 Bêkes in ya Reb tu binêr xilaş bibin ji’ nîşa lesî’
8. Barîn ‘eqarib bêqedar mane di nêv ‘alem ğedar
 Serdan di dunya der bihar lê puştî te bûn aşîkar
 Pê bû ji te remzek zîhar lew ehlê ‘ilmê tê mane jar
 Nêz e dinê bit tarûmar rûħim fida Ğezretim yar
 Lew sûdî nadet zar û zar ey Zahirê mecnûn û har
 Daîm hewar ke şed hewar da tu riha bî ez wecî’

1.8. Terkîbbend

Ji wê teşeya nezmê ya ku ji bendan pêk tê re terkîbbend tê gotin. Serwaya terkîbbendê wekî ya xezelê ye. Hejmara bendên wê di navbera 5-10an de tê guhartin. Ji beyta dawî ya bendê re benda wasita tê gotin. Ev beyt di dawîya her bendekî de tê guhartin û risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne.²⁶⁰ Di xebata ku hat kirin de bes li rastî mersîyeyeke tenê hat ku teşeya wê terkîbbend e. Ew jî ya Mela Ehmedê Nalbend e. Wî, ev mersîyeya xwe li ser mirina xanima xwe Seyyîd Fehîma nivîsiye. Ev mersîye tevde ji 26 bendan pêk tê. Qaliba wê Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘il û behra wê jî remel e.

²⁶⁰ Dilçin, *h.b.*, r. 233.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya terkîbbendê hatiye nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Hejmara Mersîyeyan ên ku bi teşeya terkîbbend hatin nivîsîn
Mela Ehmedê Nalbend	1

Tablo 17: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya terkîbbendê hatiye nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend²⁶¹

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'il

- + -- / -+ - - / --

1. 'Erzê hâla xwo ji bo kê bixwînim
Piştî wê seyyîdê har û dîn im
Çû dema dilxoş û raşet nîn im
Se'et û gav û dema nalîn im
Ez neşagî li dema yasîn im
Meyyitê qebrê û bê telqîn im
Çavrehê Şêx Behaedîn im
Da wekû seyyîdea dî bînim
Ez bi xo her we xudan texmîn im
Çunkî ez 'ebdê wî û miskîn im

Belke ew emrî biket la texeffê

2. Bo te ey xanim û canê çî bikem
Nazik û şenê giranî çî bikem
Xoş hevalbend û xudanê çî bikem

²⁶¹ Nalbend, *h.b.*, r.58.

Piştî vê xusr û ziyanê çî bikem
Bo xeş û xal û nişanê çî bikem
Şebrê serêş û qutanê çî bikem
Ey dil û rûh û rewanê çî bikem
Keftime zehmet û janê çî bikem

Ax û şed ax bo ewî dur necefê

3. Ax û şed ax nê ewe xanim û zîn
Ji fîraqê me hero ah û girîn
Me di dil keftine şed êş û birîn
Li wucuda me nebû kes we şîrîn
Piştî ew çûye ezê hatim û dîn
Çî bikem min ne tehemmul ne revîn
Cehennem in ewro şağî û jîn
Li birîna çî ye derman û kewîn
Dem bi dem huzn û gem in çû me kenîn
Weqt e nêzîk e ku em pê bimirîn

Bo gema bo me nişan wek hedefê

4. Weqte 'omrê xo me borande serî
Min neman şebr û çû şeb'ê beşerî
Nê hinav şotin û ruş hate derî
Kes çû înkare nekin vê xeberî
Ne wek cana me bûn hûr û perî
Ne şîrîn û ne çû Belqîs û zerî
Ne Zuleyxa ew ne Zîna Cezerî
Gerdenê rengê ji şîşê fenerî
Ew dema wê kirî karê seferî
Melek û gas û welî çûn di berî

Mişlê sultanê li textê şerefê

5. Min ji huznê li serî restine şax
Wê li dil dane du şed keybir û dax
Lew nemane îro li min rewneq û zax
Hatine seyr û temaşa me di tax
Nê heta weqtê ecelê mame nişax
Weqtê hestî bimehînin bibineve ax
Ez li ser milik û gema bûme kerax
Co li min hate birîn germe tebox
Hêj nehînin hat ne dem hat û ne çax
Ma çi faydê me diden nalî û ax

Bazê paşahî firî çû ji refê

6. Qeş kesê hinde nebûn 'eql û edeb
Ji wê razî 'ecem û kurd û 'ereb
Şubhî şerî bû dema digirt gêdeb
Laiqê şanê dibûn Şam û Heleb
Me li dunyayê wucûd ew bû sebeb
Ez ji bêjim çi bikem nîne 'eceb
Min neman 'eql û dil û se'î û teleb
Weqtê ew şag hero min kir qeqeq
Seyyida pak eşil 'alî neseb
Berze kir ecro li min nav û leqeb

Wek şemalê bû dema di hate sefê

7. Ew ro dunya li me hêla tarî
'Eql û sewda me neman êkcarî
Kî biket rehîmê li ser vî jarî
Ku wucuda wî bû jehra marî
Lazim e rehîmê biken berwarî
Bo yeka dî ji neseba muxtarî
Wan li ser me hebîtin hişyarî
Se'î û teftîş û gem û pisyarî

Belkî carek dî bixum vî parî
Ey Xudanê me tu îhsan karî

Zû bike roja bedir çûye xesefê

8. Kesb û kara me hemî derd û gem in
Qûtê dil nalî û êş û elem in
Careka dî te xuzn daye ve min
Keyf û lezzat û xoşî li min 'edem in
Dost û emşalê me yar û şenem in
Wan hema şewq gelek dît û ne min
Ku xudan ni'met û nazik herem in
Ehlê emlak û besatîn û çemen
Mulkê min cerh û birîn û seqem in
Rebbî her karê te luţf û kerem in

Te ji mi stande wiqûfa 'erefê

9. Te dilê mi ji fereqê şuşt û renî
Neynika ruhn û vebûy girt tenî
Cerg û mêlak razîn mane genî
Min girî daîmiyye û hinde kenî
Kefte ser mulkê dilî befir û renî
Çend min se'ye kir û xo vejenî
Te necata xo neda vî rebenî
Evroke şibhî gerîbek Yemenî
Maye dilsotî û dîbê weţenî
Bo bela bûye nîşana 'elenî

Felekê daye ber qehr û gefê

10. Şed meded ax ji cewra felekê
Xendiqîm keftime acê ji kelekê
Bûme êxsîrê di qeyd û xelegê

Kuştim ez seyyid û hûr û melekê
Nê heyata me niho ber helekê
Ez bi destê xo çî bigrim pelekê
Kire qeşda cihê bazî qelekê
Min neman qewl ji geyrî welekê
Ah bû wê Zînê mîşal û çelekê
Qelekê zulm ê neke li min gelekê

Ez giriftarê bi hubb û şegewê

11. Elem û cumle muşîbet bi 'umûr im

Ew li ser min bi geşeb bûneve kom
'Eskerê kerb û bela kirye hucûm
Ku bezîn ser me şifet urus û rom
Ma çewa 'acîzîya tehl nexom
Bo kesê hinde felek nîne zêlûm
Lazim e destî ji dunyayê bişom
Ka nezer ken li min nê ez eve çûm
Fayde naken ne 'îlac û ne 'ulûm
Çî dema bû ecelî hal bû qudûm

Cehwerê rûhê nezer da telefê

12. Piştî wê bûm reben û bê kes û jar

Qeş neman hal û mefer û şebr û qerar
Şerbeta jehir û fîraqê me vexwar
Em şemaldana şevê nîne diyar
Bûm birîndar û dewam her me hewar
'Umir û şağî li me bûn qeyd û hişar
Cehnemin mal û jin û xanî û war
Bûn beheştê me niho çol û beyar
Min girî û zarîye êvar û sehar
Wey xudan çenda li min tehle bihar

Ĝewribû kehnîya reh̄m û 'eṭefê

13. Ey reben çendî tu bê iqbal î

Bo çine hinde hewar û nalî
Hemd û şukra me bike ji vê ḥalî
Tu xusaret nebîye ji rastimalî
Bi dilî efşeh û ezman lalî
Şahibê nuṭîq û sir û eḥwalî
Bi 'umir yazde li pişt çil salî
Heye meknûnê me sirrek 'alî
Ji xezîna ku nekême û xalî
Careka dî miheka bi gopalî

Belke me'qûl e tu bînî vê kefê

14. Qeṭ neke digel me ḥisab û cedelê

Çi kire digel te me sirrek heye lê
Xo nede çolê melal û keselê
Se'îyka çak tu bike li ser meselê
Tu nizanî çî hebû li qalû belê
Mîn ji te stand dewrek baş welê
Biçerî taze li bağek nefelê
Vêt tu razî bî bi vê maḥeşelê

Bes bike hinde fiğan û esefê

15. Min muşîbet hene wek beraşa

Tu nezer ke li mezin û oldaşa
Ji feqîr û ji xenî û paşa
Ku kesek wek me hebît ḥaşa
Yef'elallahû we yeḥkûm maşa
Ku li gustîrê nehêlît qaşa
Wek xozî himmeta ehlê şaşa

Durreka dî me heba ji Xişxanê
Wek Fehîma me gula neqqaşa
Hîvîya min ji welî û başa
Xelefek bête cihê wê selefê

16. Ey xudan vêt tu bide xercê rehê
Belke lêkdeyn bo xo baregehê
Da digel qaileyê biçîê Mekkehê
Bes bikem vê gelle û ah û ehê
Belke roja 'erefe û hîn û gehî
Nekevim qeyd û bela sal û mehê
Destê weşlê bigehînin vê fehê
Min ceza dît ji curm û gunehî
Lew şemala me qemirha şobehê
Tengîdil hate cihê dilfirehê

Durra menqûş xo kêşa şedefê

17. Tu digel min çî bikey em nesilîn
Her çî emrê te kirî pê 'emilîn
Lêbelê em bi xo dilsoz û kulîn
Bilbilîn talib û 'uşşaqî gulîn
Çû bihara me dema gul kemilîn
Ettişal hinde niho jê veşilîn
Xoş tereqqî me kir û em nezilîn
Ez nizamim ku çî tov ehlê dilîn
Kerekê şafî bi kurtan û cilîn!
Demekê taze bo yarê şugulîn

Me nebir qeç çû gem cewr û cefa

18. Evroke ji destê me çûn xêr û xoşî
Huznê dil girt û cesed lê herişî
Cergê sotîli me firaqê gevişî

Hestîyê pişt û du rehna kelişî
Ġem li mêlak û hinava neqîşî
Piştî wê tîr û ber û tevin û teşî
Ew hemî çûn û heram vî pireşî
Lew kul û derd û elem ketne leşî
Min fexir kir ew Xudê li min nemeşî
Ew xudan seyyideka dî Qureşî

Bide me bi hîvî û sûnd û helefê

19. Wey felek pa tu çî zalim muzirî

Min nezanî tu çîma ji min 'enirî
Ew gula geş te bir û rist derî
Çî dema min nezerê kir li kurî
Ber bû min agir û bû pêt û gurî
Ruḥnikêd çava hemî xûne xurî
Ey xudan îro te li min vebirî
Wekî ḥeskey ku serê min vekirî
Bêje iqbala te hat û zivirî
Daîma şebrê bike pîsê gorî

Dê dewrek hêt vê cihê vê xelefê

20. Min niho ḥalê wekî Zîn û Memê

Neqdê şola me dixwazît selemê
Rebbî dana te wucûd e ji 'edemê
Min heye Şêx Behayî keremê
Çî dema ah û hewara bikemê
Şerha ḥalê xo çî bînim reqemê
Ez neşêm îro beyam kem ve hemê
Seyyidek kiç çî hebît ez didemê
Da bikem term evê berḥerefê

21. Lazim e min jineka can û ciḥêl

Min nevên bîjen û heyyal û çû çêl
Xaîn û tund û xebergîr û çivêl
Dilveker solînegul başe ne rêl
Çi cihê seyr û temaşane nihêl
Min divêt aveke bê huşmuş û pêl
Bîjna li nik hene şed hîle û fêl
Gund û bajêr û 'eşîr bêne vê hêl
Ji gema reş bû dilê min bîye sêl
Hate badan me bi qehra bû 'elêl

'Ehdekê bo kiçekê bînne wefê

22. Şa'irê tûl û ter îroke ez im

Eveye fikra min û qeşd û cezim
Sêveke şibhî eva çûy bigezim
Ku ezê dilkul û bê cerg û bezim
Bê pez û pare û bê milik û rezim
Neqşebendî me û behra recezim
Ew tenê besse nevêt ez bibezim
Şêrê ezman û kelamê lugezim
Evaka vê deşgel û remel û kezim
Libsê atlesî û armûş û qezim

Ez niho keftime rist û tenefê

23. Min tu yî yar û bira molla Huseyn

Lew li ser zâtê te heqqê mine deyn
Dûr Xudê stand ji min em çî bikeyn
Ser bi ser keftime beynel cebeleyn
Min di dil keft şerê Bedr û Huneyn
Vê gema hinde mezin besse bibeyn
'Erzê şêxî bike gewşê şeqeyleyn
Cennetel xuld yeqîn bo te ye 'eyn
Vêt 'ilacê li feqîrê xo bikeyn

Te ecir ket go meta keyfe we eyne

Reqşî dîn bû li ber çeng û defê

24. Min şanî her li Giyaşeddînî

Bi du‘a roj û şevê ya îî
Multemis bî ji behayê dînî
Seyyidek dî bo feqîrî bînî
Çunke ew ‘ebdê te ye miskînî
Hêşe lîllah tu ji wî sil nînî
Min qesem nuke kire bi wettînî
Em ketîn kerb û bela vî hînî
Ger hebît min hemî milkê çînî
Her tijî çava me girye û şînî

Na zuha bin beqa nedey min neşevê

25. Şêx Mezher me tuy beş helêx

Ehmed îro revîye ‘ebdê gorêx
Kafirê zâtê te ew jî bîye yêx
Careka dî li herba xo me bêx
Min gelek şêx bihîstîne şelêx
Serbirin şafî neku mêw kezêx
Ebeden qet me nevên geyrî we şêx
Ku li dil min hinde şed nalî û êx
Hîlen li ber me du şed xendek û kêx
Ez di warê heweme zîrek û zêx

Kerê darkêşe bi xo biden ‘elefê

26. Me şev û rojê fehê taze vepa

Keftime başk û mela çeng û lepa
Çend rabûye ji bin kefte çepa
Te‘nê hingaft ku heyhat wepa

Tu bo çêkey ku nerabûye pepa
 Ew çî bû ya me kirî ke hecepa
 Çî bikem dest verist min jî çepa
 Çû ewê mîr li text û qenepa
 Vequtan ro bi şeq û mest û tepa
 Wey xozî çûyew heba li ser du depa

Paşî wek êşê nebû yar û mefê

1.9. Tercî' bend

Di ferhengan de di maneya tekrarkirina bendan de tê destnîşankirin ku ev teşeya nezmê û terkîbbend xwedîyê gelek taybetîyên hevpar in. Bes taybetîyeke tercî' bendê heye ku wê jî terkîbbendê cuda dike. Ew jî di dawîya her bendê de dubarekirina heman riste yan jî malikekî ye. Ev taybetî di terkîbbendê de tune ye. Adak derbarê vê teşeya nezmê de pênaseyeke wisa dike:

"Tercî' bend, ew teşeya nezmê ye ku jî çendîn bendên hemkêş pêk tê û bend yan wek serwaya xezelê yekserwa ne, yan jî hemû misrayên wê di nav xwe de hemserwa ne (muserre') û di dawîya her bendekî de jî bo ku pevgirêdana bendan bi piranî beyteke ku di kêşê de hevpar, lê di serwayê de cuda cih digire. Di tercî' bendan de malik yan jî risteyên navbendê tên."²⁶²

Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat dîtin tevde 8 mersîye bi teşeya nezmê ya tercî' bendê hatine nivîsîn. Nivîskarên ku bi teşeya tercî' bendê mersîyeyên xwe nivîsîne ev in: Mela Mihemedê Liceyî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Mela Zahirê Tendûrekî, Evdirrehîm Rehmî Hekkarî, Cegerxwîn û Silêman Bedirxan.

Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya tercî' bendê hatine nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Hejmara mersîyeyan ên ku bi teşeya tercî' bendê hatin nivîsîn
Mela Mihemedê Liceyî	1

²⁶² Adak, h.b., 2019a, r.514.

Mela Zahirê Tendûrekî	1
Evdirrehîm Rehmî Hekkarî	1
Silêman Bedirxan	1
Cegerxwîn	3
Şêx Îsmetullahê Karazî	1

Tablo 18: Navê mersîyenûs û hejmara mersîyeyên wan ên ku bi teşeya nezmê ya tercî' bendê hatine nivîsîn.

Nimûne:

Ji Mela Mihemedê Licêyî²⁶³

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun

- + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1. Ez nizanîm ey felek ev heşret û derd û fiğan
Bo çî ez şeh dikim ji vê gunbêda exzer nişan
Gote min: Hicret ku kir ji vê dunyayê Quṭbê Hezan

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

2. Me'dena luṭf a îlahî menbe'a feyza Xweda
Wî bi himmet zulm û geflet kir ji dinyayê cuda
Heqq e ger cumle terennum kin bi ev şewt û şeda

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan

Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

3. Kûhê 'irfan 'erşê rehman mexzena 'ilm û weqar
Yemmê iḥsan ehlê wicdan pîrê soḥbet pur nisar

²⁶³ Mela Mihemedê Licêyî, *Dîwana Hadî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012, r.172.

Murşidê Yezdan î û sultânê ‘uşşaqê kubar

Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

4. Dehşet û hîret li min daye nizanim ez çi kem
Qeş nema xalî ji derd û mihnet û gem yek rikem
Hew dibînim ez dibêjim hem jî pur nalîn dikem

Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

5. Sa‘eta meyxaneyê hem jî meqamê suhbetê
Ez dibînim hem tewecuh gaha Şahê nisbetê
Bê teweqquf ez dibêjim wah li min vê firqetê

Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

6. Her kesê ji le‘lê zelalî wî vexwarî şerbetek
Ya xwe seş kir wî bi ixlaş û mehebbet suhbetek
Ew dibêjit çunke daye wî heyat û ulfetek

Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

7. Gewher û dur û yewaqît ku ji leb wî date der
Mustem‘i meqbûl di dêran wan di nêv can û ciger
Çunke emrazê di dil davête der wan ser te ser

Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

8. Firqeta seyda û gewsê e‘zîmî hêj hebûn

Hicreta Geylaniyê Şanî ji dil kir min zebûn
Dîn û sewda bûme îro ez dibêjim ergenûn

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

9. Derdekî zor û giran e nayête mi'yar û hisab
Firqeta Şahê Hezan e ey gelî eşhabê bab
Qeṭ li min nakin neşîhet mame ez bê şebr û tab

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

10. Warisê pêgemberî bûn ew di vî 'eşrî yeqîn
Dağ kirî can û dilê me bi sohbeta şehd û şîrîn
Bûme medhûş û dibêjim: Kan gelo babê Şîrîn

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

11. Şubhetî Hezretê Farûq ez dibêjim ji dehşetê
Şağ e pîrê min nexwarî wî mergê şerbetê
Çunke tê min bîre textê suhbet û hem nisbetê

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pûr dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

12. Min di vî 'eşrî nedî Quṭbek bi tekmîl û kemal
Ku tedawî ke dilan gahî bi cemal û geh bi celal
Bil ji Ebdulqadirê Şanî Geylanî mişal

Cumle 'alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

13. Xaliq û Rebbê ehed "yewmul-ehed" da wî necat
"Ĝeyn" û "Şîn" û "Kaf" û "Waw"ê dame tarîxa wefat
Rażî û merzî di "Cennatul-ne'îm" dîtî heyat

Cumle `alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan


14. Maye bê sebr û qerar û derdmend û mustemend
Hadî kem geşteyê te ye cudayê dilkemend
Lazim e ji bo wî bibêje ew bi burhan û sened

Cumle `alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

15. Şubhetî seydayê Taxî merqeda wî li Palî ye
Wî helandî can û dil şubhî `Izamê Balî ye
Her çi ku çav pê ketî daim ji derdan naliye

Cumle `alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
Pur dikin nalîn û kalîn û fiğan pîr û ciwan

Rêje û hejmara cureyên mersîyeyan a li gorî teşeyên nezmê di grafika li jêrê de hatine dayîn



Grafîk 3: Rêje û hejmara cureyên helbestên mersîyeyî

Di encama lêkolîna hat kirin de hat tespîtkirin; 2 mersîye bi teşeya muselles, 1 mersîye bi teşeya museddes, 92 mersîye bi teşeya qesîde, 29 mersîye bi teşeya murebbe', 15 mersîye bi teşeya muxemmes, 18 mersîye bi teşeya mesnewî, 17 mersîye bi teşeya xezel, 8 mersîye bi teşeya tercî'bend û 1 mersîye bi teşeya terkîbbend hatine nivîsîn.

Wekî ku di daneyên li jorê hatin dayîn de jî tê dîtin teşeya nezmê ya ku di mersîyeyan de herî zêde hatiye bikarîn bi 92 mersîyeyan ku teqabûlî rêjeya % 50 dike, qesîde ye. Piştî qesîdeyê teşeya nezmê ya ku di mersîyeyan de hatiye bikaranîn bi 29 mersîyeyan teşeya nezmê ya murebbe' e ku rêjeya vê teşeya nezmê jî ji % 16 e. Piştî qesîde û murebbe'ê teşeyên nezmê

yên ku herî zêde di mersîyeyên Kurdî de hatine bikaranîn bi dorê wisa ye: Mesnewî, xezel, muxemmes, tercî' bend, muselles, museddes û terkîbbend.

Ev dane û rêje nişan didin, mersîyenûsên Kurd di warê nivîsîna mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî de herî zêde teşeya nezmê ya qesîdeyê bi kar anîne.

2. Wezn

Wezn yek ji hêmanên eslî yê şî'irê ye. Lewra yek ji wan tiştên ku şa'ir dixwazin pê di şî'ira xwe de ahengekê saz bikin wezn e. Wezn bi heman awayî rîtm, aheng, nîzam û dewlemendîya di nav şî'irê de ye. Ji bilî van tiştên qala wan hat kirin yek ji wan wezîfeyên weznê di temamê helbestê de sazkirina yekîtiya mijarê ye.

Wezn çawa ku di edebiyata Erebî, Farisî û Tirkî de hatibe bikaranîn di edebiyata Kurdî de jî hatiye bikaranîn û bi demê re pêşve çûye û şa'irên Kurd di nivîsîna helbestan de curbecur wezn bi kar anîne.

Li gorî daneyên ku di encama xebata hat kirin de derketin holê, di nivîsîna 183 mersîyeyan de tevde 9 cure behr û 24 qalibên erûzê hatine bikaranîn. Behra ku zêdetirîn hatiye bikaranîn bi 68 caran behra remel e. Wek qalibek, ya ku zêdetirîn hatiye bikaranîn qaliba fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun a behra remelê ye ku pê 40 helbest hatine nivîsîn; pişt re mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun / mefa'ilun a behra hezecê tê.

Em dikarin van weznan bi behr û hejmara wan ve li jê re wisa bi rêz bikin:

Behrên Helbestan	Hejmara Helbestan
1.Behra Remel	
b. Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun	40
a. Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun	16
d. Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun	4
c. Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilun	3
h. Fa'ilatun Fa'ilun	2
e. Fa'ilatun Fa'ilatun	1
f. Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'il	1
g. Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun	1

2.Behra Hezec:	
a. Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun	35
b. Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun	9
c. Mefa'îlun Mefa'îlun	6
d. Mef'ûlu Mefa'îlu Mefa'îlu Fe'ûlun	2
e. Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun	1
f. Fa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun	1
3.Behra Recez:	
a. Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun	30
c. Mustef'îlun Mustef'îlun	14
b. Mustef'îlatun Mustef'îlatun	1
4.Behrê Muzari'	
a. Mef'ûlu Mefa'îlun Fe'ûlun	8
5.Behra Muctes:	
a. Mef'ûlu Fa'îlatun Mef'ûlu Fa'îlatun	4
6.Behra Muteqarib	
a. Feûlun Feûlun Feûlun Feûl	1
7.Behra Munserih	
a. Mustef'îlun Fe'ûlun Mustef'îlun Fe'ûlun	1
8.Behra Besît	
a. Mustef'îlun Fa'îlun Mustef'îlun Fa'îlun	1
9.Behra Serî':	
a. Mufte'îlun Mufte'îlun Fa'îlun	1


Tablo 19: Qalib û behrên 'erûzê yên mersîyeyan.

Di nav wan behrên arûzê yên ku di 183 mersîyeyên Kurdî de herî zêde hatiye bikaranîn behra remelê ye. Bi vê behra remelê mersîyenûsên Kurd bi tevahî 68 caran mersîye nivîsîne. Rêjeya vê behra arûzê li gor wan behrên din ji % 37 e. Piştî behra remelê behra ku zêdetirîn hatiye bikaranîn pêşî behra hezec û dûre jî ya recezê ye. Di mersîyeyên Kurdî de ji teref

mersîyenûsên Kurd ve 54 caran behra hezecê hatiye bikaranîn û rêjeya wê ya bikaranînê li gorî wan behrên din ji % 29 e. Behra sêyemîn a ku di mersîyeyên Kurdî de herî zêde hatiye bikaranîn behra recezê ye. Ji teref mersîyeyên Kurd ve ev behr 45 caran hatiye bikaranîn û rêjeya wê ya bikaranînê li gorî behrên din ji % 25 e.

Ev her sê behrên ku di mersîyeyên Kurdî de herî zêde hatine bikaranîn ew behr in ku di nav wê sîstema arûzê ya Xelîl b. Ehmed de ne. Ehmed vê sîstema arûzê wek “*muctelibe*” bi nav kiriye.²⁶⁴ Ji van her sê behran a ku herî zêde kêrî mersîyenûsên Kurd tê behra remelê bi xwe ye û mersîyenûsên Kurd jî herî zêde vê behra remelê bi kar anîne. Lewra behra remelê ji bo destnîşankirina mijarên mîna pesindayîn, huzn, qehremanî, ferahî, şîn û mijarên mîna wan ên dilzîz kêrhatîtir e.²⁶⁵ Dema em li mersîyeyên ku li ser mirîyan hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin ku di nav wan de him huzn û şîn him pesindayîn û qehremanî û mijarên mîna van cî digirin.

Rêjeya behrên erûzê yê helbestên mersîyeyî wisa ye:



²⁶⁴ Tevfik Rüştü Topuzoğlu, “*Hezec*”, DîA, İstanbul 2007, c.17, r.1998, r. 302.

²⁶⁵ Topuzoğlu, “*Remel*”, DîA, İstanbul 2007, c.34, r.553.

Grafîk 4: Rêjeya behrên erûzê yên helbestên mersîyeyî

Ji bo ku di helbestekê de carinan wezn tam cihê xwe bigire divê ew peyva ku hatiya bikaranîn di qaliba weznê de be, ango divê bi qalibê re lihev girtî be. Carinan ev yek mimkûn nabe. Di halên wisa de med, îmale, zîhaf û wasil dikevin dewrê da ku di risteya şî'irê de wezin tam rûne. Bi saxîya van hêmanan ahenga ku tê xwestin bê dayîn helbestê, tê saz kirin. Med, îmale, zîhaf û wasil di mersîyeyên Kurdî ji teref mersîyenûsên Kurd ve jî hatine bikaranîn. Me li jêrê pêşî pênaseya her yekî ji wan kir û dûre derheqê her yekî ji wan de mînak da.

2.1. Îmale

Heger heceyeke kurt a beytekê bi mebesta ku li weznê bê, dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke din îmale, dirêjxwendina hêceyeke kurt e. Hebûna îmaleyê ji bo helbestan wek qusûr tê qebûl kirin.²⁶⁶

Nimûne:

Ji Şêx Ewdilqadirê Hezanî²⁶⁷

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

Eman Seyda eman Seyda, mi **ne** 'eql e mi **ne** sewda

+ - - - / + - - - / + + - + / + + - -

Çi derdek bû li min peyda, te rişlet kir ji dunyaê (1)

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Qaliba beyta li jorê Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun e. Weke ku di risteya yekemîn a beytê tê dîtîn ji bo qalib li hev bigire divê ew heceyên ku di risteyê de hatine reşkirin dirêj bîn xwendin.

2.2. Med

Med tê maneya kişandinê. Bi gotineke din dema ku di navbera du kîteyên girtî de ger ku hebûna kîteyeke vekirî pêwîst be, kîteya ewil a ku dawîya wê bi dengdar û dengdêrekê xelas dibe ji îmaleyê hinekî zêdetir dirêj tê xwendin. Îmale li gelek deran wek qisûrekê ye; lê med wek hunera deng e²⁶⁸ û ji wan unsûrên ku tesîreke erênî li ser ahengê dihêlê ye.²⁶⁹

²⁶⁶ Adak, *h.b.*, 2014b, r.382.

²⁶⁷ Şêx Ewdilqadirê Hezanî, *Dîwan*, Tîpguhêzî: Mela Birhanê Tarînî, Weş. Lîs, Diyarbekir 2016, r.45.

²⁶⁸ Dilçîn, *h.b.*, r. 14.

²⁶⁹ Pala, *h.b.*, r. 301.

Nimûne:

Mela Mûsayê Mîzî²⁷⁰

Mef'ûlu Mefa'îlu Mefa'îlu Fe'ûlun

-- +/+ --+ / +---+ / +--

Sê carî birîndar bûme îsal di mehê da

Derba ku ewel hatî li nîva cigerê da

Şanî ku dihatî li umûma cesedê da

Şaliş ku dihatî bûme evdal di dinê da

Zer bûme ji êşê **wekî** gula melisî (2)

Ev pêncîneya li jorê bi qaliba Mef'ûlu Mefa'îlu Mefa'îlu Fe'ûlun hatiye nivîsîn. Dema ku em risteya dawî ya vê pêncîneyê mêze dikin em dibînin ji bo qalib li hev bigire pêdivî bi kîteyekê heye. Em dikarin vê kîteyê bi peyva “wekî” ya ku hatiye reşkirin û dawîya wê bi tîpeke dengdar û dengdêr xelas dibe tedarik bikin. Ji vê yekê re med tê gotin.

2.3. Zihaf

Eger hêceyeke dirêj a beytekê, bi mebesta ku li weznê bê, kurt bê xwendin wê demê zihaf pêk tê. Bi gotineke din zihaf, kurtxwendina dengdêreke dirêj e.²⁷¹ Zihaf wek xetayeke erûzê tê qebûlkin.

Nimûne:

Ji Seyîd 'Elîyê Findikî²⁷²

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun

Ez çiqî bêmî ji kêmahî dibêmî weşfê şah

- + --/- + - -/-+--- / - - -

Ê ku dîtî bêxered bawer dîkit qewlê di min(6)

- + --/-+ --/- + - -/-+ -

²⁷⁰ Zinar, *h.b.*, 1991a, r.264.

²⁷¹ Adak, *h.b.*, 2014b, r.382.

²⁷² Findikî, *Dîwan*, r.269.

Weke ku di risteya yekemîn a beyta jorê de tê dîtin "-fê" kîteyeke girtî ye û ji bo qaliba *Fa'îlun* derkeve holê pêwîstî bi kîteyeke vekirî heye. Di vir de zihaf tê kirin û kîteya girtî "-fê" tê vekirin. Bi vî awayî zihaf derdikeve holê.

2.4. Wesl

Eger tîpa dengdar a di dawiya bêjeyekê de û tîpa dengdêr a serê bêjeya dû wê re bi hev re bê xwendin wesil derdikeve meydanê. Nexasim di erûzê de ji bo qalib li hev bê anîn wesl tê kirin û ev yek wek hunerekê tê qebûlkirin.²⁷³ Wesl ne di kategoriya zihaf û îmalê de ye û ji bo helbestvan ne qusûr e.²⁷⁴ Me li jê re mînakek derheqê weslê de da û me, wesl bi îşareta “_” nîşan da.

Nimûme:

Ji Mela Ebdussemedê Comanî²⁷⁵

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

Ah û heşret ah û heşret ah û heşret şed hezar

Intiqal kir Hezretê Ustadê Islamê hewar

Dînê Islamê yetîm hiştî zelîl û ustuxwar

Bê kes_û malik mu'în man miskîn û dîwanedar

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes (1)

Qaliba pêncîneya li jorê Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun e. Weke ku di risteya çaremîn a pêncîneya li jorê de tê dîtin tîpa dengdar a di dawiya bêjeya “*bê kes*” de û tîpa dengdêr a “*û*” yê bi hev re tèn xwendin. Bi vî awayî qalib li hev tê anîn. Ji vê yekê re wesl tê gotin.

3.Serwa

Yek ji wan tiştên ku di edebîyatê de metnên şî'iran ji metnên pexşanê cûda dike û wateyeke xweş lê bar dike û balan pê dide kişandin li şî'irê ahenga di helbestê de ye. Bi vê

²⁷³ Pala, *h.b.*, r.472

²⁷⁴ Adak, *h.b.*, 2014b, r.384.

²⁷⁵ Zeynelabîdîn Amedî, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî'uzzemân*, Diyarbakır Söz Yay., Diyarbakır 2004b, r.12.

ahenga ku di şî'irê de xwe nîşan dide kelîme herikbar dibin û gotinên wan ji guhê meriv re xweş û balkêş tèn û dîqqeta guhdarvanan pê tê kişandin li ser helbesta ku tê gotin.

Ew ahenga ku ji teref şa'ir bi xwe ve di helbestê de dê bê sazkirin bi sê hêmanan re pêwendîdar e: Şîkl, mijar û ziman. Dema ku ev her sê hêman bibin yek, parçeyeke sexlem û kamil derînin holê û di nav xwe de li hev bigirin wê demê di wê şî'ira ku tê xwestin tesîr li ser xwîner û guhdarvanan bihêlê de ahengeke balkêş derdikeve holê.

Ji bo ku ev ahenga muaazam di helbestê de derkeve holê pêdivî bi serwa û paşserwayê bi xwe heye. Lewra ev her du hêman ji hêmanên eslî yê şî'irekê ne. Sebeba vê yekê jî ew e ku şa'ir dema dixwazin di şî'ira xwe de ahengekê saz bikin serî li serwa û redîfê didin. Em dikarin bibêjin serwa û paşserwa bi heman awayî yek ji wan parçeyên ku xweşseda û herikbarîyê didin helbesta şa'ir bi xwe ne. Bi van hêmanên ku pê ahengek di şî'irê de tê sazkirin gotinên şî'irê tesîreke zêde li ser guhdarvanên xwe dihêle û bala wan zêdetir dikşîne li ser xwe. Di helbestê de serwa her wisa rîtmekê saz dike û dengeke bi nîzam pêk tîne. Bi heman awayî paşserwaya ku di temamê helbestê de tekrar dike jî peyama ku tê xwestin di şî'irê de bê dayîn peyv bi peyv li temamê helbestê hakim û belav dike.

Vêcar her çi qas wezîfeya eslî ya serwa û paşserwayê derxistina holê ya ahengê bi xwe be jî ev wezîfe li gorî kelîme û li gorî hejmara kelîmeya ku tê bikaranîn maneyeke cuda digire li ser xwe. Wek mînak di dawîya risteyên helbestan de carinan ji bo ahengê bê pêkanîn bes herfek an jî du herf wek serwayê tèn bikaranîn. Ji vê yekê qesd sazkirina ahengê bi xwe ye. Lêbelê dema ku ev serwa şûna xwe ji paşserwayê re dihêle û bi kelîmeyek, du kelîme yan jî bi hevokekê paşserwa tê kirin wê demê meqsed ne tenê aheng e. Bi vê yekê şa'ir dixwaze yan peyamekê bide yan dixwaze balan bikşîne li ser halê xwe yan jî dixwaze balan bikşîne li ser kesê ku şî'ir li serê hatiye nivîsîn. Ev yek bi heman awayî carinan dereceya ahengê bi xwe jî zêdetir dike. Wek mînak, dema ku em li vê mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê ji teref Şêx 'Ebdurrehmanê Çoxreşî ve hatiye nivîsîn û ji 36 malikan pêk tê mêze dikin em dibînin Çoxreşî bi temametî 36 caran gotina "...gelo *Ġewşê Şîrîn kanî*" di dawîya her risteya duyemîn a her beyttekê de bi kar tîne. Çoxreşî bi vê paşserwaya "...gelo *Ġewşê Şîrîn kanî*" bes pirsekê nake. Ew di helbesta xwe de him aheng û rîtmekê saz dike û him jî bi wasitaya vê paşserwayê peyama ku dixwaze bide di seranserê mersîyeya xwe de hakim dike.

Piştî van taybetîyên serwa û paşserwayê em dikarin qala pênase û cureyên serwayê bikin. Serwa wek têgeheke edebî, ew aheng e ku di dawîya beytê yan jî du wî cihê ku wekî dawîya beytê tê qebûlkirin de, ji dubarekirina dengên di navbera peyvên cihêwate de derdikeve

meydanê.²⁷⁶ Di serwayê de, ji bona ku wekhevîya du dengan wek serwa karibe bê hesinbandin lazim e ku ev peyv ji hêla deng ve wek hev û ji hêla maneyê ve cuda bin.

Serwa li gorî cihên di risteyê de û li gorî hevbeşîya di navbera dengên di dawîya misrayan de bi du şiklan tên senifandin.²⁷⁷ Em ê hewl bidin cûreyên serwayên di mersîyeyan de li gor dengê wan û li gor cihê wan binirxînin û nîşan bidin. Piştî vê gavê jî em ê qala wan paşserwayên ku di mersîyeyên Kurdî de hatine bikaranîn bikin û hejmar û rêjeya bikaranîna wan bidin.

3.1. Li Gorî Cih Cûreyên Serwayê

3.1.1. Serwaya Bêpaşserwa

Serwaya bêpaşserwa ew serwa ye ku di dawîya risteyan de cih digire. Her çî qas nivîsîna wan yek be jî maneya wan ne yek e. Di Kurdîya Soranî de ji vê serwayê re “serwaya kutayî” tê gotin.²⁷⁸

Nimûne:

Ji Mela Ebdulhadîyê Comanî²⁷⁹

Ey gelî ehlê welat ey gelî ehlê îman
Afatek çî bû li me qeş kes nedî dewra zeman
Ax ji qelb kûr dinalim her zeman û hîn û an
Çî xesaret çî zirarek bû li me şed el eman (1)

Ji Mela Ruşdî Efendî²⁸⁰

Îro heta ser û pa canê me girtî agir
Lewra ku Quţbê Şorî ji darê fena cuda kir (1)

Tîpên ku li jorê bi rengê reş hatine nîşandan her çî qas dengên mîna hev bin jî ji ber ku maneya wan ne yek e, jê re serwayê bêpaşserwa tê gotin. Di wan beyt û bendên ku li jorê wek

²⁷⁶ Adak, *h.b.*, 2014b, 395.

²⁷⁷ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Adak, *h.b.*, 2014b, r.395-396.


²⁷⁸ *H.b.*, 2014b, r.395.

²⁷⁹ Abdurrahman Adak, *Siirt Şırnak Silvan ve Lice Şairleri*, Mêrdîn 2012d, Metna wordê, r. 109.

²⁸⁰ Lîceyî, *h.b.*, r.20.

mînak hatin dayîn de bi qertafa *-an* ku di dawîya pênc risteyan de û bi qertafa *-ir* ku hatiye dawîya du risteyan aheng û rîtmek di helbestê de saz kiriye. Mînakên bi vî rengî di mersîyeyên Kurdî de gelek zêde hatine bikaranîn. Ji 183 mersîyeyên ku hatin berhevkerin tevde 98 mersîye bi serwaya bêpaşserwa hatine nivîsîn. Ji van 98 mersîyeyan; 40 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê, 23 mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe'ê, 9 mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmesê, 13 mersîye bi teşeya nezmê ya mesnewîyê, 7 mersîye bi teşeya nezmê ya xezelê, 1 mersîye bi teşeya nezmê ya museddesê, 5 mersîye bi teşeya nezmê ya terci'bendê û 2 mersîye bi teşeya nezmê ya musellesê hatine nivîsîn.

Rêjeya bikaranîna bêpaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafîk wisa ye:



Grafîk 5: Rêjeya bikaranîna bêpaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de

3.1.2. Serwaya Bipaşserwa

Di van cureyên serwayan de paşserwa û berî wê jî serwa di dawîya misrayan de cih digire.²⁸¹ Ew herf an jî bêjeyên ku serwaya bipaşserwa pêk tînin tê guhartin. Lewra carinan dibe ku serwaya bi paşserwa jî serwaya ku ji herfekê pêk tê û bi paşserwaya ku bes daçek û kelîmeyekê pêk tê hatibe çêkirin. Carinan jî ev hejmar tê guhartin. Di her halî de bi serwaya bipaşserwa şa'ir him ritmek û him jî ahengekê dide helbesta xwe. Ji bilî vê yekê jî dîsa şa'ir dixwaze balan bikşîne li ser wê qedr û qiymeta ku ew dide wî kesê ew jê hez dike û wefat kiriye. Wek mînak di mersîyeya ku ji teref Fehmî Begê Pêçarî ve li ser Hz. Huseyîn hatiye nivîsîn û li jêrê beyteke wê hatiye dayîn de, Pêçarî tam 16 caran di dawîya risteya duyem a her beytekê de serî li serwaya bi paşserwa daye. Pêçarî bi vê yekê him ahengeke xweşseda û xweşreng daye helbesta xwe û him jî tamamê balan kişandiye li ser Hz. Huseyînê ku kirdeyê mersîyeyê bi xwe ye.

Nimûne:

Ji Fehmî Begê Pêçarî²⁸²

Rewneqê fushetserayê Muştefayî ya Huseyn

Werdê der gulşennewayê dilkulayî ya Huseyn (1)

Me li jêrê ji mersîyeya ku ji teref Axayokê Bêdarî ve li ser her du lawên xwe hatiye nivîsîn bendek wek mînak da. Weke ku di dawîya her pênc risteyên benda ewil a mersîyeyê de tê dîtin her 5 riste di nav xwe de bi serwa ne û ev yek bi saxîya *-an kirim*'a ku hatiye dawîya risteyan hatiye çêkirin. Ev serwaya *-an kirim* di dawîya her risteyeke dawî ya her benda mersîyeyê de tê dubarekirin. Helbestvan bi vê yekê him ahengek di tamamê mersîyeya xwe de saz kiriye û him jî balan kişandiye li ser êş û elema ku ew ji ber wefata her du lawên xwe dikşîne.

Ji Axoyokê Bêdarî²⁸³

Şed mixabin vê cewabê ez ji dil nal**an kirim**

Û taqet û qûwet nema min belkî ez bê**an kirim**

Leşkerê derdan geha min ji 'eqlî tal**an kirim**

²⁸¹ Adak, *h.b.*, 2014b, r.396.

²⁸² Demir, *h.b.*, r.173.


²⁸³ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

Min nema qeṭ xew bi carek bêser û saman **kirim**

Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan **kirim** (1)

Hat tespîtkirin ji 183 mersîyeyên ku hatin berhevkirin tevde 47 mersîye bi serwaya bipaşserwa hatine nivîsîn. Ji van 47 mersîyeyan; 30 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmesê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe'ê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya terci'bendê, 4 mersîye bi teşeya nezmê ya xezelê, 1 mersîye bi teşeya nezmê ya terkîbbendê û 3 mersîye bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatine nivîsîn. Me li jêrê rêjeya bikaranîna vê bipaşserwayê wek grafîk nîşan da.

Rêjeya bikaranîna bipaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafîk wisa ye




Grafîk 6 : Rêjeya bikaranîna bipaşserwayê di teşeyên helbestên mersîyeyî de

Ji ber ku bi serwaya bêpaşserwa ji şa'ir re rihettir û hêsantir tê şa'ir zêdetir serwaya bipaşserwa di nivîsîna mersîyeyan de tercih kirine. Lewra weke ku di grafîka 5an de tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde 98 mersîye bi serwaya bêpaşserwa hatine nivîsîn. Ji van 98 mersîyeyên bêpaşserwa bi tevahî 40 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya bikaranîna wê ji % 39 e. Her wisa di grafîka 6an de jî tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde ji 47 mersîye bi serwaya bipaşserwa hatine nivîsîn.

Ji van 47 mersîyeyên bipaşserwa bi tevahî 30 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya wê jî ji % 64 e. Li gor van rêjeyan em dikarin bibêjin di cûreyên serwayê yê “*Li Gorî Cih Cûreyên Serwayê*” de teşeya nezmê ya ku di wan de herî zêde cûreyên serwayê hatiye bikaranîn qesîde ye.

Li gorî teşeyên nezmê daneyên bikaranîna bipaşserwa û bêpaşserwayê di helbestên mersîyeyî de wek grafîk wisa ye:



Grafîk 7 :Li gorî teşeyên nezmê daneyên bikaranîna bipaşserwa û bêpaşserwayê di helbestên mersîyeyî de

3.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cûreyên Serwayê

Çawa ku bi wan cûreyên serwayê yên li gorî cih di mersîyeyan de ahengek tê derxistin holê bi heman awayî bi van serwayên ku li gorî hevbeşîya dengan çêdibin jî di mersîyeyan de ahengek tê derxistin holê. Ev cûreyên serwayê tev dîsa di dawîya risteyan de cihê xwe digirin û ahenga ku ji destpêkê ve hatiye destpêkirin heta dawîya mersîyeyê didomînin. Ev cûreyên serwayê ji ber ku li ser hinek esasan tên sazîkirin bikaranîna wan li gor wan cûreyên serwayê yên li gorî cih zehmettir e. Ji ber vê yekê di nivîsîna 183 mersîyeyên Kurdî de hat dîtin bes bi

tevahî 112 car serî li wan cureyên serwayê yên li gorî hevbeşîya dengan hatiye dayîn. Lê ev bikaranîn di wan cureyên serwayê yên li gorî cih de 145 e.

3.2.1. Serwaya Mucерred

Ev serwa tenê ji dubarekirina herfa rewîyê pêk tê. Di vê serwayê de herfa rewîyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye. Wekî; kef, ser, seher û hwd.²⁸⁴

Nimûne:

Ji Şêx Ehmedê Kor²⁸⁵

Dilberan dayîm denalim, dembedem şam û seher
Carê napirsî le hâlim, çaw 'uqabî xoş xeber (1)

Ji Şêx 'Eskerî²⁸⁶

Li min dîse xuya kir mişlê Deştê Kerbelayê gem
Qedem wextê hilanî Kerbelayî ez cihan der dem (1)


Di mersîyeyên ku hatin berhevkerin de hat dîtin; 24 qesîde, 13 murebbe', 9 muxemmes, 6 xezel, 6 mesnewî û 1 tercî' bend bi tevahî di 59 mersîyeyan de cureya serwaya mucerred hatiye bikaranîn.

Rêjeya bikaranîna serwaya mucerred ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafîk wisa ye:

²⁸⁴ Adak, *h.b.*, 2014b, r. 397.

²⁸⁵ Şêx Ehmedê Kor, *Dîwan*, <https://books.vejin.net/nk/text/26370> (Jêgirtin: 22.01.2023. Seat:21:21.)

²⁸⁶ Eskerî, *h.b.*, r.54.



Grafîk 8: Rêjeya bikaranîna serwaya mucerred ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de

3.2.2. Serwaya Muqeyyed

Serwaya muqeyyed, berîya herfa rewîyê dubarekirina herfên hemcins ên bêhereke ne. Wekî; derd, merd reng û hwd.²⁸⁷

Nimûne:

Ji Şêx Meczûb²⁸⁸

Ji îşaret bi şefawet didirim neğmeê çeng

Me ji dîwanê se'adet dixurim bade û beng (1)

Ji Şêx Îsmetullahê Karazî²⁸⁹

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehd e

Şerab û abê rummanî mu'etţer misk û mawerd e

Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe' û perd e (1)


²⁸⁷ Adak, *h.b.*, 2014b, r. 398

²⁸⁸ Mesut Arslan, *Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme)*, T.C. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Teza Doktorayê ya neçapkirî, Diyarbakir 2021, r. 369.

²⁸⁹ Karak, *h.b.*, 2020a, r.269.

Di mersîyeyên li ber dest de hat tespîtîkirin; 3 qesîde û 1 muselles bi tevahî di 4 mersîyeyan de cureya serwaya muqeyyed hatiye bikaranîn.

Rêjeya bikaranîna serwaya muqeyyed ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafîk wisa ye:



Grafîk 9: Rêjeya bikaranîna serwaya muqeyyed ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de

3.2.3. Serwaya Murdef

Serwaya murdef ew serwa ye ku di nav xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. “Elîf”, “waw” û “yê” herfên rîdfê tên qebûlîkirin. Eger ji van herfan yek bêyî ku herekeyekê stendibe, berîya herfa rewîyê di serwayê de bê dubarekirin, ev dibe serwaya murdef. Wekî; bihar, şîkar, û hwd.²⁹⁰

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend²⁹¹

Hemd û medhe şukr û nî’met laîqî Rebbê mubîn

Bo çi şola wî bi hikmet heskirî em şakirîn (1)

²⁹⁰ Adak, *h.b.*, 2014b, r. 397.


²⁹¹ Nalbend, *h.b.*, r.28.

Ji Mela Zahirê Tendûrekî²⁹²

Ah û eyyamê di xoş çûn me nedî 'alî cenab
Şahê Serhed ba heşem çû ne suradiq ne qubab (1)

Di encama lêkolîna ku hat kirin de derket holê; 24 qesîde, 13 murebbe', 9 muxemmes, 6 mesnewî, 6 xezel, 1 tercî'bend bi tevahî di 59 mersîyeyan de cureya serwaya murdef hatiye bikaranîn.

Rêjeya bikaranîna serwaya murdef a di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafik wisa ye:




Grafik 10: Rêjeya bikaranîna serwaya muqeyyed a di teşeyên helbestên mersîyeyî de

Weke ku di grafika 8an de tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên li ber dest de tevde 59 mersîye bi serwaya mucerred hatine nivîsîn. Ji van 59 mersîyeyên bi serwaya mucerred bi tevahî 24 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya bikaranîna wê ji % 41 e. Her wisa di grafika 9an de jî tê dîtin di nivîsîna heman mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde 4 mersîye bi serwaya muqeyyed hatine nivîsîn. Ji van 4 mersîyeyên bi serwaya muqeyyed bi tevahî 3 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya wê jî ji % 74 e. Di grafika

²⁹² Tendûrekî, *h.b.*, r.33.

10an de jî tê dîtin dîsa di nivîsîna heman mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde ji 59 mersîye bi serwaya murdef hatine nivîsîn. Ji van 59 mersîyeyên bi serwaya murdef bi tevahî 24 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya wê jî ji % 41 e. Li gor van rêjeyan em dikarin bibêjin di cûreyên serwayê yê “*Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cûreyên Serwayê*” de teşeya nezmê ya ku di wan de herî zêde cûreyên serwayê hatiye bikaranîn qesîde ye.

Bikaranîna cûreyên serwayê ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek tablo wisa ye:



Grafîk 11 : Bikaranîna cûreyên serwayê ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de

4. Paşserwa(Redîf)

Piştî serwayê û di dawiya misreyan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa(redîf) tê gotin.²⁹³ Bi gotineke din redîf, ew qertaf, qertaf û bêje yan jî kombêje, an jî tenê bêje yan kombêjeyên ku li ser şewazekî di dawiya riste an jî malikan de tene dúbarekirin e.²⁹⁴ Li gorî

²⁹³ Adak, *h.b.*, 2014b, r.399.

²⁹⁴ Önder Beyter, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî*, Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yê li Tirkiyeyê, Mêrdîn 2012, r. 71.

tiştên ku tên dubarekirin sê cur paşserwa hene. Berî ku em derbasî wan cureyên paşserwayê bibin em dixwazin hinekî qala ehemmiyeta paşserwayan a ji bo helbestê bikin.

Çawa yek ji wan tiştên ku di edebiyatê de metnên şî'iran ji metnên pexşanê cûda dike û wateyeke xweş lê bar dike serwa be ya din jî paşserwa ango redîf bi xwe ye. Şa'ir bi mebesta ku pê balan bikşînin li ser ahenga di helbestê de heye vê yekê bi kar tînin. Ji ber ku paşserwa ango redîf di dawîya risteyan de tê bikaranîn ji teref şa'iran ve gelek maneyên cuda li wan tê barkirin. Bi vê yekê şa'ir digel sazkirina aheng û rîtmê balkêş dixwaze bala guhdarvan bikşîne li ser xwe. Dema ew helbesta ku hatiye nivîsîn ji hêla cureyê ve mersîye be ev yek zêdetir dibe xwedî ehemmiyet. Lewra mersîyenûs bi van paşserwayan armanc dike ku xwîner an jî guhdarvan bi êş û elema wî bihisin, êşa ku ew dikşîne tahm bikin û qedr û qiymeta wî kesê mirî baş fam bikin. Ji ber vê yekê bikaranîna paşserwayê di mersîyeyên Kurdî de xwedî cihêkî taybet e. Em ê di vê beşê de cureyên wan paşserwayên ku di 183 mersîyeyên Kurdî de hatine bikaranîn binirxînin.

4.1.Paşserwayên Qertafi

Cureya ewil a paşserwayê, paşserwaya qertafi ye. Weke ku ji navê wê jî diyar dibe di vê cureyê paşserwayê de tiştê/ên ku tên tekrarkirin bes ji qertafan pêk tên. Ev cûreya paşserwayê ya ku bes ji qertafê pêk tê û tê dawîya risteyên mersîyeyan melodî, rîtm û ahengeke xweş dide mersîyeyê.

Nimûne:

Ji Şêx Hadîyê Qewmanî²⁹⁵

Ji nû îro birîndar im li ku ye şêxê meydanê
Ji derdê wî elemdar im tîbîbê pîrê meyxaanê (1)

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî²⁹⁶

Hewar e hey hewar e min ji vê qêrîn û geygayê
Nema min quwwet û taqat ji hicra wê dilarayê (1)

²⁹⁵ Qewmanî, *h.b.*, r.40.

²⁹⁶ Cihan Turan, *Dîwana Mela 'Ebdulfettahê Hezroyî-Metn û Vekolîn*, Weş. Banga Heq, İstanbul 2022, r.308.

Di mersîyeyên Kurdî yê ku li ser wan xebat hat kirin de hat tespîtkirin paşserwaya qertafî di 41 mersîyeyan de hatiye bikaranîn. Ji van paşserwayên qertafî ya ku herî zêde hatiye bikaranîn bi 23 caran “-ê” û bi 6 caran jî ya “-î”yê ye.

Paşserwayên qertafî yê di mersîyeyên ku hatin berhevkirin de wek tablo wisa ne:

-ê ²⁹⁷	-yê ³⁰⁸
-ê ²⁹⁸	-ye ³⁰⁹
-ê ²⁹⁹	-î ³¹⁰
-ê ³⁰⁰	-ne ³¹¹
-ê ³⁰¹	-e ³¹²
-ê ³⁰²	-im ³¹³
-ê ³⁰³	-î ³¹⁴
-ye ³⁰⁴	-en ³¹⁵
-ê ³⁰⁵	-yê ³¹⁶
-ê ³⁰⁶	-ê ³¹⁷
-ê ³⁰⁷	

²⁹⁷ Sadînî, *h.b.*, 2014a, r.139.

²⁹⁸ Seydayê Tîrêj, *Dîwan(Xelat-Zozan-Cûdî)*, Weş. Peywend, İstanbul 2014, r.529.

²⁹⁹ Adak, *h.b.*, 2022e, r. 241.

³⁰⁰ Liceyî, *h.b.*, r.182.

³⁰¹ Zinar, *h.b.*, 1991a,, r.264.

³⁰² Hezanî, *h.b.*, r.45.

³⁰³ Vamıkıddin Aydın, *Kasideler ve 19 Risale*, yy., 1999, r. 66(Cihê û dîroka çapê tune ye)

³⁰⁴ Tendûrekî, *h.b.*, r.247.

³⁰⁵ Qewmanî, *h.b.*, r.40.

³⁰⁶ Tendûrekî, *h.b.*, 271.

³⁰⁷ *H.b.*, r.287.

³⁰⁸ *H.b.*, 297.

³⁰⁹Rojname Evro, h. 2150, s. 16.07.2017, r.13.

³¹⁰ Nalbend, *h.b.*, r.17.

³¹¹ *H.b.*, r.35.

³¹² *H.b.*, r.38.

³¹³ *H.b.*, r. 58

³¹⁴ M. Zahir Ertekin, *Du Mersiyeyên Nû Li Cîhana Edeba Klasîk a Kurdî Zêde Bû*, Kovara Nûbihar, s.2022, h.160, r.13.

³¹⁵ Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî, *Dîwana Fethî*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012, r.129.

³¹⁶ Turan, *h.b.*, r.308.

³¹⁷ Findikî, *Dîwan*, r.275.

-am ³¹⁸	-î ³²⁸
-me ³¹⁹	-ê ³²⁹
-e ³²⁰	-ê ³³⁰
-ê ³²¹	-î ³³¹
-ê ³²²	-ê ³³²
-ê ³²³	-ê ³³³
-ê ³²⁴	-în ³³⁴
-e ³²⁵	-im ³³⁵
-da ³²⁶	-ê ³³⁶
-ê ³²⁷	-î ³³⁷

Di encama lêkolîna hat kirin de derket holê ku di mersîyeyên hatin berhevkirin de 21 qesîde, 9 murebbe³, 5 muxemmes, 2 tercî⁴bend, 2 xezel, 1 muselles û 1 terkîbbend bi tevahî 41 mersîye paşserwaya wan di halê qertafê de ye.

Rêjeya bikaranîna paşserwaya qertafî ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafikê wisa ye:

³¹⁸ Hezroyî, *h.b.*, r.135.

³¹⁹ Turan, *h.b.*, r.269.

³²⁰ Cegerxwîn, *Ji Min Dil Bir Bi Carek*, Weş. Lîs, Ankara 2018, c.II, r.219.

³²¹ Mela Sidîq, *"Cerg û dilê min kir birîn"*, ev mersîyeya ji destxeta Mela Ehmed Yalar a bêçap û bêreqem hat girtin.

³²² Amedî, *h.b.*, 2004b, r.18.

³²³ Karak, *h.b.*, 2020a, r.264.

³²⁴ *H.b.*, r.284.

³²⁵ *H.b.*, r.269.

³²⁶ Tendûrekî, *h.b.*, r.21.

³²⁷ Zinar, *h.b.*, 1991a, r.292.

³²⁸ Demir, *h.b.*, r.216.

³²⁹ *H.b.*, r.203.

³³⁰ Aydın, *h.b.* r. 154.

³³¹ Adak, *h.b.*, 2019a, r.144.

³³² Hanefî Taşkın, *Mela Hesênê Kaçkarî û Mersîyeyên wî yên li ser Şêx Maşûq*, Kovara Nûbiharê, Payîz 2017, h.141, r.92.


³³³ Baqûstanî, *h.b.* r.94.

³³⁴ *H.b.*, r.98.

³³⁵ *H.b.*, r.78.

³³⁶ Tîrêj, *h.b.*, r.529.

³³⁷ *H.b.*, r.524.



Grafîk 12: Rêjeya bikaranîna paşserwaya qertafî ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de

4.2. Paşserwaya ku di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan de ne

Di vê cureyê paşserwayê de tiştê/ên ku tên tekrarkirin di halê qertaf û bêje an jî di halê kombêjeyan de ne. Di 11 mersîyên Kurdî yên li ber destê me de mersîyenûs vê cureya paşserwayê bi kar anîne. Dema em li wan mersîyeyên ku bi vê cureya paşserwayê hatine nivîsîn dinêrin em dibînin digel ahenga ku di mersîyeyê de hatiye saz kirin mersîyenûs dixwaze qala rewşeke ku ew dixwaze bê hînbûn an jî dixwaze balan bikşîne li ser yekî ku ew dixwaze bê hînbûn. Wek mînak, Mela Ebdulfettahê Hezroyî di mersîyeya xwe ya ku nivîsiye de û li jêrê wek mînak bendek jê hatiye dayîn de dixwaze bala xwîner û guhdarvanan bikşîne li ser şîn û girîn her wisa huzn û matema ku tê girtin. Ew vê yekê bi paşserwaya “-ê hey hewar” a ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ye dike. Dîsa di mînaka ku piştî ya Hezroyî hatiye dayîn de jî Pêçarî jî dixwaze ew kesê ku di nezera wî de xwedîyê qedr û qiymeteke bilind û zêde ye bê nasîn. Pêçarî vê yekê bi paşserwaya “-yî ya Huseyn” a ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ye dike.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî³³⁸

Werne vê şîn û girînê hey hewar

Ûzûn û şîna nazenînê hey hewar (1)

Ji Fehmî Begê Pêçarî³³⁹

Rewneqê fushetserayê Muştefa yî ya Huseyn

Werdê der gulşennewayê dilkula yî ya Huseyn (1)

Paşserwayên di Halê Qertaf û Bêje an Kombêjeyan a di mersîyeyan de wisa ne:

-ew e³⁴⁰

-e îro³⁴¹

-dar im³⁴²

-î şud³⁴³

-î bû³⁴⁴

-ê hey hewar³⁴⁵

-di min³⁴⁶

-e dil³⁴⁷

-ê min³⁴⁸

-li kû ye?³⁴⁹

-yî ya Huseyn³⁵⁰

-ji min³⁵¹

-e dil³⁵²

³³⁸ Hezroyî, *h.b.*, r.116.

³³⁹ Demir, *h.b.*, r.173.

³⁴⁰ *Dîwana Şêx Ehmedê Kor*, Saxkirin û Lêkolîn: Fener Rojbiyanî, Berhem hêj nehatiye çapkirin û lêkolîna li ser berdewam dike.

³⁴¹ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.191.

³⁴² Liceyî, *h.b.*, r.179.

³⁴³ Tendûrekî, *h.b.*, r.95.

³⁴⁴ *H.b.*, r.261.

³⁴⁵ Hezroyî, *h.b.*, r.116.

³⁴⁶ Findikî, *h.b.*, r.269.

³⁴⁷ Cegerxwîn, *Ronahî Li Pey Tarî Ye*, Weş. Lîs, Ankara 2018, c.1, r.67.

³⁴⁸ *H.b.*, r.175.

³⁴⁹ *H.b.*, r.60.


³⁵⁰ Demir, *h.b.*, r.173.

³⁵¹ Baqûstanî, *h.b.*, r.80.

³⁵² *H.b.*, r.101.

Li gorî daneyên ku derket holê; 9 qesîde, 3 xezel û 1 terci' bend bi tevahî 11 mersîye paşserwaya wan di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne.

Rêjeya bikaranîna paşserwaya di halê qertaf û bêje an kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafik wisa ye:



Grafîk 13: Rêjeya bikaranîna paşserwaya di halê qertaf û bêje an kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de

4.3.Paşserwaya ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne

Di vê cureyê paşserwayê de tiştê/ên ku tên tekrarkirin di halê bêje an jî di halê kombêjeyan de ne. Mersîyenûsên Kurd di nivîsîna mersîyeyên xwe de vê cureya paşserwayê bi kar anîne. Di encama xebata ku hat kirin de hat tespît kirin di 42 mersîyeyên Kurdî de ev cureya paşserwayê ji teref mersîyenûsan ve hatiye bikaranîn. Mersîyenûsên ku vê cureya paşserwayê ji bilî pê di helbestê de ahengekê saz bikin bi heman awayî ji bo êş û elema ku ew dikşînin bi derdorê bidin sehkirin, kesê ku miriye bidin îlankirin, ê ku rehmet kiriye xwedî çî wesfî ye bidin zanîn û ji bo gelek armancên din bi kar anîne. Weke ku di mînaka li jêrê hatiye dayîn de jî tê dîtin Pêçarî ji ber êş û elema ku ew ji ber wefata hezkirîyekê xwe dikşîne dinale. Pêçarî ji bo asta kişandina vê êş û elema pê re nîşan bide paşserwaya “*ah û enîn ah û enîn*” a ku di halê bêje an jî kombêjeyan de ye bi kar anîye.

Nimûne:

Ji Fehmî Begê Pêçari³⁵³

Dil kul kirim cewrê felek **ah û enîn ah û enîn**

Kan naxuyan çeşmê belek **ah û enîn ah û enîn** (1)

Paşserwayên di Halê Bêje an Kombêjeyan de wisa ne:

-Ka Padîşahê Serhedan? ³⁵⁴

-Kanê Muhemmed Mustefa³⁵⁵

-Wey dilê min wey dilo³⁵⁶

-Kan Mustefa Beg naxuyê³⁵⁷

- dê le 'umirim kem debê, ca çon dilim pir xem nebê? ³⁵⁸

-Te rehlet kir ji dunyae³⁵⁹

-gelo Xewsê şîrîn kanî³⁶⁰

-Kanê Cîhangirê cîhan³⁶¹

- sed heyf çû ji dinyayê³⁶²

- Şahê Resûlan³⁶³

-kirim³⁶⁴

³⁵³ Demir, *h.b.*, r.180.

³⁵⁴ Durre, *h.b.*, r.336.

³⁵⁵ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

³⁵⁶ Doskî, *h.b.*, 2022b, r.164.

³⁵⁷ Sedat Ulugana, *Di Kurdolojîyê de Keşfeke Nû: Xewsî û Dîwana Wî-Sedsala XVIII-*, Kovara Nûbiharê, İstanbul 2016, h.137, r.8.

³⁵⁸ Şêx Ehmedê Kor, "Şev dê li umurim kê mibe", Mersîyeya ku li ser mirinê bi xwe hatiye nivîsîn, <https://books.vejin.net/ck/text/26398>, (Jêgirtin: 10.04.2023 Seat: 00.13)

³⁵⁹ Celîlê Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Weş. ?, Wîne 2004, r.129.

³⁶⁰ Şêx Ebdurrahmanê Çoxreşî, "Qewî îro ze îf halim", Destxeta neçapkirî û bêreqem a Mehmet Firat.

³⁶¹ Weda'î, *Dîwan*, Vejandin:Seîd Dêreşî, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012, r.95.

³⁶² Ji ber ku kitêba Şêx Selîm Efendî çapa wê xelas bûbû û nehat peydakirin, me du beytên mersîyeya wî ji bernameya ku li ser vê linkê hat weşandin girt:

<https://www.youtube.com/watch?v=SFns7RbcVQc> (Dîroka Jêgirtinê: 20.04.2023, Seat: 13.32)

³⁶³ M. Zana Karak, *Bi Mexlasa "Feyzî" Du Helbestên Nû Yên Şêx Mistefayê Sîsî*, Kurdîname, j.5, Mijdar 2021b, r.70.

³⁶⁴ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

- çû neman³⁶⁵
 - allah³⁶⁶
 - te rihlet kir ji dunyaê³⁶⁷
 - Ew şeraba 'îş û noşê çû ji destê min ma serab³⁶⁸
 - wa firqeta wa hesreta³⁶⁹
 - 'eyş maye telx³⁷⁰
 -xilas³⁷¹
 -îro³⁷²
 -Seyda mededkarê te me³⁷³
 - Hey wax li min dînê mubîn³⁷⁴
 - xakê Kerbela³⁷⁵
 -gelo kan Hezretî Sanî³⁷⁶
 -Bi qurban bim bi qurban bim bi qurban³⁷⁷
 -Diya³⁷⁸
 -kanî murşid ka delîl³⁷⁹

³⁶⁵ Nalbend, *h.b.*, r.19

³⁶⁶ Mela Ezîzê Bidlîsî, *Dîwana Şeyda*, Nusxeya Destxetê, r.82

³⁶⁷ Hezanî, *h.b.*, r.45.

³⁶⁸ Mela Ebdurrahmanê Hezrowî, "*Hicreta sahib cemalî ey gelê yarê zebûn*", ev mersîyeya ji destxeta Mela Ehmed Yalar a bêçap û bêreçem hat girtin.

³⁶⁹ Aydın, *h.b.*, r.143.

³⁷⁰ Tendûrekî, *h.b.*, r.87.

³⁷¹ *H.b.*, r.163.

³⁷² *H.b.*, r.267.

³⁷³ Qewmanî, *h.b.*, r.56.

³⁷⁴ *H.b.*, r.37.

³⁷⁵ Şêx Mihemed Kerbelayî, *Dîwana Kerbelayî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Îstanbulê, İstanbul 1992, r.22.

³⁷⁶ Turan, *h.b.*, r.314.

³⁷⁷ Hezroyî, *h.b.* r.156.

³⁷⁸ Hanefî Taşkın, *Du şîrên li ser Şêx Muhammed Diyauddîn yên Mela Zubeyr û Mela Abid*, Kovara Nûbiharê, h.140, s.2017, r. 158.

³⁷⁹ Seyid Qedrî Haşimî, *Dîwana 'Îrfan, Edîsyon-Krîtîk*, amd. M. Nesîm Doru, Weş. Nûbihar, İstanbul 2016. r.86.

-gelo babê Şefîq kanî ?

- kir³⁸⁰

-Xurşîd³⁸¹

-Ax Kurdistanîm ka!³⁸²

- kir³⁸³

-ah û enîn ah û enîn³⁸⁴

-ez³⁸⁵

-bikim³⁸⁶

-gelek³⁸⁷

-Menderes³⁸⁸

-Menderes³⁸⁹

-Menderes³⁹⁰

-Leyla³⁹¹

-Bavê felek³⁹²

-Kemal³⁹³

³⁸⁰ Liceyî, *h.b.*, r.20.

³⁸¹ Cegerxwîn, *h.b.*, c.1, r.464.

³⁸² *H.b.*, r.97.

³⁸³ Zinar, *h.b.*, 1991a,, r.296.

³⁸⁴ Demir, *h.b.*, r.180.

³⁸⁵ Qedrîcan, *Tabûta Bixwîn*, Kovara Hawar, Weş. Belkî, İstanbul 2012, h.11, r.166.

³⁸⁶ Baqûstanî, *h.b.*, r.60.

³⁸⁷ *H.b.*, r.90.

³⁸⁸ Sedat Kardeş, *Muşlu Şair Nûrî'nin Adnan Menderes'e Yazdığı Kürtçe Mersiyeler*, Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, c.10, h.1, Hazîran 2021, r.11.

³⁸⁹ *H.b.*, r.12.

³⁹⁰ *H.b.*, r.13.


³⁹¹ Tîrêj, *h.b.*, r.131.

³⁹² *H.b.*,r.382.

³⁹³ *H.b.*, r.535.

Di 183 mersîyeyên ku hatin berhevkirin de 26 qesîde, 2 xezel û 12 murebbe û 2 muxemmes bi tevahî 42 mersîye paşserwaya wan di halê bêje an jî kombêjeyan de ne.

Rêjeya bikaranîna paşserwayan a di halê bêje an jî kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafikê wisa ye:




Grafîk 14: Rêjeya bikaranîna paşserwayan a di halê bêje an jî kombêjeyan a di teşeyên helbestên mersîyeyî de.

Weke ku di grafîka 12an de tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên hatin berhevkirin de tevde 41 mersîye bi paşserwayên qertafî hatine nivîsîn. Ji van 41 mersîyeyên bi paşserwayên qertafî bi tevahî 21 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya bikaranîna wê jî % 51 e. Her wisa di grafîka 13an de jî tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde jî 11 mersîye bi paşserwaya ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne hatine nivîsîn. Ji van 11 mersîyeyên bi paşserwaya ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne bi tevahî 9 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatine nivîsîn. Rêjeya wê jî % 69 e. Di grafîka 14an de jî tê dîtin di nivîsîna mersîyeyên ku hatin berhevkirin de tevde 42 mersîye bi paşserwaya ku di halê bêje an jî kombêjeyan de ne hatine nivîsîn. Ji van 42 mersîyeyên bi paşserwaya ku di halê bêje an jî kombêjeyan de hatine nivîsîn bi tevahî 26 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê


hatine nivîsîn. Rêjeya wê jî ji % 62 ye. Li gor van rêjeyên ku derketin holê em dikarin bibêjin ji teşeyên nezmê ya ku di wan de herî zêde cûreyên paşserwa/redîfê hatiye bikaranîn teşeya nezmê ya qesîdeyê ye.

Hejmara bikaranîna sê cureyên paşserwayê ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de wek grafik wisa ye:



Grafîk 15: Hejmara bikaranîna sê cureyên paşserwayê ya di teşeyên helbestên mersîyeyî de.

Rêjeya bikaranîn her sê cûreyên paşserwayan a di 183 mersîyeyên Kurdî de wek grafîk wisa ye:




Grafîk 16: Rêjeya bikaranîn her sê cûreyên paşserwayan(redîf) a di 183 mersîyeyan.

BEŞA SÊYEMÎN

HÛNERÊN EDEBÎ DI MERSÎYEYÊN KURDÎ DE

Ew tiştê ku helbesta helbestvan dixemlîne û maneyeke kûr didiyê hunerên edebî bi xwe ne. Helbestvanên ku serî li hunerên edebî didin bi wasitaya van huneran derd û kul, êş û elem, kêf û şahiyên xwe bi şiklekî tesîrdar dighijînin xwîneran. Şa'irên Kurd bi Kurdîya Kurmancî li ser wefata nas an jî hezkirîyekî xwe gelek mersîye nivîsîne. Mersîyenûs di van mersîyeyan de him ji bo xwîner û guhdarvanan têxin nava wê atmosfera şînê û tesîreke zêde li ser wan bihêlin û him jî ji bo gotinên xwe bixemlînin bi tevahî 3422 caran hûnerên edebî bi kar anîne. Me li jêrê hejmara wan hûnerên edebî yên ku di mersîyeyan de hatine bikaranîn yek bi yek destnîşan kir. Li gorî daneyên ku derketin holê di mersîyeyên ku Kurdî de hûnera edebî ya ku herî zêde hatiye bikaranîn pêşî hunera teşbîhê dûre jî bi dorê hunera îstîfham û tenasub e.

Reqema bikaranîna hunerên edebî yên di mersîyeyan de wek grafîk hatiye dayîn:



Grafîk 17: Reqema bikaranîna hunerên edebî yên di mersîyeyan de nîşan dide

Em ê di vê beşê de 183 mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn di çarçoveya hûnerên edebî de binirxînin û hejmar û rêjeya her hûnerê edebî ya di mersîyeyan de destnîşan bikin. Her wisa em ê di vê beşê de qala her hûnerê ku hatiye tespîtkirin di mersîyeyê de hatiye bikaranîn bikin û ji bo her yekî yek-du mînak bidin û wek encam rêjeya bikaranîna wê hûnerê ya li gorî wan hûnerên din destnîşan bikin.

1-Hûnerên Edebî yên bi Mecazê re Têkildar

1.1.Teşbîh

Kelîmeya teşbîhê kelîmeyeke ‘Erebî ye û tê maneya şibandin û şibînê. Teşbîh bi armanca şibandina tiştekî ya li tiştekî din tê kirin.³⁹⁴ Ji bo hunera teşbîhê derkeve holê divê hêmaneke qels û yeke bi qewet hebe û ya qels bi ya ji xwe qewîtir bê şibandin. Dema ku ev yek bê kirin hunera teşbîhê derdikeve holê. Di edebiyata Kurdî de şibandin exleb bi peyvên mîna; *weke, fena, nola, mîna, wek, şiphê, bi mislê* û hwd. tê kirin û şa‘ir dema ku dixwaze hestên xwe yên derheqê tiştek an kesekî de bîne ziman gelek caran serî li vê hûnerê edebî ya bi navê teşbîhê didin. Lêbelê dema ku mijar mersîye bi xwe be rêjeya bikaranîna vê hûnerê edebî zêdetir dibe. Lewra şa‘ir di mersîyeyan de exlebe him di beşa pesindayîn û şingirtinê de û him jî di beşa diakirin û sebixwestinê de serî li vê hûnerê didin. Şa‘ir dema ku vê hûnerê bi kar tînin di beşa pesindayînê de bi rêya vê hûnerê hewl didin qedr û qiymeta wî kesê mirî yan jî tiştê ku ew jê dûr ketiye bi xwendekaran bidin famkirin. Di beşa şingirtinê de jî şa‘ir dîsa gelek zêde serî li vê hûnerê didin. Ji vê yekê armanca wan ew ê ku ew wê asta êş û elema ku bi wan re peyda bûye diyar bikin. Ji bo vê yekê jî gelek teşbîhan dikin. Ji bilî beşa pesindayîn û şingirtinê her wisa dîsa di mersîyeyan de di beşên diakirin û sebixwestinê bi xwe de jî serî li hûnerê teşbîhê didin. Bi vê yekê kesê mersîyenûs ji alîyekî ve rê li ber xwe vedike, êş û elema ku kesê mirî jêre bûye sebeb tîne zimên û ji Xwedê lavayî dike. Ev lavayîkirin him di warê diakirin û him jî di warê sebixwestinê de xwe nîşan dide. Wek mînak; Fethîyê ku çend mersîyeyên wî hene û me di xebata xwe de cî daye wan, di muxemmesa li jêrê de êş û elem, renc û azara ku ew ji ber firaqa yarê dikşîne tîne zimên. Dema ku Fethî qala vê êş û elemê dike xweşikbûn û bedewbûna yarê dişbîne ‘*bulbulê şeyda*’ û ‘*gulek nazik*.’ Seyda bi van her du gotinan

³⁹⁴ Nusrettin Bolelli, *Belagat (Beyan-Me‘anî-Bedî‘ İlimleri: Arap Edebiyatı)*, İFAV Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı Yayınları, İstanbul 2017, r.35.

hunerê teşbîhê bi kar aniyê. Dîsa Melayê Mûsayê Mizî dema qala rewşa ku ew ji ber mirinê ketiyê navê dike gotina “*wekî gula melisî*” xwe dişbihîne gulekê.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî³⁹⁵

Ji firaqa te dikêşin gelekî eş û elem
Ji xiyala te ne mecrûh ji ser ta bi qedem
Her **wekî bulbulê şeyda** ne di gemxaneyê gem
Tu **gulek Nazik î** ey xwace di gulzarê irem
Ya tu rûh î û mucerred qefesa şubhê leşîn (5)

Ji Mela Mûsayê Mizî³⁹⁶

Sê carî birîndar bûme îsal di mehê da
Derba ku ewel hatî li nîva cegerê da
Şanî ku dihatî li umûma cesedê da
Şaliş ku dihatî bûme evdal di dinê da
Zer bûme ji eşê **wekî gula melisî** (2)

Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat tespîtkirin di mersîyeyên klasîk ên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de tevde 774 caran hûnera teşbîhê hatiye bikaranîn. Ji van hûnerên teşbîhê 251 heb bi daçekên şibandinê yê mîna “*wek, wekî, mislê, mîna, şibhê, şebîh, mîsal, manend*” û hwd. û 523 heb jî bi wan peyvên ku di wan de daçekên şibandinê tune ne, hatine kirin. Di mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin de hûnera ku herî zêde hatiye bikaranîn hûnera edebî ya teşbîhê ye û rêjeya bikaranîna vê hunera edebî ji % 23 ye.

³⁹⁵ Hezroyî, *h.b.*, r.152.

³⁹⁶ Zinar, *h.b.*, 1991a, r.264.

1.2.Îstiare

Yek ji ‘ilmên herî muhîm ê beyanê îstîare ye.³⁹⁷ Tişteki ji bilî navê xwe bi navê tişteki ku dişbihê bîr anîn e. Ji ber vê yekê îstîare him hunera mecazê ye him jî ya teşbîhê ye. Ji ber vê taybetiyê divê di îstîarê de ev wesf hebin: Divê peyv ji bilî wateya xwe ya rastî ji bo tişteki bûbe nav, divê ne mimkun be ku peyv di wateya xwe de bê bikaranîn û divê pêwîstiya qesda şibandinê hebe.³⁹⁸

Çawa ku ji pênaseyên ji jor jî tê famkirin ji bo hûnera edebî ya bi navê îstîare derkeve holê divê ew peyva ku pê hûnera edebî hatiye kirin di nav xwe de maneyeke mecazî bihewîne û ji maneya xwe ya rastî divê dûr bikeve. Dema ku ev yek bê kirin jî divê maneya rastî û ya mecazî ya peyvê ji hev qut nebe, bi gotineke din divê di navbera her duyan de pêwendîyek hebe.

Di navbera hûnera teşbîh û îstîareyê de têkilîyeke aşkere heye û îstî'are teşbîheke kinkirî ye³⁹⁹ yan jî kakilê teşbîhê bi xwe ye⁴⁰⁰. Lêbelê di hûnera teşbîhê de pêdivî bi hêmanên şibandî û pêşibandî heye û divê ji bo vê hûnerê her du hêman bi hev re bîn bikaranîn. Ev pêdivî di hûnera edebî ya îstîareyê de nikare bê tetbîqkirin û ji xwe ne lazim e jî. Ji van her du hêmanan bes bi hêmaneke tenê jî hûnera edebî ya îstîareyê dikare bê çêkirin.

Mersîyenûsên ku ji ber wefata kesekî êş û elemeke zêde û giran dikşînin dikarin bi çend gotinên ji rêzê derd û kulên xwe bînin zimên û vê yekê bi derdorê bide hesandin. Lê ew vê yekê nakin. Lewra ew dixwazin bi nivîsîna mersîyeyê yên li derdora wî fam bikin ka ew êş û elemeke bi çi rengî dikşîne. Ji ber vê yekê jî ew di mersîyeyên xwe yên ku dinivîsînin de serî li wan gotinên ji rêzê yên ku pê tesîr li ser guhdar û xwîneran nahêlin nadin; di şûna wan de gotinên ku ew karibin tesîreke zêde li ser xwîner an jî guhdarvanan bihêlin didin. Ew vê yekê bi hûnera edebî ya bi navê îstîareyê jî dikin. Ji vê yekê re ji mersîyeya ku Axayokê Bêdarî li ser lawên xwe nivîye mînakekê bidin.

³⁹⁷ Bolelli, *h.b.*, r.90.

³⁹⁸ Dilçin, *h.b.*, r. 412.

³⁹⁹ M. A. Yekta Saraç, *Klasîk Edebiyat Bilgisi*, Belagat, Weş. Gökkubbe, İstanbul 2010, r.118.

⁴⁰⁰ Perwîz Cihanî, *Mem û Zîn*, Weş. Nûbihar, Çapa Yekem, İstanbul 2010, r. 49.

Ji Axayokê Bêdarî⁴⁰¹

Her du rojan heq bi ser min ev muşîbet anîye
Sal hezar û şed û çil çûne ji hecra ummî ye
Mahê nîsanê ku roja reş li min bû şenbî ye
Lazim e her çî ku heq kit em bi wî bin raî ye
Lêk van derd û geman bê daniş û iz'an kirim (4)

Bêdarî di destpêka benda çarem a mersîyeya xwe de ji bo xebera wefata lawên xwe bide derdorê risteya “*Her du rojan heq bi ser min ev muşîbet anîye*” bi kar anîye. Weke ku di risteyê de tê dîtîn Bêdarî xebera wefata lawên xwe di mersîyeyê de bi gotinên mîna; lawên min mirin, wefat kirin, çûn rehma Xwedê û hwd. nayêne ziman. Di şûna wê de ji bo ku tesîreke zêde li ser xwînerên xwe bihêle qedr û qiymeta lawên xwe ya di nezera xwe de bide zanîn serî li hûnera îstîareyê dide. Em dizanin ku roj wek însanekî ne tiştêkî rûhber û xwedî fikr û ‘eql e. Ji ber vê yekê ne xwedî qabilîyet e ku tiştêkî bi serê kesekî de tiştêkî wek muşîbetê bîne. Şa‘ir di vê risteyê de zarokên xwe yê rehmetkirî şibandiye rojê û vê yekê jî bi wasitaya hûnera edebî ya îstîareyê kiriye.

Ji bo vê hûnera edebî em dikarin ji Fehmî Begê Pêçarî û Seydayê Tîrêj jî mînakên bidin. Di risteya “*Kewekî min di rewqa cigerê de bû firî*”(1)⁴⁰² ya di mersîyeya Fehmî Begê Pêçarî de jî ev hûner tê dîtîn. Şa‘ir ji bo xebera mirina qîza xwe ya bi navê Fikrîya bi derdorê bide hesandin û ji bo ku derdorê têxe bin tesîra xwe û asta kişandina êş û elema ku ew dikşîne bide famkirin qîza dişbihîne kewekî ku ji hêlîna xwe firê ketiye û nema vedigere hêlînê. Dîsa Seydayê Tîrêj di mersîyeya ku nivîsiye de gotina “*Ey şêrê welat, pilingê Berzan!*”(41)⁴⁰³ bi kar tîne. Ew şêr û pilingê ku ji malbata pîsîkan bi xwe ne di mersîyeya ku hatiye nivîsîn de ne xwedî maneya xwe ya rasteqîn in. Seydayê Tîrêj bi van peyvên Mela Mistefa Barzanî şibandiye van her du hêmanan û bi vî awayî serî li hûnera edebî ya îstîareyê daye.

⁴⁰¹ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

⁴⁰² Demir, *h.b.*, r.216.

⁴⁰³ Tîrêj, *h.b.*, r.135.

Mînakên bi vî rengî di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsandin de gelek zêde hene. Li gorî daneyên li ber dest di van mersîyeyên ku me li ser wan xebat kir de bi tevahî 135 caran mersîyenûsan serî li vê hûnerê dane. Rêjeya bikaranîna vê hûnerê li gorî wan hûnerên din ji % 4 e.

1.3. Kînaye

Di edebiyatê de dema gotineke ku dê bê du wateyan bi şiklekî ku mecazî bê fêmkirin, bê bikaranîn hunera kînaye yê derdikeve holê. Di kînaye yê de him wateya rastî him jî ya mecazî heye. Lêbelê wateya mecazî ji ya rastî xurttir e⁴⁰⁴ û kesê ku serî li vê hunerê dide peyvê ne di maneya rastî; di maneya mecazî de bi kar tîne.⁴⁰⁵

Di jiyana rojane de dema ku em diaxivin gelek caran di gotinên xwe de bi saxîya wan gotinên pêşîyan an jî biwêjan serî li hûnera edebî ya kînaye yê didin. Wek mînak dema ku em derheqê yekî ku qesîs e û naxweze tiştêkî xwe bi kesekî re parve bike de xeber didin em dibêjin “Filan keso dest girtî ye.” Yan jî dema ku em qala yekî ciwamêr û ji mal û milkên xwe dide kesên li dora xwe dikin em ji bo wî jî dibêjin “Filan keso yekî dest vekirî ye.” Di van her du biwêjan de jî peyvên “destgirtî” û “destvekirî” him di wateya rastî û him jî di wateya mecazî de dikare bî bikaranîn. Lêbelê di gotinê de meqseda me ji bo her du peyvên jî wateya dûr ango mecazî ye.

Di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de jî ev huner ji teref mersîyenûsan ve hatine bikaranîn. Mersîyenûs dema ku vê hûnerê bi kar tînin di gotinên xwe de her tim qesda wateya dûr ango mecazî dikin; lêbelê peyva ku bi kar tînin ji bilî wateya mecazî xwedîyê wateya rastî ye jî. Wek mînak, Mela Ehmedê Nalbend di mersîyeya ku li ser mirina lawê xwe Muhemmed nivîsîye de ji bo êş û elema dikşîne bîne zimên gotina “*me şikest pişt*” bi kar anîye. Meriv di vê risteyê de gotina “*me şikest pişt*” him dikarî di maneya rastî û him jî di maneya mecazî de jî fam bike. Lêbelê di vir qesda mersîyenûs zêdetir maneya mecazî bi xwe ye. Şa‘ir bi vê gotinê destnîşan dike ji ber wefata Muhemmedê lawê wî, êdî hal di wî de nemaye, çok lê şikîyane û ew bêçare û perîşan maye.

Nimûne:

⁴⁰⁴ Pala, *h.b.*, r. 276.

⁴⁰⁵ Bolelli, *h.b.*, r.171.

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁰⁶

Şed car şukir Ellah çî kir berxê mi bir şev hat û mir
Me **şikest pişt** quwwet çû rişt ev tişt û mişt pûçin tamam (1)

Her wisa mersîyenûs dema dixwazin bêçaretîya xwe ya ji ber êş û elema ku dikşînin bînin zimên biwêja “**Dest li ber nayête hildan**” û ji bo xebera mirina kesê jê hezkirî jî bide biwêja “**pişt da dinê**” bi kar anîne. Bi van gotinên ku hatin dayîn mersîyenûs di bend û beytên li jêrê de serî li hunera kînayeyê dane û pê qesda wateya mecazî kirine. Mersîyenûs vê yekê jî bi armanceke mezin dikan. Lewra ew êşa ku ew dikşînin di nezera wan de ne êş û elemeke ji rêzê ye û zû bi zû jî dawî lê nayê. Ji ber vê yekê ew dixwazin hinek kes bibin hevderên wan û ji derd û elemên wan re bibin şîrîk.

Nimûne:

Ji Mela Zahirê Tendûrekî⁴⁰⁷

Da em nekin qeṭ‘a dilan ji gulşenan û hem gulan
Nalîn biken wek bilbilan lê j’ber çûna zulf sunbulan
Pişt da dinê şeyx û melan lewra bi dil me fetîlan
Mirin bi nîz me qewîlan derdê bi zehrê ‘emilan
Sist kir li şec‘anan milan der exzê ruḥ xûdwekîlan
Dayî me rûḥ ji ḥubba dilan lewra di mewtê bûne şecî‘ (5)

Seydayê Tîrêj⁴⁰⁸

Ey birader mirina malikxerab bêbext û dîn
Dest li ber nayête hildan tê me ew her dem bi kîn (13)

⁴⁰⁶ Nalbend, *h.b.*, r.13.

⁴⁰⁷ Tendûrekî, *h.b.*, r.207.

⁴⁰⁸ Tîrêj, *h.b.*, r. 368.

Wek encam, mersîyenûsên Kurd dema ku mersîyeyên xwe nivîsîne û tê de qala êş û elemên ku ew ji ber wefata yekî dikşînin dikin gelek caran serî li vê hûnera edebî dane. Bi vê yekê xwestina bi xwîner û guhdarvanên xwe re bidin famkirin ew di nav atmosfer û psîkolojîyeke çawa de ne. Di van mersîyeyên ku li ser wan xebat kirin de mersîyenûsan bi tevahî 251 caran serî li vê hûnerê dane. Rêjeya bikaranîna vê hûnerê li gorî wan hûnerên din ên edebî ji % 7 e.

1.4.Mecaza Mursel

Dema peyvek bêyî ku qesda şibandinê û li derveyî maneya xwe ya rastî de bê bikaranîn hûnera mecaza mursel derdike holê. Di vê hûnerê de peyv li derveyî maneya xwe ya rastî de tê bikaranîn. Di vê bikaranînê de qesda maneya mecazî tê kirin, lêbelê vêca ev yek ne bi rêya şibandinê tê kirin. Ev taybetî mecaza mursel ji hunera îstîareyê cuda dike. Dema ku hunera mecaza mursel tê bikaranîn di navbera peyvên de têkilîyek nayê danîn.⁴⁰⁹ Ev hûnera edebî di biwêjan de gelek zêde tê dîtin.⁴¹⁰

Ev hûnera edebî di mersîyeyên Kurdî de ji teref mersîyenûsan ve hatiye bikaranîn. Mersîyenûs bi vê hûnerê balan dikşînin li ser halê xwe û li ser wê êş elema ku ew dikşînin.

Nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁴¹¹

Dilo rabe bi qehr û cengebazî

Li nêv tirban bikî qirîn û gazî(34)

Seydayê Tîrêj di mersîyeya xwe ya ku li ser Şêxmûsê kurê Se'îdoyê Gaso nivîsîye de ji ber tesîra mirina wî bi gotina "*Dilo rabe bi qehr û cengebazî*" bang li "*dilê*" xwe dike. Lê tê dizanîn ku "*dil*" 'uzvekî însan e, lê ne dangan seh dike û ne jî tiştan fam dike. Mersîyenûs di rastîyê de bi kelîmeya "*dil*" bang li xwe dike. Weke ku tê dîtin mersîyenûs di vir de peyva dil li derveyî maneya wê de bi şiklê mecazî bi kar

⁴⁰⁹ Pala, *h.b.*, r. 448.

⁴¹⁰ Dilçin, *h.b.*, r. 414.

⁴¹¹ Tîrêj, *h.b.*, r. 142.

anîye û di vê bikaranînê de şibandin bi xwe jî tune ye. Ji ber vê yekê hunera mecaza mursel derketiye holê.

Nimûne:

Ji Feqîyê Teyran⁴¹²

Ey felekê bê î'tibar min bi te nîn in qet çu car
Nê te gelek mehbûb veşar paşî ewan xal û xetê (9)

Feqîyê Teyran di mersîyeya ku nivîsîye de sîtemê ji felekê re nîşan dide û felekê wek sebeba mirina kesê ku ew jê hez dike dibîne. Teyran dema ku vê yekê dike destnîşan dike nabêje te ew kuştîye, te ew “*veşar*”tîye. Feqî bi vê şêwazê di şûna peyva mirinê de rûyê sar a mirinê bi gotina veşartinê diyar dike. Di vê bikaranînê de veşartin bêyî şibandinê ji maneya xwe ya rastî dûr hatiye xistin û di maneya kuştinê de hatiye bikaranîn. Feqî bi vî awayî serî li hûnera edebî ya mecazi murselê dide û hewl dide wê êş û elemê bide hesandin.

“Mîm û Hê” şa'irkî pak e herkesê b' ruħ bû ji makê
Hemîyan dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê (24)

Dîsa Feqîyê Teyran di vê malika ku li jor wek mînak hatiye dayîn de serî li hunera mecazi murselê daye. Teyran di risteya duyem a malikê de peyva “*fena ke*” bi kar anîye. Ev bikaranîna di vê risteyê de ne di wateya tunebûnê de ye. Peyv ji wateya xwe ya rastî dûr ketiye û di wateya mirinê de hatiye bikaranîn. Bi bî awayî peyva fena ji wateya xwe ya eslî dûr ketiye û di wateya mecazî de hatiye bikaranîn. Bi vî awayî hunera mecazi mursel derketiye holê.

Hûnerên edebî yên mecazi murselê bi vî rengî di mersîyeyên Kurdî bi şiklekî cihêreng cih girtine. Hat tespîtkirin di mersîyeyên Kurdî de ji teref mersûyenûsên Kurd ve ev hûnera mecazi murselê 164 caran hatiye bikaranîn. Rêjeya bikaranîna vê hunera edebî li gor wan hûnerên din ji % 5 e.

⁴¹² Sadîni, *h.b.*, 2013a, r.139.

1.5. Întaq/Teşxîs

Di edebiyatê de heywan û tiştên necandar mîna însanan diaxivin tîna nîşandayîn ku ji vî hunerê re teşxîs/întaq tê gotin. Teşxîs ji bo hinek tiştên razber û eşyayên ku axavtîna wan tune ye; întaq jî tenê ji bo heyberên ku axavtîna wan tune ye tê bikaranîn. Di her întaqê de teşxîs heye lê di her teşxîsê de întaq tune ye.⁴¹³

Di mersîyeyên kurdî de kesê ku her tim şîna digire, rodikan dibarîne, eş û elemê dikşîne, kezeb li xwe diperitîne mersîyenûs bi xwe ye yan jî ew kesên li derdora wî ne. Lêbelê di hinek mersîyeyên Kurdî de tê dîtîn mersîyenûs yan jî ber ku êdî taqeta kişandina eş û elemê pêre namîne yan jî ji ber ku dixwaze ji xeynî însanan temamê tiştên rûhber û bêrûh tevî vî eş û elemê bike serî li hûnera edebî ya bi navê întaqê didin. Mersîyenûs bi vî awayî parîkek be jî him barê li ser milên xwe sivik dike û him jî li derdora xwe dide nîşandan ew êşa ku pêre peyda bûye û tê kişandin bes wî xemgîn nake, ji bilî wî tiştên rûhber û bêrûh jî xemgîn dike.

Nimûne

Ji Mela Elîyê Baqûstanî⁴¹⁴

Dil û can im hingê disot, qelb û ceger vêkra digot
Ey miskîn û heqqê ennehû yemût, hey mehzûn û meyûs e dil (3)

Mela Elîyê Baqûstanî di mersîyeya xwe ya ku li ser wefata Seydayê Helîm nivîsiye de ji bo asta eş û elema ku pêre peyda bûye bide nîşandan û li derdorê bide hesandin serî li hûnera întaqê daye û derd û kulên xwe bi wan daye gotin. Baqûstanî dema ku vî yekê destnîşan dike, dibêje dil û canê wî ji ber wefata seyda ew qas zêde şewitiye ku qelb û ceger hatine ziman.

Nimûne:

Ji Şêx Îsmetullahê Karazî⁴¹⁵

⁴¹³ Pala, *h.b.*, r. 452-453.

⁴¹⁴ Baqûstanî, *h.b.*, r.101.

⁴¹⁵ Karak, *h.b.*, 2020a, r.264.

Şanî hey şanî bûm weşîda gem û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceşşê gumûman da 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im(1)

Dîsa di van bendên mersîyeyên ku li jorê hatine parvekirin de mersîyenûsê bi navê Şêx Îsmetûllahê Karazî ji ber wefata ku pêk hatiye gelek mehzûn bûye. Ew vê êş û janê bi mûyan bi xwe jî dide kişandin û dibêje ji her “*mûkî sedayek*” tê. Mersîyenûs bi vî awayî mûyê ku nikare xeber bide mîna însanekî ku dikare xeber bide û êş û elemê bikşîne daye nîşandan û bi vî şiklî serî li hûnera întaqê daye.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulhadîyê Comanî⁴¹⁶

Roja hicranê yeqîn 'eşrê eyar
Hey hewar e hey werin dewrê gedar
Asiman jê ra girî bûn îhmirar
Asiman û dunya şor bû mişlê xwîn (6)

Carinan barê mersîyenûs ew qas zêde dibe ku mersîyenûs ji bo hem vê yekê hem jî tesîra wefata wî kesî ya li ser rûyê erdê nîşan bide, ji xeynî însanan hinek tiştên ku ne xwedîyê taybetîyên însanan in, dide giryandin û vê yekê jî dîsa bi wasitaya vê hûnerê dike. Weke ku di benda mersîyeya ku ji teref Mela Ebdulhadîyê Comanî ve li ser Seîdê Kurdî hatiye nivîsîn de tê dîtîn, Comanî destnîşan dike ku ji ber wefat Seîdê Kurdî ne tenê însan temamê gerdûnê şîn digre û digrî. Comanî vê yekê bi gotina “*asîman jê ra girî bûn*” dike.

⁴¹⁶ Amedî, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî'uzzemân*, r.21

Di mersîyeyên Kurdî yê ku xebat li ser wan hat kirin de hat dîtin mersîyenûs ji bo xwîner û guhdarvanan zêdetir bixin bin tesîra xwe 58 caran serî li vê hûnera edebî dane. Rêjeya bikaranîna vê hûnerê ya di nav wan hûnerên din de ji %2 ye.

2.Hûnerên Edebî yê bi Wateyê re Têkildar

2.1.Tenasûb

Dema ku dudo an jî zêdetir biwêj, terîm an jî peyvên ku di naveyna wan de ji hêla wateyê ve pêwendî heye, bêyî ku di nav wan de tezad hebe digel hev bînan bikaranîna hunera tenasûbê derdikeve holê.⁴¹⁷ Hejmara wan kelîmeyên ku ji hêla wateyê ve bi hev re eleqedar in dibe ku du kelîme an jî zêdetir bin.⁴¹⁸ Di hûnera tenasûbê de yek ji tiştên herî muhîm lihevhatina kelîmeyan bi xwe ye. Wekî din ew peyvên ku pê tenasûb tê çêkirin û di navbera wan de pêwendîyeke heye di nav malik an jî bendan de bi gelemperî bêserûber tên nivîsîn.

Mersîyenûsên Kurdî di wan mersîyeyên ku nivîsîne de nexasim dema qala wesfên baş ên kesê mirî dikin an jî pesnê kesê mirî didin serî li vê hûnerê didin. Lewra mersîyenûs dixwaze qedr û qiymeta wî kesê mirî bide famkirin û ji bo vê yekê jî wan peyvên ku ne dijberên hev in û pêwendî di navbera wan de heye bi kar tînin. Carinan mersîyenûs vê yekê bi du peyvan carinan jî bi zêdetir du peyvan çêdikin. Wek mînak; di muxemmesa li jêrê de em dibînin ku peyvên mîna *bax, çimen, gul, gulzar, sosin, sunbul, nesrîn, serw, gulistan, bostan, perwane û bulbul*; her wisa di beyta ku hatiye dayîn de jî peyvên mîna; *mîr, hakim, xan û sultan* hatine bikaranîna. Di naveyna van peyvan de tezad tune ye; lêbelê di naveyna wan de ji hêla wateyê ve jî pêwendî heye. Bi vî awayî hunera tenasûbê derketiye holê.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴¹⁹

Bi te bû reweqî **bağ** û **çimenê** şer'ê Resûl

⁴¹⁷ Pala, *h.b.*, r. 448.

⁴¹⁸ Bolelli, *h.b.*, r.489.

⁴¹⁹ Hezroyî, *h.b.*, r.152.

Bi te hey bû demekî ey **gulê gulzarê** qebûl
Sosin û sunbul û nesrînê didan lafê fuzûl
Tu dema bûyî nihan bûn hemî ew jar û melûl
Man di leb teşnekî û her we di teyhê 'ateşîn(9)

Ji Ehmedê Xanî⁴²⁰

Çend **mîr** û **hakim** rakirin, çend **xan** û **sultân** da kirin
Kom û heşem ber ba kirin, ka Padîşahê Serhedan? (10)

Mersîyenûs ji bilî beşa pesindayînê her wisa di beşa şîngirtin û rondik rijandinê bi xwe de jî gelek caran serî li vê hûnera edebî dane. Û xwestine ku ew bi vê yekê wê eş û jana ku ji ber mirina hezkirîyekî wî di dilê wî de cî girtîye bi derdorê bidin hesandin an jî tehmkirin. Mersîyenûs dema ku vê yekê dîkin dîsa peyvên ku ne dijberên hev in û di navbera wan de ji hêla wateyê ve pêwendîyek heye û pê jan û kovana bi wan re tê destnîşankirin bi kar tînin.

Weke ku di beyt û benda ku li jêrê de hatiye dayîn de tê dîtin Axtepi ji bo şîna ku digre û tesîra ku pêre peyda bûye destnîşan bike û li derdorê bide hesandin bi rêya hûnera tenasûbê peyvên “*efğan, gazî, dad, hewar û feryadîres*” û Hezroyî jî bi heman armancê û bi rêya heman hûnera tenasûbê peyvên mîna “*şîn, derd, dax, kerb, huzn û hesret*” bi kar anîye.

Nimûne:

Ji Şêx Ebdurrehmanê Axtepi⁴²¹

Ne **efğan** û **gazî** ne **dad** û **hewar**

Ne **feryadîres** bû şehîdê kubar (21)

⁴²⁰ Durre, *h.b.*, r.336.

⁴²¹ Amedî, *h.b.*, 2016a, r.279.

Nimûne:

Ji Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî⁴²²

Wî bi himmet wergerand ‘ezm û ‘inana himmetê

Çû bi bal bagê liqa û şehnişîna cennetê

Da me **şîn** û **derd** û **dağ** û **kerb** û **huzn** û **hesretê**

Hesreten kadet biha en teblugel-ruhul-teraq (6)

Nimûneyên bi vî rengî di mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin de pir zêde hene. Di encama lêkolîna ku li ser van mersîyeyên li ber destên me ne hat kirin de derket holê mersîyenûsên 377 carî serî li vê hûnera tenasubê dane. Di mersîyeyên ku xebat li ser wan hat kirin de rêjeya bikaranîna vê hûnerê li gorî yên din ji % 11 e.

2.2. Telmîh

Bi bîr xistina bawerî, gotinên pêşîyan, meselok, mijarên ilmî, qisse, bûyer an jî şexsekî navdar ê ku ji teref hemû kesan ve tê zanîn.⁴²³ Wateya wê ya ferhengî tişteki bi îma gotin⁴²⁴ e. Mersîyenûs di dema qalkirina êş û elema xwe ya di mersîyeyê de meseleya kesên mîna “Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn, Leyla û Mecnûn, Yaqûb û Yûsif” ku di mazîyê de pêk hatiye di bîran dixe.

Di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de mersîyenûs bi armancên cuda serî li vê hûnerê dane. Bi gotineke din dema ku mersîyenûs xwestina qala xweşîkbûna wî kesê wefatkirî bikin bi rêya telmîhê xweşîkbûna Hz. Yûsif û her wisa Zîn û Şîrîn di bîr xistine. Encax di mersîyeyê de dema ku mersîyenûs qala mêranî, mêrxasî û dilawerîya kesê mirî dike vêcar jî bi rêya telmîhê wan kesayetên dîrokî yên mîna Rustem û Kawayê ku bi mêranîya xwe di dîrokê de cihên xwe girtine di bîran dixe. Ji bilî xweşîkbûn û qehremanîyê, mersîyenûs her wisa di dema şingirtinê de jî gelek caran meseleya Yaqûb ku ew ji ber dûrbîna lawê xwe pir zêde êş û elem kişandiye û spîkatî avêtiye çavên wî û ew kor bûye di bîran dixin. Di van her sê forman de jî mersîyenûs hewl didin qedr û qiymeta kesê wefatkirî ya di nezera xwe de û her

⁴²² Hezroyî, *h.b.*, r.129.

⁴²³ Dilçin, *h.b.*, r. 461.

⁴²⁴ Kanar, *h.b.*, r.1290.

wisa êş û elema ku ew dikşîne li ber çavan rabixe û dixwaze xwînerên xwe têxe nava vê atmosferê. Ji bo her yekî ji van tiştên ku me qala wan kir me li jêrê mînak dan.

Nimûne:

Ji Şêx Îsmetullah Karazî⁴²⁵

Rindiya **Zîn û Şîrînan** tev di wî da xetim bûn

Mustenîr wechê qemer **Yûsuf** bû ew Şeyxê kubar(4)

Ji Mela Ehmedê Xasî⁴²⁶

Felek dîsa li min ker kir fûad e

Di eşrê ewwelê şehrê muharrem

Ji xatir derketin ke' b û wişal e

Wekî **Leyla û Mecnûnê** mukerrem (1)

Ji Seydayê Tîrêj⁴²⁷

Diya **Kawa** ji me r anî gelek **Kawa** ew ê bînî

Serê dijmin bi çakûça bikin perçe bi mêranî(16)

Ji Seyid 'Elîyê Findikî⁴²⁸

Ger ku çavê me bibit spî wekî **Ye' qûb** ji girîn

Hindik e hêjî ji qehra çûyina şahê mezin (7)

Di mersîyeyên Kurdî de herî zêde bi peyvên mîna; *Yaqûb û Yûsif, Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Xatem, Rostem, Loqman, Kawa, Bîjen, Wamiq, Xusrew, Zuleyxa, Beko, Belqis, Silêman* û hwd. telmîh hatiye kirin. Mersîyenûs di mersîyeyên xwe de bi tevahî 160 caran serî li vê hûnera edebî dane. Rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî li gor wan hûnerên din ên edebî ji % 5 e.

⁴²⁵ Karak, *h.b.*, 2020a, r.262.

⁴²⁶ Karak, *h.b.*, 2021c, r.82.

⁴²⁷ Tîrêj, *h.b.*, r. 524.

⁴²⁸ Findikî, *h.b.*, r.269.

2.3. Mubalexe

Di edebiyatê de ji bo tesîra gotinê bê zêdekirin tiştêkî weke ku nabe an jî ji wesfê wê zêdetir an jî kêmtir nîşandan e.⁴²⁹ Bi gotineke din ji alîyê rewanbêjîyê ve jî gava mirov hestekê, vebêje, dikare ji xeleka rastîyê derkeve û wê mezintirîn nîşan bide yan jî rewşa wê ya heyî dikare biçûktir û kemtir jî dîyar bike.⁴³⁰ Di encama vê tiştê ku tê kirin de hunera edebî ya mubalexeyê derdikeve holê.

Ev cureya hûnerê ji teref mersîyenûsên Kurd ve jî hatiye bikaranîn. Lewra êş û elema mirinê ji mersîyenûs re pir giran tê. Ji ber vê yekê bes ew şîne nagire. Li gorî wî, digel wî temamê alemê şîne digrî. Mersîyenûs ji bo ku xwînerên xwe têxe nava atmosfereke xeyalî û di dilê wan de kelecaneke ava bike serî li ciwankariya mubalexeyê dide.⁴³¹ Dema ku vê yekê dike jî bûyera mirinê ya pêk hatiye gah wek sebeba xerabûna dinyayê gah jî sebeba şîngirtina temamê alemê û tiştên di nav wê de nîşan dide û vê yekê bi wasîtaya hûnera edebî ya mubalexeyê dike.

Nimûne: Ji Mela Ruşdî Efendî⁴³²

‘Alem ji her du çeşman lew abê xwîn dirêjin
Seydayê xas û ‘aman sa‘et li ser me rakir (2)

Mela Ruşdî Efendî di vê beyta mersîyeya xwe de ji bo ji xwînerên xwe re atmosfereke huzm û xemê çêbike û wan bixe bin tesîra xwe êş û elema ji ber wefatê rasterast nayêne ziman. Di şûna wê de tiştêkî ku qewimîye ji wesfê wê zêdetir û an jî tiştêkî ku ne mimkûn e wisa be nîşan dide. Mela Ruşdî di risteya yekem de tîne ziman, ji ber wefata seydayê wî temamê alemê -di nav vê alemê de tiştên rûhber û bêrûh jî hene- şîne digre. Ev tişt an jî kes bi şîngirtinê rihet nabin hêstiran dibarînin û asta êşkişandina wan ew qas zêde dibe ku ew hêstirên wan bi demê re şûna xwe ji xwîne re dihêle. Weke ku di vê beytê de tê dîtin ne mimkûn e temamê alemê digel tiştên rûhber û bêrûh tev şîne bigirin û ne mimkûn e ku di şûna hêstiran de ji ber şîne xwîn

⁴²⁹ Pala, *h.b.*, r.338.

⁴³⁰ Saydun, *h.b.* 107.

⁴³¹ *H.b.*, r.107.

⁴³² Liceyî, *h.b.*, r.20.

bibare. Lê Mela Ruşdî bi van gotinên ku pê serî li hûnera mubalexeyê daye dixwaze xwîner û guhdarvanên xwe bikşîni nava wê sînora huznê.

Di mînakên ku li jêrê hatine dayîn de jî Mela Ebdulhadîyê Comanî ketina zelzel, recf û teherrukê ya nav ehlê zemîn; Mele Ebdussemedê Comanî jî kirina şîn û girînê ya alema Îslamê bi wefata yekî ve girê didin û vê yekê serî li hunera edebî ya mubalexeyê didin.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulhadîyê Comanî⁴³³

Tevde werin cumle **temamê muslimîn**

Ehlê şerqê ehlê gerbê ecme'în

Pur bikin ah û fiğan û pur girîn

Ax hezîn im ax hezîn im ax hezîn (1)

Ji Ebdussemedê Comanî⁴³⁴

'Alem a Qur'anê tev zarî bikin şîn û girîn

Ev muşîbet pur giran e lazim e huzn û enîn

Lew 'urûc bû bi semayê şemsê vê dînê mubîn

Pur qebahet bû li me êdî bikin ferh û kenîn (3)

Mersîyenûs bes ne di beşa şîngirtina li ser mirîyan de bi heman awayî di beşa pesindayîne de jî serî li hunera edebî ya mubalexeyê didin. Mersîyenûs di mersîyeya xwe de dema ku qala nas, bira, şêx, seyda, bav, qîz û hwd. dîkin û pesnê wan didin gelek caran serî li vê hunerê didin. Ew bi rêya vê yekê hewl didin qedr û qiymeta wî kesî bi xwînerên xwe bidin nasîn.

Wek mînak, di beytên mersîyeyên li jê re de mersîyenûs serî li hunera mubaxaleyê dane û derheqê wan kesên ku li ser wan mersîye nivîsîne de wesfandinên kirine.

⁴³³ Amedî, *h.b.*, 2004b, r.21.

⁴³⁴ *H.b.*, r.12.

Nimûne

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴³⁵

Heyat û raheta dil bû di nav şahib dilan gul bû

Di zîkrê heq de bulbul bû gelo kan Hezretî Şanî(11)

Ji Mela ‘Elîyê Baqûstanî⁴³⁶

Behra ‘ulûm û hikmet e, şemsa terîq û huccet e

Nûra qulûbê zulmet e, tenê bi wî hidayetê(11)

Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat tespîtkirin di wan mersîyeyên ku xebat li ser wan hatiye kirin de bi tevahî 115 car serî li hûnera mubalexeyê hatiye dayîn. Di nav wan hûnerên din ên edebî de rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî ya mubalexeyê ji % 3 ye.

2.4. Tezad

Digelhev qalkirina şibandin an jî wesfên beravajî yên du fikr, xeyal an hestan hunera tezadê derdixe holê. Ji termên bedî‘ e û bi navên tîbaq, mutabaqat, tatbîq û tekafûyê jî tê naskirin.⁴³⁷ Peyva “tezadê ji “zidda” Erebî tê⁴³⁸ û di zimanê de Kurdî de tê wateyên mîna “dijber” û “berewajî.”

Hûnera edebî ya tezadê carina bi bikaranîna di heman risteyê de ya du peyvên ku dijberên hev in an jî di malik û komristeyan de bi bikaranîna peyvên ku ji hêla wateyê ve dijberên hev in çêdibe. Bi saxiya bikaranîna vê hûnera edebî şa‘ir kelecana mirovan zindî digre.⁴³⁹ Dema ku em li wan mersîyeyên li ber destê xwe mêze dikin em dibînin ku mersîyenûs ji bo bala xwîner û guhdarên xwe bikşînin li ser êşa ku ew

⁴³⁵ Turan, *h.b.*, r.314.

⁴³⁶ Baqûstanî, *h.b.*, r.94.

⁴³⁷ Pala, *h.b.*, r. 455.

⁴³⁸ Kanar, *h.b.*, r.1327.

⁴³⁹ Pala, *h.b.*, r. 455.

dikşîne serî li hûnera edebî ya bi navê tezadê dane. Ji vê yekê jî armanca wan ew e ku ew êş û elema ku tê kişandin zindî bê girtin.

Mersîyenûs bi vê hunerê hest û ramanên xwe bi coş û kelecaneke mezin ji bo kesên xwîner û guhdarvan teqdîm dike. Weke ku di malika mersîyeya ku li jêrê wek mînak hatiye dayîn de jî tê dîtin Mela Ebdulfettahê Hezroyî du peyvên ji hêla wateyê ve dijber ango peyvên şev û roj bi kar anîne. Hezroyî di vê malikê de destnîşan dike kişandina wî ya êş û elemê ne tenê bo demekê ye; bîleqş bênavber bi şev û roj jî berdewam dike. Hezroyî bi wasitaya vê hûnerê hewl dide kelecane, êş û elema mewcûd di hiş û dilê xwîneran de zindî bigire.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴⁴⁰

Şev û roj û sehergahan dikêşim heşret û ahan

Ji feqda mîr û hem şahan gelo kan Hezretî Şanî(19)

Di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de hûnera edebî ya tezadê rasterast bi wan peyvên ku ji hêla wateyê ve dijberên hev in nayê çêkirin. Carinan bi wan lêker an jî navderên ku ji hêla maneyê ve dijberên hev in jî dikarin bêt çêkirin. Wek mînak di benda mersîyeya ku li jêrê hatiye parvekirin de Nalbend di mersîyeya xwe de bi wasitaya du lêkerên tezad hûnera edebî ya tezadê çêkiriye.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁴¹

Keyf û dilxwoşî û bestî û vebûn

Dîtin û destkirin û **hatin û çûn**

Ew hemî xewn û xiyal û venebûn

Bizin û mih hêstir û zengil çû neman(6)

⁴⁴⁰ Turan, *h.b.*, r.314.

⁴⁴¹ Nalbend, *h.b.*, r.19.

Di wan mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmanacî hatine nivîsîn û me li ser wan xebat kir de hat tespîtîkirin ji teref mersîyenûsan ve bi tevahî 51 caran hûnera edebî ya tezdê hatiye bikaranîn. Rêjeya vê hûnera edebî di nav wan hûnerên edebî yê din de ji % 1e.

2.5. Tekrîr

Ji bo tesîra gotinê bê zêdekirin wan peyvên ku wate lê hûr bûne li dûv hev bi rêz kirin e.⁴⁴² Di Kurdî de ji bo tekrîrê "ducar", "dubare", "tekrar" û "cardin" tê bikaranîn.⁴⁴³ Mebesta bikaranîna ciwankariya tekrîrê, bihêzîkirin û perçînkirina peyvê ye; ev, digel zindîbûnê kelecaneke jî dide helbest an jî menzûmeyan.⁴⁴⁴ Armanca dubarekirina peyvan ên ji bo tekrîrê derxistina holê ya ahengekê ye. Dema ku ev yek tê kirin carinan bi du peyvên hemwate û carinan jî bi du kombêjeyên hemwate tê kirin. Divê neyê jîbîrkirin ew peyvên ku wekhev hatine nivîsîn lê wateya wan ne yek in nabin peyvên tekrîrê e.

Di mersîyeyên Kurdî de mersîyenûs gelek zêde li ber kesê wefatîkirî dikevin û ji ber vê mirinê gelek zêde xemgîn dibin, dikin feryad û fixan. Mersîyenûs dema ku derd û kulên xwe tînin zimên ji bo tesîra gotina xwe zêde bikin, ahengekê bidin gotina xwe û balan bikîşînin li ser wefata ku pêk hatiye serî li hunera tekrîrê didin. Di beytên li jêrê de bi bikaranîna peyvên reşkirî hûnera tekrîrê derketiye holê.

Nimûne:

Ji Ehmedê Xanî⁴⁴⁵

Kanê Muhemmed beg gelo? **Ka Padîşahê Serhedan**

Îro ji dil bigrîn dilo! **Ka Padîşahê Serhedan**(1)

Ehmedê Xanî di mersîyeya xwe ya ku nivîsîye de hêj di beyta ewil de di heman beytê di du ristên ji hev cuda de heman kombêjeyan bi kar anîye û ahengekê derxistiye holê. Xanî bi bikaranîna gotina "*Ka Padîşahê Serhedan*" him şînê digire him ahengeke

⁴⁴² Dilçin, *h.b.*, r.452.

⁴⁴³ Îzolî, *h.b.*, r. 989.

⁴⁴⁴ Saydun, *h.b.*, 114.

⁴⁴⁵ Durre, *h.b.*, r.336.

xweş derdixe holê û him jî hêj di destpêka mersîyeya xwe de dîqquetan dikşîne bal xwe ve.

Mînakên bi rengî yê ku bi kombêjeyan hatine çêkirin di mersîyeyên Kurdî de hene. Lêbelê ev hûnera edebî ya bi navê tekrîr her tim bi rêya kombêjeyan nayên êkirin; carinan jî bi dubarekirina heman peyvên tê çêkirin. Wek mînak, Seydayê Tîrêj di mersîyeya xwe ya ku nivîsîye de him di risteya ewil û him jî risteya duyem de serî li hûnera edebî ya tekrîrê daye. Di risteya ewil de bi peyva “*wekî*” û di ya duyem de jî bi peyva “*kanî*” hûnera edebî ya tekrîrê bi kar anîye.

Nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁴⁴⁶

Gelek **wekî** te çûn dil bi hisret mîna Kamîran **wekî** Celadet

Kanî Şêx Se'îd, Ihsan û Qadî **kanî** Berzanî şêrê bi heybet (8)

Ev hûnera edebî ya ku mersîyenûs di mersîyeya xwe de bi kar anîne, pê ahengek çêkirine û balan pê kişandine di mersîyeyên Kurdîya Kurmancî de bi tevahî 195 caran hatiye bikaranîn. Rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî li gorî wan hûnerên din ên edebî jî % 6 e.

2.6.Nîda

Nîda, di edebiyatê de ji bo diyarkirina şaşbûn, kêfxweşî, hêrsbûn û hestên mîna van bilindkirina deng an jî bangkirinê ye. Di dirûva peyvên mîna “*Ey, eya, ya, hey, amîn*” de xwe nîşan dide.⁴⁴⁷ Di helbestan de bi baneşan û peyvên *wekî* “*ey, hey, ya, lo, lê,*”yê û bi qertafên *wek* “*o*” û “*ê*”yên qertafên zayendê û bi qertafa “*ya*”ya nîdayî ya

⁴⁴⁶ Tîrêj, *h.b.*, r. 378.

⁴⁴⁷ Pala, *h.b.*, r. 358.

li pey navan çêdibe.⁴⁴⁸ Nîdaya ku yek ji hunerên edebî ye carinan li derveyî wateya xwe ya esas de jî tê bikaranîn.⁴⁴⁹

Di mersîyeyên Kurdî de beşeke xûsûsî heye ku jê re beşa duayê tê gotin. Mersîyenûs di vê beşê de ji bo kesê wefatkirî, ehlê wî û carinan jî ji ber êş û elema ku ew bi xwe dikşîne ji xwe re di‘a dike. Şa‘ir ji bo kesê wefatkirî ji Xwedê daxwaz dike da ku wî têxe cennetê û ji bo ehlê kesê mirî jî di‘a dike da ku Xweda sebreke cemîl bide wan. Mersîyenûs dema ku di‘a dike û ji Xweda lavayî dike gelek caran serî li hunera nîdayê dide û gotinên bangê/nîdayê yên mîna “*îlahî, ya îlahî, ya Reb, ey, eya û hwd.*” di mersîyeyên xwe de bi kar tîne.

Wekî ku di beytên ku li jêr de tê dîtîn mersîyenûs dema ku ji Rebbê xwe tişteki dixwazin bang li Rebbê xwe dikin û ji bo vê yekê jî peyvên mîna “*ya Reb, Xudaya û Îlahî*” bi kar tînin. Mersîyenûs bi vê yekê destê xwe û derîyên dilên xwe ji Rebbê aleman re vedikin û yan ji bo xwe û ehlê kesê wefatkirî sebrê yan jî ji bo kesê wefatkirî rehmetê teleb dikin.

Nimûne:

Ji Mela ‘Elîyê baqûstanî⁴⁵⁰

Her du‘aya min bikî **ya Reb** qebûl û her qebûl
Med‘ûyê min kes tunîne geyrê te **ya Reb** gerek (14)

Ji Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi⁴⁵¹

Xudaya bi heqê benî Fatîme
Kî ber qewlê îman konem xatîme(49)

Îlahî tu Ruhî nekî şermîzar

⁴⁴⁸ Ramazan Çetîn, *Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm*, K.T. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2019, r.49.

⁴⁴⁹ Bolelli, *h.b.*, r.302.

⁴⁵⁰ Baqûstanî, *h.b.*, r.90.

⁴⁵¹ Zeynelabidîn Amedî, *Şerha Rewdul Ne‘îma Şêx ‘Ebdurrehman Aktepi*, Weş. Seyda, Diyarbekir 2016a, r.279.

Kerr û lal û gêj e tunîne medar (50)

Di mersîyeyên Kurdî de hunera edebî ya nîdayê bes di formên dia û lavayîkirinê de nayên dîtin. Carcaran ev hûnera edebî ji bo di asteke bilind de ji felekê re bertek bê nîşandan tê bikaranîn. Lewra di çavê mersîyenûs de kesa ku ji mirinê re dibe sedem felek bi xwe ye.

Nimûne:

Ji Feqîyê Teyran⁴⁵²

Ey felekê bê wefayê te çira muhlet nedayê

Yar di nêv axê gihayê ey felek bê mirwetê (8)

Feqîyê Teyran, di risteya ewil ya vê malika ku li jor dayîn de weke ku tê dîtin gazin û gilîyan ji felekê dike û wê wek kesê bêwefa û bêmirwet nîşan dide. Feqî dema ku vê gazina xwe tîne zimên bi peyva nîdayê ya “ey” xîtabî felekê dike û jê hesabê dipirse.

Formeke din a bikaranîna hunera edebî ya nîdayê ya di mersîyeyên Kurdî de banga ku ji dil re tê kirin e. Mersîyenûs dema ku mersîyeya xwe dinivîsîne carinan berê xwe dide dilê xwe û bang lê dike û pirsan jê dike. Wekî ku di mînaka jêr de jî tê dîtin Seyîd Elîyê Findikî bi peyva “*Ey dilo!*” bang li dilê xwe dike, wî wek meskenê derd û kulan diyar dike û pirsan jê dike.

Nimûne:

Ji Seyîd Elîyê Findikî⁴⁵³

Ey dilê meskenê derda ma tu zanî ku çi bî

Ew Se‘îdê canfida j’ dînê me ra j’ kîsê me bî (1)

Hûnera edebî ya nîdayê ku yek ji zêdetirîn hûnera edebî ye di mersîyeyên Kurdî de hatiye bikaranîn. Ev hûnera edebî ya ku pê bangewazî li yekî yan tiştêkî tê kirin di

⁴⁵² Sadinî, *h.b.*, 2014a, r.139.

⁴⁵³ Findikî, *h.b.*, r.227.

wan mersîyeyên Kurdî de bitevahî 234 caran hatiye bikaranîn. Rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî li gorî wan hûnerên din ên edebî ji % 7 e.

2.7. Îstîfham

Ji bo bal û dîqet zêdetir bê kişandin li ser tiştê tê xwestin bê gotin pirs tê kirin. Bi gotineke din bi wasitaya vê hunerê derheqê tiştekî ku berî niha tê zanîn de pirs tê kirin. Bi vî awayî nîşandana hest û ramanan balkêşiyê dide peyvê. Divê hêviya bersivê ji hunera îstîfhamê neyê kirin. Lewra sedema wê hest û kelecana e.⁴⁵⁴

Di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de nivîskarê wê mersîyeyê ji bo wateyeke xweş bide peyvê û ji bo dîqqetan bikêşîne li ser wî tiştê ku ew bi xwe dixwaze serî li vê hûnerê dide. Ji bo vê yekê jî pirsê ku ew bi xwe jî bersiva wê dizanî dipirse, lêbelê ew li bersiva vê pirsê nagere.

Di bend û beytên jêr de bi peyvên ku hatine diyarkirin ji bo wate xurttir bibe û ji bo bal bîn kişandin, hunerê îstîfhamê hatiye bikaranîn. Weke ku ji wateya di beyt û bendan de kifş dibe mirov tu bersivê ji pirsan hêvî nake; lewra ji ber êş û elema ku tê kişandin pirs hatine kirin û her du mersîyenûs bi xwe jî dizanin ew kesên ku ew li ser wan mersîye nivîsîne bi emrê Xwedê rehma kirine û ji vê dinyayê koç kirine. Lê digel vê yekê jî ew pirsê wan hezkirîyên xwe dikin û weke ku ew hêj sax in û wînda bûne li wan digerin.

Nimûne:

Ji Weda⁴⁵⁵

Romê dema 'esker dikir bê hedd û bê defter dikir
Mîr leşkerê wan ker dikir **kanê cîhangirê cîhan** (4)

Ji Ebdulfettahê Hezroyî⁴⁵⁶

Heyat û raşeta dil bû di nav şahîb dilan gul bû

⁴⁵⁴ Çetîn, *h.b.*, r.240.

⁴⁵⁵ Wedaî, *h.b.*, r.95.

⁴⁵⁶ Turan, *h.b.*, r.314.

Di zîkrê heq de bulbul bû **gelo kan Hezretî Şanî** (11)

Di mersîyeyên ku bi Kurdîya Kurmancî hatine nivîsîn de piştî hûnera edebî ya teşbîhê hûnera ku herî zêde hatiye bikaranîn hûnera îstîfhamê ye. Lewra di temamê mersîyeyan de hetta di hinek mersîyeyan de ji destpêka mersîyeyê heta dawîya mersîyeyê pirsên ku bersivên wan tê zanîn ji ber êş û elema ku tê kişandin tên kirin. Di van mersîyeyan de ji teref mersîyenûsan ve 716 caran hûnera edebî ya îstîfhamê hatiye bikaranîn. Rêjeya bikaranîna vê hûnerê ya li gorî wan hunerên din ji % 21 e.

2.8. Tecahula ‘Arîf

Di helbestê de dema ku rastîyek ji teref helbestan ve bê zanîn û helbestvan bi rêya nukteyekê xwe li nezanîne deyne tecahulî arîf derdikeve holê.

Ji bona ku mersîyenûs di helbesta xwe de maneyeke xweş bi cî bike yariyek eseh bi sedema ecêbmayîn, pesindayîn, kêmxistin, birûmetkirin, lomandinê û hwd. dike. Ev yariya ku kakila vê hunera edebî ava kiriye, dibe ku ji bo van çar sedeman jî hatibe kirin: Tenşît (kêfxweşkirin), tewbîh (îqazkirin), teheyûr (ragihandina heyirîmanê) û tedelluh (jixweveçûyîn).⁴⁵⁷ Helbestkarên ku serî li tecahula arîfê didin ne dibêjin em tiştêkî nizanin ne jî dibêjin em bi tiştêkî dizanin û wê vedişêrin. Şair dema ku vê pêk tîne ji mubalexe, îstîfham⁴⁵⁸ û şibandîne sûd werdigire.

Di mersîyeyên Kurdî de mersîyenûs ji bo maneyeke xweş derîne holê yariyekê yan ji ber ecêbmayîn û pesindayîne yan jî ji ber lomandin û kêmxistin û ji ber sedemên din bi kar tîne. Mersîyenûs dizanibe nas an jî yekî din ê ku di navbera wan de pêwendî heye û wefat kiriye, miriye û cardin venagerê. Lêbelê heqîqeta mirina kesê ku şa‘ir jê hez dike lê giran tê. Ji ber vê yekê ew naxweze vê heqîqetê qebûl bike û xwe li nezanîne dideyne. Wek mînak; Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî di mersîyeya ku li ser Şêx Muhemmedê Çanî nivîsîye de, dizane ku Şêx Muhemmedê Çanî rehmet kiriye û ji vê dinyayê koç kiriye. Lêbelê digel zanîna vê heqîqetê Şêx Muhemmed weke ku haya wî jê tuneye ku ew rehmet kiriye. Ew radibe lê digere û bi rêya hûnera îstîfhamê bi gotina

⁴⁵⁷ Pala, *h.b.*, r.444.

⁴⁵⁸ Dilçin, *h.b.*, r. 441.

“gelo winda bû...” pirs a wî dike. Ev pirs a ku tê kirin wateya şaşmayîn û heyirîmayînê dide risteyê.

Mînak:

Ji Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî⁴⁵⁹

Sahîbê ‘ilm û huner bû me‘dena şidq û şewab
Heyf e şed heyf e gelo winda bû paş perdê-w hîcab (4)

Mînakên bi rengî di wan mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin de 143 carî hatine bikaranîn. Rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî ya ku bi wateyê re têkildar e li gorî wan hûnerên din ên edebî ji % 4 e.

2.9. Îqtîbas

Ji bo gotin qewî û bihêztir bibe bikaranîna ayet û hedîsan e.⁴⁶⁰ Îqtîbas ji hêla têgehê ve tê maneya deynstandinê. Îqtîbas bi giştî dibe sê beş: Îqtîbasa ku maqbûl û xweşik tê hesibandin, îqtîbasa mubah û îqtîbasa mustehcen û merdûd.⁴⁶¹ Di hûnera îqtîbasê de ne ferz e ku helbestkar temamê ayet an jî hedîsekê binivîsîne.

Em vê hunera edebî di gelek mersîyeyên Kurdî de dikarin bi rihetî bibînin. Dema ku em li mersîyeyên Kurdî mêze dikin em dibînin kesên mersîyenûs di mersîyeyên ku nivîsîne de yan cî dane ayetên Qur’ana Kerîm û yan jî cî dane hedîsên Hz. Muhemmed.(s.x.l.). Dema ku vê yekê kirine an cî dane temamê ayet û hedîsê yan jî beşeke ayet û hedîsê.

Wek mînak, Axoyekê Bêdarî piştî ku qala wefata her du lawên xwe dike êdî qebûl dike ew ji ba Xwedê hatine û ew ê veger bal wî de be û ew vê yekê bi ayeta “*inna lillahi raci’un*” diyar dike. Feqîyê Teyran jî di mersîyeya xwe ya ku nivîsîye de piştî ku qala wefat û êşa ku ji ber wê yekê tê kişandin dike, destnîşan dike ew ê rojekê her tişt ji holê rabin ango bimirin. Ew vê yekê bi ayeta “*Kullu şey’in*” destnîşan dike.

Nimûne:

⁴⁵⁹ Qewmanî, *h.b.*, r.52.

⁴⁶⁰ Dilçin, *h.b.*, r. 465.

⁴⁶¹ Bolelli, *h.b.*, r.441.

Ji Axayokê Bêdarî⁴⁶²


Ĝeyn Elif beske ji nal û zarî waha derûn
Ew qezaya barî ye ma kes li wê çû kit bi rûn
Sa'etek texîrî nabîtin wela yesteqdimun
Herçî heq kit ew heqq e *inna lillahi raci'un*
Lê ji derd û heşretan ez bê 'eded giryan kirim(8)

Ji Feqîyê Teyran⁴⁶³

Nazik û mehbûb ciwanik wamet û bejna ziravik
“*Kullu şey'in*” dê bin halik ji geyrî Şahê Qudretê (10)

Ji bo wate zexmtir bê kirin hat dîtin mersîyenûs di wan mersîyeyên Kurdî yê ku nivîsîne û xebat li ser wan hat kirin de bi tevahî 49 caran serî li vê hûnerê dane. Rêjeya bikaranîna vê hûnera edebî li gor wan hûnerên din ên edebî ji % 1 e.

Rêjeya bikaranîna hûnerên edebî di mersîyeyên Kurdî de



Grafik 18: Rêjeya bikaranîna hûnerên edebî di mersîyeyên Kurdî de nîşan dide.

⁴⁶² Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

⁴⁶³ Sadînî, *h.b.*, 2013a, r.139.

BEŞA ÇAREMÎN

BEŞÊN MERSÎYEYÊN KLASÎK

Wek wan edebiyatên klasîk ên neteweyên din mersîyeyên Kurdî yên klasîk jî di nav xwe de hinek beşan dihewînin. Di mersîyeyan klasîk de her çî qas tev bi hev re di mersîyekê de cî negirin jî bi gelemperî beşên mîna; mirin, şîn-girî, pesindayîn, sîtema jî felekê re, dinya-axiret, sebir, di‘a-temennî, nifir tên bikaranîn û mersîyenûs şîna xwe li ser van beşan ava dikin.

Ji bo beşên mersîyeyên Tirkî yên klasîk rêzikek tê dayîn. Wek mînak, Îsenê nivîskarê xebata bi navê “*Acıyı Bal Eylemek-Türk Edebiyatında Mersiye*” di xebata xwe de ji bo beşên mersîyeyên ku bi Tirkî hatine nivîsîn rêzikeke wiha diyar dike:

*“Şa ‘ir di destpêka helbesta xwe de -dixwaze bila bend be û dixwaze bila beyt be- qala fanîbûna dinyayê, zalimbûna kaînatê dike û dû re di bend an jî beytên dû re de dest bi pesna kesê/a mirî dike. Piştî vê pesindayîne nivîskar êdî dest bi sîtema li hember felekê dike û di beşên dawîyê hinek îstîsna ne di nav de her tim di‘a tê kirin û şa ‘ir daxwazên xwe tîne zimên.”*⁴⁶⁴

Lêbelê ev yek di mersîyeyên Kurdî de ne wisa ye. Lewra dema em li mersîyeyên ku bi Kurdî hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin ku ekserîyetê mersîyeyan yan bi şîn û rêşgirêdanê yan bi berteka jî felekê re yan jî bi pesindayîne dest pê dikin. Piştî vê yekê ji wan beşên din re cî tê dayîn û mersîye exleb bi di‘a û temennîyan bi dawî dibin.

Ji bo beşên mersîyeyên Kurdî wek pêşgotin dikare bê gotin, di beşên mersîyeyên Kurdî de tê dîtin mersîyenûs di beşa mirinê de xebera wî kesê ku rehmet kiriye bi me dide zanîn. Ev xeberdayîn carinan rasterast bi peyvên mîna rehmet kir, wefat kir, mir, koç kir an jî bi rêya hûnerên edebî bi peyvên mîna mala xwe bar kir tê kirin. Ji bilî vê yekê mersîyenûs di mersîyeyên xwe de li ser têgeh û heqîqeta mirina ku dibe sedema êş kişandinê radiweste. Di beşên şîn-girîne de jî mersîyenûs bi şiklekî hûrgilî qala wê êş û elemê dikin ku ew ji ber wefata yekî dikşînin. Dema ku mersîyenûs

⁴⁶⁴ İsen, *h.b.*, 1994b, r.22.

vê yekê dikin hêstiran li ser kesê wefatkirî dibarînin û daxwaz dikin ew jî êdî li vê dinyayê sax nemînin. Beşeke din a di mersîyeyên Kurdî yên klasîk de tê dîtîn sîtema ku ji felekê re tê nîşandan e. Mersîyenûs di vê beşê de ji ber ku felekê bi xwe wek mesûlê mirina ku pêk tê dibînin gazin û gilîyan jê dikin û bertek nîşanî wî didin. Mersîyenûsên Kurd piştî ku di mersîyeyên xwe de van beşan bi kar tînin serî li beşa sebir, di 'a-temennîyan didin. Di van beşan de mersîyenûs ji bo xwe û ji bo ehlê wî kesê ku wefat kiriye ji Rebbê aleman sebrê daxwaz dike da ku barê wan a êş û eleman sivik bibe. Dîsa mersîyenûs bi di 'a û temennîyên ku dikin daxwaz dikin cihê wan kesên wefatkirî cennetên firdews be, hesabê wan sivik be û ew bi xwe di cennetê de bibin cîranê wî kesê mirî. Ji vê beşa di 'a û temennîyan re di mersîyeyan de exlebe pir zêde cî tê dayîn. Lê di hinek mersîyeyên Kurdî de nifira ku bîleqsa di 'ayan e tê dîtîn. Di van mersîyeyên wisa de ger kesê wefatkirî ji teref kesekî ve hatibe kuştin ji wî kesê qatil re nifir tê kirin. Ji bilî van beşan, beşeke din a ku di mersîyeyên klasîk de tê dîtîn beşa dinya-axretê ye. Di vê beşê de mersîyenûs qala fanîbûna dinyayê û ehemmiyeta axretê dike û destnîşan dike ew ê jî wek her kesî rojekê bimire û biçê axretê.

Derheqê van beşên mîna; mirin, şîn-girî, pesindayîn, sîtema ji felekê re, dinya-axiret, sebir, di 'a-temennî û nifir de em dikarin bibêjin mersîyenûs bi xebitandina van beşan ji alîyekî ve qedr û qiymeta wî kesê mirî ya di nezera xwe de û ji alîyekî ve jî êş û elema ku ew ji ber wefata pêk hatiye dikşîne bi me dide nîşan. Ev beşên ku qala wan hat kirin di hinek mersîyeyên Kurdî de carinan bi şiklekî kamil, di hinekan de carina çend heb û di hinekan de carinan jî bes beşek bi xwe cî digire û mersîyenûs mersîyeya xwe li ser wê beşê ava dike.

Piştî van agahîyên ku wek pêşgotinekê derheqê beşên mersîyeyan de hat dayîn em ê yek bi yek bi hûrgilî qala van beşan bikin û di van beşan de ji mersîyeyan mînakên metnên transkribkirî yên ku bi beşê re têkildar in bidin.

1. Mirin

Ji ber ku mersîye li ser fi'ila mirinê bi xwe tînin nivîsîn em ê di destpêkê de qala têgeha mirinê ya di mersîyeyan de bikin. Dema ku nasê însanekî dimire êş û elema firaqa kesê mirî zor û zehmetiyeke dijwar dide însên û wî gelek zêde mehzûn dike. Ji ber vê yekê tebatî nayê meriv. Lewra êş û elema mirinê tehl e û gelek zêde bi zehmet

e. Ji ber vê yekê di vê pêvajoyê de cîhana êş û elemê ya însên dide pêşiya cîhana reng û xweşiyê ya însên⁴⁶⁵ û dibe sedema kişandina êş û elemê.

Di mersîyeyên Kurdî de têgeha mirinê di gelek wateyên cuda de hatiye bikaranîn. Di mersîyeyan de mirin; geh dibe sedema kişandina êş û eleman geh dibe derîyê wesletê geh dibe xala dawîbûna derd û kul û eleman û geh jî dibe wasitaya qebûlkirina barê giran a mirinê. Em vê yekê di mersîyeyên Kurdî yên ku hatine nivîsîn de bi şiklekî aşkere dibînin. Em ê li jêrê yek bi yek qala van wateyên cihêreng ên mirinê ya di mersîyeyan de bikin.

Di mersîyeyên Kurdî de mirin carinan dibe sedem ku mersîyenûs êş û elemeke pir dijwar bikşîne û wê tehl û nexweşbûna mirinê tehm bike. Mersîyenûs dema di mersîyeya xwe de qala vê têgehê dike ji alîyekî ve halê xwe ya nebaş a ku ew tê de ye û ji alîyê din ve jî êş elema ku ew dikşîne destnîşan dike. Di benda li jêrê de tê dîtîn ji ber mirina ku pêk hatiye Hezroyî di nav şînekê de ye û ew ji ber wefata yekî halê derûnîya xwe ya neyînî tîne zimên.

Nimûne:

Ji Mela Zahirê Tendûrekî⁴⁶⁶

Şehra Şubaţ nema tebat lew bûne mat kirin wefat
Şahê welat kêma bûn civat naxoş heyat derd bûne qat
Derdê mezin hubba kevin hejya ji bin lewra mirin
Xoş bû bi min durra 'edin bud û defîn man bêşubat(1)

Mersîyenûs di mersîyeyên ku dinivîsînin de geh geh ji ber firaqa ku pêk hatiye û ji ber êş û elema tê kişandin bertek ji mirinê re nîşan didin û gazin û gilîyan ji mirinê bi xwe dikin. Lê di netîceya vê yekê de bêçaretîya xwe ya li hember wê jî tînin zimên. Ev yek di gelek mersîyeyên Kurdî de tînin dîtîn. Di malika li jêrê ya ku ji teref Baqûstanî ve hatiye nivîsîn de tê dîtîn. Mersîyenûs di destpêkê de ji mirinê gilî û gazinan dike,

⁴⁶⁵ Breton, *h.b.*, r.19.

⁴⁶⁶ Tendûrekî, *h.b.*, r.41.

şîne digire. Lêbelê di netîceyê de ew bêçarerîtiya xwe ya li hember heqîqeta mirinê jî destnîşan dike.

Nimûne:

Ji Mela ‘Elîyê Baqûstanî⁴⁶⁷

Ahîn ji destê mirinê, fayde nake ji gotinê
‘Umir kin e di vê dinê, kanî reîsê ummetê(8)

Barê dûrketina ji kesê hezkirî û êş û elema ku ji ber wefatê tê kişandin, carinan pir zêde dibe. Mersîyenûs ji ber vê êş û elema ku dikşînin êdî nema îdare dikin û tebat nayê wan. Ji ber vê yekê ji bo dawîbûna vê êş û elemê mersîyenûs daxwaza mirina xwe ji Rebbê xwe dikin. Lewra mersîyenûs dermanê derdê xwe û xelasîya ji êş û eleman di mirina xwe bi xwe de dibîne. Di malika li jêrê ya Comanî de tê dîtin, mersîyenûs destnîşan dike dawîbûna êş û elemên ku ew ji ber wefata seyda dikşîne mirin bi xwe ye. Li gor wî dema ku ew mir, ew ê wuslat pêk bê û ew ê bighijê seydayê xwe.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulhadîyê Comanî⁴⁶⁸

Wuşlet û çare ev e ku bimirin em teve
Biçne cem seyda bedî‘ pê ra biçin cennetê(12)

Piştî êş û elema ku ji ber mirinê tê kişandin û daxwazkirina mirinê ya ji bo dawîbûna van êş û eleman; vêca jî em dibînin ku mirin xwe bi xwedîyê mersîyeyê dide qebûlkin. Mirin bi mersîyenûs dide famkirin ku ji mirinê bi xwe rev tune ye û ew ê jî rojekê bi mirinê re rû bi rû bimîne û dê mirinê tehm bike. Lewra di van bend û malikên mersîyeyên ku ji teref Seydayê Tîrêj ve li ser mirina kesên cuda hatine nivîsîn

⁴⁶⁷ Baqûstanî, *h.b.*, r.94.

⁴⁶⁸ Amedî, *h.b.* 2004b, r.18.

de tê dîtin ku mersîyenûs digel girtina şîne êdî heqîqeta mirinê qebûl dike û destnîşan dike dema roj û wext hat ew ê jî wek her kesî rehmet bike.

Nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁴⁶⁹

Erê Tîrêj mirin ku hate insan
Venajînin ne textor û ne derman
Eger bê ser ji gorê Quţbê Geylan
Bi berbejn û nivişt û şerqûbatê(12)

Ji Seydayê Tîrêj⁴⁷⁰

Xweş tu bawer be bira her kes li ber roja xwe ye
Ku çî qasî em bijîn dawî mirin para me ye(14)

Ji Seydayê Tîrêj⁴⁷¹

Karwanê mirinê ne, em li pê hev
Pêk ve li ser in, me nîne jê rev(49)

Di mersîyeyan de piştî temamê xalan, mersîyenûs vê carê dawîbûna fîraqê, xelasbûna êş û eleman û her tiştên din ên ji ber mirinê ji bîr dike û mirina xwe ji bo rîza û wesleta Rebbê xwe daxwaz dike. Dema em li çarîneya li jê re mêze dikin em dibînin şa'îr daxwaz dike ku êdî ew nema bijî û biçê ba Rebbê xwe.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁷²

Min ji îqbala xwo ew ro kirye gazinde û şekat

⁴⁶⁹ Tîrêj, *h.b.*, r.529.

⁴⁷⁰ *h.b.*, r. 368.

⁴⁷¹ *h.b.*, r.135.

⁴⁷² Nalbend, *h.b.*, r.2

Xwoşîyek min jê nedîte çend min kir bît û xebat
Talibim weşl û rîza te bessin ev 'emir û heyat
Paşî mirinê serferaz bim ehlê îşlah û reşad(7)

2. Şîn-Girîn

Beşa herî muhîm a mersîyeyan yek ji wan jî şîn û girîn e. Lewra ji ber mirina ku pêk hatiye û ji ber êş û elema tê kişandin, mersîyenûs dixwaze rêyeke ku ew tê de karibe bimeşe û derd û kulên xwe lê bireşîne hebe. Ev rêya ku qala wê tê kirin û mersîyenûs lê digere da ku ew tê de derd û kulên xwe bîne ziman mersîye bi xwe ye. Dema ku mersîyenûs helbesta xwe dinivîsîne êş û elema ku dikşîne tîne zimên. Her wisa wê êş û elemê li derdorê dide hesandin û ji ber vê yekê şînê girê dide û dest bi girî û nalînê dike. Di vê pêvajoyê de di mersîyeyan de carcar tê dîtîn bes ne şa'ir tenê bi heman awayî temamê 'alem û tabîetê jî digel wî ji ber mirina ku pêk hatiye şînê digirin.

Di mersîyeyên ku hatine nivîsîn de tê dîtîn, şa'ir dema ku bi rastî û heqîqeta mirinê re rû bi rû dimîne dest bi ah û fixan, nalenal û feryad û fixanê dike. Lewra ev rastîya mirinê di qelbê wî de birîneke kûr, hetta birîneke ku qemûşk nagire vedike. Ji ber vê yekê her tim xwîn ji wê birîna wî diherike. Ev êş û elema şa'ir ti car di nezera wî de kevin nabe û her tim nû dibe. Di bendên li jêrê yên ku ji teref Karazî ve hatine nivîsîn de tê dîtîn, mersîyenûs ji ber mirina ku pêk hatiye êş û elemeke pir zêde dikşîne, dike feryad û fixan. Mersîyenûs dema qala wê êş û elemê dike, dike hewar û hawara xwe ji Rebbê xwe re dibe. Dîsa bi derdorê dide hesandin birîneke ku nayê girtin pê re peyda bûye û ew ji ber vê yekê her tim di nav huzn û şînê de ye.

Nimûne:

Ji Şêx Îsmetullahê Karazî⁴⁷³

Şanî hey şanî bûm weşîda gem û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê

⁴⁷³ Karak, *h.b.*, 2020a, r.264.

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceyşê ğumûman da 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im(1)

Hawara min bi te ya Reb nema min çareya şebrê
Ez im bedħal siyehkar im ğerîqê zenb û vê cewrê
Me rehber Şahê şanî çû li me şa bû kerê gebrê
Bi vê beytê terennum kim ħeta bimrim biçim qebrê

Bi qurbana ewan qewsê di nûn û awurê yar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im(2)

Ez im tahî birînkûr im di nêv mecrayê van wadan
Li min rabû çemê eş û elem ez qeṭr û her cadan
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv eħşa' û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin gelî wildan û şehzadan

Fida be rûhê te bo merqeda babê me' û Salim
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im(3)

Dîsa di beyta mersîyeya ku ji teref Namî ve hatiye nivîsîn de tê dîtin, mersîyenûs destnîşan dike, ji ber wê mirina Haco Axa bes ne ew her wisa xort, biçûk û bûk jî xemgîn û mehzûn dibin.

Ji Ehmedê Namî⁴⁷⁴

Qîrên û hewar xort û bûkan,
Lerzîn dikete dilê biçûkan(20)

⁴⁷⁴ Selîm Temo, *Antolojîya Helbesta Kurdî, Weş. Agora, İstanbul 2019, c. II, r. 770.*

Di mersîyeyên Kurdî de tê dîtin şa‘ir carinan ji bo giranbûna êş û elema ku ji ber firaqê tê kişandin nîşan bide serî li hunerên edebî dide û biwêja “*şikestina pişt*” bi kar tîne. Her wisa şa‘ir dema dixwaze bêçaretîya xwe ya ji ber êş û elema ku dikşîne bîne ziman biwêja “*Dest li ber nayête hildan*” û ji bo xebera mirina kesê jê hezkirî jî bide biwêja “*pişt da dinê*” bi kar tîne. Ev yek jî ast û zêdebûna wê êş û elema ku bi mersîyenûs re çêbûye bi xwîner û guhdaran dide famkirin. Ev biwêjên ku qala wan hat kirin û ji teref mersîyenûsan ve hatine bikaranîn di mînakên li jêrê de hatin nîşandan.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁷⁵

Şed car şukir Ellah çî kir berxê mi bir şev hat û mir
Me **şikest pişt** quwwet çû rişt ev tişt û mişt pûçin temam(1)

Ji Mela Zahirê Tendûrekî⁴⁷⁶

Da em nekin qeṭ‘a dilan ji gulşenan û hem gulan
Nalîn biken wek bilbilan lê j’ber çûna zulf sunbulan
Pişt da dinê şeyx û melan lewra bi dil me fetîlan
Mirin bi nîz me qewîlan derdê bi zehrê ‘emilan
Sist kir li şec‘anan milan der exzê ruḥ xûdwekîlan
Dayî me rûḥ ji ḥubba dilan lewra di mewtê bûne şecî‘ (5)

Seydayê Tîrêj⁴⁷⁷

Ey birader mirina malikxerab bêbext û dîn
Dest li ber nayête hildan tê me ew her dem bi kîn(13)

Ji ber ku barê firaqê û ya êş û elema mirinê ji şa‘ir re ew qas giran tê, ew carinan dixwaze temamê; mislimanan, ins û cinan, tiştên jîndar an nejîndar û temamê alemê

⁴⁷⁵ Nalbend, *h.b.*, r.13.

⁴⁷⁶ Tendûrekî, *h.b.*, r.207.

⁴⁷⁷ Tîrêj, *h.b.*, r. 368.

wek wî şîne bigre. Mersîyenûs vê yekê dike da ku êş û elema tê kişandin bê famkirin û barê li ser milên wî û êşa di qelbê wî de parîkek be jî sivik bibe. Di bendên mersîyeyên li jêrê de weke ku tê dîtin ji ber êş û elema tê kişandin mersîyenûs dixwaze barê li ser milê xwe yê huznê û êşa di qelbê xwe de sivik bike. Ew, ji bo vê yekê bang li temamê mislimanan û alema Qur'anê dike da ku ew jî digel wî şîne bigirin.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulhadîyê Comanî⁴⁷⁸

Tevde werin cumle **temamê muslimîn**

Ehlê şerqê ehlê gerbê ecme'în

Pur bikin ah û fiğan û pur girîn

Ax hezîn im ax hezîn im ax hezîn (1)

Ji Mela Ebdussemedê Comanî⁴⁷⁹

'**Alema Qur'anê** tev zarî bikin şîn û girîn

Ev muşîbet pur giran e lazim e huzn û enîn

Lew 'urûc bû bi semaê şemsê vê dînê mubîn

Pur qebahet bû li me êdî bikin ferh û kenîn(3)

Şa'ir dema kul û keder, êş û elema xwe tîne zimên serî li gelek hunerên edebî yê mîna teşbîh, teşxîs û hwd. dide. Ev yek di ekseriyetê mersîyeyan de bi şiklekî xurt tê dîtin. Di mersîyeyên li jêrê de jî tê dîtin mersîyenûs serî li hûnerên edebî yê mîna teşbîh û teşxîsê dane û derd û kulên xwe bi vê rêyê anîne zimên.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴⁸⁰

Ji firaqa te dikêşin gelekî êş û elem

⁴⁷⁸ Amedî, *h.b.*, 2004b, r.21.

⁴⁷⁹ Amedî, *h.b.*, r.12.

⁴⁸⁰ Hezroyî, *h.b.*, r.152.

Ji xiyala te ne mecrûh ji ser ta bi qedem
Her **wekî bulbulê şeyda** ne di gemxaneyê gem
Tu **gulek Nazik î** ey xwace di gulzarê irem
Ya tu rûh î û mucerred qefesa **şubhê leşîn**(5)

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁸¹

‘Andelîb in şûfî û bilbil murîd in malxirab
Çûne nav bağ û hedîqa **gul nedît** û man hezîn(23)

Di mersîyeyên ku Kurdî yên ku hatine nivîsîn de dîsa tê dîtîn, şa‘ir ji ber mirinê ew qas zêde êş û elemê dikşîne ku êdî ev دنیا li ber çavê wî bi tamamî reş dibe û ew ji bo wesletê daxwaza mirina xwe dike. Ev yek zêdebûn û giranbûna êşa ku ji ber mirinê pê re peyda bûye nîşan dide.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁸²

Min ji îqbala xwo ew ro kirye gazinde û şekat
Xwoşîyek min jê nedîte çend min kir bît û xebat
Talibim weşl û rîza te bessin ev ‘emir û heyat
Paşî mirinê serferaz bim ehlê îşlah û reşad(7)

Heta vê derê şîna ku dihat girtin, êş û elema ku dihat kişandin, hêstirên ku dihatin barandin tev ji ber mirina yekî bûn. Lê di edebiyata Kurdî ya klasîk de hinek mersîye hene di wan de li ser kesekî ku hêj nemiriye jî şîna tê girtin, hêstirên barandin. Ev taybetî di wan mersîyeyên ku li ser êsîrketina kesekî yan li ser zirardîtina dîne Îslamê hatine nivîsîn de tê dîtîn. Wek mînak, di pêvajoya xebata ku hat kirin de hat tespîtkirin ji teref Xewsî ve li ser êsîrketina Mîr Mustafa Paşa mersîyeyek hatiye

⁴⁸¹ Nalbend, *h.b.*, r.28.

⁴⁸² *H.b.*, r.2.

nivîsîn. Dema ku em li vê mersîyeya wî dinêrin em dibînin Xewsî di nav halekî bi huzn û şînê de ye û li Mîr Mustafa Paşa digere. Lê ev halê bi huzn û şîn a Xewsî ne ji ber wefata Mîr Mustafa Paşa ye, li ser êsîrketina wî bi xwe ye.

Nimûne:

Ji Xewsî:⁴⁸³

Başaçixan bûye sefer
Çû ew emîrê mûteber
Ew ma li wê cîh bê mefer
Kanê Muştefa Beg naxuyê (1)

Her wisa yek ji van cûreyên şîngirtinê ya di mersîyeyên Kurdî de ew mersîye ne ku li ser dîn hatine nivîsîn. Nûnerê vê yekê Qewmanî ye. Qewmanî di dema dagirkirina axa Mislîmanan de dibîne ku malên Mislîmanan hatine wêrankirin, zilm û zordarî li wan tê kirin û dînê Îslamê pir zirar dîbîne. Ew bi vê yekê pir diêşe û radibe li ser vê rewşê mersîyeyekê dinivîse. Qewmanî di mersîyeya xwe de li ser dînê Îslamê bi xwe şînê digire.

Nimûne:

Ji Hadîyê Qewmanî⁴⁸⁴

Hey ho hewar hey ho hewar hey wax li min dînê mubîn
Hey wax û feryad û sitar hey wax li min dînê mubîn(1)

Hey wax li min dîn çû ji dest em mane bêheş mane mest
Reş bû li me dewran û bext hey wax li min dînê mubîn(2)

Reş bû li me dewr û zeman dîn çû ji dest me eleman
Em mane bêhêvî guman hey wax li min dînê mubîn(3)

⁴⁸³ Ulugana, *h.b.* r.8.

⁴⁸⁴ Qewmanî, *h.b.*, r.37.

Di matem û şîna ku di mersîyeyan de tê girtin de herî zêde peyvên mîna; *ax û ax, çû, rihlet kir, dirîx, hesret, ah û enîn, feryad, fixan, nale, feryadîres, qîr, hewar, qêrîn, girî, derd, matem, hey hawar, kanî, wax, heywax, zar û zar, zar û şîn, derd, birîn, ceger, nalîn, renc, qehir, xezeb, fîraq, afat, bela û hwd.* tên bikaranîn. Ev terîm û peyv yê herî muhîm ên şîngirtinê û qalkirina êş û elemê ne.

3. Pesindayîn

Di mersîyeyên Kurdî de beşeke din a ku derdikeve pêş dayîna pesnê ye. Dema ev pesindayîn tê dayîn ji hunerên edebî gelek zêde sûd tê wergirtin. Bi van huneran ew kesê ku mirîye; ger alim be pesnê wî di warê 'ilmê de, ger wek rêberekî hatibe qebûlkirin pesnê wî di warê jêhatîbûn û kêrhatîbûnê de û ger endamekî malbatê bi xwe be pesnê wî yê di nav malê de tê dayîn û qala qencî û başiyên wî kesî tê kirin.

Di mersîyeyên Kurdî yê ku hatin berhevkirin de gelek mersîye hene ku li ser beg, axa, şêx, rêber, endamên malbatê, Hz. Huseyîn, siyasetmedar, hunermend, dost û hevalan hatine nivîsîn. Ev kesên mersîye li ser wan hatine nivîsîn bi xwe jî şîklê didin herikîna pesindayîna kesê mirî. Dema ku ev pesindayîn tê dayîn serî li şayesandin û hunerên edebî tê dayîn. Di hinek mersîyeyan de ev pesindayîn gelek dirêj û di hinekan de jî kurt e. Mersîyenûs dema ku vê pesindayînê dike qedr û qiymeta li ber çavên xwe ya kesê mirî nîşanî me dide. Kesê ku mirîye mîr an jî axa be bi gotineke din di nav gel de wesfê îdarevantîyê girtibe li ser xwe wê demê di warê îdarevantî, şervantî û mêranîyê de pesnê wî kesî tê dayîn. Di wan mersîyeyên ku ji teref Ehmedê Xanî û Weda'î ve hatine nivîsîn û mînakên wan li jêrê hatine dayîn de tê dîtin ku mersîyenûs di warê şervantî, mîrxasî, dilawerî û wêrektîyê de pesnê lehengên mersîyeyan didin.

Nimûne:

Ji Ehmedê Xanî⁴⁸⁵

Mîrê di nêv mîran bi nav, esheb suwarê rim zirav
Bala bilindê perr belav, ka Padîşahê Serhedan?(3)

⁴⁸⁵ Durre, *h.b.*, r.336.

Ji Weda⁴⁸⁶

Romê dema 'esker dikir bê hedd û bê defter dikir
Mîr leşkerê wan ker dikir kanê Cîhangirê cîhan(4)

Dîsa di mersîyeyan de tê dîtîn kesê mersîye li ser wî hatiye nivîsîn ger kesekî di nav Kurdan wek rêber û pêşewayekî hatibe qebûlkirin be wê demê qala fazîlet, qencî û başiyên wî tên kirin. Dû re pesnê wî ya di warê fedakarîyê de tê dayîn. Di beytên mersîyeyên li jêrê de Seydayê Tîrêj di vî warî de pesnê Mela Mistefa Barzanî û Ehmedê Namî jî pesnê Haco Axa dide.

Nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁴⁸⁷

Mêvanekî pir **qenc û ezîz î**
Rêzanekî **hêja û temîz î**(29)

Ji Ehmedê Namî⁴⁸⁸

Agê me Haco ê **dilovan,**
Ġemxwarê feqîr û jarên Kurdan

Di vî warî de xalekî dîn a ku pêwîst e bê gotin heye. Ew jî ev e: Exlebeyê mersîyeyên ku bi Kurdî hatine nivîsîn li ser şêx, alim, seyda û meleyan e. Ev yek bi xwe jî di warê naveroka pesindayîne de şikl dide pesindayîne. Bi gotineke din eger mersîye li ser kesekî ehlê ilm û tesewûfê hatibe nivîsîn wê demê pesindayîn bi peyvên ku bi ilm û tesewûfê ve girêdayîne tê kirin. Di van mersîyeyên ku wek nimûne li jêrê hatine dayîn de tê dîtîn; Hezroyî, Baqûstanî û Comanî dema ku pesnê kesê wefatkirî

⁴⁸⁶ Weda'î, h.b., r.95.

⁴⁸⁷ Tîrêj, h.b., r.135.

⁴⁸⁸ Temo, h.b., r.770.

didin peyvên mîna; zikir, zahid, ‘abid, zakir, terîqet, heqîqet, behra ‘ulûm û hikmet û şemsa terîq û huccetê bi kar tînin.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴⁸⁹

Heyat û raşeta dil bû di nav sahib dilan gul bû
Di zîkrê heq de bulbul bû gelo kan Hezretî Şanî(11)

Ji Mela ‘Elîyê Baqûstanî⁴⁹⁰

Behra ‘ulûm û hikmet e, şemsa terîq û huccet e
Nûra qulûbê zulmet e, tenê bi wî hidayetê(11)

Ji Mela Ebdussemedê Comanî⁴⁹¹

Zahid û ‘abid û zakir mişlê wî qet kes nedî
Zû tefekkûr bû di şun ‘illahî mewlel ewhedî
Fîl terîqet kal heqîqet seyyidê hem senedî
Der futûhê ma‘newî Heyder Kerrar û Esedî
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef (10)

Di Kurdî de çend mersîyeyên ku li ser şhadeta Hz. Huseyîn hatine nivîsîn hene. Dema di van mersîyeyan de pesnê Hz. Huseyîn tê dayîn navê wî bi Hz. Muhemmed, Hz. Alî, Hz. Fatima û Hz. Hesên re tê zikirkirin ku ev yek ji bo nîşandana qedr û qiymeta Hz. Huseyîn tê dayîn.

Nimûne:

Ji Fehmî Begê Pêçari⁴⁹²

⁴⁸⁹ Turan, *h.b.*, r.314.

⁴⁹⁰ Baqûstanî, *h.b.*, r.94.

⁴⁹¹ Amedî, *h.b.*, 2004b, r.12.

⁴⁹² Demir, *h.b.*, r.173.

Rewneqê fushetserayê Muştefa yî ya Huseyn
Werdê der gulşennewayê dilkula yî ya Huseyn(1)

Mersîyeyên ku di vê beşê de hatin zikirkirin û ji wan çend mînak hatin dayîn tev li ser wan kesên ku wefatkirine yan jî hatine kuştin, hatine nivîsîn. Di van de pesna şexsekî tê dayîn û qala fezîlet, başî û başbûnên wî tê kirin. Lê divê vê gotin di edebiyata Kurdî ya klasîk de hinek mersîye hene ku ne li ser şexsekî li ser welat bi xwe, ne li ser mirinê li ser dûrbûn û hezkirina welat bi xwe hatine nivîsîn. Di van mersîyeyên wisa de mersîyenûs dema ku şînê digire li ser welat şînê digire û dema ku dest bi beşa pesnê dike tê de pesnê welat bi xwe dide. Di mersîyeya ku ji teref Silêman Bedirxan ve li ser dûrbûn û hezkirina welat bi xwe hatiye nivîsîn de tê dîtin ku mersîyenûs di mersîyeya xwe de pesnê welatê xwe dide û qala xweşîkbûn û bedewbûna wê dike.

Nimûne:

Ji Silêman Bedirxan⁴⁹³

Welatê me gul û reyhan
Jê têtin her bihna cînan
Em pê bûne mest û mestan
Hetta ebed axir zeman

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan (7)

Her çend welat wek şekir e
Halê zozan şerîntir e
Ew sîr û mast hêj xweştir e
Bi hezaran jê çêtir e

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan(8)

⁴⁹³ Silêman Bedirxan, *Ax Kurdistan*, Kovara Hawar, İstanbul 2012, Weş. Belkî h.10, r.146.

Wek encam em dikarin ji bo vê beşê bibêjin mersîye li ser kî hatibe nivîsîn li gorî taybetîya wî û cihê wî yê di nav civak û cîhanê an jî malbatê de wesf û pesnê wî tê dayîn. Ji bo peyvên ku di mersîyeyan de pesna kesê mirî pê tê dayîn em dikarin van peyvan mînak bidin: *Canfida, Şîrîna Ferhad, şekir, şîrîn, xweşik, Zîna Botan, şêrîn, şehbaz, hebîb, dilruba, rimbaz, çeşmê şehla, esed, mislê Xalid, meş 'ela xawer, şemsa munîr, şêxê cihan, cewher, serwer, ehlê suhbet, şemsa dinê, cesûr, tiryaq, behra 'ulûm û hikmet, şemsa terîq û huccet, şêr, şûr, şîr, 'ezîz, şîrîn zeban, alim, cewher, durr, durra sedef, bulbulê xweşxwan, şehsiwar, şah, rêber, piling, gul, zana, jîr, tac, şah, xaqanî, edeb, tûtî, şêrîn kelam, xweş xeber, rengîn, wefakar, emekdar, fanûs, fener, xonçe, ebrû mah, afîtab, rûgeş, comerd, ciwamêr, dilfireh, devliken, destvegirtî, miskê tatar, zakir, 'abid, zahid, şebçirax, maden û hwd.*

4. Sîtema ji Felekê re

Ji berê ve dema ku di nav civakê de tiştekî nebaş an jî kovandar û elemnak pêk tê însan felekê wek berpîrsê û mesûldarê vî tiştê ku pêk hatiye dibînin û gazinan jê dikin. Ev yek wek adetekê di nava civakê de cihê xwe girtiye û hêj berdewam dike. Di wan mersîyeyên ku bi Kurdî hatine nivîsîn de jî ev adet cihê xwe girtiye. Şa'ir di gelek malik û bendên mersîyeyên xwe de ji felekê re bertekên dijwar nîşan didin. Lewra li gor şa'iran mesûl û sedema vê mirina ku pêk hatiye felek bi xwe ye.

Derheqê hêmana felekê ya ku dikeve nav hêmanên alema kozmîk de gelek nirxandin hatine kirin û gelek mane lê hatine barkirin. Yek ji wan jî ji teref Îskender Pala ve hatiye kirin. Pala di berhema xwe de derheqê vê hêmana felekê ya ku şa'ir wê wek mesûlê mirina kesekî dibînin de nirxandineke wisa dike:

"Li gorî bawerîya ku çavkanîya wê pergala Batlamyos e; dinya navenda kaînatê ye û 9 felek dinyayê dorpêç kirine. Bi dorê rêza van gerstêrk/seyyareyan wisa ye: Heyv, Utarîd, Zuhre, Tav, Merih, Muşterî û Zuhal e. Di feleka heştêmîn de burc û stêrkên sabît ên ku naleqin hene. Di feleka nehemîn de feleka atlas heye ku ev felek a herî mezin û bilind e û temamê felekan dorpêç dike. Dema ku ev felek dizivire zext li wan felekên din jî dike da ku digel wî bi aliyê ku ew dizivire de bizivirin. Bi gotineke din ew, wan jî vê yekê re mecbûr dihêle. Ji ber vê yekê ew felekên ku beravajîya îstîqameta xwe dizivirin tesîr li ser talîh, refah, bext û kêfxweşî û şadîya însanan dikin. Sedema gazin û gîlîyên însanan a ji felekê ev e. Ji ber ku piştî feleka

*nehemîn ilmê Xweda dest pê dike, însan gazin û gilîyên xwe li vê felekê dikin û wê wek mesûla qedera xwe dibînin.*⁴⁹⁴

Ev tablo û rewşa ku qala wê hat kirin di mersîyeyên ku bi Kurdî hatine nivîsîn de jî bi şiklekî aşkere tê dîtin. Mersîyenûs di mersîyeyên xwe de felekê wek mesûlê mirina pêk hatiye dibînin û jê gazinan dikin û mersîyeya xwe bi gazina ku ji felekê dikin, didin destpêkirin. Di mersîyeyên ku ji teref Mela Hesenê Qerenazî û Mela Muhammedê Saricanî ve hatine nivîsîn de tê dîtin ku ew, felekê wek mesûlê mirina pêk hatiye dibînin. Li gor wan kesê hezkirîyên wan ji destên wan standiye û wan ji hev dûr xistiye felek bi xwe ye.

Nimûne:

Ji Mela Hesenê Qerenazî⁴⁹⁵

Îro ji ber zulma felek
Dil bû bi êşan muhtela
Wan nezerên çehvên belek
Dûr kir ji min şed merhela(1)

Ji Mela Muhammedê Saricanî⁴⁹⁶

Dîsa felek ku îro rabû li me weha kir
Wî şeyxê pakê nûrî girt û li me cuda kir(1)

Di hinek mersîyeyên Kurdî de jî tê dîtin mersîyenûs wateyeke cuda li hêmana felekê bar dikin. Mersîyenûs di mersîyeyên xwe de digel berteka ku nîşan dide felekê wek yekî zalim dibîne û hesabê jê dipirse. Em vê yekê di mersîyeyên ku ji teref Mela Ehmedê Nalbend û Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn de dibînin. Ew bi vê sitema ku nîşan didin û gazin û gilîyên ku dikin hesabê ji felekê dipirsin.

⁴⁹⁴ Pala, *h.b.*, r.149.

⁴⁹⁵ Zinar, *h.b.* 1991a, r.294.

⁴⁹⁶ Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî, *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoğlu, Weş. Nûbihar, İstanbul 2011, r.54.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁴⁹⁷

Ey felek şed ax ji ber te wek te ma zalim hene
Bê wefa û 'ehden ev gerhan û dewr û çerxe ne (1)

Ji Feqîyê Teyran⁴⁹⁸

Ey felekê bê wefayê te çira muhlet nedayê
Yar di nêv axê gihayê ey felek bê mirwetê (8)

Dîsa di heman mersîyeyên Kurdî yên ku hatine nivîsîn de ji bilî gazin û gilîyên ku ji felekê tê kirin û ji bilî ji felekê hisabpîrsînê tê dîtîn ku mersîyenûs felekê wek çavkanîya tamamê eş û elema ku dikşîne diwesfîne. Di van mersîyeyên ku ji teref Mela Ebdulfettah Hezroyî û Fehmî Begê Pêçarî ve hatine nivîsîn de tê dîtîn mersîyenûs eş û elemeke pir zêde dikşînin. Ji ber vê yekê mersîyenûs qala wî halê ku ew tê de ne dikin û sebaba vê eş û elemê jî dibêjin felek bi xwe ye. Ev yek di gelek mersîyeyên Kurdî de tê dîtîn.

Nimûne:

Ji Mela Ebdulfettahê Hezroyî⁴⁹⁹

Ji cefaya te gelek sîne û dil tev herişîn
Ji kevanê gezeba te di hezar keşmekeşîn
Her li dûv hev qedeha derd û gema te diçeşîn
Dem bi dem nale û feryad û fiğanan dikeşîn
Ey felek qeş me nedî kes ku bi hukmê te xweşîn(1)

Ji Fehmî Begê Pêçarî⁵⁰⁰

⁴⁹⁷ Nalbend, *h.b.*, r.35.

⁴⁹⁸ Sadîni, *h.b.*, 2014a, r.139.

⁴⁹⁹ Hezroyî, *h.b.*, r.152.

⁵⁰⁰ Demir, *h.b.*, r.180.

Ah û fiğan û şed hewar gazy û nalîn bê qerar
Dil xûn kirim hicra xeddar ah û enîn ah û enîn(3)

Zulma felek mehcûr kirim nalende û rencûr kirim
Anîm di hev de hûr kirim ah û enîn ah û enîn(4)

Dema ku em li mersîyeyên li ber destê xwe mêze dikin, em dibînin ji bo feleka ku ji teref şa'ir ve wek mesûlê mirinê tê dîtin, ev peyv û wesfên mîna; xayîn, bêsoz, bêbext, neyar, zalim, kor, xurt û zor, xiyanet, kîndar, bêwefa, rûsîya, mala te ne ava, feleka wêran, har, xeddar, bêminwet, bêîtîbar, bêwîcdan, bêdîn û hwd. tên bikaranîn û bi van peyv û gotinan bertek jê re tê nîşandan.

5. Dinya-Axiret

Di mersîyeyên Kurdî de beşeke din a ku tê dîtin dinya û axret e. Di mersîyeyên ku hatin berhevkirin de dinya geh warê xweşî û bextewarîyê û geh jî cihê kişandina êş û eleman e. Lê her çiqas mirin ji şa'ir re tehl were jî ew dizane ku ev dinya fanî ye û ew ê jî rojekê bimire û biçe axretê. Ew vê bawerîya xwe jî ji dîne Îslamê werdigre û axretê wek warê wesletê dibîne. Di mersîyeyan de tê dîtin bi gelemperî ji bo dinya û axretê ev peyv ji teref edîbên Kurd ve tên bikaranîn: *Fanî, denî, behrê xem, qirêj, warê êş û eleman, ne hêja û biteqreq, 'alem, milk, bax, 'uqba, baqî, dar 'ul-beqa* û hwd.

Dema em li mersîyeyên Kurdî dinêrin em di hinek cihan de dibînin ku dinya li ber çavê mersîyeyên şêrîn û xweş e. Lêbelê ev şêrînbûn û xweşî heta derekê berdewam dike. Lewra digel mirina kesê ku şa'ir jê hez dike, ev dinyaya ku ji bo wî xweş û şêrîn e vêca dibe warê derd, kul, êş û eleman.

Nimûne:

Ji Mela Sidîq⁵⁰¹

⁵⁰¹ Mela Sidîq, "Cerg û Dilê Min Kir Birîn Deng û Nidaya Rihletê", ev mersîyeya ku li ser Şêx Muhammed Selîmê Hezanî hatiye nivîsîn ji destxeta Mela Ehmed Yalar a bêçap û bêreqem hat girtin.

Dinya li min bû behrê gem keyf û serwerê min bû 'edem
Derdê dilêmin nayê qelem nayê hesab û qışsetê(8)

Dîsa di heman mersîyeyên Kurdî de tê dîtîn ku mersîyenûs piştî kişandina êş û elemê, vêca bi hebûna heqîqeta mirinê dihesê û diyar dîke ku ji mirinê rev tune ye û ew ê rojekê derkeve pêşîya wî bi xwe jî. Her wisa ji ber êş û elema ku tê kişandin şa'ir piştî ku şînê digire, dîke nale nal, feryad û fixan balan dikşîne li ser derbasdar û fanîbûna dinyayê. Bi vê yekê mersîyenûs qebûl dîke ku dinya fanî ye û kes lê ebedî jîyan nake. Mînakên vê yekê di mersîyeyên ku ji teref Seydayê Tîrêj, Mela Hesenê Qerenazî û Mela Xelîlê Zoqeydî ve hatine nivîsîn de tên dîtîn. Me ji bo vê yekê li jêrê mînak dan.

Nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁵⁰²

Çi qasî tu li dinyayê bimînî
Tu dê mirnê bi çavên xwe bibînî(25)

Ji Mela Hesenê Qerenazî⁵⁰³

Nedîm wek wî di nêv rindan, di şehr û hem ne di gundan
Şêrintir j' hingiv û qendan, ji dinya fanî hîcret kir(8)

Ji Mela Xelîlê Zoqeydî⁵⁰⁴

Bizanin ey ulu'l-cezmê ji paş Mehmûdê zi'l-gemmê
Şefa nîne di vê bezmê di wê dunyayê dar fanî (24)

⁵⁰² Tîrêj, *h.b.*, r. 142.

⁵⁰³ Zinar, *h.b.*, 1991a, r.296.

⁵⁰⁴ Adak, *h.b.*, 2019a, r.144.

Mersîyenûs piştî van qonaxên ku me qala wan kir cardin xemgînîyên xwe tîne zimên. Lêbelê vêca hêmana axretê dide pêş û axretê wek wargeha hatina ba hev a digel kesê wefat kiriye diwesfîne. Di vê xalê de mersîyenûs lavayî ji Xwedê dike da ku wî bigihîne wî kesê wefat kiriye.

Nimûne:

Ji Seyîd ‘Elîyê Findikî⁵⁰⁵

Ey Se‘îdê her du dunya dîtina te bû keder

Em j’ Xudayê xwe dixwazin l’axretê em l’cem te bî(8)

6. Sebir

Di mersîyeyên Kurdî de yek ji wan beşên ku şa‘ir barê xwe lê sivik dike û asta xemgînî û êşa xwe lê dadixe beşa sebrê ye. Lewra mersîyenûs di mersîyeyên xwe de ji ber êş û elem û firaqê him xwe û him jî kesên li derdora xwe tesellî dike. Ev têgeha bi navê sebrê hema hema di temamê mersîyên Kurdî de cihê xwe girtiye. Ev têgeh carina ji şa‘ir re dibe wargeha bêhnvedan, tesellî û taqatê. Beşa sebirxwestinê di mersîyeyên Kurdî de her tim di beyt an jî bendên dawî de cî nagire. Carina di destpêka helbestê de carina jî di cihên din de cihê xwe digire. Dema ku ev yek tê kirin an jî tê gotin peyvên mîna *bike*, *bide*, *hêvî* tînin bikaranîn. Bi vê formê ji Xweda tê xwestin ku sebrê bide wî û ehlê mirî. Di mersîyeyên Kurdî de sebir bi form û şiklên cuda xwe nîşan dide. Ji ber vê yekê em ê di vê beşê de digel mînanan li ser van forman birawestînin û bi şiklekî hûrgilî qala vê yekê bikin.

Di mersîyeyên Kurdî de mersîyenûs ji ber mirina ku pêk hatiye berê xwe dide Xwedayê ku pê îman anîye û di çarçoveya xwestina alîkarîyê de jê sebrê temennî dike da ku ew li ber vê êş û elemê bibe xwedî taqet û teslîmî tiştê teqdîrkirî bibe. Di vê bend û beyta li jê re de weke ku tê dîtî mersîyenûs ji ber wefatê hezkirîyekî xwe êş û elemê dikêşîne. Ji ber ku ev êş û elem li mersîyenûs ew qas zor dike, ew ji Xwedê lavayî dike da ku sebrê bide wî.

⁵⁰⁵ Findikî, *h.b.*, r.227.

Nimûne:

Ji Mela Mûsayê Mizî⁵⁰⁶

Ger şêstî 'umur kim û bimînim li heyatê
Bêjim ji ewel da kul û derdê di şebatê
Nabit ku xelaş bin ji ewel ta sekeratê
Hêvî ji Xweda min **bide şebr û qene'atê**
Minet ji Xwedê ra ku ji bo min hewes î (1)

Ji Mela Hadîyê Qewmanî⁵⁰⁷

Weqta ku çûye qebrê bû şed fîğan û gazî
Ya Reb! bide **tu şebrê** bi şeyxê serfirazê(4)

Her çi qas şa'ir bi gelemperî daxwaza sebrê bike jî ev yek carinan şûna xwe ji sebirnekirinê re berdide û şa'ir sebirnekirina xwe ya li hember derd û kulan a ji ber mirinê di mersîyeyan de tîne zimên. Di nimûneyên li jêrê de jî tê dîtin mersîyenûs piştî ku qala derd û kul û her wisa êş û elemên xwe dikin serî li têgeha bêsebirbûnê didin. Ew bi vê yekê destnîşan dikin, ji ber zêdebûna zexta êş û eleman êdî ew nikarin sebir bikin.

Nimûne:

Ji Şêx Hemze Hîmmetullah⁵⁰⁸

Dinalim min **şebir nayê**
Birîndar im ji ahşayê
Nemînim ez li dinyayê
Di wî huzn û birîndarê (8)

⁵⁰⁶ Zinar, *h.b.* 1991a, r.264.

⁵⁰⁷ Qewmanî, *h.b.*, r.54.

⁵⁰⁸ Ahmet Alan, *Hetawî Kurd*, Weş. Avesta, İstanbul 2016, r. 286.

Ji Mela Zahirê Tendûrekî⁵⁰⁹

Man **bêşebir qelbê** me mir derûn ji girr lew bûye pir
Nefxa semurr di qelbê dumer lê ne eşer ma bê mefer
Ma bêqerar bi derdê gedar hubba ji yar bû aşîkar
Dûr bû ji diyar bêşehrîyar serkofte mar lew bûne mat (2)

Hinek mersîyeyên Kurdî de mersîyenûs piştî sebirkerin an jî sebirnekirinê digel ku êş û elema mirinê ji bîr nekiribe jî dev ji gazin û gilîyan û kişandina êş û eleman berdide. Dema ku vê yekê dike ew berê xwe dide teqdîra Xwedê û ji qederê re teslîm dibe. Mersîyenûs bi vê yekê bes qezenckirina rizaya Xwedê teleb dike. Di van her du mersîyeyên ku ji teref Nalbend ve li ser mirina lawê xwe yê bi navê Muhemmed hatine nivîsîn de tê dîtîn, Nalbend piştî astekî êdî dev ji şîn û girînê berdide û li ber emrê Îlahî serê xwe ditewîne û rizaya wî teleb dike.

Nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁵¹⁰

Û Hikmeta wî kes nizanît çare **teslîm û rîza**
Keyf û gem xoşî û nexoşî pêkve nabin hemqerîn(4)

Min ji îqbala xwo ew ro kirye gazinde û şekat⁵¹¹
Xwoşîyek min jê nedîte çend min kir bît û xebat
Û Talîbim weşl û rîza te bessin ev 'emir û heyat
Paşî mirinê serferaz bim ehlê îşlah û reşad(7)

7. Di' a-Temennî

Beşa di' a û temennîyan di temamê mersîyeyan de beşeke muhîm û taybet e û exleb di dawîya mersîyeyê de cî digire. Mersîyenûs di vê beşê de ji bo kesê mirî

⁵⁰⁹ Tendûrekî, *h.b.*, r.41.

⁵¹⁰ Nalbend, *h.b.*, r.28.

⁵¹¹ *H.b.*, r.3.

rehmetê teleb dike û ji Rebbê aleman daxwaz û temennî dike ku ew kesê mirî bike cennetê. Her wisa di vê beşê de dîsa di‘a tê kirin da ku Xweda sebrê bide wî bi xwe û ehlê kesê mirî.

Mersîyenûs di vê beşa di‘ayê de bi daxwaz û temennîyên cuda cuda derdikeve pêşîya me. Ji bo mesele baş bê famkirin em ê çend xalan digel mînak nîşan bidin û dû re formên di‘ayê yên ku herî zêde di mersîyeyan de tên bikaranîn bi rêz bikin.

Ji formên di‘ayê ya ku ewil derdikeve pêşîya me û ji teref mersîyenûs ve gelek zêde tên bikaranîn daxwaza rehmê ya ji Xwedê ye. Mersîyenûs bi lavayîyan ji Rebbê xwe daxwaz dike ku ew, rehma xwe li ser kesê mirî bibarîne û wî efû bike. Di van her du beytên ku li jêrê wek mînak hatine dayîn de Ehmedê Namî ji bo Haco Axa û Seyîd ‘Elîyê Findikî ji bo Se‘îdê Nûrsî, ji Xwedê rehmê teleb dikin.

Mînak:

Ji Ehmedê Namî⁵¹²

Ey Xwahê mezin tu çendî pakî,
Haco tu bi rehma xwe şa kî.(39)

Ji Seyîd ‘Elîyê Findikî⁵¹³

Çû wefat kir çî mûşîbet şed hezar rehmê li ser
J’ehlê vî dînê mûbîn ra çî numûnek taze bî(5)

Di mersîyeyên Kurdî yên ku hatine nivîsîn de mersîyenûs ji bo kesê mirî yê ku tê xistin qebrê û bi tena serê xwe dimîne jî di‘a dike. Mersîyenûs di vê xalê de dîsa ji Rebbê xwe ji bo kesê mirî daxwaz dike; bila qebra kesê mirî bi nûrê tije bibe, bibe bexçeyek ji bexçeyên cennetê û fireh û geş bibe.

Nimûne:

⁵¹² Temo, *h.b.*, r.770.

⁵¹³ Findikî, *h.b.*, r.227.

Ji Weda⁵¹⁴

Ya Reb ji te destûr bitin qebra vî her pir nûr bitin
Meħremserayê xor bitin kanê Cîhangirê cîhan(34)

Formateke din a di'ayên ku ji bo kesê mirî tê kirin daxwazkirina têketina li cennetê ye. Şa'ir bi di'ayên ku dike daxwaz dike kesê mirî biçe cennetê, têkeve nav hûrîyan û cihê wî û xweş û geş be. Di van mersîyeyên li jêrê hatine dayîn de jî weke ku tê dîtin Baqûstanî û Tîrêj di mersîyeyên xwe de ji bo kesên wefatkirî di'a dikin û ji Rebbê xwe daxwaz dikin ku cihê kesê wefatkirî bibe cennet.

Nimûne:

Ji Mela 'Elîyê Baqûstanî⁵¹⁵

Tu ji min rehmê bikî ya Reb li rûhe wiy temiz
Bên tewafa çar teref wî hûrî û pêncşed melek (9)

Ji Seydayê Tîrêj⁵¹⁶

Xazim bikî hemdemê têniştê
Tu li ber vekî dergehê bihiştê(75)

Di berdewama hinek di'ayên ku tên kirin de tê xwestin Xweda wan kesên mirine bike cîranê Resûlê xwe û tê hêvî û lavayîkirin ku Resûlê Xwedê ji bo wan bibe şefaatkar.

Nimûne:

Ji Mela 'Elîyê Baqûstanî⁵¹⁷

⁵¹⁴ Weda'î, *h.b.*, r.95.

⁵¹⁵ Baqûstanî, *h.b.*, r.90.

⁵¹⁶ Tîrêj, *h.b.*, r.135.

⁵¹⁷ Baqûstanî, *h.b.*, r.94.

Seyda niha çû rehmêtê, ya Reb wê texî cennetê
Nêzî şefî'ê ummetê, em jî heval di wê hedretê(5)

Mersîyeyên ku heta niha qala wan hatin kirin di wan de mersîyenûs bes ji bo kesê mirî û ji bo wê êş û elema ku ew dikşîne di' a dikir. Di hinek mersîyeyên Kurdî yên ku hatine nivîsîn de ev şiklê kirina di' ayê tê guhartin. Lewra hinek mersîye di Kurdî de hene ku mersîyenûs yan berîya mirina xwe yan di halê nexweşîyê de li ser xwe nivîsîye. Mersîyenûsên bi vî şiklî mersîye nivîsîne ji ber êş û elema ku ew ji ber nexweşî yan jî ji ber halê mirinê dikşînin ji Xwedê lavayî dikin da ku ew, sebrê û şifayê bide şexsê wan. Em vê rewşê di mersîyeya ku ji teref Murad 'Elî ve hatiye nivîsîn de dibînin. Dema ku ew bi nexweşîyeke giran dikeve û êş û elemeke zêde dikşîne berê xwe dide Rebbê xwe û ji bo xwe di' a dike.

Nimûne:

Ji Murad Elî⁵¹⁸

Ya Rebbî me setar bike, ji şeytanî hîfîz bike,
Îmana me kamil bike, Xuda tu yî delîlê me (23)

Rebbî, Murad şifa bike, ji derd û bela xilas bike,
Bi rehmeta xo şa bike, Xuda tu yî delîlê me (24)

Hinek şiklên di' ayên ku di mersîyeyên Kurdî de tên kirin bi vî awayî ne: *Ya Reb wê texî cennetê, rehmetullahî 'eleyhî kulle hîn, hebit ocax qedîm, xweş bin emîm, şa key bi lutf û rehmetê, bi rehma xwe şa kî, rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes, her şa bit ev cennetmeqam, biçne cem seyda bedî' pê ra biçin cennetê, çû wefat kir çî mûsîbet sed hezar rehmet li ser, bi rehmeta xwe şa kî, Rîdwan tu bikî heval û rêber, Tu li ber vekî dergehê bihiştê, Îlahî tu Ruhî nekî şermîzar û hwd.*

Dema em li mersîyeyên li ber destên xwe mêze dikin em dibînin nifirên ku berevajîya di' ayan in, di wan mersîyeyên li ser şhadeta Hz. Huseyîn hatine nivîsîn

⁵¹⁸ Celîl, h.b., r.90.

de, hatine bikaranîn. Di warê le'netanînê de mala Aqtepiyan bi mersîyeyên xwe derdikevin pêş. Şêx 'Ebdurrehman Aqtepi û Şêx Mihemed Kerbelayî di mersîyeyên ku nivîsîne de le'netê ji kesên ku Hz. Huseyîn şehîd kirine re dixwînin.

Nimûne:

Ji Ebdurrahman Aqtepi⁵¹⁹

Ĥuseyn gonçeyê bagê Alê 'Eba
Şehîd kir ewî le'netî rû sîya(13)

Ji destê me nayê bikim xîzmetê
Welê ser Yezîdî dikim le'netê(47)

Ji Şêx Muhemmd Kerbelayî⁵²⁰

Şed hezar la'net dibêjin ser Yezîd û tabi'an
Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê Kerbela(13)

⁵¹⁹ Amedî, *h.b.*, 2016a, r.279.

⁵²⁰ Kerbelayî, *h.b.*, r.22.

BEŞA PÊNCÊMÎN

KESÊN KU MERSÎYE LI SER WAN HATINE NIVÎSÎN

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de ji mîr, axa, şêx, seyda, seyîd, endamên malbatê, Hz. Muhemmed, hunermend, xwe, dost û heval û Hz. Huseyîn bigirin heta li ser welat, bajêr, dîn û mirinê bi xwe jî mersîye hatine nivîsîn. Me, mersîyeyên ku li ser rûhber û bêrûhan hatine nivîsîn di vê beşê de kir di du beş. Me ew mersîyeyên ku li ser ruhberan hatiye nivîsîn wek “Mersîyeyên ku li ser şexsan hatine nivîsîn” û wan mersîyeyên ku li ser tiştên bêrûh hatine nivîsîn jî wek “Mersîyeyên ku li ser dîn, welat, bajêr û mirinê hatine nivîsîn” bi nav kir. Piştî vê binavkirinê ji bo her beşekê nixandî hat kirin û metna mersîyeyekê ya transikîrbkirî di bin sernava têkildar de hat dayîn.

Me xebata xwe ya vê qadê ji mersîyeya ewil a ku hat tespîtîkirin di sedsala XVIIem de ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn da destpêkirin û heta Şerê Yekem a Cîhanê sînordar kir. Di encama xebata ku hat kirin de hat tespîtîkirin di vê wextê ku hatiye sînordarkirin de bi tevahî 183 mersîye hatine nivîsîn.

Em ê di vê beşê de mersîyeyên klasîk ên ku ji teref mersîyenûsan ve hatine nivîsîn ji hêla wan kesên ku li ser wan hatine nivîsîn ve dabeş bikin. Her wisa em ê di vê beşê de destnîşan bikin ka li ser kîjan tebeqeyê û an jî tiştî çend mersîye hatine nivîsîn û rêjeya wan a di nav mersîyeyan de çi qas e. Dîsa em ê netîceya ku dê derkeve holê wek grafîkê destnîşan bikin. Herî dawî em ê di dawîya her beşa li ser wan mersîye hatine nivîsîn de bes mersîyeyekê wek nimûne bidin û nixandîna wê **bikin**.

A-MERSÎYEEYÊN KU LI SER ŞEXSAN HATINE NIVÎSÎN

1.Ên ku li ser Mîr û Axayan Hatine Nivîsîn

1.1. Mîr

Ev cûre mersîye ew mersîye ne ku li ser mîrê herêmekî hatine nivîsîn. Di van mersîyeyan de di navbera kesê ku mersîye nivîsîye û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn de têkilîyekî xurt û bi hêz heye. Ji ber têkilîya di navbera mersîyenûs û kesê wefatkirî de û ji ber himayet û xwedîderketina wî kesê mîrî ya gelê xwe û herêma xwe

mersîyenûs, mersîyeya xwe bi dilekî şewat dinivîsîne. Mersîyenûs dema ku vê mersîyeya xwe li ser axa yan jî began dinivîsîne hest û ramanên xwe bi zimanekî ji dil û can destnîşan dike. Mersîyenûs dema li ser mîrê xwe mersîye dinivîsîne him di beşa şîngirtinê û him jî di beşa pesindayînê û her wisa carinan di beşên din wesfên îdarevantî, xwedîderketin, dilawerî û mêrxasîya wî mîrê rehmet kirî dikan.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de hat dîtin bi Kurdîya Kurmancî bes ji teref 3 mersîyenûsan ve sê mersîye hatine nivîsîn. Wekî din nehat dîtin ku di vê qadê de mersîye hatine nivîsîn. Dewra mîrektîyên Kurdan bi Herba Çaldêranê ku di sala 1514an de hatiye kirin dest pê dike û bi Qanûnnameya Wîlayet a ku di sala 1846an de hatiye derxistin bi dawî dibe. Di vir de tişteki balkêş heye. Ew jî digel hebûna bi dehan mîrektîyên Kurdan di vê wextê navborî de kêmbûna mersîyeyên bi Kurmancî yên li ser mîran e. Lewra di vî wextî de şa'irên Kurdan di bergeha patronaja edebî de gelek berhem an jî şî'ir telîf kirine. Lê di vî warî de ji xeynî 3 mersîyeyên bi Kurdî(Kurmancî) wekî din mersîye nehatin dîtin. Yakup Aykaç jî di xebata xwe ya bi navê “*Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*” de bes qala sê şa'irên Kurd dike ku ew li ser mîrên xwe mersîye nivîsîne.⁵²¹

Mersîyenûsên vê qonaxê Ehmedê Xanî, Xewsî û Weda'î ye. Mersîyeya ewil a ku li ser mîran hatiye nivîsîn a Ehmedê Xanî ye. Xanî vê mersîyeya xwe ya bi navê “*Kanê Muhemmed Beg Gelo*” li ser wefata Mîrê Bazîdê Muhemmed Begê Purbelalî nivîsîye. Mersîye, bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn û ji 31 malikan pêk tê û qaliba wê ya arûzê jî mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun e. Xanî ji ber ku katibê fermî yê Muhemmed Beg bû û gelek salan pêkve mane di navbera wan de têkilîyeke xurt û ji dil û can çêbûye. Ev yek xwe di mersîyeya ku Xanî li ser wefata Purbelalî nivîsîye de nîşan dide. Xanî ji ber mirina Muhemmed Begê Purbelalî gelek zêde tesîrdar dibe û mersîyeya xwe ya ku ji 31 beytan pêk tê bi gotina “*Kanê Muhemmed beg gelo? Ka Padîşahê Serhedan*” dide destpêkirin û pîrsa mîrê xwe dike. Ev yek jî destnîşan dike ku ew li hember mîrê xwe ehlê wefayê ye. Lewra di nezera Xanî de ew, padîşah û desthilatdarê Serhedan bû. Dema li mersîyeya wî bê mêzekirin ewê bê dîtin ku Xanî ji ber wefata Muhemmed Beg êş û elemeke zêde dikşîne û xemgîn dibe. Di mersîyeyê de Xanî ji alîyekî ve li ber mirina wî dikeve û ji aliyê din

⁵²¹ Aykaç, *h.b.*, r.400-423.

ve jî pesnê wî dide û qala mêranî û mêrxasîyê wî dike. Xanî dema vê yekê dike serî li hunerên edebî dide. Xanî, di mersîyeya xwe de ji ber wefatkirina Muhemmed Beg, bi temametî 32 caran gotina “*Ka Padîşahê Serhedan*” dubare dike ku ev yek jî nîşan dide wefata Muhemmed Begê Purbelalî birîneke kûr a ku qemûşk nagire pê re vekiriye. Ji ber vê sedemê ew, ji alîyekî ve dinale, dike feryad û fîxan û ji alîyê din ve jî pesnê Purbelalî dide. Di mersîyeyê de tiştêkî din a balkêş heye ku ew jî destpêk û dawîya helbestê ye ku ev yek; wê qedr û qiymet û cihê Muhemmed Begê Purbelalî ya li ba Ehmedê Xanî nîşanî me dide. Her wusa taybetîyeke din ê Xanî ya li ber çavan xurtbûna patronajê bi gotineke din sîstema sarayê ye.⁵²²

Mersîyeya duyemîn a ku di vî warî de hatiye nivîsîn a Xewsî ye. Xewsî vê mersîyeya xwe li ser êsîrketina Mîr Mustafa Begê ji mîrên Mîrektîya Bazîdê nivîsîye. Ji mersîyeya ku hatiye nivîsîn tê famkirin Osmanî li ser Gurciyên “Açixbaş” seferek dane destpêkirin û ev mîr jî tevî wê seferê bûye, di seferê de êsîr ketiye û cardin venegerîyaye. Vê rewşê tesîreke pir zêde li ser Xewsî hiştiye û Xewsî mersîyeyekê li ser Mîr Mustafa nivîsîye.

Benda ewil a mersîyeya Xewsî.⁵²³

Başaçixan bûye sefer
 Çû ew emîrê mûteber
 Ew ma li wê cîh bê mefer
 Kanê Muştefa Beg naxuyê (1)

Teşeya nezmê ya mersîyeya ku ji teref Xewsî ve li ser Mîr Mustafa Paşa hatiye nivîsîn, murebbe' û qaliba wê ya arûzê jî mustef' ilun mustef' ilun e. Mersîyeya ku behra wê recez e ji ber ku temamê helbestê nehat bidestxistin nayê zanîn ji çend bandan pêk tê. Dema ku em li her du bendên mersîyeya ku ji teref Xewsî ve hatiye nivîsîn mêze dikin bi şiklekî aşkere dibînin ku ew di bin tesîra Ehmedê Xanî de maye. Lewra di risteyên dawî ya her du bendên mersîyeyê yên ku hatin bidestxistin de tê dîtin ku

⁵²² Ji bo agahîyên zêdetir ên derhêqê patronajê de binêrin: Ayhan Tek, *Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Mukaddîme, h.3, s. 2010, r.41-60.

⁵²³ Ulugana, *h.b.* r.8.

ew gotina “*Kanê Mustafa Beg nexuyaye*” bi kar tîne û nazîre li mersîyeya Ehmedê Xanî ya ku ew bi serwaya “*Kanê Muhemmed Beg Gelo*” nivîsiye dike.

Di warê mersîyeyên ku li ser mîran hatine nivîsîn de nûnerê dawî Weda‘î ye. Weda‘î mersîyeya xwe li ser kuştina Şêxî Begê Mîrê Miksê nivîsiye. Ev mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn û ji 38 malikan pêk tê û bi qaliba arûzê ya mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun hatiye nivîsîn. Ji mersîyeya ku hatiye nivîsîn tê famkirin, Weda‘î vê mersîyeya xwe ya li ser kuştina Şêxî Begê Mîrê Miksê, li ser mersîyeya Xanî ya bi neqereta “*Kanê Cihangîrê Cihan*” ava kiriye. Li gorî beyta dawî ya mersîyeyê Şêxî Beg di sala 1821ê de hatiye kuştin.

Ya qenc ew e em vê bikeyn navî li tarîxê bideyn⁵²⁴

Bo Ğeyn û Rê û Lam û Zeyn kanê cihangîrê cihan (38)

Li gorî hesabê ebcedê ji misraya duyem a vê malikê “*Bo ‘Xeyn û Rê û Lam û Zeyn*” ev tarîx derdikeve: X (1000), R (200), L (30), Z (7)= ev jî dike 1237 ku ev yek teqabûlî 1821ê dike.

Navên mersîyenûs û kesên ku mersîye li ser wan hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyan wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Ehmedê Xanî	Muhemmed Begê Purbelalî	Qesîde	mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun
Xewsî	Mîr Mustafa Beg	Murebbe‘	mustef‘ilun mustef‘ilun
Weda‘î	Şêxê Begî Miksê	Qesîde	mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

Tablo 20: Mersîyeyên ku li ser mîran hatine nivîsîn.

Ji bo wan mersîyeyên ku li ser mîran hatine nivîsîn nimûne:

Ji Weda‘î⁵²⁵

⁵²⁴ Weda‘î, *h.b.*, r.100.

⁵²⁵ *H.b.*, r.95.

Mustef 'ilun Mustef 'ilun Mustef 'ilun Mustef 'ilun

--+-/- --+-/- --+-/- --+-

1. Îro ji destê felekê kanê Cîhangirê cîhan
Bigrîn ji bo Şexî Begê kanê Cîhangirê cîhan
2. Mîrê bi îhsan û kerem kan şahibê cûd û nî'em
Weşfê di vî her de bidem kanê Cîhangirê cîhan
3. Çagê di nav komê diket heybet bi ser Romê diket
Ma ev felek domê diket kanê Cîhangirê cîhan
4. Romê dema 'esker dikir bê hedd û bê defter dikir
Mîr leşkerê wan ker dikir kanê Cîhangirê cîhan
5. Mîrê bi îhsan û xelat ji Romê vegirtin pir welat
'Esker ji Bohtan bo dihat kanê Cîhangirê cîhan
6. Kanê gelo mîrê bi nav 'esker li Romê kir belav
Dijmin bezendin vî tevav kanê Cîhangirê cîhan
7. Ev hâkimê pir nav û deng ji Romê vegirt top û tiveng
Dijmin li ber mabûne teng kanê Cîhangirê cîhan
8. Mîr pir hebû qedr û rewac pêçan evî Rom û Helac
J'behran dihat jê ra xerac kanê Cîhangirê cîhan
9. Xesmê Şikak û Waniyan kan dijminê Ertoşiyân
Koçer li ber Mîr lerziyan kanê Cîhangirê cîhan
10. Hâzîr di îmdada di Mîr Hîzan û Şêrwan û Cizîr
Hetta xoşim nakem ji bîr kanê Cîhangirê cîhan

11. Romî di qels in bêzirav dilerizîn wekî torra di av
Serhed hemî hatin silav kanê Cîhangirê cîhan
12. Serhed selamkarê te bûn dijmin birîndarê te bûn
Jar û feqîr barê te bûn kanê Cîhangirê cîhan
13. Wek Mîr nebûn 'alîhîmem di Kirmanciye hetta 'Ecem
Kan leşker û Ceyş û heşem kanê Cîhangirê cîhan
14. Berda Wezîr û Begleran şebxûn didane 'eskeran
Nayêne şerh û defteran kanê Cîhangirê cîhan
15. Kan hakimê 'alîcenab weşfê di vî nabin hisab
Lê felekê zû kir şîtab kanê Cîhangirê cîhan
16. Ma Mîr tinê îhsan dikir fermandehî l'behran dikir
Vî serwerî l'Westan dikir kanê Cîhangirê cîhan
17. Ma Mîr tinê Westan vegirt! Li ber koçeran Zozan vegirt
hetta cihê Bohtan vegirt kanê Cîhangirê cîhan
18. Dijmin li ber Mîr bûn zebûn Westan û Şax wergirtibûn
Firyad ji çerxa wajigûn kanê Cîhangirê cîhan
19. Her çî dema Mîr ba siwar dijmin dibûne tar û mar
Wergirtibû hetta Xumar kanê Cîhangirê cîhan
20. Ma kes hebû vê ra mecal daim hezar mêr bûn li bal
Teqdîr heqq e nabit be'tal kanê Cîhangirê cîhan
21. Çi b'kem ji vê çerxa felek muhlet neda çavêd belek
Vê nazenîn kuştin gelek kanê Cîhangirê cîhan

22. Carek li teqdîrê binê çerxî gerande kuştinê
Nav û kerem hişte dinê kanê Cîhangirê cîhan
23. 'Esker hegirt û çûyî Şax pekve hinarin çûye Tax
Ev çerx-i pir azar e, ax kanê Cîhangirê cîhan
24. Joryan şihand û Mîr birin şed sûnd û 'ehd jê ra kirin
Mekrê jinan her hazır in kanê Cîhangirê cîhan
25. Mîr xwendin û birne herem jê ra kirin sûnd û qesem
Vekra kirin luft û kerem kanê Cîhangirê cîhan
26. Çi b'kem ji teqdîra Cebar destûr nedan Mîr bête xwar
Wan hişte jor ev şehsiwar kanê Cîhangirê cîhan
27. Mîrê ku pir qedr û wîqar ev huqqebaza hîlekar
Şêx şand û xencer jê veşar kanê Cîhangirê cîhan
28. Hetta ku Mîr raza bi xef Neşraniyan girt çar 'teref
Şed heyf ku Mîr kirne telef kanê Cîhangirê cîhan
29. Zîndî çi kir çerxa cîhan ev hâkimê pir dest û dan
Kuştin bi dest Neşraniyan kanê Cîhangirê cîhan
30. Babê feqîr û rewîyan deryê mirad û hêwiyan
Şed heyf-i Mîrê Meksiyan kanê Cîhangirê cîhan
31. Medhê di Mîr min kir tamam daîm ji heq lê bin selam
Her şa bit ev cennetmeqam kanê Cîhangirê cîhan
32. Her çî dibêjim her we bû medhê di Mîr hêj zêde bû
Qeç kes li van weşfan nebû kanê Cîhangirê cîhan

33. Ya Reb bi heqqê qudretê mir çûye mala zulmetê
Şa key bi lu'ţ û rehetê kanê Cîhangirê cîhan
34. Ya Reb ji te destûr bitin qebra vî her pir nûr bitin
Mehremserayê xor bitin Kanê Cîhangirê cîhan
35. Qeţ mislê Xan Mehmûd yekê nînin di dewra felekê
Xoş bit li cih Şêxî Begê kanê Cîhangirê cîhan
36. Her çî bivê vî her webî çendî dinê bî her hebî
Tali' li wî fexundebî kanê Cîhangirê cîhan
37. Min dil ji bo Mîr sohtiye dê beş biken jê 'amiye
Bêjin Weda'î gotiye kanê Cîhangirê cîhan
38. Ya qenc ew e em vê bikeyn navî li tarîxê bideyn
Bo 'Geyn û Rê û Lam û Zeyn kanê Cîhangirê cîhan

Ji ber ku me di vê beşê de qala mersîyeya Ehmedê Xanî kiribû û ji ber ku temamê metna mersîyeya duyemîn a Xewsî nehat temînkirin, me di beşê de metna mersîyeya Weda'î da. Dema em li mersîyeya ku Weda'î li ser Şêxî Begê Miksî nivîsiye û di warê nivîsîna wê de di bin tesîra Ehmedê Xanî de maye mêze dikin em dibînin ew, bi gazina ji felekê û her wisa bi şîn û girînê dest bi mersîyeya xwe dike. Weda'î di seranserê mersîyeyê de bi gotina "*Kanê Cîhangirê cîhan*" 39 caran pirsê Şêxî Begê dike. Ev yek ji hêla nîşandana wefaya li hember mîrê xwe xaleke muhîm e.

Di mersîyeyên Kurdî yê klasîk de beşa şingirtin û pesindayîne xwedî cihekî taybet e. Em van her du beşan di seranserê mersîyeya Weda'î de bi şikleki xurt dibînin. Di mersîyeyê de piştî şîna tê girêdan û rondikên tîn rijandin vêca Weda'î ji beyta duduyan pêve dest bi dayîna pesnê Şêxî Begê Mîrê Miksê dike. Şa'ir dema ku vê yekê dike geh xesletên wî yê baş û wesfên wî yê qenc ên di nav civakê de geh jî qala qehremenî, şervanî û mîrxasîya wî ya di meydana ceng de dike. Di mersîyeyê de beşa

dayîna pesna mîr xwedî cihêkî taybet e ku ev pesindayîn heta malika 31ê berdewam dike. Ev yek jî qedr û qiymeta Şêxî Begê Mîrê Miksê ya li ber çavên wî nîşan dide.

Piştî ku Weda'î pesnê Mîrê Şêxî Begê Miksê dide, vêcajî di malika 32 û 33yan de ji mîrê xwe re di' a dike. Şîn-girîn, pesindayîn, ji felekê re bertek nîşan dayîn û di' a kirin ji wan beşên sereke yên mersîyeyeke klasîk in. Em van bi şiklekî xurt di mersîyeya Weda'î de dibînin. Mersîyeya Weda'î bi du malikên ku tê de qala êş û elema firaqê tê kirin û dîroka kuştina Şêxî Begê Mîrê Miksê tê diyarkirin bi dawî dibe.

1.2. Axa

Di vê kategorîyê de bes li rastî helbestekê hatin ku bi terza mersîyeyê hatiye nivîsîn. Di encama xebata ku hat kirin de hat dîtin nûnerê vê qadê bes Ehmedê Namî ye. Ev mersîyeya ku di qada xwe de tekane ye ji teref Ehmed Namî ve li ser axayê bi navê Haco Axa (m.1940) hatiye nivîsîn. Ji ber ku Haco Axa jî di wextê xwe de xwedîtî li Kurdan kiriye û ji bo wan têkoşiyaye di nav gel de dihat hezkirin. Ji ber vê qedr û qiymeta ku jê re dihat dayîn dema ew wefat kiriye mersîyeyek ji teref Ehmed Namî ve li ser wî hatiye nivîsîn.

Şiklê teşeya nezmê ya mersîyeya ku ji teref Ehmed Namî ve hatiye nivîsîn mesnewî ye û tev de ji 40 beytan pêk tê. Ev mersîye bi behra muzari' û bi qaliba mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun hatiye nivîsîn.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Ehmedê Namî	Haco Axa	Mesnewî	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun

Tablo 21: Mersîyeyên ku li ser axayan hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeyên ku li ser axayan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Ehmedê Namî⁵²⁶

⁵²⁶ Temo, *h.b.*, r.770.

Mef'ûlu Mefa'îlun Fe'ûlun

-- + / + - + - / + - -

1. Der sala hezar û neh şed û çil,
Bîst û didiwê Nîsana têrgul;
2. Agê me Haco ê dilovan,
Gemxwarê feqîr û jarên Kurdan.
3. Yezdanê mezin bi rehma xwe,
Dil şad kirî bi ceneta xwe.
4. Bîst û sisîyê meha me gotî,
Tîra felekê dilê me sofî.
5. Tabût giha bû ser mezarê,
Rengê xwe dida riwê Biharê.
6. Ezman Cizîrê bûbû tarî,
Wê gavê ji ewran xwîn dibarî.
7. Ew dem te digo ew e qiyamet,
Zahir ko me dîn du şed 'elamet.
8. Em gerqeyî pêlê heşretê bûn,
Sewda yî serê me wê demê çûn.
9. Xortê me ketin deravê kalan,
Bi hêl û qiwet mîşalê dalan.
10. Ser ta bi qedem hemî birîn bûn,
Têk da bi tebayî sernexwîn bûn.
11. Rûdênê keça hemî wekî co,

Bê eql û hewes ji derdê Haco.

12. Şev ta bi seher melûl û gêj in,
Xwîn in ko ji çavê reş dirêjin.

13. Çerxa felekê neyar û bêbext,
Doza te çi ye, bi min re her wext?

14. Nahêle bi dilxweşî ko rûnin,
Nisxa gereza te em bixwînin.

15. Serdarê ciwan û xort û kalan,
Bê şuc û guneh te kir bi talan.

16. Em mane di hesret û gemê da,
Tîra ko li dil ketî te lêda.

17. Bes ko kedera te em helandin,
Can û cegerê me tev qewandin.

18. Qehr û gezeba xwe bes birêje;
Cewra te li me kirî ji mêj e.

19. Celwa gezeba xwe dagerîne;
Şûcek me tu nîn e ev çi kîn e.

20. Qîrên û hewar xort û bûkan,
Lerzîn dikete dilê biçûkan.

21. Figan ji me çûne banê barî,
Hêja bi me re dikî neyarî.

22. Ko rêçeşînasê milletê Kurd,

Ġemgir li ser wî miletê Kurd.

23. Haco tu bi navê Kurdewarî,
Razayî li benda efwa barî.
24. 'Emrê te meger giha bû şestî,
Nazdarê welat tu zû nivistî.
25. Wextê te ne bû, niha tu razî,
Doza me bi dilxweşî bixwazî.
26. Înşaf bike ev ne 'edl e, zîlm e;
Rojek te nekir kerem digel me.
27. Bistanê bi hendesê te danî,
Guhdarî hene bi dergevanî.
28. Pêta li dilê te ê birîndar,
Xortê me ji xewnê kirine hişyar.
29. Der heqê te de nîzam çi bêjim,
Bê şebr û qerar û dîn û gêj im.
30. Feryad dikin ji bê mecalî,
Hêstir diwerin ji herdu alî.
31. Tirba te li pêşberê me her dem,
Pê şebr dikin heta xweş in em.
32. Ger çendî qewî li me nihan bû,
Navê te î xweş ji nû eyan bû.
33. Namî bes e, ey şivanê derdan,

Hêja bi xweşî dikî xebêdan.

34. Wek mirxê hezîn bi davê dilxweş,
Rûne bi tenê li quncikî reş.

35. Çendî ko bibêjî, hem binale,
Heta bigihîne dewrê salê.

36. Dîsa tu nizanî ev çi hal e,
Derdê di dila ye, bê mecal e.

37. Lê hêvî dikim Xwahê gewre,
Vî ewrereşî li me bigore.

38. Daxwaz li me êdî zû xuya bê,
Şêrîn e welat niha qe nabê.

39. Ey Xwahê mezin tu çendî pakî,
Haco tu bi rehma xwe şa kî.

40. Kêmayî hebin jî, lê nebîne,
Pir cewr û cefa ji bo me dîne.

Ev mersîyeya Namî, bi destnîşankirina dîroka wefatê “*Der sala hezar û neh şed û çil/ Bîst û didiwê Nîsana têrgul*” dest pê dike. Namî piştî diyarkirina wefata Haco Axa dest bi şîn û girînê dike û ji ber wefatê hêstiran dibarîne ku ev yek beşeke sereke ya mersîyeyên klasîk e. Namî, êş û elema xwe ya ji ber wefata Haco Axa diderîne asteke wisa ku li ser serê Cizîrê bi temametî dibe tarî û Cizîr ji ber wefata Haco Axa reş girê dide. Di mersîyeyê de heta beyta 12emîn şîn û girîn bênavber berdewam dike. Ev yek jî zêdebûna tesîra mirina Haco Axa ya li ser Namî bi xwîner dide famkirin.

Di mersîyeyê de ji beyta sezdemîn pêve ji feleka ku ji teref mersîyenûs ve wek mesûlê mirina Haco Axa tê dîtin re bertek tê nîşandan. Ev berteknîşandana ji felekê re

heta beyta panzdehan didome. Piştî vê sîtem û berteknîşandana ji felekê re Namî, cardin dest bi feryad û fixanê dike û xort û bûkan jî tevî şîngirêdanê dike. Ev şîngirtin, rondikbarandin û kişandina êş û elemê ya Namî heta beyta 33yan bi şiklekî bînavber berdewam dike. Namî ji beyta 33yan heta beyta 38an şîretan li xwe dike û hewl dide êşa di dilê xwe de ya ji ber wefata Haco Axa sivik bike. Piştî vê sîtem, girîn, teskîn û temennîyan Namî bi du beytên dawî yê mersîyeyê yê ku tê de ji bo Haco Axa di'a dike dawî li mersîyeya xwe tîne.

Dikare bê gotin di vê mersîyeya ku ji teref Ehmedê Namî ve li ser mirina Haco Axa hatiye nivîsîn de beşên mîna di'a, sîtema ji felekê re, şîn û girîn û hwd. ên mersîyeyêke klasîk bi şiklekî xurt cihê xwe girtine û zêdetir derdikevin pêş.

2. Ên ku li ser Pêşewa û Rêberên Kurdan Hatine Nivîsîn

Di vê beşê de ew ê qala wan mersîyeyên bê kirin ku ew li ser wan kesên di nav cima'at û civaka Kurdan de wek pêşewa û rêzan hatine qebûlkirin û di jiyana rojane de di warê netewetî û dînî de bûne rêber. Dema ku li dîrokê bê nihêrtin ew ê bê dîtin, ji Kurdan re di vî warî de gelek kes pêşîvantî û rêbertî kirine. Hat tespîtîkirin mersîyenûsên Kurd, di vî warî de li ser Şêx Se'îdê Paloyî (m.1925), Se'îdê Kurdî (m.1960) û li ser Mele Mistefa Barzanî (m.1979) tevde 8 mersîye nivîsîne.

Gelê Kurd ji van her sê kesayetên re pir zêde qedr û qiymet dide ku ev qedr û qiymet bû wasitaya hezkirin û pêwendîyêke xurt. Şehîdbûn an jî wefata wan tesîreke mezin li ser kesên ku ji wan hez kiribûn û hêj hez dikin hiştiye. Ji ber vê yekê li ser wan mersîye hatine nivîsîn. Meriv dikaribû van her sê mersîyeyan jî di wê kategorîya mersîyeyên şêx-mela-seydayan de bide. Lê ji ber ku ev her sê kesayet tesîreke mezin û zêdetir li çar aliyê welêt kirine, me ew di binbeşêke cuda de da. Em ê van mersîyeyên ku derheqê van her sê kesayetên Kurd de hatine nivîsîn ji hêla teşe û rûxsarê û binirxînin.

2.1. Şêx Se'îd

Kesayetê ewil ê ku li ser wî mersîye hatine nivîsîn Şêx Se'îd e. Li ser wî ji teref du mersîyenûsan ve tevde 2 mersîye hatine nivîsîn. Ji van her du mersîyeyan yek ê Fehmî Begê Pêçarî û yê din jî Mela Tahayê Mayî ye.

Mersîyeya ku ji teref Fehmî Begê Pêçarî ve bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn tevde ji 15 malikan pêk tê. Ev mersîye bi behra hezecê û bi qaliba arûzê ya mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun hatiye nivîsîn. Mersîyeya ku ji teref Mela Tahayê Mayî ve bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatiye nivîsîn tevde ji 22 malikan pêk tê û bi behra hezecê û bi qaliba arûzê ya fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun hatiye nivîsîn.

Dîroka nivîsîna mersîyeya Pêçarî nediyar e, lêbelê ya Mayî di sala 1941ê de hatiye nivîsîn. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin ji van her du mersîyeyan filan mersîye yekemîn e ku li ser Şêx Se'îd hatiye nivîsîn.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Mela Tahayê Mayî	Şêx Se'îd	Mesnewî	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Fehmî Begê Pêçarî	Şêx Se'îd	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

Tablo 22: Mersîyeyên ku li ser Şêx Se'îd hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeyên ku li ser Şêx Se'îd hatine nivîsîn nimûne:

Ji Fehmî Begê Pêçarî⁵²⁷

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- Şumara ahê dil nîne elemdar im ji hicranê
Ji mehcûrî me dil ker bû dîkin lew ah û efganê
- Fiğan û naleyan her dem dîkit ev rûhê purmurde
Meded min dil ez in ahan kebab e şubhê buryanê

⁵²⁷ Demir, *h.b.*, r.203.

3. Cîger şîşa kebabê ye li ser narê firaqa wî
Di hicranê lehebsaz im be'îdê rewşen û 'anê
4. Be'îd ez durrê yekta û we hem dîdarê fermah im
Şecî'ek na murad im ez gerîbê qurb û dîwanê
5. Li meylakêm dibarin tîr ji burca furqeda
Palo Enîsê balê feryad in wekî murğxê şebustanê
6. Bi şubhê 'endelîb nalan ji ber hicra elemdare
Li ber sêpê hem çû canim esîrê hukm û fermanê
7. Çû pabeste û pur zar im di 'izlet xwoz û bê yar im
Çikim ez puştê şad û sînan me'aş û debr û şadanê
8. Çi şadabî hebit êdî di puştê dağê fersûde
Li dil her an mureddef tên di vê edna û kulxanê
9. Dilo ez ʔali'ê meş'ûm tebessum manedê carek
Hero der qehr û azar în digel xarat û talanê
10. Nişatû înbisatâ dil bi şubhê bazê perwaz da
Me dîdara ewan xalan 'eceb tê çar û îmkanê
11. Bi dil giryân û nalende ji çehvan dem'ê xûnrîz im
Heme der mewtê alûde li min nakam û rencanê
12. Felek ez qehr û xwor nagah xedengê ateşîn berda
Peyapey badeya muhriq bi ser da tê ji gemxanê
13. Me eşkê xûn çû derya kef didin der qe'rê eşşâ im
Seciyy û gemzede maîn me şahê mulkê dil kanê

14. Ji tarîxê mucewher tu helîne herfê ser ey can
Gurûb kir şems û nûnê dil zewal da textê Îranê

15. Tu Namî bes ke teswîdê Xuda ra pur ke tehmîdê
Bi cuz wan mêrxasên Palo nexwahim sayê sîwanê

Fehmî Begê Pêçarî bi beyta ewil “*Şumara ahê dil nîne elemdar im ji hicranê/Ji mehcûrî me dil ker bû dîkin lew ah û efganê*” dest bi şîn û girînê dike. Di seransera mersîyeya ku ji 15 malilkan pêk tê de şîn û girîn, feryad û fixan hakim e. Her wisa di mersîyeyê de beşên mîna di‘akirin û ji felekê re bertek nîşandan jî derdikevin pêş. Ev halê şîngirtin û destnîşankirina êş û elema ji ber wefata Şêx Se‘îd heta beyta duwazdehan berdewam dike.

Yek ji beşên sereke yên mersîyeyan ji felekê re bertek nîşan dayîne. Lewra mersîyenûs felekê bi xwe wek mesûlê wefata ku pêk tê dibîne. Em vê yekê di beyta yazdehan de dibînin. Pêçarî di vê beytê de ji felekê sîtem dike û dûre cardin dest bi kişandina êş û elemê dike. Piştî kişandina êş û elema ji ber wefata Şêx Se‘îd, Pêçarî helbesta xwe bi beyta ku tê de bang li xwe dike diqedîne.

Dema ku li temamê mersîyeya Pêçarî bê mêze kirin ew ê bê dîtîna ku di vê mersîyeyê de beşên mersîyeyêke klasîk ên mîna; kirina di‘ayê û sebir, daxwazkirin tune ye û pesindayîn jî ji bilî gotina “...*mêrxasên Palo*...” tune ye. Di şûna van de şîngirtin û kişandina êş û elemê hakim e.

2.2. Se‘îdê Kurdî

Kesayetê duyemîn ê ku li ser wefata wî mersîye hatine nivîsîn Se‘îdê Kurdî ye. Di vê kategoriya rêber û rêzanan de kesê ku herî zêde mersîye li ser wî hatine nivîsîn Se‘îdê Kurdî ye. Di encama xebata ku hat kirin de⁵²⁸ derket holê ku li ser wî tevde 4 mersîye hatine nivîsîn. Nûnerên vê qadê Seyid ‘Elîyê Findikî, Mela ‘Ebdussemed

⁵²⁸ Ji bo mersîyeyên ku li ser Se‘îdê Kurdî hatine nivîsîn binêrin: Abdurrahman Adak, *Helbestên Kurdî Yên Li Ser Bedûzzeman Se‘îdê Nûrsî Hatine Nivîsîn, Di 50 Salîya Wefata Wî de Sempozyuma Bedûzzeman Se‘îdê Nûrsî*, Weş. Nûbiharê, Istanbul 2011c.

Comanî û Mela ‘Ebdulhadîyê Comanî ye. Di nav van her sê mersîyenûsan de yê herî zêde li ser Se‘îdê Nûrsî mersîye nivîsîne Mela ‘Ebdussemed Comanî ye. Hejmara mersîyeyên wî tevde dudo ne. Wekî din nehat dîtin ku li ser Se‘îdê Nûrsî mersîye bi Kurdî hatine nivîsîn.

Mersîyeya ku ji Seyid ‘Elîyê Findkî ve bi teşeya nezmê ya xezelê hatiye nivîsîn tevde ji 9 beytan pêk tê, bi qaliba fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun û bi behra remelê hatiye nivîsîn. Mersîyeya din a ku hatiye nivîsîn a Mela ‘Ebdulhadîyê Comanî ye. Mersîyeya wî ya ku bi teşeyan nezmê ya murebbe‘ê hatiye nivîsîn ji 18 çarîneyan pêk tê, qaliba wê mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun û behra wê jî recez e. Di vî warî de mersîyenûsê me yê dawî bi 2 mersîyeyan Mela ‘Ebdussemed Comanî ye. Mersîyeya wî ya ewil ya ku bi teşeya nezmê ya xezelê hatiye nivîsîn tevde ji 18 beytan pêk tê, qaliba wê fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun e û bi behra remelê hatiye nivîsîn. Mersîyeya wî ya din jî ya ku bi teşeya nezmê ya muxemmesê hatiye nivîsîn tevde ji 14 çarîneyan pêk tê, bi qaliba mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun û bi behra recezê hatiye nivîsîn.

Navên mersîyenûsan û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Seyîd ‘Elîyê Findkî	Se‘îdê Nûrsî	Xezel	fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun
Mela ‘Ebdussemed Comanî	Se‘îdê Nûrsî	Xezel	mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun
Mela ‘Ebdussemed Comanî	Se‘îdê Nûrsî	Muxemmes	fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun
Mela ‘Ebdulhadîyê Comanî	Se‘îdê Nûrsî	Murebbe‘	mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

Tablo 23: Mersîyeyên ku li ser Se‘îdê Nûrsî hatine nivîsîn.

**Ji bo mersîyeyên ku li ser Se'îdê Kurdî hatine nivîsîn nimûne:
Ji Mela Ebdussemed Comanî⁵²⁹**

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun

- + - - / - + - - / - + - - / - + - -

1. Ah û heşret ah û heşret ah û heşret şed hezar
Intiqal kir Hezretê Ustadê Islamê hewar
Dîne Islamê yetîm hiştî zelîl û ustuxwar
Bê kes û malik mu'în man miskîn û dîwanedar
Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes
2. Ey tûllabê nûrcî 'alem tamam kin em fiğan
Berqekî xatib li me wer bû ji burcê asiman
Hezretê Ustadê ehlê erd û hem kullî cihan
Ber bi mi'rac şu'ûd kir el eman şed el eman
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef
3. 'Alem a Qur'anê tev zarî bikin şîn û girîn
Ev muşîbet pur giran e lazim e huzn û enîn
Lew 'urûc bû bi semaê şemsê vê dîne mubîn
Pur qebaheş bû li me êdî bikin ferh û kenîn
Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes
4. Milletê Turkîyû Sûrîyû Mişrû ehlê Hicaz
Hem Yemen Hindû Hebeş ehlê 'Iraqê tev bisaz
Ehlê îman bihevra cumleten ahîyû gaz
Ah û efgan kin bi qelbek hîrret û derd û bi naz
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef
5. Ey Kelamullah qedîm yazûg û heyf maye Wehîd
Lew Se'îdê Nûrsî ji bo te pasibanê ber weşîd

⁵²⁹ Amedî, *h.b.*, 2004b, r.12.

Rafî'ê rayatê 'izze bo ji bo te wa 'emîd
Dafî'ê reyb û şukûkan ew li ser ehlê 'enîd
Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes

6. Cumel û ayatê Furqanê bi hevra kin nida
Sewîyû bêkes xweyî man ya Îlahî ya Xuda
Lew 'elemdarê me rihet kir bi emrê yek şeda
'Alem a berzex bi wî dilşad û xurrem bû Huda
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef

7. Ey resaîl û kitabê Hezretî Ustadê dîn
Ev muşîbet xaşşeten ji bo we wek 'ilmel-yeqîn
Çinkî hûn kenza xefî man bê beyan û dil hezîn
Wan îşarat û rumûzan nukteyan mane hezîn
Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes

8. Zelzele û recf û teherruk kefte nav ehlê zemîn
Mest û medhûş û muheyyer mane megmûm û mehîn
Kes nikare 'itirazke zêde hem bi keyf û çunîn
Emrê Sulţanê ezel fe'ale Rebbul 'alem îin
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef

9. Qulzema 'ilm û me'arif bû Bedî'ê der ferîd
Hamîyê şer'a muqaddes bû bi burhanê şedîd
La yexafû lewmete men kane şeytanen merîd
Seyfehûl bettarû yet'en kulle keffarîn 'enîd
Rehmetullahî 'aleyhî kulle hînin we nefes

10. Zahid û 'abid û zakir mişlê wî qeş kes nedî
Zû tefekkûr bû di şun 'illahî mewlel ewhedî
Fîl terîqet kal heqîqet seyyidê hem senedî
Der futûhê ma'newî Heyder Kerrar û Esedî
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef

11. Fil feşaḥa wel belaḡa mu‘cizê ehlê xilaf
Fil me‘anî wel beyanî wel bedî‘ dûrra şefaf
La yuqawîmû siwahu la we billah der meşaf
Seyfuhul ayat û yeqte‘ elsine men la yexaf
Reḡmetullahî ‘aleyhî kulle ḥînin we nefes

12. Hewce nîne ez dirêj kim ‘alem ê dîtî bi çav
Seḡera ana wefatê xwîn dibarê bi guzav
Iḡmirarul cewwî bîşşeklî mehîbî geyr û xaf
Hezîhî ayatû şirfin lil‘uluwî la xilaf
Şems û xûrşîdê ufûl kir şed esef ah û esef

13. Ehlê ‘Urfa lekûmul-buşra bîhezîn ni‘metî
Tucîbul-feḡle lekum ya ḡebbeza mîn furḡetî
Şafi‘û yewmîl-qiyame caekûm bîl fuccetî
Ma ji kê re dest dide ev ḡali‘ û ev dewletî
Şemsê rabi‘ çû kusûfê şed esef ah û esef

14. Ey feqîr ‘Ebduşşemed medḡê te ḡayet qaşir e
Ev meqam zêdî tê ye quwwe te cama kasir e
Lewra ewşafê bedî‘ weqtê beḡra zaxir e
Fatîḡan jê re bixwînin pur hedîyyek faxir e
Reḡmetullahî ‘aleyhî kulle ḥînin we nefes

Ji ber ku di nav civakê de gelek zêde ji Se‘îdê Kurdî dihat hezkirin şîna ku ji ber wefata wî di nav civakê de tê girtin jî ew qas zêde û berze ye. Dema ku şîn li serê tê girtin yan jî pesnê wî tê dayîn mersîyenûs serî li hunerên edebî didin û qala wesfên wî û jêhatîbûna wî dikin. Yek ji van mersîyeyan a ku tê de asta kişandina êş û elemê zêde û berze ye mersîyeya Mela ‘Ebdussemedê Comanî ye.

Di mersîyeya ku Mela ‘Ebdussemedê Comanî li ser Se‘îdê Nûrsî nivîsiye de şîn, êş û elem bi şikleki aşkere û zelal tê dîtîn. Lewra Comanî hêj di benda ewil a

mersîyeya xwe de dest bi girî, feryad û fixanê dike û dibêje “*Ah û hesret ah û hesret ah û hesret şed hezar/Intiqal kir Hezretê Ustadê Islamê hewar.*” Comanî dema ku li ser Se’îdê Nûrsî şînê digire bang li “*ṭullabê nûrcî ‘alem, alema Qur’anê, milletê Turkîyû Sûrîyû Mişrû ehlê Hîcaz*”ê dike û ji wan daxwaz dike ku ji ber wefata Se’îdê Nûrsî ew jî bikin şîn û girîn. Ev halê şîn û girînê ku yek ji beşên sereke yên mersîyeyên klasîk e ji benda ewilî heta benda nehan bênavber berdewam dike.

Piştî şîngirtinê beşeke din heye ku di mersîyeyan de zêde derdikeve pêş. Ew jî dayîna pesnê kesê wefatkirî ye. Em vê yekê di mersîyeya Comanî bi xwe de jî dibînin. Comanî piştî vê şîna ku digire û piştî feryad û fixana ku dike vêca di benda 9 û 10an de dest bi dayîna pesnê Se’îdê Nûrsî dike. Comanî dema ku pesnê wî dide peyvên mîna “*qulzema ‘ilm û me‘arif, ḥamîyê şer‘a muqaddes, zahid, zakir û ‘abid*” bi kar tîne.

Comanî piştî ku pesnê Se’îdê Nûrsî dide dîsa nikare bi xwe û cardin dest bi kişandina êş û elemê dike û mersîyeya xwe bi xwendina Fatîhayan a ji Se’îdê Nûrsî re bi dawî bike.

2.3. Mele Mistefa Barzanî

Kesayetê sêyemîn ê ku di vî warî de li serê mersîye hatine nivîsîn Mele Mistefa Barzanî ye. Tevde 2 mersîye li ser wî hatine nivîsîn. Nûnerê vê qadê yek ji wan Mela Mahmûd û yê din jî Seydayê Tîrêj e.

Mersîyeya ku Mela Mahmûd bi teşeya nezmê ya mesnewîyê nivîsiye qaliba wê mef‘ûlu mefa‘ilun fe‘ûlun û behra wê jî muzari‘ e. Ev mersîye tevde ji 15 malikan pêk tê. Mersîyenûsê me yê din ê ku di vê qadê de li ser Mela Mistefa Barzanî mersîye nivîsiye Seydayê Tîrêj e. Mersîyeya wî ya ku bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatiye nivîsîn ji 76 malikan pêk tê, qaliba wê mef‘ûlu mefa‘ilun fe‘ûlun û behra wê jî muzari‘ e. Wekî din nehat dîtin ku ji teref mersîyenûsên Kurd ve li ser Mela Mistefa Barzanî mersîye hatine nivîsîn.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Mela Mahmûd	Mistefa Barzanî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun
Seydayê Tîrêj	Mistefa Barzanî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun

Tablo 24: Mersîyeyên ku li ser Mela Mistefa Barzanî hatine nivîsîn.

**Ji bo mersîyeyên ku li ser Mela Mistefa Barzanî hatine nivîsîn nimûne:
Ji Seydayê Tîrêj⁵³⁰**

Mef'ûlu Mefa'ilun Fe'ûlun

- - + / + - + - / + - -

1. Adarê tu hat, ne wek hemû car
Hêviya me ji te, ne ev bû adar
2. Her sal tu dihat bi mehrevanî
Tev kêf û xweşî û şademanî
3. Tanî te digel xwe cejnên Newroz
Pêrgî te dibûn em tev bi pîroz
4. Dosta me tu bû ji dewra Kawa
Xweşya ber dilê keçan û lawa
5. Bextê me reş e ji ser heya bin
Ma qey tu jî bû digel me dijmin?
6. Îro dilxweş in û hem jî gêngîn
Em tev rûgeş in lê dil bi nal in

⁵³⁰ Tîrêj, *h.b.*, r.135.

7. Em devlikên in umîdewar in
Lê ji çavên me hêstir dibarin
8. Îro li me bûye cejn û sersal
Lê derdekî pir giran xwe da pal
9. Rojek xwe yî xweş nedîn me kurdan
Êşa me giran e, tev ji derdan
10. Ava belekê berfê û Sîpan
Qeṭ nakujî agirê dil û can
11. Bayê Serhedê û zozanê banî
Hênik nake dil bi zendeganî
12. Xweşya Hêlekan û Mûş û Wanê
Qeṭ nabe ji dil ve eş û janê
13. Roja me li welêt nû hat delava
Hîva me li gêrbê çûye ava
14. Berzanî ji vê cîhanê bar kir
Umîda me pêk ve tarûmar kir
15. Şed heyf û mixabin şahê kurda
Van rojên di ʔeng, te dev j' me berda
16. Ey bavê feqîr û dîl û jara
Tem hiştine bêxwedî li wara
17. Kes nîne serok cihê te bigrî
Dîroka cîhan li ser te digrî

18. Peykar û xebata pêncî sala
Meydana welat te hiştî vala
19. Meydan xalî ye îro ji mêran
Torik û çeçel li warê şêran
20. Ey balefîra hejar û gêmîn
Tu l' bala dikî hewar û qîrîn
21. Tu b' xumxum û nalîn û fîgan î
Perwazan didî li jora banî
22. Xumîna te ya gêmê dilê min
Nalîna te ya derd û kulê min
23. Tu b' gazî ye geh li jor û jêr e
Gazyâ sibeha tu car ne xêr e
24. Tu b' lêz û bi bez ji Ewrûpa tê
Tenha ku berê te li Rojhilatê
25. Qonaxa te dûr e, çol e ew qat
Warê te ye bajarê Mehabad
26. Hêdî bilive bi nermî xweş deyn
Siwarê xwe yê hêja tu meêşîn
27. Siwarê te ye Miştefa yê Berzan
Pêşwayê bilind, bi nav û nişan
28. Pir hatî bi xêr ey şahê Berzan îro
Li Mehabad bûye mêvan

29. Mêvanekî pir qenc û ezîz î
Rêzanekî hêja û temîz î
30. Tu j' mêj ve gelo ji refê xwe bir bû
Millet û welat bêrya te kir bû
31. Ey dil ca tu rab bi cengebazî!
Tu l' kurdan bikî qîrîn û gazî
32. Kurdên di 'Iraq û Tirk û Îran
Kurdên ku li Sûrî û Yêrîvan
33. Li çayê Berzan heyânî Torê
Pêk ve da bicivin hemî li dorê
34. Ew deşta û çiya tijî bibin kes
Da xayis bimînî çerxê etles
35. Deryak çêbibî ji Ademî zad
Ji şehre Şîn û heya Mehabad
36. Tabûtê ji rengê geştiya baş
Yê ku tê de ew serok û ew pa
37. Tabûtê li ser serê xwe rakin
Dest bidne hevdu û pişt re ban kin
38. Xweş xweş bikevî, ber pêlê destan
Heya we ku bighînin goristan
39. Tîrêj tu li ber serê wî rûne
Hêstiran tu bibarînî ji xwînê

40. Bêje: Ey serok û şah û rêber!
Derkev tu ji tabûtê dilawer
41. Ey şêrê welat, pilingê Berzan!
Şevgerê çiya û deşt û zozan!
42. Îro ne ew çag e ku tu razê
Azadiya Kurdistan bixwazî
43. Çargoşê welat hemî neyar in
Pêşmergê te va hemî li kar in
44. Dîsa wek berê dijîn li meydan
Çavnêrê te ne bi emir û ferman
45. Deng nayê ji te, bi kêf û şadî
Îro çima bersiva min nadî
46. Qey rast e, gelo te j' cem me bar kir
Mirna malxerab, te j' me cuda kir
47. Canê te dema ji ten cuda bû
Perwazê li nik erşê Xweda bû
48. Çerxa felekê ji rengê şûr e
Rêça mirinê di bin dibûre
49. Karwanê mirinê ne, em li pê hev
Pêk ve li ser in, me nîne jê rev
50. Kurdistan seraser bûye lê şîn
Yek mal nema bê fiğan û nalîn

51. Kurd wa hemî derketin ji malan
Qîrîn ket piçûk û pîr û kalan

52. Bû qîr û hewar, li jêr û hem jor
Xortên di bedew, keçên gulîşor

53. Hêstir bi xwe wek tavêd biharê
Ji çavên belek xweş têne xwarê

54. Wek tavên meha adar û nîsan
Derya rijîya ji ewra dîsan

55. Şorgul hemî çilmisîn di bağan
Ber tev weşîyan ji gulyên şaxan

56. Şîna te çi qas bikim ji ezber
Qeş nakim xelaş bi xam û defter

57. Lê kurd tu dizanî ew çi mêr in
Şopa te tu carî naguhêrin

58. Nakim ji bîr bi soz û îqrar
Roja pêncsemê yekem ji Adar

59. Sala ku tu çû, hezar û nehşed
Hem heftê û neh meqamê sermed

60. Seyda hûn bişon, dereng e zûkan
Ji ava hêstirên keçan û bûkan

61. Sabûnek bi bêhn ji şehrê Amed
Qerqer ji welatê Muş û Serhed

62. Cawê kefenê wî şapik û şal
Şaşa ser serî kolos û desmal
63. Şilfa xencerê mekin ji kalan
Dîsa bidne kêlekê ji dil û can
64. Darbeste ji dehla çayê Berzan
Pêwend û wêrîs ji porê qîzan
65. Bergorek fireh, ne teng û goncal
Kêla ber serî, ji çayê Şengal
66. Hêdî û bi semt deynin di gorê
Baqê şorgula hûn bidne dorê
67. Ey gora cihê 'egîd û merdan
Wey war û cihê geman û derdan
68. Gorê şîn keve, wekî biharê
Gorê bibe wek bağê Zinarê
69. Gorê bibe tev tu merg û çîmen
Gorê bibe tev kulîlk û çîmen
70. Gorê bibe tev rohnî û pertew
Lê reş nebî qeṭ nebî tu lê şev
71. Me spartîye te serokê Berzan
Parêz bike wî ji tebayê çolan
72. Hember qirş û qalê rûyê erda
Rahmet li wê gora te be Seyda

73. Yezdan tu bi navê Miştefa kî
Berzanî bi rehmata xwe şa kî

74. Rîdwan tu bikî heval û rêber
Da bên pêşiyê ferîşte û per

75. Xazim bikî hemdemê têniştê
Tu li ber vekî dergehê bihiştê

76. Tîrêj timî hêstira bibarîn
Her bigrî li ser bi ax û nalîn

Seydayê Tîrêj vê mersîyeya xwe li ser Mela Mistefa Barzanîyê ku di sala 1979an de çûye rehma Xwedê nivîsiye. Ev mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatiye nivîsîn bi tevahî ji 76 malikan pêk tê.


Di mersîyeya ku hatiye nivîsîn de Tîrêj rasterast dest bi girtina şîne û rijandina hêstiran nake. Ew ji beyta ewil pêve ji wê demsala biharê ya ku tê zanîn demsala wefata Mela Mistefa bi xwe ye hesabê dipirse û destnîşan dike bihar ne bihara her car e. Tîrêj bi vî awayî ji beyta ewil heta beyta 14an di mersîyeya xwe de qala huzn û xemgînîyekê û her wisa tiştêkî kovandar a ku dilê wî pê diêşe dike. Lêbelê ew, destnîşan nake ku sedem û çavkanîya vê êş û elemê kî ye yan jî çi ye. Ev nediyarî di beyta 14an de ji holê radibe û Tîrêj bi gotina “*Berzanî ji vê cîhanê bar kir*” bi me dide zanîn ku Mela Mistefa Barzanî çûye rehma Xwedê û yê ku bûye sedema êş û elema di qelbê wî de ew bi xwe ye.

Tîrêj piştî girtina şîne di beytên pêş de bi peyvên mîna “*şahê Kurdan, bavê feqîr û dil û jaran, şahê Berzan, hêja û temîz*” dest bi dayîna pesnê Barzanî dike. Dayîna pesnê kesên wefatkirî her çi qas di mersîyeyên klasîk de zêde cî bigire jî di vê mersîyeya ku hatiye nivîsîn de zêde dernayê pêş. Tîrêj di mersîyeya xwe de ji pesnê zêdetir êş û elem, huzn û şîn, keser û kovanê derxistiye pêş û heta beyta 32yan vê girtina şîne didomîne û dûre bang li temamê Kurdên li “*Iraq, Tirk, Îran, Sûrî û Yerîvan*”ê dike û wan jî tevî vê şingirtinê dike. Ev yek jî tesîra ku wefata Barzanî li ser wî hiştiye û qedr û qiymeta wî ya di nezera şexsê wî de nîşanî me dide. Ev halê

şîngirtin heta beyta 66an bi şîklekî aşkere berdewam e. Lêbelê Tîrêj piştî beyta 66an êdî dawî li vê şîngirtinê tîne û dest bi temennî û di‘ayan dîke û ji Rebbê aleman daxwaz dîke ku wî bi rehma xwe şa bike. Tîrêj vê rewşa di‘akirinê heta beyta 75an didomîne. Lê ji ber giranbûna êş û elemê ew dîsa nikare bi xwe û bi gotina “*Tîrêj timî hêstira bibarîn*” dawî li mersîyeya xwe tîne.

Di bergehê beşên mersîyeyê klasîk de ji bo vê mersîyeya Seydayê Tîrêj a ku li ser wefata Mela Mistefa Barzanî hatiye nivîsîn, em dikarin bibêjin di vê mersîyeyê de herî zêde beşa şîngirtin û hêstirbarandinê, pesindayîn û kirina di‘ayan derdikeve pêş.

Rêjeya mersîyeyên ku li ser kesên rêber û pêşewa hatine nivîsîn wisa ye:



Grafîk 19: Rêjeya mersîyeyên li ser kesên rêber û pêşewa hatine nivîsîn

3. Ên ku li ser Şêx-Seyda-Seyîdan Hatine Nivîsîn

3.1. Şêx

Di edebiyata Kurdî de piştî rûxandina mîrektîyên Kurd him di warê siyasî û him jî di warê edebî de valahîyeke derket holê. Ev valahîya ku di sedsala XIXem de derket holê ji teref terîqeta Mewlana Xalidê Şehrezorî ve hat dagirtin. Lewra piştî rûxandina mîrektîyan li seranserê welêt fikr û ekola Xalidîtiyê bi cî bû û Mewlana Xalid û xelîfeyên ku piştî wî hatin gelek kesan di pey xwe de wek xelîfe diyar kirin.

Van kesên ku wek xalîfe hatin diyarkirin ji bi hezaran kesan re hamîtfî kirin û li ber destên wan bi hezaran kes ders wergirtin. Ji ber vê atmosfer û tesîrê piştî mîrektîyan piraniya mersîyeyên Kurdî di serdama Xalidîtiyê de di bin atmosfera Xalidîtiyê de hatine nivîsandin. Lewra di medrese û tekyeyên wan de hatine nivîsîn. Bi pêkhatina vê derdora tekyayê ya ji ber Xalidîtiyê bi dehan alim û helbestkar derketin holê. Di navbera wan helbestvanên ku di bin tesîra ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de derketin holê û di navbera kesê ku ji wan re murşîdî kirin de têkilîyeke hêzdar derket holê û pîr û murşîdê terîqetê ji murîd re bûn mîna evîndarekî. Di vê çarçoveyê de kesên mîna Seydayê Licî, Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Seydayê Xasî, Mela Zahirê Tendurekî, Hecî Ebdulfettahê Hezroyî û bi dehan şêxsên mîna wan ji ber ku li ber destên wan şêxên xwe yên ku ji tarîqa Xalidîtiyê tên perwerde standine, di navbera wan û murşîdê de wan de têkilîyeke bi hêz çêbûye. Ev têkilîya bi hêz piştî mirina wan murşîdan di wan mersîyeyên murîdên wan de wek êş û elemê xwe nîşan daye.

Di encama xebata ku hat kirin de derket holê ku hejmara van mersîyeyên li ser şêxan hatine nivîsîn bi tevahî 94 e. Em dibînin mersîyenûsên Kurd li ser gelek şêxên cuda mersîye nivîsîne. Me ew şêxên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de herî zêde li ser wan mersîye hatine nivîsîn bi dorê li jê re diyar kir.

Kesê ku li ser wî mersîye hatiye nivîsîn	Hejmara Mersîyeyan
Şêx Muhemmed Ziyaûddîn	36
Şêx Ebdilqadirê Hezanî	8
Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	8

Ji bilî van şêxan li ser şêxên mîna; Şêx Ehmedê Çanî, Şêx Zeynelabidinê Fersafî, Şêx Fethullahê Werqanisî, Şêx `Elaeddîn Oxînî, Şêx Ebdurrehmanê Taxî, Şêx Husamettîn, Şêx Zeynelabîdîn, Şêx Hezîn, Şêx Muhemmed Çanî, Şêx Xiyaseddîn, Şêx Tahayê Mayî, Şêx Fethûllahê Hamîdî, Şêx Seyfeddînê Hamîdî, Şêx Ebdullah, Şêx Îbrahîm Heqqî, Şêx Evdirrehmanê Garisî, Şêx `Elî Husamettîn, Şêx Ebdilqahhar, Şêx Kemal, Şêx Mustafayê Sîsî, Şêx Masûm, Şêx Maşûq, Şêx Zeynelabîdîn, Şêx Fethullah û li ser şêxên mîna wan jî gelek mersîye hatine nivîsîn.

Em dikarin şa'irên ku di warê mersîyenûsîya li ser şêxan de herî zêde derketine pêş jî wisa birêz bikin:

Mersîyenûs	Hejmara Mersîyeyên Wî
Mela Zahirê Tendûrekî	27
Mela 'Ebdulfettahê Hezroyî	8
Mele 'Ebdulezîzê Bidlîsî	7
Şêx Îsmetûllah	5
Mele 'Elîyê Baqûstanî	4

Di nav van mersîyenûsan de mersîyenûsek heye ku wî bes li ser heman şêxê xwe û lawê wî bi teşeyên nezmê yê curbecur bi tevahî 27 mersîye nivîsîye. Ev mersîyenûsê me Mela Zahirê Tendûrekî ye. Em ê di pêş de qala serpêhatîya wî ya di warê mersîyenûsîyê de jî bikin.

Em dikarin derheqê mersîyeyên ku li ser şêxan hatine nivîsîn de ji hêla teşeyên nezmê ve bibêjin ku teşeyên nezmê û hejmara wan wisa ye: 12 murebbe', 12 xezel, 50 qesîde, 10 muxemmes, 2 tercî'bend, 7 mesnewî û 1 muselles. Ev dane jî nîşan didin ku li ser şêxan herî zêde bi teşeya nezmê ya qesîdeyê mersîye hatine nivîsîn. Di nav van de qesîdeya herî dirêj ji 87 malikan pêk tê û ji teref Mela Ehmedê Nalbend ve li ser Şêx Xiyaseddînê kurê Şêx Bahaûddîn hatiye nivîsîn. Piştî qesîdeyê teşeya ku herî zêde hatiye bikaranîn murebbe' e. Murebbe'a herî dirêj jî 24 bendan pêk tê û ji teref Mela 'Ebdulfettahê Hezroyî ve li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî hatiye nivîsîn. Piştî qesîde û murebbe'ê teşeya ku herî zêde di vî warî de hatiye bikaranîn muxemmes e. Muxemmesa herî dirêj ji 16 bendan pêk tê û ji teref Mela Mihemedê Liceyî ve li ser Şêx 'Ebdulqadirê Hezanî hatiye nivîsîn.

Di temamê mersîyeyên ku li ser şêxan hatine nivîsîn de; şîn, girî û pesindayîn gelek zêde derdikeve pêş û di'a zêde tê kirin û ji Xwedê ji bo tehemmûla vê êşa firaqê

sebir tê xwestin. Ji ber ku ekserîyetê kesên ku mersîye nivîsîne yan intisabî wî şêxî kirine û bûne murîdê wî, yan li ber destên wî ders girtine û yan jî ji wan gelek zêde hez kirine; êş û elem, derd û kul, nalîn û girîn û her wisa xwestina sebrê ji dil û can e û samîmî ye. Lewra di navbera her du terefan de dilgermahî û hezkirineke rasteqîn û bi qewet çêbûye. Lêbelê di van mersîyeyên ku li ser şêxan hatine nivîsîn de di beşa pesindayîne de mubalaxe pir heye. Ev yek jî bi ya me ji bo şa'ir hezkirina xwe ya li hember wî şêxî û qedr û qiymeta wî ya li ba xwe nîşan bide hatiye kirin. Lêbelê digel êş û elema ku tê kişandin di talîyê de ji ber bawerîya bi Îslamê heqîqeta mirinê tê qebûlkirin, ji Xweda sebir tê daxwazkirin û tê hêvîkirin cihê şêxê wî bibe cennet. Her wisa mersîyenûs daxwaz dike dema ku ew bi xwe jî mir herî bigihijî şêxê xwe û konê xwe li axretê li ba wî deyne.

Ji van 94 mersîyeyên Kurdî yê ku li ser şêxan hatine nivîsîn du mersîyeyên ku li ser Şêx Ebdurrehmanê Taxî hene ku yek ji wan di vî warî de a yekemîn e. Yek ji van mersîyenûsan Şêx Muhemmed Xelîfe û yê din jî Mela Ebdulezîzê Bidlîsî ye. Xelîfe di navbera salên 1775-1898an û Bidlîsî jî di navbera salên 1856-1928an de jiyaye. Her du jî li ser wefata Şêx Ebdurrehmanê Taxîyê ku di sala 1886an de wefat kiriye mersîye nivîsîne. Lêbelê dîroka nivîsîna her du mersîyeyan jî nayê zanîn. Ji ber vê yekê em nikarin mersîyeya yekemîn a di vî warî de ya filan mersîyenûsî ye, lê ji her duyan yek muheqqeq a yekemîn e.

Di vê beşê de em dikarin navên wan mersîyenûsan û şêxên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn û her wusa teşê û qalibê mersîyeyan wek tablo wisa bidin:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Şêx Muhemmed Xelîfe	Şêx Ebdurrahmanê Taxî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun
Şêx Selîmê Gêxî	Şêx Ehmedê Çanî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

Şêx Mustafayê Sîsî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun
Mela Mihemedê Liceyî	Şêx Ebdulqadirê Hezanî	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Ebdulqadirê Hezanî	Muxemmes	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Ebdulqadirê Hezanî	Tercî'bend	mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Ebdulqadirê Hezanî	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun
Şêx Celaledîn Eskambevî	Şêx Zeynelabidinê Fersafî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
Mele Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Muhammed Zîyaeddîn	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Muhammed Zîyaeddîn	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Muhammed Zîyaeddîn	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Fethullahê Werqanisî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Fethullahê Werqanisî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx 'Elaeddîn Oxînî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Ebdurrehmanê Taxî	Murebbe'	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
Şêx Evdirrehmanê Hezanî	Şêx Evdirrehmanê Taxî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Mela Mûsayê Mizî	Şêx Muhammed Zîyaeddîn	Muxemmes	mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun
Mele Ehmedê Xasî	Şêx Selîmê Hezanî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun

Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Şêx Meczûb	Şêx Husamettîn	Qesîde	fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun
Mela Ebdurrehmanê Hazrowî	Şêx Selîmê Hezanî	Murebbe'	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Şêx Silêman	Şêx Zeynelabîdîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Molla Mahmud	Şêx Hezîn	Muxemmes	mustef'îlun mustef'îlun
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Xezel	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun

Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Museddes	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Tercî'bend	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Fethûllah	Xezel	mef'ûlû fa'ilatun mef'ûlû fa'ilatun
Şêx Fethûllah	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
Şêx Fethûllah	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun

Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî	Şêx Muhemmed Çanî	Mesnewî	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Şêx Xiyaseddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Tahayê Mayî	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Heybetullah Abirî	Şêx Fethûllahê Hamîdî	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Seyfeddînê Hamîdî	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mele Muhammedê Seyda	Şêx Ebdullah	Mesnewî	mefa'ilun mefa'ilun
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
	Şêx Muhemmed Zîyaüddîn	Qesîde	fa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
	Şêx 'Evdilqadirê Hezanî	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Murebbe'	mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun
Seyid 'Eliyê Findikî	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun

Seyid 'Eliyê Findikî	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Celadet Bedirxan	Şêx Evdirrehmanê Garisî	Mesnewî	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Mela Nûranî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Muselles	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Seydayê Mela Omer	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
Kamiran Bedirxan	Şêx Evdirrehmanê Garisî	Mesnewî	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Mela Zubeyr Bîldîrîcî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Şêx Abdurrahmanê Şawurî	Şêx Îbrahîmê Heqqî	Mesnewî	muft'e'îlun muft'e'îlun fa'îlun
Seyid Qedrî Haşimî	Şêx 'Elî Husamettîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Molla Reşîd Comanî	Şêx Evdilqahhar	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Mela Muhemmedê Saricanî	Şêx Mustafayê Sîsîyê	Mesnewî	mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun
Cegerxwîn	Şêx Kemal	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Mela Sidîq	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Tercî' bend	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Yahyayê Çoqreşî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Yahyayê Çoqreşî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun

Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Muhammed Selîmê Hezanî	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Mela Hesenê Qerenazî	Şêx Masûm	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Maşûq	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun
	Şêx Maşûq	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Qedrî Can	Şêx Abdurrehmanê Garisî	Murebbe'	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun
Mele Xelîlê Zoqeydî	Şêx Mahmudê Karakoyî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Mela Hesenê Kaçkarî	Şêx Maşûq	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Şêx Seyfeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
	Şêx Seyfeddînê Ehmedî	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
	Şêx Seydayê Cizîrî	Qesîde	mustef'îlun fe'ûlun mustef'îlun fe'ûlun
	Şêx Seyfeddînê Mardînî	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
B.Ferîdun	Şêx Evdirrehmanê Garisî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun

Tablo 25: Mersîyeyên ku li ser şêxan hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeyên ku li ser şêxan hatin nivîsîn nimûne:

Ji Mela Zahirê Tendûrekî⁵³¹

Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Dağ û derdê min hezar in lew di nêv derdan muqîm
Hicreta şeyxê kubar e ew ji derdan pur elîm

⁵³¹ Tendûrekî, *h.b.*, r.233.

Lê mûşîbet bû Xudê da ew li ser ‘alem ‘emîm
Talîbê ecrê ne ya Reb Tu bidî ecra ‘ezîm

2. Min birîn kûr bû di dil îro ji hicra şehsuwar
Lew dinî tengbû li ser me çû ji dest me namîdar
Bê te dunya bûye zindan lew ku tê mane hesar
Hikmeta Barî di xostî rehleta şeyxê fexîm
3. Lew Zîyaeddîn penah bû ew ji bo ‘alem hemê
Hem ji çûna te seraser ‘alem mane der gemê
Bûn birîndar em bi tîran ketne zêde elemê
Dağ û derdê me di dil da şubhetê narê cehîm
4. Çi bela bû hatî ser me vê Şubaţê çi bela
Lew gerîq man di belayê bil ‘umûm şeyx û mela
Ji hicreta şeyxê mukemmel mane heyrî muhtela
Hukm û teqdîra Xuda bû hate ser ‘ebdan muqîm
5. ‘Alimê ‘ilmê ledunnî pêşewayê murşîda
Nuktedanê der terîqet qiblegahê meqşeda
Muşîrê mulkê qena‘et bû nevînî mesneda
Hem helîm bû hem şebûr hem weqûr hem besîm
6. Hem Zîya bû hem şena bû hem di ‘ilmê da çîya
Ji heşed hatin xusûfê lew li ber wî nexuya
Feleka pur kîn û zalim bêwefa û rûsîya
Muhriban ber feqîran her wekî babê rehîm
7. Lew li min îsal bi reş hatî Şubaţa pur şedîd
Êş û derd û eleman çi bi ceger kir kir qedîd
Hakimê bi şer‘ û terîqê bû di hukmê hem şedîd
Çû ji dest me me‘şera bêkes di dunya man yetîm

8. Te ‘emeldarî bi şer‘ê bû di dunya bêhisab
 Lew enîsê te ji nêv emtî‘eyê dunya kîtab
 Lê Xuda razî ji te hem te rîza ke der meab
 Bit qerînê te di qebrî rehma Rebbê kerîm
9. Rohnîya çehvê melan destegîrê salikan
 Rehşunasê canibê eqdes ji bo şahibşekan
 Çêtirî bû bînewayan zi genc û malê malikan
 Tu delîla ‘alem ê bû ber şîraça musteqîm
10. Zahirâ mehsûl nebû îro ji bo te qetî mirad
 Hêvî û zarî bike bit xakîpayê her ‘îbad
 Da bigijî şehsuwarê xwe di hengamê mî‘ad
 Qiblegaha zarîya te hem kerîm him ‘elîm

Berî niha jî me gotibû Mela Zahirê Tendûrekî ew kes e ku di warê mersîyenûsîya li ser şêxan de herî zêde derdikeve pêş. Wî li ser şêxê xwe Şêx Muhemmed Ziyauddîn 24 û li ser lawê wî Şêx Fethullah jî 3 bi tevahî 27 mersîye nivîsîne. Tendûrekî vê mersîyeya xwe ya bi navê “*Dağ û derdê min hezar in lew di nêv derdan muqîm*” bi teşeya nezmê ya murebbe‘ê nivîsîye. Ev mersîyeya wî ji 10 bendan pêk tê û bi behra remelê û bi qaliba fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun hatiye nivîsîn.

Girtina şînê, anîna ziman a derd û kulên ji ber wefatê û dayîna pesnê kesê wefatkirî beşên sereke yê mersîyeyê Kurdî ya klasîk in. Em van her sê beşan di vê mersîyeya ku ji teref Tendûrekî ve bi teşeya nezmê ya murebbe‘ê hatiye nivîsîn de dibînin. Tendûrekî ji benda ewil heta benda dehan bi şikleki bînavber ji ber wefata şêxê xwe Şêx Muhemmed Zîyaeddîn şînê girê dide û birîna xwe wek birîna ku nayê girtin diwesfîne û qala wê êş û elema ku ji ber şêxê xwe dikşîne dike. Di bendên pêş de asta vê êş û elema ku ji ber wefatê tê kişandin zêdetir dibe. Tendûrekî dema ku qala vê êş û elema ji ber wefata şêxê xwe dike peyvên mîna “*dağ û derdê min hezar, hicret, mûşîbet, birîn kûr bû, dunya bûye zindan, gem, elem, birîndar, narê ceħîm, şîbaça reş,*

yetim û hwd.” bi kar tîne. Ev tabloya şingirtinê bi şikleki bênavber di temamê mersîyeya wî de hakim e.

Tendûrekî digel şingirtinê bênavber bi peyvên mîna “*şeyxê kubar, penaha ‘alemê, şeyxê mukemmel, ‘alimê ‘ilmê ledûnî, pêşewayê murşîdan, helîm, şebûr, weqûr, besîm, rohnîya çavan, destegîrê salikan, rehşûnas û hwd.*” pesnê şêxê xwe dide. Tendûrekî di berdewama mersîyeyê de piştî ku ji felekê re bertek nîşan dide, bi di‘aya ku dike mersîyeya xwe diqedîne. Di vê mersîyeyê de û di mersîyeyên din ên Tendûrekî de kişandina êş û elemê û dayîna pesnê şêx zêdetir derdikeve pêş. Lewra Tendûrekî gelek zêde bi murşîdê xwe ve girêdayî bû û jê gelek zêde hez dikir. Tendûrekîyê ku heta dawîya ‘emrê xwe mersîye nenivîsîbû piştî ku şêxê wî Şêx Muhemmed Ziyaûddîn û piştî wî bi heftîyekê jî bi mirina Şêx Fethullah re dest bi nivîsîne helbestan dike⁵³² û heta dawîya ‘emrê xwe gelek zêde helbestên ku ekserîyeta wan mersîye ne li ser şêxê xwe dinivîsîne.

3.2. Mela

Ji bilî li ber destên şêxan, gelek kes li ber destên kesên ku di nav civakê de di warê ‘ilm de pêşve çûne û wek alim/seyda/mela tên nasîn derbas bûne. Ji ber vê yekê di navbera kesên ku li ber destên wan ders standine û yan jî di nav civakê de tên nasîn û hezkirin de têkilî û eleqeyeke xurt çêbûye. Ji ber vê têkilîya xurt û hezkirina zêde, dema ew kesayetê naskirî wefat kiriye tesîreke mezin li ser civata ku ew tê de jiyane kiriye. Ji ber vê yekê li ser van kesan jî hinek mersîye hatine nivîsîn.

Di encama lêkolîna hat kirin de derket holê ku li ser alim/seyda/melayan tevde ji teref 3 mersîyenûsan ve bi tevahî 3 mersîye hatine nivîsîn. Di vî warî de Mela ‘Ebdulhadîyê Comanî mersîyeyek, Mela ‘Elîyê Baqûstanî mersîyeyek û Mele Ruşdî Efendî mersîyeyek nivîsiye. Mersîyeya ku Mela ‘Ebdulhadîyê Comanî bi teşeya nezmê ya murebbe‘ê nivîsiye, qaliba wê fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun û behra wê jî remel e. Ev mersîye wî bi tevahî 11 bendan pêk tê. Mersîyeya ku Mela ‘Elîyê Baqûstanî bi teşeya nezmê ya qesîdeyê nivîsiye qaliba wê mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun û behra wê jî recez e. Ev mersîye jî ji 16 malikan pêk tê. Di vê beşê de mersîyeya dawî ya ku hatiye nivîsîn a Mela Ruşdî Efendî ye. Ev mersîyeya

⁵³² Tendûrekî, *h.b.*, r.5.

ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn qaliba wê mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun û behra wê jî muctes e. Ev mersîye jî tevde ji 19 malikan pêk tê

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsiye	Teşe	Qalib
Mele Ruşdî Efendî	Seyda Muhammed Hadî	Qesîde	mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun
Mela 'Ebdulhadiyê Comanî	Molla Muhyeddîn	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Seydayê Helîm	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Tablo 26: Navê mersîyenûs û navê wan seyda/melayên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeyên ku li ser Seyda/Melayan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Mela 'Eliyê Baqûstanî⁵³³

Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun

- - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1. Îro ji seydayê Helîm, mihnetkêş û mehzûn e dil
Dîsa ji nar û şu'leyê, meyxwar û serxwoş e dil
2. Min şu'leyek avête dil, dernakevit ta şeq bî dil
Lerzek ji nageh girtî dil, wer layîq e medhûş be dil
3. Dil û can im hingê disot, qelb û ceger vêkra digot
Ey miskîn û heqqê ennehû yemût, hey mehzûn û meyûs e dil
4. Ne yaziqtir seyda gîbî, yaşamamış bir ademî

⁵³³ Baqûstanî, *h.b.*, r.101.

- Huznunde kalmış her ‘alemî qena‘at verir mî şanlı dil
5. Ji dîlbera her wek gelek, cerh bû ceger mişlê tifeng
Qeṭ çênebû yek hiss û deng, her dem bi dem meflûc e dil
 6. Şewqa dilê min bû tefî, ji germa dilê min peritî
Huzna dilêm her xebitî, her me‘zûm û mexrûm e dil
 7. Seyda ku şemsa ‘alem ê, îro neqil bûye‘ j dinê
Meḫzûn kirî ‘alem hemî, ji ḫisretê kewwandî dil
 8. Eywan û dîwan û diyar, kir ker cîger mişli xiyar
Lew tên ji min firyad û zar, mecbûr dibe me‘lûl bi dil
 9. Ewlad û eşabê delal, cîran û etba‘ û heval
Qurban dikim tev can û mal, îro dilêm serxûn e dil
 10. Ya Reb ji min reḫmê bikî, ji cem‘a me ra mehder bikî
Van yetîma meḡfûr bikî, daim li rê merbût e dil
 11. Eywan û dîwana Hezan, ḫeyfa min te daîm li wan
Şorgul ji wan bûye rewan, ḫesret dikêşit qelb û dil
 12. Ew gulzara reyḫan û gul, binefş û lale û sumbul
Firya li ser carek qumbul, çûwan dibe mesrûr bi dil
 13. Ew bexçeya her lê buhar, Zahir bû lê ef‘alê man
‘alem hemî man çar kenar, keyf û fereḫ çûne ji dil
 14. Ya Reb tu wan me‘mûr bikî, van bexçeyan her şîn bikî
Daîm tu wan bibêhn bikî, da xoş bibî pê qelb û dil
 15. Şahê Hezan wefat kirî, îro ji dinê neqil kirî

Xweda rehma xwe lê kirî, niye derman jibona dil

16. Her dem du 'açî ye 'Elî, çendan ji şewta vî dilî

Wendakirî çeşmê kilî, şafî ji huznê kor e dil

Mela 'Elîyê Baqûstanîyê ku xwedîyê 7 mersîyeyan e, vê mersîyeya xwe ya bi teşeya nezmê ya qesîdeyê ya ku ji 16 beytan pêk tê li ser wefata Seydayê Helîm nivîsiye. Di tevahîya mersîyeyê de Baqûstanî tabloyeke kovandar a kişandina êş û elema ji ber wefata Seydayê Helîm diyar dike. Ev yek him qedr û qiymeta kesê wefatkirî ya di nezera wî de û him jî êş û elema ku ew ji ber wefata Seydayê Helîm dikşîne nîşanî me dide. Lewra beytên 4, 10, 12, 13, 14 û 16an ne di nav de di deh beytên din de Baqûstanî şîne girê dide û derd û kulên xwe tîne ziman. Wekî din di mersîyeya ku hatiye nivîsîn de tê dîtîn ku Baqûstanî di beytên duwazdeh û sêzdehan de pesnê Seydayê Helîm dide û di beytên deh û çardehan de jî ji Seydayê Helîm re di 'a dike.

Di vê mersîyeya ku hatiye nivîsîn de tê dîtîn ku Baqûstanî zêdetir mijarên şîngirtin, kirina di 'ayê û dayîna pesna kesê mirî derxistiye pêş. Ev her sê xal jî beşên sereke yên mersîyeyê Kurdî ya klasîk in. Di vê mersîyeyê de beşên mîna; sebir û ji felekê re sîtemkirin cî negirtine.

3.3. Seyîd

Di vê beşê de li ser seyîdan bi tevahî 3 mersîye hatine nivîsîn. Nûnerên vê kategorîyê Şêx 'Ebdurrahmanê Çoxreşî, Şêx Ehmedê Kor û Şêx Îsmetullahê Karazî ye. Şêx 'Ebdurrahmanê Çoxreşî û Şêx Îsmetullahê Karazî li ser Seyîd Sibxetullahê Erwasî û Şêx Ehmedê Kor jî li ser Seyîd Taha mersîye nivîsiye.

Mersîyeya ku Şêx 'Ebdurrahmanê Çoxreşî nivîsiye teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun û behra wê jî hezec e. Ev mersîye tevde ji 37 malikan pêk tê. Mersîyeya ku Şêx Îsmetullahê Karazî nivîsiye teşeya wê ya nezmê muselles, qaliba wê mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun mefa 'îlun û behra wê jî hezec e. Ev mersîye tevde ji 10 bendan pêk tê. Mersîyenûsekî din ê vî warî Şêx Ehmedê Kor e ku wî li ser Seyîd Taha bi teşeya wê ya nezmê qesîdeyê mersîyeyek

nivîsiye. Qaliba wê fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun û behra wê jî remel e. Ev mersîye jî tevde ji 24 malikan pêk tê. Wekî din nehat dîtin ku ji teref mersîyenûsên Kurd ve li ser seyîdan mersîye hatine nivîsîn.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsiye	Teşe	Qalib
Şêx Ehmedê Kor	Seyîd Taha	Qesîde	fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun
Şêx ‘Ebdurrahmanê Çoxreşî	Seyîd Sibxatullah Erwasî	Qesîde	mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun
Şêx Îsmetullahê Karazî	Seyîd Sibxetullah Erwasî	Muselles	mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun

Tablo 27: Navê mersîyenûs û navê wan seyîdên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeyên ku li ser seyîdan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Şêx Ebdurrahmanê Çoxreşî⁵³⁴

1. Qewî îro ze‘îf halim, dinalim ez ji hicranê
Esîrê murşidê kal im, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
2. Gelo kan şahîbê weqtê, emîrê tac û hem textê
Celîsê kursiyê bextê, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
3. Feqîrê bejn û bala me, esîrê çeşmê sehla me
Wekî Mecnûnê Leyla me, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
4. Ez im îro wekî Mecnûn, feqîr û jar û hem mehzûn
Ji fikra şûreta gulgûn, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

⁵³⁴ Şêx Ebdurrehmanê Çoxreşî, “Qewî îro ze‘îf hal im, dinalim ez ji hicranê”, Me destxeta vê helbestê ji Mehmet Firatê Çoxreşîyê neviyê Şêx Ebdurrehmanê Çoxreşî stand.

5. Çi ʔerz e dî binim jar e dema roj tête êvar e
Ma tete bîr ku her car e, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

6. Qewî îro ze'îf ʔalim, dinalim ez ji hicranê

7. Di wê weqtê dibû deng e, xuyabû qameta şeng e
Wekî bedrê şifet reng e, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

8. Heçî weqta tecella bû, wekî bedra mu'ella bû
Li ser xalê cemîla bû, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

9. Murîd û muxliş û kamil, hemî t êk 'alim û fazil
Divêtin qeṭ nehin ĝafil, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

10. Dema têtin kemerbestan dibûn şubhê min û mestan
Bi mişlê bulbulê bustan, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

11. Dema meş kir wekî sultân, digotin wan kemerbestan
Fedeke rûhuna ey can, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

12. Li cayê suḥbeta şîrîn şifetxaqan ewî nûrîn
Dibûn calis digel temkin, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

13. Ewî xweş noş tekellum kir, gelek caran tebessum kir
Li eşhaban tereḥḥum kir, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

14. Di wê weqtê nezer dabû hinek meczûb û şeyda bû
Hinek hişyar û bîna bû, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

15. Hinek bûn 'aşiqê şeyda, wekî Mecnûn û hem Leyla
Li koh û deşt û hem şehra, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

16. Hinek bûn xaiîfê hail, hinek hêj ʔalibê mail
Hinek kamil, hinan cahil, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
17. ʔebîb û ʔaziq û mahir, di ʔilmê batin û Zahir
Helîm û muşfiq û şabir, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
18. Qedem sabit mueyyed bû, li ser nehca Muħemmed bû
Di şerʔê da meded bû ew, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
19. Ev e ʔaşil tu guhdar bî, bila qelbê te hişyar bî
Bi vê qeşrê xudan kar bî, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
20. Bi mişle wî di dunyayê nebûn murşid û qeṭ nayê
Kemalatek Xweda daye, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
21. Ku lew ferʔê Nebî bû ew, Muħemmed meşrebî bû ew
Di şerʔê da qewî bû ew, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
22. Kemala wî ʔelamet bû, ji bo neqlê îşaret bû
Li nik wî xweş beşaret bû, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
23. Dema wî dîtî ev ʔerz e, bi bal neqlê dide remz e
Kelamê ba te kir ʔerz e, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
24. Ji xeyra axirê peyda qelayê bateyî kanî
Sefer kêşa bi Mekkê da, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
25. Wî iʔraz kir ji dunyayê, nebû meyla wî bi ʔuqbayê
Ji geyrê feḍl û reʔnayê, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
26. Di sala heştêy û heftan di puştî elf û mîetan
Di Sebtê kir qebûl ferman, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

27. Tijî zulmet bû dunyaî, sema û erd û behraî
Xwedê şîn û girîn dayî, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
28. Rical û niswet û bûkan li ser rahan di nêv sûkan
Tîfal û teyr û hem çûkan, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
29. Texelxul kefte şehrayê, di puştî rûyê zîbayê
Heyat xweş nîne li dunyayê, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
30. Ela ey mexfiyê rûreş wek te kes nebû bextreş
Yetîm mayî hetanî xweş, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
31. Yetîm û bê pudêr mame, 'elîl im bê tîbîb mame
Ğerîb im der bi der mame, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
32. Ğerîb mame ji ewtanen, ji eħbab û ji ixwanan
Ji ehl û zewc û cîranan, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
33. Birîndarê du ebrû me, esîrê çeşmê cadû me
'Elîlê xalê ser rû me, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
34. Dil û cergê me bû ker ker ji ħubba qameta 'er'er
Ji bêhna geysûya ezfer, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
35. Ji bêhna zulf û geysûyan, ji remza çeşm û ebrûyan
Ji ħusna cebhet û rûyan, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
36. Nehin qeş kes bi ħalê min, qewî pir bûn melalê min
Ji min çî dîkin delalê min, gelo Ğewşê Şîrîn kanî
37. Ela ey 'Ebdurreħman mebe ayîs dibit punhan
Li derdê te bike dermam, gelo Ğewşê Şîrîn kanî

Di mersîyeyan de beşeke ku gelek caran derdikeve pêş dayîna pesnê kesê wefatkirî ye. Dema ev pesindayîn tê kirin ji hunerên edebî gelek zêde sûd tê wergirtin. Bi van huneran ew kesê ku mirîye; ger alim be pesnê wî di warê ‘ilmê de, ger wek rêberekî hatibe qebûl kirin pesnê wî di warê jêhatîbûn û kêrhatîbûnê de û ger endamekî malbatê bi xwe be pesnê wî yê di nav malê de tê dayîn û qala qencî û başîyên wî kesî tê kirin. Vêca dema ku em li vê mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê ji teref Şêx ‘Ebdurrehmanê Çoxreşî ve hatiye nivîsîn û ji 36 malikan pêk tê mêze dikin em dibînin ku ev beşa pesindayînê gelek zêde derdikeve pêş. Lewra di temamê helbestê de Çoxreşî ji bo pesnê Seyîd Sibxetullah Erwasî bide peyvên mîna “*saħîbê wextê, şûreta gulgûn, bedra şîfet reng, bedra mu‘ella, ‘alim, fażîl, sûhbet şîrîn, fer‘ê nebî, Muħammed meşrebî û hwd.*” bi kar anîye. Ji bilî van peyvên Çoxreşî bi temametî 36 caran gotina “*gelo Ğewşê Şîrîn kani*” bi kar tîne. Ew bi vê yekê him pirsar ‘Erwasî dîke û bi vê pirsînê şînê girê dide û him jî cardin pesnê wî dide. Ji bo vê mersîyeya ku li ser Seyîd Sibxetullah Erwasî hatiye nivîsîn dikare bê gotin ku digel ku tê de şîngirtin hebe jî beşa ku herî zêde derdikeve pêş dayîna pesnê kesê wefatkirî ye. Ji xwe ev yek beşeke sereke ya mersîyeyên klasîk e. Wekî din daxwazkirina sebrê û di‘a kirin digel ku di mersîyeyên klasîk de cihê xwe girtibin jî di vê mersîyeyê de nayê dîtin. Bes di malîka dawî de Çoxreşî bang li xwe dîke û bi şîreta ku li xwe dîke dawî li mersîyeya xwe tîne.

4. Ên ku li ser Hz. Huseyîn Hatine Nivîsîn

Hz. Huseyînê ku nevîyê Hz. Muhemmed(s.x.l.) bû û ehlê wî di sala 680yî (mîladî 61) de li Kerbelayê, bi fermanê Siltanê Emewîyan Yezîdê kurê Muawîye piştî ku çendîn rojan tî hatin hiştin, hatin şehîdkirin. Ev hedîseya şehîdkirina Hz. Huseyîn û ehlî wî ya li deşta Kerbelayê tesîreke mezin li ser Mislimanan hişt û bû sedem ev tesîr xwe di helbestan de wek şîn û girînê an jî lanetanîna li ser Yezîd nîşan bide. Ji ber vê yekê jî wê rojê vir ve gelek berhemên mensûr û menzûm hatin nivîsîn û hetta hinek berhem hatin nivîsîn ku di wan de xwerû qala şehîdkirina Hz. Huseyîn tê kirin. Her wisa di edebiyata klasîk ên Rojhilat de şehîdkirina Hz. Hesenê ku birayê Hz. Huseyîn e jî bûye xwedîyê tesîreke mezin. Ji ber ku Hz. Hesen birayê Hz. Huseyîn û nevîyê Hz. Muhemmed(s.x.l.) e, dema ku meseleya Kerbelayê tê zikirkirin di nav gel de gotina “*Hesen û Huseyînê Kerbelayê*” tê gotin. Lêbelê divê bê gotin ku tu ‘eleqeya

şhadeta Hz. Hesen bi meseleya Kerbelayê re nîne. Lê digel vê yekê hinek şa'ir hene ku di mersîyeyên xwe cî dane van qetlâman û şîna van her du birayan pêkve girtine.

Me di beşên berî niha de derheqê tesîra şhadeta Hz. Huseyîn de hinek tiştan anîbû zimên û cî dabû mersîyeyên ewil ên ku bi zimanên Erebi, Farisî û Osmanî hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê em ê di vê beşê de qala wan nekin û bes li ser wan mersîyeyên ku di edebiyata Kurdî de bi zaravayên Kurmancî hatine nivîsîn birawestin. Di encama xebata ku hat kirin de 3 mersîyeyên ku li ser Hz. Huseyîn hatin nivîsîn, hatin tespîtîkirin. Nûnerên vê qonaxê Şêx 'Ebdurrehman Aqtepi, Fehmî Begê Pêçari û Şêx Mihemed Kerbelayî ye.

Mersîyeya ku Şêx 'Ebdurrehman Aqtepi bi teşeya nezmê ya mesnewîyê nivîsiye qaliba wê fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl û behra wê muteqarib e û tevde ji 50 malikan pêk tê. Mersîyeya duyem a ku ji teref Fehmî Begê Pêçari bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn qaliba wê fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun, behra wê remel e û ji 17 malikan pêk tê. Mersîyenûsê dawî yê ku di vî warî de li ser Hz. Huseyîn mersîye nivîsiye Şêx Mihemed Kerbelayî ye. Mersîyeya ku Kerbelayî bi teşeya nezmê ya qesîdeyê nivîsiye qaliba wê fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun, behra wê remel e û ji 15 beytan pêk tê. Dema ku em li van 3 mersîyeyên ku hatine nivîsîn û li jiyana mersîyenûsan mêze dikin em dikarin bibêjin ku di vî warî de ji ber ku di nav nivîskarên ku li jorê navê wan hat zikirkirin de kesê ku berîya wan şa'irên din jiyaye û herî pêşî wefat kiriye Aqtepi(1845-1910) ye. Ger em van daneyên ku hatin zikirkirin esas bigirin em dikarin bibêjin ku yekemîn mersîyeya ku li ser Hz. Huseyîn hatiye nivîsîn a Şêx 'Ebdurrehman Aqtepi ye. Wekî din nehat dîtin ku di vî warî de mersîye hatine nivîsîn.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyan wisa ne:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsiye	Teşe	Qalib
Şêx Evdirrehmanê Aqtepi	Hz. Huseyîn	Mesnewî	feûlun feûlun feûlun feûl

Şêx Mihemed Kerbelayî	Hz. Huseyîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Fehmî Begê Pêçarî	Hz. Huseyîn	Qesîde	failatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Tablo 28: Mersîyenûsên ku li ser Hz. Huseyîn mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyan.

Ji bo mersîyeya ku li ser Hz. Huseyîn Hatiye Nivîsîn Nimûne:

Ji Şêx Ebdurrahmanê Aqtepi⁵³⁵

Feûlun Feûlun Feûlun Feûl

+ -- / + -- / + -- / + -

1. Bide saqîya badeyê por elem
Di dil da me hilbû hezar narê gem
2. Ku gemgîn bibim ez bi vî cur'eyê
Qeti' kim bi hiddet serê xameyê
3. Wekî ney binalim ji qelbê hezîn
Bikêşim hezar def'e ah û enîn
4. Qelem germî bêtin di nezmê gelek
Binalin li ser çerxê 'alî melek
5. Nezim kim hinik matemê matemî
Ku giryende kim ins û cinan hemî
6. Eger çi ne meqşûdê bû ev kelim
Welekin ji min xwestê besta meqam

⁵³⁵ Amedî, *h.b.*, 2016a, r.279.

7. Ji bo ĥubbê ŧehzadêganê nebî
Nezim kim li vir bendekî ecnebî
8. Ji dewranê çerxê ku gazin bikim
Di 'alem de merŧiye mazin bikim
9. Çi tedbîrekî naseza kir felek
ŧehîd ew ŧehê Kerbela kir felek
10. Di ŧehrayê kerbûbela ŧeh Ĥuseyn
Dihen xoŧk û leb teŧne bû ŧeh Ĥuseyn
11. Ne bab û ne da û ne qewm û bira
Di ħurbet ŧehîd bû ŧehê Kerbela
12. Li ŧedrê wî ŧehzadeyê pir 'ezîz
Te'in kiriye mel'un yekî rimhê tîz
13. Ĥuseyn ħonçeyê baħê Alê 'Eba
ŧehîd kir ewî le'netî rû sîya
14. Ewî quretê 'eynê ŧahê zeman
Bi feđla ŧehadet muŧerref çunan
15. Di nêv Kerbela çûn Ĥuseyn bû ŧehîd
Bi 'erđ û sema ket fiħanek ŧedîd
16. Heçî sengekî bû li rûyê zemîn
Di bin de tijî xûnê ŧorxîn çunîn
17. Ji bo matemê ŧah deŧê 'Iraq
Ket ezman û 'erđan 'eceb îĥtîraq

18. Qewî heqq e ger çerxê gerdûnê dîn
Li erdan birijit sirişkê di xwûn

19. Felek surxî bû ez ufuq ta ufuq
'Elamet heye şiklê xwûn şefeq

20. Huseyn an kî reyhaneyê cennetê
Şehîd bû ji nav leşkerê ummetê

21. Ne efgan û gazî ne dad û hewar
Ne feryadîres bû şehîdê kubar

22. Sanî, werin matemê bittemam
Ji bo merşîya şeh bikin îhtiram

23. Bi matem hemî hurîyê cennetê
Huseynim şehîd bû di nav gurbetê

24. Muherrem dema taze bîtin hîlal
Cedîdan bikin matem pir delal

25. Çû 'aşûra bîtin di mahê hezîn
Dikin heft tebeq 'erđ û ezman enîn

26. Ku ecsamê camid bikin giryeyê
Li me heqtir e qeşdê merşîyeyê

27. Huseyna Huseyna şehê Kerbela
Bi 'işqa te xayet ez im mubtela

28. Dilê min kebab e ji ber firqetê
Ku tê fikra min şiddeta derbetê

29. Le'în siyeh bextê murdarê pîs
Şeqiyê cehennem mekanê xebîs
30. Dema te'ne da tîzeyê zehrîdar
Şehîd bû Huseyn im şanî hewar
31. Derîxa Huseyn im derîxa Huseyn
Ji bo Muştefa qurretê her du 'eyn
32. Eger Murteza şahê merdan 'Elî
Li meydan bikişa fiğanek celî
33. Weya be'zê eşhabê nûrîn cemal
Bihata di feryadê şahê delal
34. Çi hed bû ji bo wî le'înê şedîd
Huseynê Imam ew bikîtin şehîd
35. Welêkin di ğurbet îmamê şebab
Şehîd bû ciger teşne bo qitre ab
36. Huseyna, Huseyna, Huseyna, Huseyn!
Kuca Fatima Murteza eyne eyn
37. Eya Fatîme rohniya her du çav
Huseyn im şehîd bûye bê da û bav
38. Şanî li cem'a şehaban tamam
Hemî werne imdadê şahê îmam
39. Îmamê binê Kerbelayê gerîb
Şehîd kirîye zalim bi halek 'ecîb

40. Welêkin serê cumle derd û hezen
Bi semmê şehîd bûye Imam Hesen
41. Çi agir kete cergê min por şedîd
Huseyn û Hesen her du bûne şehîd
42. 'Eceb qatilê her du şîrîn bira
Dibêjin em in ummeta Muştefa
43. Kesê ku Huseynî şehîd kit hezîn
Digel şeh Hesen sem bidit în çunîn
44. Çisan dê şefa'et bibînit 'eceb
Ji ceddê ewan şahê fexrê 'ereb
45. Ne razî me ez ey Rebbê kirdîkar
Bi qetla evan şahîzadê kubar
46. Di mersîyeyê wan 'ezîzan gelek
Ji min ah û efğan diçin ta felek
47. Ji destê me nayê bikim xîzmetê
Welê ser Yezîdî dikim le'netê
48. Tehemmul nekir qelbê min ev xeber
Me matem birrî bendekê muxteşer
49. Xudaya bi heqê benî Fatîme
Kî ber qewlê îman konem xatîme
50. Îlahî tu Ruhî nekî şermîzar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar

Xalek heye pêwîst e derheqê Şêx ‘Ebdurrehman Aqtepî de bê gotin da ku ‘eşq û muhabbeta wî ya ji bo Hz. Huseyîn bê famkirin. Dema em li jiyana Aqtepî mêze dikin em dibînin ku digel di Îslamê de li ser yekî anîna le‘netê caiz nehatibe dîtin jî ew ji ber giranbûna êş û elema şhadeta Hz. Huseyîn helbestek nivîsîye ku cûreya wê le‘netname ye û tê de ji wan kesên ku Hz. Huseyîn şehîd kirin re weke ku ji navê helbestê jî tê famkirin, le‘netê dixwîne. Her wekî din Aqtepî ji ber muhabbeta xwe ya li hember Hz. Huseyîn navekî lawê xwe kiriye Şêx Kerbelayî ku ev kurê wî û yên din jî wekî bavê xwe derheqê Hz. Huseyîn de mersîye nivîsîne. Ji ber vê hezkirin û muhabbetê, Aqtepî hest û ramanên xwe û her wisa êş û elema ku ew ji ber şhadeta Hz. Huseyîn dikşîne ji dil û can tîne zimên.

Mersîyeya ku Aqtepî nivîsîye tevde ji 50 malikan pêk tê û bi teşeya nezmê ya mesnewîyê hatiye nivîsîn. Behra wê muteqarib û qaliba wê jî fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûl e. Di mersîyeya ku hatiye nivîsîn de em dibînin ku mersîye bi van sê malikên ewil

Bide saqîya badeyê por elem
Di dil da me hilbû hezar narê gem(1)

Ku gemgîn bibim ez bi vî cur‘eyê
Qeti‘ kim bi hiddet serê xameyê(2)

Wekî ney binalim ji qelbê hezîn
Bikêşim hezar def‘e ah û enîn(3)

dest pê dike ku ev yek jî êş û elema ku Aqtepî ji ber şhadeta Hz. Huseyîn dikşîne û hezkirin û muhabbeta wî ya li hember Hz. Huseyîn nîşanî me dide.

Şêx ‘Ebdurreham Aqtepî ji ber ku gelek zêde girêdayîyê Hz. Huseyîn e û jê hez dike; êş û elema ku dikşîne jî ew qas zêde û dijwar e. Ji ber vê yekê di nezera wî de kes an jî tiştê ku divê şînê bigire û rondik bibarîne ne ew tenê ye, tamamê ehlê ‘erd û asîmanan û tamamê ins û cinan e. Aqtepî vê yekê di malikên pênc û panzdehan de bi gotinên “*Ku giryende kim ins û cinan hemî, Bi ‘erđ û sema ket fiğaneke şedîd*” destnîşan dike. Şehîdbûna Hz. Huseyîn li Aqtepî ew qas giran tê ku ew asta kişandina êş û elemê

û feryad û fixanê di beyta bîst û duduwan de derdixe asta herî jor û dike hewar û ew daxwaz dike ku her kes beşdarî vê matemê bibe û ji bo mersîyeya şeh îhtîramê bigire.

Aqtepî di vê mersîyeya xwe de digel şîna ku girê dide û rondikên ku ji ber şhadeta wî dibarîne, qala zilma ku li Hz. Huseyîn hatiye kirin û şêwaza şehîdkirina wî dike û bi beytên mîna 29 û 47an wan kesên ku Hz. Huseyîn şehîd kirine diwesfîne û bi gotinên “ *Le ‘în siyeh bextê murdarê pîs/Şeqiyê cehennem mekanê xebîs, Ji destê me nayê bikim xîzmetê/ Welê ser Yezîdî dikim le ‘netê*” le ‘netê ji wan re dixwîne.

Yek ji beşên din ê sereke ya mersîyeyan dayîna pesnê kesê wefatkirî ye. Di gelek beytên mersîyeyê de Aqtepî, pesnê Hz. Huseyîn dide û wî dişbihîne “*îmamê şebab, şehê Kerbela, şehîdê kubar, reyhaneyê cennetê û hwd.*” Aqtepî piştî şîna ku di seranserê mersîyeyê de digre, bi van her du malikên ku tê de ji bo Hz. Huseyîn di ‘a dike dawî li mersîyeya xwe tîne.

Xudaya bi heqê benî Fatîme
Kî ber qewlê îman konem xatîme(49)

Îlahî tu Ruhî nekî şermîzar
Kerr û lal û gêj e tunîne medar(50)

Derheqê mersîyeya ku ji teref Aqtepî ve hatiye nivîsîn de herî dawî em dikarin bibêjin di mersîyeyê de mijarên mîna; şîn, kişandina êş û elemê, di ‘a, pesindayîn derdikevin pêş. Beşeke din a vê mersîyeyê heye ku wê ji wan mersîyeyên din cuda dike. Ew jî ji qatîlên Hz. Huseyîn re anîna le ‘netê ye ku ev yek di gelek cihên mersîyeyên Aqtepî de xwe nîşan dide.

5- Ên ku li ser Endamên Malbatê Hatine Nivîsîn

Di jiyane de însan bi gelemperî herî zêde ji ferdên malbata xwe yên wekî kesên; dê, bav, bira, xuşk, qîz, law û hwd. hez dike. Ji ber ku di cîhanê de kesên ku jê re nêztirîn kes ev in, ev kes ji hemû kesian zêdetir li ber dilê însan şêrîntir e. Vêca dema kesek ji van ferdên malbatê diçe rehma Xwedê êş û elema wî kesî zêde giran dibe û feryad û fixana ku tê kirin ji dil û cantir dibe. Dema em di vê bergehê de li van mersîyeyên ku li ser ferdên malbatekê hatine nivîsîn mêze dikin em dikarin bibêjin ku

di warê kişandina êş û elemê de û kirina feryad û fixanê de zêde ferq li gorî wan mersîyeyên din tune ye. Lêbelê ji ber ku ew kes ji xwîna însan bi xwe ne, êş û elema tê kişandin û rondikên tên rijandin ji dil û cantir in. Dema em li edebiyata Kurdî a klasîk mêze dikin em li rastî 26 mersîyeyên ku li ser endamên malbatekê hatine nivîsîn tîn.

Di encama xebata ku li ser wan mersîyeyên endamên malbatê hat kirin de hat dîtîn ku li ser lawan 12 mersîye, li ser qîzan 1 mersîye, li ser birayan 3 mersîye, li ser xaniman 5 mersîye, li ser bavan 3 mersîye, li ser kurapan 1 mersîye û li ser kalikan 1 mersîye bi tevahî 26 mersîye hatine nivîsîn.

Niha jî em ê van mersîyeyên ku li ser endamên malbatekê hatine nivîsîn li jêrê binirxînin.

5.1. Bav

Dem a em li qada edebiyata Kurdî ya klasîk mêze dikin em dibînin ku li ser wefata bavan ji teref du mersîyenûsan ve tevde 3 mersîye hatine nivîsîn. Di van mersîyeyên ku hatine nivîsîn de ji ber ku kesê wefat kirîye û li ser wî mersîye hatiye nivîsîn bav bi xwe ye asta şingirtinê û êş û elema ku tê kişandin, însan zêdetir dixê bin tesîra xwe. Her wisa di van mersîyeyan de beşên mîna; di 'akirin, pesindayîn, şingirtin, hêvî û temennî, sebir xwestin jî dibin rêyeke ku mersîyenûs karibe lê bar û huzna dilê xwe bireşîne.

Di vî warî de Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî li ser bavê xwe Şêx Mustafayê Sîsî 2 mersîye nivîsîne. Mersîyeya wî ya ewil a ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye; behra wê recez û qaliba wê jî mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun e. Ev mersîye tevde ji 13 beytan pêk tê. Mersîyeya wî ya duyemîn jî dîsa teşeya wê ya nezmê qesîde ye, behra wê hezec û qaliba wê jî mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun e. Ev mersîye jî tevde ji 11 beytan pêk tê.

Di vî warî de mersîyenûsê din Şêx Hemza Hîmmetullah e. Wî, ev mersîyeya xwe li ser bavê xwe Sultan Memdûhê Tûlowîyê ku di sala 1847an de çûye rehma Xwedê nivîsîye. Ev mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe'ê û bi qaliba mefa'îlun mefa'îlun hatiye nivîsîn û behra wê hezec e. Ev mersîye jî tevde ji 13 bendan pêk tê.

Ji ber ku dema Sultan Memdûhê Tûlowîyê (m.1847) bavê Şêx Hemza Hîmmetullah wefat kiriye, Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî hêj nehatiye dinyayê em dikarin bibêjin mersîyeya ewil a ku li ser bavan hatiye nivîsîn a Şêx Hemza ye.

Navên mersîyenûs û kesên ku mersîye li ser wan hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyan wisa ne:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsîye	Teşe	Qalib
Şêx Hemza Hîmmetullah	Sultan Memdûhê Tûlowî	Murebbe‘	mefa‘îlun mefa‘îlun
Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî	Şêx Mustafayê Sîsî	Qesîde	mustef‘îlun mustef‘îlun mustef‘îlun mustef‘îlun
Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî	Şêx Mustafayê Sîsî	Qesîde	mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun

Tablo 29: Mersîyenûsên ku li ser bawên xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeyên ku li ser bavan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî⁵³⁶

Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun

+ - - - / + - - / - + - - - / + - - -

1. Ji nû îro birîndar im li kû ye şêxê meydane
Ji derdê wî elemdar im çebîbê pîrê meyxanê
2. Wefata şahê Seyda bû xulaşa neqşebenda bû
Wekî şêrê li meydan bû di vê ‘eşrê di vê anê
3. Di vê ‘eşrê xwe da rabû di cahê gews û seyda bû

⁵³⁶ Qewmanî, *h.b.*, r.40.

Di batin behr û derya bû dizanit ew kesê zanê

4. Gelo kan ew şehê şîrîn xwedanê cama gulrengîn
Ji bo min qeṭ nema temkîn ku îdî nayê dîwanê

5. Ku xalî kir'ye dîwan e muṭî'ê emrê Reḥman e
Li qebran bûye mēhvan e bikin em ah û efganê

6. Bi efgan û bi nalîn im ji dada firqetê dîn im
Hewar Seyda te nabînim di cumle 'alem a hanê

7. Ewî 'alem ku îhya kir ewî yek yek ji xew rakir
Ṭerîqa şer'ê îfşa kir ji dest me çû bi nadanê

8. Gelo kan ew şehê 'alî murîd hiştin di vî halî
Ḥeta kengî bikim nalî xwe bavêm merqeda palê

9. Xwe bavêm merqeda nûrîn bibêjin şahidê şîrîn
Tu bû stûnek ji bona dîn li pišta me bî d' mîzanê

10. Di roja heşr û mîzanê murîdêd min bibên kanê
Muṭî'ê emr û fermanê hema hilde ji meydanê

11. Muḥemmed Hadiyê xadem te wî hiştî di behra gem
Fîraqa te hejand 'alem bi vê ṭerz ê bi vê şanê

Mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye, behra wê recez û qaliba wê jî mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun e, bi êş û elema ku Qewmanî ji ber wefata bavê xwe Şêx Mustefayê Sîsî dikşîne dest pê dîke. Qewmanî di beyta ewil û ya duyemîn de li ser bavê xwe digrî û keder û elema xwe tîne zimên. Qewmanî dema ku vê yekê dîke her wisa bi peyvên mîna “*Ṭebîbê pîrê meyxanê, Wekî şêrê li meydan bû*” pesnê xwe bavê xwe dide.

Qewmanî di beyta sêyemîn de vêca dest bi zikirkirina wesfên qenc û baş ên bavê xwe dike û vê yekê heta beyta nehemîn didomîne. Qewmanî, di van beytan de digel pesindayînê, êş û elema xwe ya ji ber wefata bavê tîne zimên, dike ax û zar, feryad û fixan û bi beytên mîna yên li jêrê bi rêya hunera edebî pirsra bavê xwe dike.

Gelo kan ew şehê şîrîn xwedanê cama gulrengîn
Ji bo min qeṭ nema temkîn ku îdî nayê dîwanê (4)

Gelo kan ew şehê 'alî murîd hiştin di vî halî
Ḥeta kengî bikim nalî xwe bavê merqeda palê(8)

Qewmanî di beyta neh û dehemîn de dawî li pesindayîna bavê xwe tîne û şîna ku ew ji ber wefata xwe digre tîne zimên. Piştî vê gavê Qewmanî dest bi temennî û daxwazan dike. Piştî vê xalê Qewmanî bi beyta dawî ya yazdemîn a ku tê de şîna tê girtin dawî li mersîyeya xwe tîne. Ji ber ku kesê wefatkirî bav bi xwe ye meriv bi rihetî wê êş û elema ku tê kişandin dikare hîs bike.

Di çarçoveya beşên mersîyeyeke klasîk de ji bo vê mersîyeyê dikare bê gotin di vê mersîyeya ku ji teref Qewmanî ve li ser bavê xwe Şêx Mustafayê Sîsî hatiye nivîsîn de temayên şîna-girî û pesin derdikeve pêş.

5.2. Law

Wek pêşgotinekê pêwîst e em bibêjin, di edebiyata Kurdî ya klasîk de herî zêde li ser endamên malbatê û li ser şêxan mersîye hatine nivîsîn. Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat tespîtkirin 94 mersîye li ser şêxan û 26 mersîye jî li ser endamên malbatê hatine nivîsîn. Di nav van endamên malbatê de jî kesê ku herî zêde li serê mersîye hatine nivîsîn law in.

Vêca em veşgerin li ser wan mersîyeyên ku bi mijara me re têkildar in, ango li ser mersîyeyên ku derheqê wefata lawikan de hatine nivîsîn. Hat dîtin di vê kategorîyê de ji teref 5 mersîyenûsan ve tevde 12 mersîye li ser lawik/kuran hatine nivîsîn.

Nûnerên vê qonaxê Axayokê Bêdarî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Nalbend, Cegerxwîn û Mela 'Elîyê Baqûstanî ye. Di vê kategorîyê de mersîyenûsê pêşîvan Mela

Ehmedê Nalbend e ku wî tevde 8 mersîye li ser lawê xwe nivîsîye. Piştî wî Axayokê Bêdarî, Mela Qasim, Cegerxwîn û Mela 'Elîyê Baqûstanî tê. Her yek ji wan jî di vî warî bes mersîyeyek nivîsîne.

Di vî warî de mersîyeya yekemîn a ku hatiye nivîsîn a Axayokê Bêdarî ye. Bêdarî, vê mersîyeya xwe li ser du lawên xwe yên ku di sala 1728an de rehmet kirine nivîsîye. Dema ku em li díroka wefata wan mersîyenûsên mîna Mela 'Elîyê Baqûstanî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Nalbend û Cegerxwîn mêze dikin em dibînin ev şa'ir piştî Bêdarî jiyane ku ev yek yekemîn mersîyebûna mersîyeya Bêdarî xurtir dike. Mersîyeya Bêdarî ya ku di sala 1728an de li ser wefata her du lawên xwe nivîsîye jî hêla teşeya nezmê ve bi teşeya muxemmesê hatiye nivîsîn û ji 8 bendan/pêncîneyan pêk tê. Behra mersîyeyê remel û qaliba wê jî fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun e. Di vî warî de mersîyenûsê me yê din Mela Qasim e ku wî li ser lawê xwe Abdullahê ku rehmet kiriye mersîyeyek nivîsîne. Mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya murebbe'ê hatiye nivîsîn, qaliba wê fa'ilatun fa'ilatun û behra wê jî remel e û tevde ji 23 bendan pêk tê. Piştî Mela Qasim, mersîyesûnê me yê din ê di dorê de Mela Ehmedê Nalbend e. Wî tevde 8 mersîye li ser lawê xwe yê bi navê Muhemmed nivîsîye. Teşeyên nezmê, qalib û behrên mersîyeyên ku ji teref Mela Ehmedê Nalbend ve li ser lawê xwe yê bi navê Muhemmed hatine nivîsîn li jêrê di tabloyê de hatine destnîşankirin.

Mersîyenûsekî din ê di vî warî de Mele 'Elîyê Baqûstanî ye. Wî mersîyeyek di vî warî de li ser lawê xwe yê bi navê Wehîd nivîsîye. Mersîyeya ku Baqûstanî nivîsîye jî hêla teşeya nezmê ve bi teşeya muxemmesê hatiye nivîsîn û ji 9 pêncîneyan pêk tê. Behra mersîyeyê remel û qaliba wê jî fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun e.

Mersîyenûsê me yê dawî yê di vî warî de Cegerxwîn e. Cegerxwîn mersîyeya xwe li ser lawê xwe yê bi navê Xurşîd nivîsîye. Mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê murebbe' e, bi qaliba mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun û bi behra muzari' hatiye nivîsîn û tevde ji 8 bendan pêk tê.

Navên mersîyenûs û kesên ku mersîye li ser wan hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsiye	Teşe	Qalib
Axayokê Bêdarî	Li ser du lawên xwe	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mela Qasim	Lawê xwe Abdullah	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Xezel	mustef'iun fa'ilun mustef'iun fa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Xezel	Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Cegerxwîn	Lawê xwe Xurşîd	Murebbe'	mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun

Mele 'Elîyê Baqûstanî	Lawê xwe Wehîd	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
-----------------------	----------------	----------	--

Tablo 30: Mersîyenûsên ku li ser lawan mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeyên ku li ser lawan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Axayokê Bêdarî⁵³⁷

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Şed mixabin vê cewabê ez ji dil nalan kirim
 Taqet û qûwet nema min belkî ez bêcan kirim
 Leşkerê derdan geha min ji 'eqlî talan kirim
 Min nema qeç xew bi carek bêser û saman kirim
 Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim
2. Wê dema mesmû'î min bû hicreta cohtê kuran
 Gem li ser pişta me hazır bûne barê oştiran
 Sitirî nabim ez tu car êdî ji vî barê giran
 Rîş û rih her du me şil bûne ji ava hêstiran
 Furqeta wan şorgulan ez bê'eded girîyan kirim
3. Ey Rebbî 'alem tu yî, derdê li halê min pur e
 Min ji xanî çûne vekra rojekê cohtê kur e
 Ger weled 'ar e welakin ew li nik babî durr e
 Cewherek xelkê bîyanî bo me bûn şêrîn sur e
 Vê demê dîn û teles ez hewceyê dêran kirim
4. Her du rojan heq bi ser min ev muşîbet anîye
 Sal hezar û şed û çil çûne ji hecra ummî ye
 Mahê nîsanê ku roja reş li min bû şenbî ye
 Lazim e her çî ku heq kit em bi wî bin raî ye
 Lêk van derd û geman bê daniş û iz'an kirim

⁵³⁷ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42.

5. Her du rojan wan bi yek ra daîye terka cehan
 Yek di sala sezdehê bû yek di sala pazdehan
 Xwezî ew her du bigirîna li min ne ku ez li wan
 Sitirî nabim ez tu caran ji hesreta cohtê kuran
 Hicreta wan şorgulan ez bê 'eded girîyan kirim
6. Qeş ji dil nayête der tîra di dil tîra kulab
 Min birîna dil di dev da der bûye jê tê 'edab
 Sîne ateş danî îro dil di wê da bû kebab
 Lew dinalim bê qîyas û lew dikalim bêhisab
 Vê gulanê ez ji seyra şorgul û werdan kirim
7. Min divêt 'Îsa bibînim dê ji kû peyda bitin
 Min birîna dil xef e esseş bizan xweş nabitin
 Dê bi derd û gem bimînim ta qîyamet rabin
 Ger di heşrê da bibînim wan ku dil pê şa bitin
 Lê tê ta yewmel-qîyame munîsê derdan kirim
8. Geyn Elîf beske ji nal û zarî waha derûn
 Ew qezaya barî ye ma kes li wê çû kit bi rûn
 Sa'etek texîrî nabîtin wela *yesteqdimun*
 Herçî heq kit ew heqq e *inna lîllahî raci'un*
 Lê ji derd û hesretan ez bê 'eded giryan kirim

Piştî van agahîyên ku derheqê mersîyenûs û mersîyeyên wan de hat dayîn, em dixwazin mersîyeya ku ji teref Bêdarî ve hatiye nivîsîn ji hêla teşe û beşên mersîyeyê ve binirxînin.

Mersîyeya ewil a ku hatiye nivîsîn a Axayokê Bêdarî bû û wî ev mersîyeya xwe li ser êş û elema ku ji ber wefata her du lawan pê re peyda bûye nivîsîye. Dîroka nivîsîna vê mersîyeyê 1728 e. Ev mersîye ji hêla teşeya nezmê ve bi teşeya

muxemmesê hatiye nivîsîn û ji 8 bendan/pêncîneyan pêk tê. Behra mersîyeyê remel û qalîba wê jî fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun e.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de xususîyeteke mersîyeyan ew e ku bi şîn, êş û elemê dest pê bike. Bêdarî bi pêncîneya ewil a mersîyeya xwe pêkve mirina her du lawên xwe û êş û elema ku ew ji ber vê wefata pêkve dikşîne bi teswîr û şayesandinên xurt tîne zimên. Ev yek jî tesîra wefata lawan a li ser wî nişan dide.

Asta kişandîna êş û elemê ya Bêdarî di temamê mersîyeyê de xwe pir zêde xurt nişan dide ku ev êş û elem piştî astekê dikeve nava sînora xwe ji wan re fedakirinê. Bêdarî di benda pêncan de bi gotina "*Xwezî ew her du bigirîna li min ne ku ez li wan*" daxwaz dike ku kesê mirîye ew bûna ne her du kur bûna.

Bêdarî di mersîyeya ku nivîsîye de gelek caran serî li hunera edebî ya teşbîhê daye û lawên xwe yên ku wefat kirine bi van gotinan wesfandiye: "*Du şahî, cohtê kuran, şorgulan, du roj.*"

Di benda çaremîn û pêncemîn a mersîyeyê de Bêdarî bi me dide zanîn ku lawên wî pêkve di sala 1728an de çûne rehma Xwedê û yek ji wan 13 û yê din jî 15 salî bûye. Êş û elema ku Bêdarî ji ber wefata her du lawên xwe dikşîne ew qas zêde lê giran dike ku ew bi gotina "*Dê bi derd û gem bimînim ta qîyamet rabbitin*" dibêje ev êş heta ku qiyamet ranebe bi dawî nabe. Ew di benda heftan de jî dest bi daxwaz û temenîyan dike û daxwaz dike ku di heşrê de ew li ba li her du kurên xwe be.

Bêdarî piştî nalîn, feryad û fixana ku dike, serê xwe li ber heqîqeta mirinê ditewîne û teslîm dibe û dibêje ku "... *em ji ba Xweda hatine û veger li wî ye.*" Lê digel vê yekê tiştêkî balkêş heye ku ew jî risteya dawî ya benda heştan e. Bêdarî digel ku teslîmbûna xwe li hember emrê Xweda diyar dike jî ji ber zexta êş û elema wefata zarokên xwe, bi xwe nikare û cardin derd û kulên xwe tîne zimên û mersîye bi dawî dike.

Wek encam derheqê vê mersîyeya Bêdarî de em dikarin bibêjin ku mersîyeya wî ji ber ku her du lawên wî yên temenbiçûk di heman demê de mirine, bi temaya êş û elemê zêdetir derdikeve pêş. Ev derketina pêş a şîn û girînê ya di mersîyeyan de beşeke sereke ya mersîyeyên klasîk e.

5.3. Qîz

Edebiyata Kurdî ya klasîk di warê nivîsîna mersîyeyên li ser qîzan de gelekî ne xurt e. Bi gotinek din di vî warî de zêde mersîye nehatine nivîsîn. Di encama lêkolîna ku hat kirin de bes em li rastî mersîyeke tenê hatin ku ew jî a Fehmî Begê Pêçarî ye. Pêçarî vê mersîyeya xwe li ser qîza xwe ya bi navê Fikrîya nivîsîye. Mersîyeya ku ji teref Pêçarî ve li ser qîza xwe ya bi navê Fikrîya hatiye nivîsîn, teşeya wê ya nezmê qesîde ye û ji 11 malikan pêk tê. Behra mersîyeyê remel û qaliba wê jî fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun e.

Ji bo mersîyeyên ku li ser qîzan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Fehmî Begê Pêçarî⁵³⁸

Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilun

+ + - - / + + - - / + + - - / + + -

1. Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî
Me du çav mane li seyra ufuqan ka zivirî?
2. Buhurîn peyre gelek roj û meh û hefte û sal
Hê nehat şenga dilê jar û neçar û keşirî
3. Qediya şebr û qerara me ji hicran û gemê
Kêf û dilxweşî û zewqa me bi kerbê gewurî
4. Esef û tehlî û dilçengî ye karê me her roj
Roj û gavê me qe neçin carek bê ah û girî
5. Dilê me ji derd û gemê bûye tijî dag û birîn
Bi evê zexmê neşag im ta bi kilke kevirî
6. Bêheşî dûriya wan çavên gezalî û reş in
Di heş û bîra me cî girtine wan dêmên zerî

⁵³⁸ Demir, *h.b.*, r.216.

7. Ji wê meh-tel'etê dûr im me nema şebr û qerar
Bi xiyal her me li bal in dev û lêvên şekirî
8. Kelemê cewra felek şax û gulî dane di dil
Kûr e û agir û pête di kezeb pê xewirî
9. Dil dibêje ez diçim rûh û aqil nadine rê
Bi hemî new'ê cefaê herişî bû du kerî'
10. Me ji reşbextiyê jîn hîvî fikir çağ û çilek
Ne kujandin û bi ser de ten û can tev biçirî
11. Bêçek in mişlê gezalan mefera def'ê me bez
Dane ber te'n û seran Namî bezand û çepirî

Di mersîyeyên klasîk de mersîyenûs ji bo destnîşankirina asta qedr û qiymet an jî êş û elema firaqa kesê wefatkirî ya di nezera xwe de, gelek caran serî li hunerên edebî didin. Hetta mersîyeyên xwe bi vî şiklî didin destpêkirin. Fehmî Begê Pêçarî jî di mersîyeya ku li ser qîza xwe Fikrîya nivîsiye de bi teşbîha dike qîza xwe dişbihîne kewa ku ji ber çavên wî firê ketiye û çûye rehma Xwedê û dest bi mersîyeya xwe dike. Pêçarî di seransera mersîyeya xwe ya ku ji 11 malikan pêk tê de temaya êş û elema firaqê nexşandiyê û ji serî heta dawîya mersîyeyê bi gotinên mîna “ *dilê jar, qediya şebr û qerara me ji hicran û gemê, dilê me ji derd û gemê bûye tijî dax û birîn, bi evê zexmê nesag im ta bi kilke keviri, nema şebr û qerar, kûr e û agir û pête di kezeb pê xewirî û hwd.* ” li ser qîza xwe Fikrîya êşê kişandiyê û şînê girê daye.

Di mersîyeyê de ji bilî şîn û girî, bêsebr û qerariyê beşa pesindayînê jî heye. Pêçarî bi wesfandin û teşbihên ku di mersîyeyê de dike bi gotinên mîna “ *meh-tel'etê , mişlê gezalan û şenga dil* ” pesnê qîza xwe Fikrîya dide.

Ji bo vê mersîyeya ku di kategorîya mersîyeyên li ser qîzan hatine nivîsîn de dikare bê gotin digel ku di vê mersîyeyê de beşên mîna di'akirin, daxwazkirina sebrê û sîtema ji felekê re tunebin jî beşên mîna yê şingirtin û dayîna pesnê cihê xwe girtine.

5.4. Hevser

Piştî law, bav û qîzan çîneke din heye ku ew jî ji endamê malbatekê ne û li ser wan mersîyeyên dilşewat û herikbar hatine nivîsîn. Ew jî ew mersîye ne ku li ser wefata hevseran hatine nivîsîn. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de nûnerên vê beşê yên ku li ser hevserên xwe mersîye nivîsîne Mela Ehmedê Nalbend, Mirad 'Elî, Mela Yasîn Yûsrî û Esamî ye. Wan bi tevahî 5 mersîye nivîsîne. Mele Nalbend di vî warî de 2 mersîye li ser wefata xanima xwe ya bi navê Seyîd Fehîma nivîsîye. Mersîyeya wî ya ewil a ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê hatiye nivîsîn ji 24 malikan pêk tê û behra wê remel û qaliba wê jî fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun e. Mersîyeya duyemîn a Nalbend a ku bi teşeya nezmê ya terkîbbendê hatiye nivîsîn ji 26 bendan pêk tê û behra wê remel û qaliba wê jî fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun e. Piştî Nalbend ê ku li ser xanima xwe mersîye nivîsîye Mirad 'Elî ye. Ew di vî warî de mersîyeyek nivîsîye. Mersîyeya ku 'Elî nivîsîye teşeya wê ya nezmê muxemmes, behra wê recez û qaliba wê jî mustef'ilun mustef'ilun e. Ev mersîye tevde ji 30 bendan pêk tê. Mersîyeya ku Esamî jî nivîsîye teşeya wê ya nezmê xezel, behra wê hezec û qaliba wê jî mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun e. Ev mersîye jî tevde ji 9 malikan pêk tê. Di vî warî de mersîyenûsê dawî Mela Yasîn Yusrî ye. Wî li ser xanima xwe Reyhanet Xanim mersîyeyek nivîsîye. Ev mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye bi qaliba mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun û bi behra recezê hatiye nivîsîn. Ev mersîye tevde ji 12 malikan pêk tê.

Mersîyeya yekemîn a di vî warî de nayê zanîn. Lewra di her 5 mersîyeyên ku hatine nivîsîn de dîroka wefata kesan nehatiye diyarkirin. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin di vî warî de mersîyeya yekemîn a filan mersîyenûsî ye.

Navên mersîyenûs û kesa ku mersîye li ser wê hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyan wisa ye:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsîye	Teşe	Qalib
Mela Ehmedê Nalbend	Li ser xanima xwe	Terkîbbend	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Mela Ehmedê Nalbend	Li ser xanima xwe	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mirad `Elî	Li ser xanima xwe	Muxemmes	mustef'ilun mustef'ilun
Esamî	Li ser xanima xwe	Xezel	mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun
Mela Yasîn Yusrî	Li ser xanima xwe	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Tablo 31: Mersîyenûsên ku li ser hevserên xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyan.

Ji bo mersîyeyên ku li ser hevseran hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Mela Ehmedê Nalbend⁵³⁹

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'il

— + — — / — + — — / — —

1. `Erzê hâla xwo ji bo kê bixwînim

Piştî wê seyyîdê har û dîn im
Çû dema dilxoş û raĥet nîn im
Se'et û gav û dema nalîn im
Ez neşaġî li dema yasîn im
Meyyitê qebrê û bê telqîn im
Çavrehê Şêx Behaeddîn im
Da wekû seyyîdea dî bînim
Ez bi xo her we xudan texmîn im
Çunkî ez `ebdê wî û miskîn im

Belke ew emrî biket la texeffê

2. Bo te ey xanim û canê çi bikem
Nazik û şenê giranî çi bikem

⁵³⁹ Nalbend, h.b., r.58.

Xoş hevalbend û xudanê çî bikem
Piştî vê xusr û ziyane çî bikem
Bo xeş û xal û nîşane çî bikem
Şebrê serêş û qutane çî bikem
Ey dil û rûh û rewanê çî bikem
Keftime zehmet û janê çî bikem

Ax û şed ax bo ewî dur necefê

3. Ax û şed ax nê ewe xanim û zîn
Ji firaqê me hero ah û girîn
Me di dil keftine şed êş û birîn
Li wucuda me nebû kes we şirîn
Piştî ew çûye ezê hatim û dîn
Çî bikem min ne tehemmul ne revîn
Cehennem in ewro şagî û jîn
Li birîna çî ye derman û kewîn
Dem bi dem huzn û gem in çû me kenîn
Weqt e nêzîk e ku em pê bimirîn

Bo gema bo me nişan wek hedefê

4. Weqte 'omrê xo me borande serî
Min neman şebr û çû teb'ê beşerî
Nê hinav şotîn û ruh hate derî
Kes çû înkare nekin vê xeberî
Ne wek cana me bûn hûr û perî
Ne şirîn û ne çû Belqîs û zerî
Ne Zuleyxa ew ne Zîna Cezerî
Gerdenê rengê ji şîşê fenerî
Ew dema wê kirî karê seferî
Melek û gas û welî çûn di berî

Mislê sultanê li textê şerefê

5. Min ji huznê li serî restine şax
Wê li dil dane du şed keybir û dax
Lew nemane îro li min rewneq û zax
Hatine seyr û temaşa me di tax
Nê heta weqtê ecelê mame nişax
Weqtê hestî bimehîn bibineve ax
Ez li ser milik û gema bûme kerax
Co li min hate birîn germe tebax
Hêj nehîn hat ne dem hat û ne çax
Ma çi faydê me diden nalî û ax

Bazê paşahî firî çû ji refê

6. Qeṭ kesê hinde nebûn 'eql û edeb
Ji wê razî 'ecem û kurd û 'ereb
Şubhî şêrî bû dema digirt gēdeb
Laiqê şanê dibûn Şam û Heleb
Me li dunyayê wucûd ew bû sebeb
Ez ji bêjim çi bikem nîne 'eceb
Min neman 'eql û dil û se'î û ṭeleb
Weqtê ew sağ hero min kir qebqeb
Seyyida pak eşil 'alî neseb
Berze kir ecro li min nav û leqeb

Wek şemalê bû dema dihate sefê

7. Ew ro dunya li me hêla tarî
'Eql û sewda me neman êk carî
Kî biket rehmê li ser vî jarî
Ku wucuda wî bû jehra marî
Lazim e rehmê biken berwarî

Bo yeka dî ji neseba muxtarî
Wan li ser me hebît hişyarî
Se'î û teftîş û ğem û pisyarî
Belkî carek dî bixum vî parî
Ey Xudanê me tu ihsan karî

Zû bike roja bedir çûye xesefê

8. Kesb û kara me hemî derd û ğem in
Qûtê dil nalî û eş û elem in
Careka dî te huzn daye ve min
Keyf û lezzat û xoşî li min 'edem in
Dost û emsalê me yar û şenem in
Wan hema şewq gelek dît û ne min
Ku xudan ni'met û Nazik herem in
Ehlê emlak û besatîn û çemen
Mulkê min cerh û birîn û seqem in
Rebbî her karê te luţf û kerem in

Te ji mi stande wiqûfa 'erefê

9. Te dilê mi ji fereqê şuşt û renî
Neynika ruhn û vebûy girt tenî
Cerg û mêlak razîn mane genî
Min girî daîmiyye û hinde kenî
Kefte ser mulkê dilî befir û renî
Çend min se'ye kir û xo vejenî
Te necata xo neda vî rebenî
Evroke şibhî ğerîbek Yemenî
Maye dilsotî û dîbê wetenî
Bo bela bûye nîşana 'elenî

Felekê daye ber qehr û gefê

10. Şed meded ax ji cewra felekê
Xendiqîm keftime acê ji kelekê
Bûme êxsîrê di qeyd û xelegê
Kuştim ez seyyid û hûr û melekê
Nê heyata me niho ber helekê
Ez bi destê xo çî bigrim pelekê
Kire qeşda cihê bazî qelekê
Min neman qewl ji geyrî welekê
Ah bû wê Zînê mîşal û çelekê
Qelekê zulm ê neke li min gelekê

Ez giriftarê bi hubb û şegewê

11. Elem û cumle muşîbet bi 'umûr im
Ew li ser min bi gēdeb bûneve kom
'Eskerê kerb û bela kirye hucûm
Ku bezîn ser me şifet urus û rom
Ma çewa 'acizîya tehl nexom
Bo kesê hinde felek nîne zelûm
Lazim e destî ji dunyayê bişom
Ka nezer ken li min nê ez eve çûm
Fayde naken ne 'îlac û ne 'ulûm
Çî dema bû ecelî hal bû qudûm

Cehwerê rûhê nezer da telefê

12. Piştî wê bûm reben û bê kes û jar
Qeş neman hal û mefer û şebr û qerar
Şerbeta jehir û firaqê me vexwar
Em şemaldana şevê nîne diyar
Bûm birîndar û dewam her me hewar
'Umir û şagî li me bûn qeyd û hişar

Cehnemin mal û jin û xanî û war
Bûn beşeşta me niho çol û beyar
Min girî û zarîye êvar û sehar
Wey xudan çenda li min tehle bihar

Ġewribû kehnîya rehm û 'eşefê

13. Ey reben çendî tu bê iqbal î
Bo çine hinde hewar û nalî
Ĥemd û şukra me bike ji vê halî
Tu xusaret nebîye ji rastimalî
Bi dilî efşeş û ezman lalî
Şahîbê nuşîq û sir û ehwâlî
Bi 'umir yazde li pişt çil salî
Heye meknûnê me sirrek 'alî
Ji xezîna ku nekême û xalî
Careka dî miheka bi gopalî

Belke me'qûl e tu bînî vê kefê

14. Qeş neke digel me hisab û cedelê
Çi kire digel te me sirrek heye lê
Xo nede çolê melal û keselê
Se'îyka çak tu bike li ser meselê
Tu nizanî çi hebû li qalû belê
Min ji te stand dewrek baş welê
Biçerî taze li bağek nefelê
Vêt tu razî bî bi vê maşeşelê

Bes bike hinde fiğan û esefê

15. Min muşîbet hene wek beraşa

Tu nezer ke li mezin û oldaşa
Ji feqîr û ji xenî û paşa
Ku kesek wek me hebît haşa
Yef'elallahe we yeşkûm maşa
Ku li gustîrê nehêlît qaşa
Wek xozî himmeta ehlê şaşa
Durreka dî me heba ji Xişxanê
Wek Fehîma me gula neqqaşa
Hîvîya min ji welî û başa
Xelefek bête cihê wê selefê

16. Ey xudan vêt tu bide xercê rehê
Belke lêkdeyn bo xo baregehê
Da digel qaileyê biçîê Mekkehê
Bes bikem vê gelle û ah û ehê
Belke roja 'erefe û hîn û gehî
Nekevim qeyd û bela sal û mehê
Destê weşlê bigehînin vê fehê
Min ceza dît ji curm û gunehî
Lew şemala me qemirha şobehê
Tengîdil hate cihê dilfirehê

Durra menqûş xo kêşa şedefê

17. Tu digel min çi bikey em nesilîn
Her çi emrê te kirî pê 'emilîn
Lêbelê em bi xo dilsoz û kulîn
Bilbilîn talib û 'uşşaqî gulîn
Çû bihara me dema gul kemilîn
Ettişal hinde niho jê veşilîn
Xoş tereqqî me kir û em nezilîn
Ez nizanim ku çi tov ehlê dilîn
Kerekê şafî bi kurtan û cilîn!

Demekê taze bo yarê şugulîn

Me nebir qeṭ çû gem cewr û cefa

18. Evroke ji destê me çûn xêr û xoşî

Ḥuznê dil girt û cesed lê herişî
Cergê sotîli me firaqê gevişî
Ḥestîyê pişt û du rehna kelişî
Gem li mêlak û hinava neqîşî
Piştî wê tîr û ber û tevin û teşî
Ew hemî çûn û heram vî pirezî
Lew kul û derd û elem ketne leşî
Min fexir kir ew Xudê li min nemeşî
Ew xudan seyvideka dî Quresî

Bide me bi hîvî û sûnd û helefê

19. Wey felek pa tu çi zalim mizirî

Min nezanî tu çima ji min ‘enirî
Ew gula geş te bir û rist derî
Çî dema min nezerê kir li kurî
Ber bû min agir û bû pêt û gurî
Ruḥnikêd çava hemî xûne xurî
Ey xudan îro te li min vebirî
Wekî ḥeskey ku serê min vekirî
Bêje iqbala te hat û zivirî
Daîma şebrê bike pîsê gorî

Dê dewrek hêt vê cihê vê xelefê

20. Min niho ḥalê wekî Zîn û Memê

Neqdê şola me dixwazît selemê
Rebbî dana te wucûd e ji ‘edemê

Min heye Şêx Behayî keremê
Çî dema ah û hewara bikemê
Şerha halê xo çî bînim reqemê
Ez neşêm îro beyam kem ve hemê
Seyyidek kiç çî hebît ez didemê
Da bikem term evê berterefê

21. Lazim e min jineka can û çihêl

Min nevên bîjen û heyval û çû çêl
Xaîn û tund û xebergîr û çivêl
Dilveker solînegul başe ne rêl
Çî çihê seyr û temaşane nihêl
Min divêt aveke bê huşmuş û pêl
Bîjna li nik hene şed hîle û fêl
Gund û bajêr û 'eşîr bêne vê hêl
Ji gema reş bû dilê min bîye sêl
Hate badan me bi qehra bû 'elêl

'Ehdekê bo kiçekê bîne wefê

22. Şa'irê tûl û ter îroke ezim

Eveye fikra min û qeşd û cezim
Sêveke şibhî eva çûy bigezim
Ku ezê dilkul û bê cerg û bezim
Bê pez û pare û bê milik û rezim
Neqşebendî me û behra recezim
Ew tenê besse nevêt ez bibezim
Şêrê ezman û kelamê lugezim
Evaka vê degel û remel û kezim
Libsê atlesî û armûş û qezim

Ez niho keftime rist û tenefê

23. Min tu yî yar û bira molla Huseyn
Lew li ser zâtê te heqqê mine deyn
Dûr Xudê stand ji min em çi bikeyn
Ser bi ser keftime beynel cebeley
Min di dil keft şerê Bedr û Huneyn
Vê gema hinde mezin besse bibeyn
‘Erzê şêxî bike gewşê sequeleyn
Cennetel xuld yeqîn bo te ye ‘eyn
Vêt ‘ilacê li feqîrê xo bikeyn
Te ecir ket go mete keyfe we eyne

Reqsî dîn bû li ber çeng û defê

24. Min şanî her li Giyaşeddînî
Bi du ‘a roj û şevê ya îî
Multemis bî ji behayê dînî
Seyyidek dî bo feqîrî bînî
Çunke ew ‘ebdê te ye miskînî
haşe lillâh tu ji wî sil nînî
Min qesem nuke kire bi wettînî
Em ketîn kerb û bela vî hînî
Ger hebît min hemî milkê çînî
Her tijî çava me girye û şînî

Na zuha bin beqa nedey min neşevê

25. Şêx Mezher me tuy beş helêx
Ehmed îro revîye ‘ebdê gorêx
Kafirêt zâtê te ew jî bîye yêx
Careka dî li herba xo me bêx
Min gelek şêx bihistîne şelêx
Serbirin şafî neku mêw kezêx
Ebeden qet me nevên geyrî we şêx

Ku li dil min hinde şed nalî û êx
Hîlen li ber me du şed xendek û kêx
Ez di warê heweme zîrek û zêx

Kerê darkêşe bi xo biden 'elefê

26. Me şev û rojê fehê taze vepa
Keftime başk û mela çeng û lepa
Çend rabûye ji bin kefte çepa
Te 'nê hingaft ku heyhat wepa
Tu bo çêkey ku nerabûye pepa
Ew çi bû ya me kirî ke hecepa
Çi bikem dest verist min ji çepa
Çû ewê mîr li text û qenepa
Vequtan ro bi şeq û mest û tepa
Wey xozî çûyew heba li ser du depa
Paşî wek êşê nebû yar û mefê

Mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya terkîbbendê ji teref Mele Ehmedê Nalbend ve li ser xanima xwe Seyîd Fehîma hatiye nivîsîn bi tevahî ji 26 bendan pêk tê. Nalbend di benda ewil a terkîbbenda xwe ya ku li ser xanima xwe nivîsiye de dest bi rijandina derd û kulên xwe û dest bi kişandina êş û elema ji ber wefata xanima xwe dike. Em hêj di benda ewil a terkîbbendê de dibînin ku wefata Seyîd Fehîma tesîreke pir zêde li ser Nalbend hiştiye. Lewra Nalbend di benda ewil de piştî ku destnîşan dike xanima wî Fehîma rehmet kiriye bi risteyên mîna *“Piştî wê seyyîdê har û dîn im, Çû dema dilxoş û raçet nîn im, Se 'et û gav û dema nalîn im, Ez nesağî li dema yasîn im û Meyyitê qebrê û bê telqîn im”* yên benda ewil rewş û halê ku ew ji ber wefata xanima xwe di nav de ye nîşanî me dide.

Nalbend di bendên berdewama mersîyeyê de asta êş û elema ku dikşîne zêde dike û li xanima xwe digere û ji ber tunebûna wê bêsebr û bêqerarîya xwe tîne zimên.

Di mersîyeyê de feryad û fixana Nalbend a ji ber wefata xanima wî heta benda sêzdehan bi şiklekî gelekî xurt û tesîrdar xwe nîşan dide. Nalbend digel kişandina êş û elemê û anîna zimên a derd û kulên xwe car caran pesnê xanima xwe jî dide. Nalbend piştî ku heta benda sêzdehan derd û kulên xwe tîne zimên vêca berê xwe dide xwe û nesîhetan li xwe dike û dikeve nava temennî û xwestekan. Ev yek heta benda hijdehan jî berdewam e. Nalbend di risteyeke mersîyeyê de xwe bi vê gotina “*Bes bike hinde fiğan û esefê*” hişyar dike û temennîyên xwe didomîne.

Nalbend vê bêdengîya xwe ya di warê êş û elemê de zêde nadomîne û ji benda hijdehan pêve cardin dest bi reşgirêdanê dike û bi vê gotina xwe “*Wey felek pa tu çi zalim mizirî*” bi şiklekî tund bertek ji felekê re nîşan dide. Piştî vê bertek û reaksiyonê vêca Nalbend di bendên 20, 21 û 22yan de da‘wa jineke din dike û vê yekê bi gotina “*Lazim e min jineka can û cihêl*” tîne zimên. Dema ku em van her sê bendan bi hevra dîxwînin em dibînin ku ew, di wan de wesfên xanima xwe ya Seyîd Fehîma tîne zimên.

Nalbend ji benda 23yan pêve hawara xwe dibe kesên mîna Molla Huseyîn, Şêx Xiyaseddîn, Şêx Mezher û daxwaz û rîcayan ji wan dike û ji bo wan derd û kulên xwe tîne zimên.

Wek encam em dikarin bibêjin ku di vê mersîyeya ku Nalbend li ser xanima xwe nivîsîye de beşên mîna şîn û girî, di‘a kirin, pesin dayîn, ji felekê re reaksiyon nîşan dayîn, daxwazkirina sebrê û hwd. bi şiklekî zêde derdikevin pêş.

5.5. Bira

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de yek ji wan endamên malbatê yên ku piştî hevseran li ser wan mersîye hatine nivîsîn, ên li ser birayan e. Di vî warî de tevde 3 heb mersîye hatine nivîsîn. Nûnerên vê qonaxê Fehmî Begê Pêçarî, Şêx Esedê Çoxreşî û Şêx ‘Eskerî ne û her yek ji wan mersîyeyek li ser birayên xwe nivîsîne.

Mersîyeya ku Şêx Esedê Çoxreşî li ser kekê xwe Mela Xelîl (m.1881) nivîsîye teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun û behra wê remel e. Ev mersîye tevde ji 15 malikan pêk tê. Mersîyenûsê me yê din Şêx ‘Eskerî ye. Şêx ‘Eskerî vê mersîyeya xwe li ser birayê xwe Şêx Muhemmed Kerbelayî (m.1939)

nivîsiye. Mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye bi qaliba mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun hatiye nivîsîn û behra wê jî hezec e. Ev mersîye jî bi tevahî ji 21 malikan pêk tê. Nûnerê dawî yê vê beşê Fehmî Begê Pêçarî ye. Mersîyeya ku Pêçarî li ser birayê xwe Cewdet nivîsiye teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun û behra wê jî recez e. Ev mersîye jî bi tevahî ji 20 malikan pêk tê.

Di nav van de yê ku mersîyeya yekemîn e, ê Şêx Esedê Çoxreşî ye. Lewra Mela Xelîlê ku birayê Şêx Esedê Çoxreşî ye berîya birayê wan mersîyenûsên din rehmet kiriye.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyan wisa ye:

Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsiye	Teşe	Qalib
Şêx Esedê Çoxreşî	Mela Xelîl	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun
Şêx 'Eskerî	Muhemmed Kerbelayî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
Fehmî Begê Pêçarî	Cewdet	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun

Tablo 32: Mersîyenûsên ku li ser birayên xwe mersîye nivîsîne û teşe û qalibên mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser birayan hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Şêx 'Eskerî⁵⁴⁰

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

+ --- / + --- / + --- / + ---

1. Li min dîse xiya kir mişlê Deştê Kerbelayê gem
Qedem wextê hilanê Kerbelayî ez cihan der dem

⁵⁴⁰ Eskerî, *h.b.*, r.54.

2. Li qelbê bêkesan rabû qiyamet lê çi tofan e!
Dema şehzane fir da aşîyan wehdet serayê cem
3. Çi xweş bû ew dem û çagên ku yar bê pêçe û perde
Ji bo teşnedilan der bezmi işret bû wekî Zemzem
4. Di bağ û gulşenê yarê de ew werda geş û taze
Çi xweş bû endelîban her li ser bû daneyên şebnem
5. Nizanim dê çawa kim wey li min bêçare û bêkes!
Xwozî ez jî biçûma, ya bimama dinekî sersem
6. Çewa bêkes, feqîr û dilşikestî hiştin û ew çû?
Çewa zêr û zeber kir wî li me ev qubeye ‘alem ?
7. Jibîra nabe ev êşa rim u tîrê firaqa wî!
Ji nageh de li dil kefti yû tê cî girtiye muhkem
8. Çi derd û êşi pur alê Nebî der Kerbela dîtin!
Tecelî kir di qelbê wî ewan êşê ziyade hem
9. Ku el Heq Kerbelayî, bo fîdayê ehlê Beytê bû
Di hubba wan de wî can û dilê xwo mehwî kir der hem
10. Çi zatek ruhê alî bû di nêv uşaqê ‘alem de
Ku îla işqê zate Heq, di qelbê wî de bû hemdem
11. Di vê ‘esrê de yekta bû dilê wî behri işqê Heq
Xezîna sîrrê Yezdan bû ewî halê wî yê meħrem
12. Ne ku haşe wekî Ibniz-Zemani em dinasin wan
Heqîqet Ke‘betul-Lah bû, ji nûra Eħmed û Adem

13. Di hubb û 'îşqê dilber de wucûda arîzî dabû
Fena fil-lah, beqa bil-lah bû, rûhê wî yê e'zê
14. Tu mewtê eyîni fewtê qeṭ nebîn, guhdêre Qur'anê
Şehîdan şağî ye daim, bi rizq û ni'metê ekrem
15. Çi ne berq û birûskê vê buharê der dilê mehzûn?
Yeşînîm tev tecela ne ji rûhê dilbera deyhê
16. Hela ey saqiyê dilber bide camê, me serxweş ke
Sivik bin rûh û dil, belki bi dil gavek biçîne cem
17. Eger ne, tehliyê behra muhîti, saqiye can bit
Ji ku tene zuhûr hinde ev nehrê şîrîn û çem?
18. Digo min: Qey gulê şorê cihanê zerdî nabin qeṭ !
Welê dil xapiya payiz e, ka bağê gul û pur çem?
19. Ewê serwa rewan weqta ku meş da 'alem a Qudsî
Heme dunya ji hicranê xwo reş pêça kete matem
20. Di nîva Sî yû Yek Mard, û Yekê Nîsan Şeva Cum'ê
Di sala Yek Hezar û Sêşed û Pencî yû Pencê hem
21. Ji vê dunya fena rişlet kirî bezma beqayê Heq
Di pê wî re birînê 'Eskerî jî mane bê merhem.

Mersîyeya ku di vê kategorîyê de ji teref Şêx 'Eskerî ve bi teşeya nezmê ya qesîdeyê li ser wefata Şêx Muhemmed Kerbelayî hatiye nivîsîn qaliba wê mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun û behra wê jî hezêc. Ev mersîye tevde ji 21 beytan pêk tê. Di mersîyeya ku ji teref Şêx 'Eskerî ve hatiye nivîsîn de beşên mîna şîrîn, kişandina êş û elemê, pesindayîna birayê xwe û temennî hakim e.

Wefata Şêx Muhemmed Kerbelayî li Şêx 'Eskerî ew qas giran tê ku ew, mersîyeya xwe bi qiyasa ku dike dide destpêkirin û destnîşan dike ku wefata Kerbelayî derîyê êş û eleman a Deştê Kerbelayê ji nû ve li ber wî vekiriye. Şêx 'Eskerî dema ku di malikên ewil de bi vî awayî xebera wefata birayê xwe dide xwînêran dide zanîn ku ev rewş di nezera wî de wek qiyamet û tofanê bi xwe ye. Ev tabloya kişandina êş û elemê ya ku ji beytên ewil ê mersîyeyê dest pê dike heta beytên dehan bênavber didome. Ev yek jî qedr û qiymeta birayê wî ya di nezera wî de û hezkirina wî nîşanî me dide.

Ji bilî kişandina êş û eleman Şêx 'Eskerî ji bo muhabbeta xwe ya li hember birayê xwe nîşanî me bide ji malikên dehan heta beyta çardehan pesnê Şêx Muhemmed Kerbelayî dide. Şêx 'Eskerî di malikên pêşde heqîqeta mirina birayê xwe qebûl dike û vê yekê bi gotinên "*Digo min: Qey gulê şor ê cihanê zerdi nabin qet!, Welê dil xapiya payiz e, ka bagê gul û pur çem?*" bi xwendekarên mersîyeyê dide zanîn. Şêx 'Eskerî di malika bîstan de tarîxa wefata birayê xwe wek 1355an destnîşan dike ku ev yek jî teqabûlî 1936ê miladî dike û ew destnîşan dike bi wefata birayê wî birînên wî bê derman û bê merhem mane.

Di vê mersîyeya ku ji teref Şêx 'Eskerî ve li ser Şêx Muhemmed Kerbelayî hatiye nivîsîn de ji beşên mersîyeyeke klasîk ên mîna şîngirtin, rondikrijandin, sebîrxwestin, di'akirin, ji felekê bertek nîşandan û pesindayînê bes beşên mîna şîngirtin, rondikrijandin, pesindayîn cihê xwe di mersîyeyê de girtine.

5.6. Kurap

Di encama lêkolîna ku hat kirin de di vî warî de bes mersîyeyek tenê hat tespît kirin. Ew jî ji teref Şêx Bahaeddîn ve hatiye nivîsîn. Bahaeddîn vê mersîyeya xwe li ser Şêx Zeynelabidînê kurapê xwe nivîsîye. Ev mersîyeya ku ji 18 malikan pêk tê; teşeya wê qesîde, behra wê hezec û qaliba wê jî mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun e.

Ji bo mersîyeya ku li ser kurapan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Şêx Bahaeddîn⁵⁴¹

⁵⁴¹ Aydin, *h.b.*, r.154.

Mefa 'îlun Mefa 'îlun Mefa 'îlun Mefa 'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Eya Reb tu bide şebrê bi luţfa xwe digel ecrê
Li ser vê firqet û hicrê îlahî tu bidî şebrê
2. Ji weqta zeynê 'ubadan firaqa pîrê ustadan
Kevandî cerg û ekbadan îlahî tu bidî şebrê
3. Firaqa wî wekî nar e di qelbê de çi dijwar e
Dilû cergê me kir pare îlahî tu bidî şebrê
4. Eya Reb çi kamil bû cihem hulwuşşemail bû
Hekîm û merhemê dil bû îlahî tu bidî şebrê
5. Çi Quţbek bû li afaqan çi nûrek bû di ahdavan
Çi me 'şûqî 'uşşaqan îlahî tu bidî şebrê
6. Çi derdek bû di weqtê da çi beħrek bû di 'ilmê de
Çi fedek bû di 'eqlê da îlahî tu bidî şebrê
7. Muzîlê hemmû ğemma bû mûnîrê cumlê qelban bû
Teġîbê kullî derdan bû îlahî tu bidî şebrê
8. Eya Reb tu reġman î reġîm û pir bi îhsan î
Cemala me tu her zanî îlahî tu bidî şebrê
9. Îlahî me şebirdar kî ji xeyran de me hişyar kî
Ji dinyayê me dil şar kî îlahî tu bidî şebrê
10. Çi ħuznek hate dinyayê çi narek bû du eġşayê
Ji ber wî qeġ şebir nayê îlahî tu bidî şebrê
11. Eya Rebbî tu settarî li qelbê me çi ğem barî

Te kir dinya li em țarî îlahî tu bidî şebrê

12. Ez im mehzûn û hem miskîn ji bo babê qewîyyeddîn
Dinalim her zeman û hîn îlahî tu bide şebrê

13. Eya Rebbî tu meğfûr kî bi rehma xwe tu meğfûr kî
Di rihê wî tijî nûr kî îlahî tu bidî şebrê

14. Matemê wî tu e'la kî bi firdewsê tu wî şa kî
Tu darelxulde me'wa kî îlahî tu bidî şebrê

15. Eya Rebbî bike minnet li me daim bike rehma
Bi neclan re bike şifqet îlahî tu bidî şebrê

16. Tu rehma xwe li min wan kî tu me bêderd û eħzan kî
Ji 'uşyanê me aza kî îlahî tu bidî şebrê

17. Eya Rebbî şelawatan birjî hem teħîyyatan
Li ser xeyrel berîyyatan îlahî tu bidî şebrê

18. Li ser al û aşhaban li ser etba' û eħbaban
Li me û cumle dê û baban îlahî tu bidî şebrê

Şêx Behaeddîn vê mersîyeya xwe ya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye û ji 18 bendan pêk tê li ser kurapê xwe yê bi navê Şêx Zeynelabidîn nivîsîye. Yek ji beşên mersîyeyan a ku herî zêde derdikeve pêş digel şingirtinê daxwazkirina sebrê ya ji Xweda ye. Ev daxwazkirina sebrê jî bi xwîneran dide famkirin ka wefata ku pêk hatiye tesîreke çî qas mezin li ser mersîyenûs hiştiye. Ev beşa ku me qala wê kir di mersîyeya Şêx Behaeddîn de tam 19 caran xwe nîşan dide. Lewra êş û elema ku ew ji ber wefata kurapê xwe dikşîne ew qas zêde ye ku ew di mersîyeya xwe de 19 caran bi gotina “îlahî tu bidî şebrê” ji Rebbê aleman sebrê daxwaz dike da ku ew karibe li ber vê êş û elemê tahammul bike. Şêx Behaeddîn her wisa di malikên 1, 2, 3, 10, 11 û 12an de halê xwe yê bi êş û elem tîne zimên û balan dikşîne li ser halê xwe.

Şêx Behaeddîn piştî ku êş û elema xwe tîne zimên di malikên 4, 5, 6 û 7an de ji aliyekî pesnê kurapê xwe dide û ji aliyê din ve jî dîsa sebrê ji Xweda daxwaz dike. Şêx Behaeddîn dema ku pesnê kurapê xwe dide peyvên mîna; *kamil, hekîm, merhemê dil, quṭb, ilmê beḥrê, ṭebîbê derdan û hwd.* ên ku bi alimbûn û ilmê re tîkîldar in bi kar tîne.

Ev şîngirtin û pesindayîn û xwestina sebrê ya ku heta beyta 13an bînavber didomîne tev qedr û qiymeta Şêx Zeynelabîdîn a di nezera wî de destnîşan dike. Şêx Behaeddîn piştî van gavan êdî serî li ber emra îlahî ditewîne û ji malikê 13an heta malika 18an bînavber di‘a dike û ji Rebbê aleman daxwaz dike ku ew, kurapê wî efû bike, cihê wî bike cennetên firdews. Ev beşa di‘akirinê ya ji bo kesê mirî bi şiklekî xurt di mersîyeyê de hatiye nexşandin.

Bi kurtasî ji bo vê mersîyeya ku li ser kurap hatiye nivîsîn dikare bê gotin ku di vê mersîyeyê de ji teref mersîyenûs ve beşên mîna şîngirtin, rondikrijandin, daxwazkirina sebrê, pesindayîn û ji bo kesê wefatkirî di‘a kirin bi şiklekî xurt hatine xebitandin.

5.7. Kalik

Mîna wan mersîyeyeyên ku li ser kurapan hatine nivîsîn nûnerê vê kategorîyê jî bes kesek e. Di encama lêkolîna ku hat kirin de di vî warî de bes mersîyeyeke tenê hat dîtin. Ew jî ya Mela ‘Isamûddîn e. Wî ev mersîyeya xwe li ser Şêx Hezînê ku kalikê wî ye nivîsiye. Ev mersîyeya ku ji 19 malikan pêk tê; teşeya wê qesîde, behra wê hezec û qaliba wê jî mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun e. Ji bilî mersîyeya Mela ‘Isamûddîn di vî warî de mersîyeyeke din nehat dîtin.

Nimûne:

Ji Mela ‘Isamûddîn⁵⁴²

Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

⁵⁴² Aydin, *h.b.*, r.82.

1. ‘Ecêb îro dikim zarî li min tava geman barî
Dibû دنیا li min tarî bi emrê waheidê barî
2. Ji dil têna ji min şed ah dibêjim ah û waweylah
Wefat kir bavê ‘Ebdullah xwedanê feyz û esrarî
3. Xwedane himmet û ihsan çirayê şem‘â Kurdistan
Bela bû zulmet û eþzan li ser afaq û aqtarî
4. Ku renek bû di îslamê ferîdê ‘eşr eyyamî
Ji bo xaşî ji bo ‘amî fikir îrşad û hişyarî
5. Te‘alellah çi kamil bû ‘ecêb şêrîn şema‘il bû
Tabîb û merhema dil bû fikir şafi ji bîmarî
6. Fîraqa wî çi icra kir li xelqê matemek rakir
Hemî mest û sukara kir ji eþzan û ji ekdarî
7. Ji firqet ez kirim mehzûn dilim şohtî ceger kir xûn
Bi roj û şev wekî Mecnûn dinalim ez ji wî narî
8. Dinalim ez şebir nayê birîndar im ji aþşayê
Nemînim ez li dinyayê di wî huzn û birîndarî
9. Çi huzn û heşretek da ma ji ber bê şebr û bê xew ma
Li min nekin nekin lewma li ‘aşiq nabe înkârî
10. Ji dil da ‘aşiqê wî ma ser û qamet qemer sîma
Fedayê dêma nûrî ma muzeyyen bû bi enwarî
11. Esîrê murşîdê kal im qatilê wê siya xal im
Ji paş wî dê çi bit hal im ji geyrî derd yîgîmxarî

12. Newahû qed şewa qelbî we men 'ahû seba lubbî
Fe bittûl yewma fî kerbî we alamîn we efkarî
13. Beranî be' dehul beynû we mînnî qeddenel heynû
Welem tenfek lî yel 'eynû tufîdû dem' ehel carî
14. Ji çar van eşik min şor tîn ji dil ah û keser zor tîn
Wekî pêtan ku ber jor tîn muqîmem ez di vî karî
15. Sekanî hecrûhû murran weqed dîqtî bihî şedran
Welem estîh lehû şebren wela eslû bi egyarî
16. Ji dağ û heşret û firqet nehfîf bûm min nema taqet
Dikim feryad bi şed hurqet wekî bulbul di eşarî
17. Xwedaya tu bidî şebrê li ser vê firqet û hecrê
Bi lufta xwe digel ecrê ku razî bin bi eqdarî
18. Tu bi lufta xwe megmûr bikî derîhê wî tîjî nûr kî
Bi riðwana xwe mesrûr kî tu reħmanî tu geffarî
19. Tu 'Aşim bes bikî feryad ji feqda ma' denil- îrşad
Tu şabir ba ji wî îmdad bixwaza şubh û êvarî

Ji ber ku mirina Şêx Hezîn, ji Mela 'Isamûddîn re giran tê, ew hêj di destpêka mersîyeya xwe de dest bi girtina şînê dike. Lêbelê ev şîngritina wî ya ji ber wefata kalê wî di çarçoveya bawerîya bi qederê de ye. Lewra Mela 'Isamûddîn dema ku di beyta ewil de qala wefata kalê xwe dike, dibêje dinya li wî tarî bûye û ev yek jî bi emrê Xweda ye. Mersîyenûs di beyta duyem de jî girtina şînê û halê xwe yê mahzûntîyê tînê zimên û destnîşan dike yê ku rehmet kiriye bavê 'Ebdullah ango Şêx Hezîn e.

Piştî şîna di van her du beytên ewil de vêca tê dîtîn mersîyenûs bo demekê be jî navberê dida şîna xwe û di beyta 3, 4 û 5an de pesnê kalê xwe dide. Lêbelê ev navberadayîna li şînê ji beyta 6an pêve cardin dest pê dike û heta beyta 10an berdewam dike. Mela ‘Isamûddîn di beytên 6, 7, 8 û 9an de destnîşan dike ev xebera wefata kalê wî bes ne dilê wî bi hema awayî yê xelqê jî êşandiyê û di nav xelqê de bûye sedema matematikê. Mela ‘Isamûddîn dema ku vê tabloya şîngirtinê xêz dike asta kişandina êş û eleman zêde dike û ji bo vê yekê jî serî li hûnerên edebî dide. Mela ‘Isamûddîn di vê bergehê de destnîşan dike ku ew ji ber firqet û hicreta pêk hatî wekî Mecnûn dinale, sebr û hedan nayê wî. Mersîyenûs di risteya duyemîn a beyta nehan de bi gotina “*Li min nekin lewma li ‘aşiq nabe înkari*” ji derdora xwe daxwaz dike ku bila ti kes ji hal û wextê wî yê di nav mehzûntîyê de gilî û gazinan neke.

Ev halê şîngirtin û pesindayînê heta beyta 17an bênavber berdewam dike. Ev yek bi xwe jî qedr û qiymeta ku mersîyenûs dide kalê xwe bi me dide famkirin. Piştî van seansên dirêj ên şîn û pesnê em dibînin mersîyenûs di beytên 17 û 18an de him ji bo xwe û him jî bo kalê xwe di ‘a dike û ji Rebbê aleman daxwaz dike ku sebrê bide şexsê wî bi xwe. Her wisa dîsa lavayî ji Xwedê dike da ku ew rehmê li kalê wî bike û wî bixe cennetê. Mersîyenûsê me di beyta dawî ku tê de şîretan li xwe dike da ku ew bibe ehlê sebrê dawî li mersîyeya xwe tîne.

Wek encam ji bo vê mersîyeyê em dikarin bibêjin; mersîyeyêke klasîk exlebe di nav xwe de beşên mîna şîn-girîn, di ‘a, sebir, sîtema ku ji felekê re tê nîşandan, pesin dayîn û dinya-axretê dihewîne. Mela ‘Isamûddîn jî vê mersîyeya xwe ya ku li ser kalikê xwe nivîsîye li ser çar hêmanan ava kiriye: Şîn, pesin, sebir û di ‘a.

Ji bo vê beşa mersîyeyên ku li ser endamên malbatê hatine nivîsîn em dikarin bibêjin; di encama xebata ku hat kirin de hat tespîtkirin ku li ser lawan 12 mersîye, li ser qîzan mersîyeyek, li ser birayan 3 mersîye, li ser xaniman 5 mersîye, li ser bavan 3 mersîye, li ser kurapan mersîyeyek û li ser kalikan mersîyeyek hatiye nivîsîn.

Bi tevahî tabloya 26 mersîyeyên ku ji teref mersîyenûsan ve li ser endamên malbatê hatine nivîsîn wisa ye:


Navê Helbestvan	Li ser Kî Nivîsîye	Teşe	Qalib
Şêx Hemza Hîmmetullah	Li ser bavê xwe	Murebbe´	mefa´ilun mefa´ilun
Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî	Li ser bavê xwe	Murebbe´	mustef´ilun mustef´ilun
Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî	Li ser bavê xwe	Murebbe´	mefa´ilun mefa´ilun
Axayokê Bêdarî	Li ser lawê xwe	Muxemmes	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun
Mela Qasim	Li ser lawê xwe	Murebbe´	fa´ilatun fa´ilatun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Murebbe´	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Xezel	mustef´iun fa´ilun mustef´iun fa´ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Qesîde	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Qesîde	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Murebbe´	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Murebbe´	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun
Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Xezel	mefa´ilun mefa´ilun mefa´ilun mefa´ilun

Mele Ehmedê Nalbend	Li ser lawê xwe	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Cegerxwîn	Li ser lawê xwe	Murebbe'	mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun
Mele 'Elîyê Baqûstanî	Li ser lawê xwe	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun
Fehmî Begê Pêçarî	Li ser qîza xwe	Qesîde	fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun
Mela Ehmedê Nalbend	Li ser xanima xwe	Terkîbbebd	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mela Ehmedê Nalbend	Li ser xanima xwe	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Mîrad 'Elî	Li ser xanima xwe	Muxemmes	mustef'ilun mustef'ilun
Esamî	Li ser xanima xwe	Xezel	mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun
Mela Yasîn Yusrî	Li ser xanima xwe	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Şêx Esedê Çoxreşî	Li ser birayê xwe	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx 'Eskerî	Li ser birayê xwe	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun
Fehmî Begê Pêçarî	Li ser birayê xwe	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Şêx Behaeddîn	Li ser kurapê xwe	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun
---------------	-------------------	--------	--

Tablo 33: Mersîyenûsên ku li ser endamên malbatê mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Hejmara mersîyeyên ku li ser endamên malbatê hatine nivîsîn:



Grafîk 20: Hejmara mersîyeyên ku li ser endamên malbatê hatine nivîsîn.

6. Ên ku li ser Hunermendan hatine nivîsîn

Di warê mersîyeyên ku li ser hunermendên Kurd hatine nivîsîn de bes Seydayê Tîrêj derdikeve pêş. Wî di vî warî de du mersîye li ser hunermendên bi navê Mihemed Şêxo û Tehsîn Taha mersîye nivîsîne. Tîrêj, di mersîyeyên xwe de dîroka nivîsîna van mersîyeyên xwe destnîşan nekiriye. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin di vî warî de

mersîyeya ku pêşî hatiye nivîsîn filan mersîye ye. Lê ger em li gorî dîroka koça wan a dawî, esas bigirin em dikarin bibêjin ku di vî warî de mersîyeya ewil li ser Mihemed Şêxoyê ku di sala 1989an de wefat kiriye hatine nivîsîn. Lewra Tehsîn Taha jî di sala 1995an de koça dawî kiriye.

Mersîyeya Seydayê Tîrêj a derheqê Tehsîn Taha de bi teşeya nezmê ya murabbe'ê hatiye nivîsîn û jî 13 bendan pêk tê. Behra wê hezec û qaliba wê jî mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun e. Mersîyeya duyemîn a ku li ser hunermendên Kurd hatiye nivîsîn dîsa ya Seydayê Tîrêj e. Wî ev mersîyeya xwe li ser Mihemed Şêxo nivîsîye. Mersîyeya ku bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn jî 14 malikan pêk tê. Behra wê remel û qaliba wê jî fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun e.

Ji bo mersîyeya ku li ser hunermendan hatine nivîsîn nimûne:

Ji Seydayê Tîrêj⁵⁴³

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

+ - - - / + - - - / + - -

1. Çi sersal û çejn e kaka Tehsîn
Amêdî lê bû Newroza welat î
Mexabin ez çi qa îro dinêrim
Xuya nakî di vê kom û civatê

2. Dipirsî min ji çend dost û hevala
Dipirsî min ji xort û pîr û kala
Dipirsî min ji wan gerdengezala
Digotin Tehsîn Taha çû wefatê

3. Dema ku min bihîst ez mame xayiz
Di ezmanan de Perwîn bûye Kadiz
Buhara min diçû lê bûye payiz
Gulem weşiyar li ber serma sibaşê

⁵⁴³ Tîrêj, *h.b.*, r.529.

4. Welat ma dest li çar hawer û alî
Mi go qey ev cîhan tev maye xalî
Nema bilbil di bağan dinalî
Nema ew qeqeba dengê kewa tê

5. ‘Emir pêncî û çar salî mexabin
Kesê wek te ji dunyayê cuda bin
Herin gora reş û tarî beta bin
Bi hesretiya ger û kar û xebatê

6. Hezar û neh şed not pêncê zanê
Di roja sêşemê hivdê Gulanê
Te koç bar kir ji vê dewra cîhanê
Berî daye riya çûn û nehatê

7. Nema dengê te yî zîz tê guhê me
Nema tev radibin penc û rehê me
Ketin şînê dem û sal û mehê me
Li ser tê bilbilê bagê Xelatê

8. Nivîsandî me navê te b’ nigarê
Bi tîpên zêr li ser enya buharê
Bela rondik li ser te bêne xwarê
Şev û rojan wekî Ducl û Ferat

9. Çiqa bêjim tu hêja ye hunermend
Gelo ka ew sema û reqş û govend
Gelo ka ew dîlok û saz û sazbend
Li Dêrbend û Metîn û şax û latê

10. Keç û xortê me kurda şehlewend in
Tu dizanî tev li ser te derdemend in
Te koç bar kir ji Ewropa ji Lendin

Berî da Kurdistana rojhilatê

11. Ji gund û şehîr û toprax û diyara

Dihatin peşîya koçê b' hezara

Amêdî ma dibin toza siwara

Ketin şîn û girî û kêferatê

12. Erê Tîrêj mirin ku hate insan

Venajînin ne textor û ne derman

Eger bê ser ji gorê Quṭbê Geylan

Bi berbejn û nivîşt û şerqûbatê

13. Xuda her dem tu hêvî û reca ye

Tehsîn mêvanê teşnê Kərbela ye

Bila ew têr vexwe gerden ziwa ye

Ji Kewşer têr nebû j' ava heyatê

Ev mersîyeya Tîrêj, bi kişandina êş û elemê yan jî bi rondikrijandinê dest pê nake. Tîrêj di şûna vê yekê de di bendên ewil ên mersîyeya xwe de pirsê Tehsîn Taha dike û di taliya vê pirsê de Tîrêj pêhisîna xebera wefata Tehsîn Taha tîne zimên. Digel vê bihistîne, Tîrêj dest bi rijandika rondikan û kişandina êş û elemên ji ber wefata Tehsîn Taha dike. Rijandina hêstiran û girtina şîne beşeke sereke ya mersîyeyên Kurdî ye. Tîrêj dema ku êş û elema xwe ya ji ber wefata Tehsîn Taha tîne zimên gelek caran serî li hunerên edebî yê mîna teşbîh û teşxîsê dide. Ji ber mirina Tehsîn Taha halê xwe û ya derdorê yê ku ji Tehsîn Taha hez dikirin û li ber mirina wî diketin di benda 3 û 4an de wisa îzah dike:

Dema ku min bihîst ez mame xayiz

Di ezmanan de Perwîn bûye Kadiz

Bihara min diçû lê bûye payiz

Gulem weşîyan li ber serma sibaṭê(3)

Welat ma dest li çar hawer û alî

Mi go qey ev cîhan tev maye xalî

Nema bilbil di bağan dinalî

Nema ew qeqeba dengê kewa têt(4)

Piştî ku digel Tîrej welat û tebî'at jî şîne girê dide, vêca di bendên pêşde em li rastî wefata Tehsîn Taha tên. Li gorî agahîyên ku di bendên pênc, şeş û dehan de derbas dibin; Tehsîn Taha di 54 salîya xwe de dema ku dîrok 17ê Gûlana sala 1995an nîşan dide li Londorayê koça dawî dike. Tîrêj di bendên heft, heşt û nehan de vêca dest bi pesindayîna Tehsîn Taha dike û dema vê pesindayîne dike gelê Kurdistanê jî têdixe nava vê yekê. Di van bendan de Tîrêj him pesnê wî dide û him jî li ser wî dîsa şîne digre. Di benda yazdehan de asta vê şîngirtinê ji sînoren Tîrêj derdikeve û tamamê gelê Kurdistanê ya ku ji bo cinazeya wî kom bûbû têdixe nava xwe.

Ji gund û şehr û toprax û diyara
 Dihatin peşîya koçê b' hezara
 Amêdî ma dibin toza siwara
 Ketin şîn û girî û kêferatê(11)

Tîrêj piştî şîngirtin, feryad û fixanê di benda duwazdehan de heqîqeta mirinê qebûl dike û dû re di benda sêzdehan de ji bo Tehsîn Taha ji Xwedê wisa lavayî dike:

Erê Tîrêj mirin ku hate insan
 Venajînin ne textor û ne derman
 Eger bê ser ji gorê Quţbê Geylan
 Bi berbejn û nivîşt û şerqûbatê(12)

Xuda her dem tu hêvî û reca ye
 Tehsîn mêvanê teşnê Kербela ye
 Bila ew têr vexwe gerden ziwa ye
 Ji Kewşer têr nebû j' ava heyatê (13)

Ev mersîyeya ku ji teref Seydayê Tîrêj ve li ser hunermendê Kurd Tahsîn Taha hatiye nivîsîn weke ku me li jorê jî destnîşan kir ji hêla şîn, pesindayîn, daxwaz, temennî û di'ayan ve dewlemend e. Ev tiştên ku me destnîşan kir tev beşên mersîyeyeke klasîk in. Dema ku em bi tevahî li vê mersîyeyê mêze dikin bes em li rastî beşa sebrê nayên.

7. Ên ku li ser Siyasetmedaran Hatine Nivîsîn

Di encama xebata ku hat kirin de hat dîtin ji teref 3 mersîyenûsan ve bi tevahî 7 mersîye li ser siyasetmedaran hatine nivîsîn. Nûnerên vê qadê Seydayê Tîrêj, Mela Nûrullahê Godîşkî û Cegerxwîn e. Di vî warî de Seydayê Tîrêj 2 mersîye, Mele Nûrullahê Godîşkî 3 mersîye û Cegerxwîn jî 2 mersîye nivîsîne.

Dîroka nivîsîna van mersîyeyan jî teqez nayê zanîn. Ev yek jî derfet nade me em bibêjin filan mersîye di vî warî de a yekemîn e. Lêbelê ger em dîroka wefata kesên ku li ser wan mersîye hatine nivîsîn esas bigirin em dikarin bibêjin pêşî li ser Stalîn mersîye hatiye nivîsîn. Lewra Stalîn 1953yan de, Adnan Menderes di sala 1961ê de, Idrîs Barzanî di 1987an de, Leyla Qasim jî di sala 1974an de koça dawî kiriye.

Me li jê re wek tablo navê mersîyenûs; teşeya nezmê ya mersîyeyan û navê kesên ku mersîye li ser wan hatiye nivîsîn û qaliba mersîyeyan destnîşan kiriye.

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li serê mersîye hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Cegerxwîn	Leyla Qasim	Tercî' bend	mustef' ilun mustef' ilun
Cegerxwîn	Stalîn	Tercî' bend	mef' ûlu mefa' ilun fe' ûlun
Mela Nûrullahê Godîşkî	Adnan Menderes	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun
Mela Nûrullahê Godîşkî	Adnan Menderes	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun
Mela Nûrullahê Godîşkî	Adnan Menderes	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun
Seydayê Tîrêj	Idrîsê Barzanî	Mesnewî	mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun fe' ûlun
Seydayê Tîrêj	Leyla Qasim	Qesîde	mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun

Tablo 34: Mersîyeyên ku li ser siyasetmedaran hatine nivîsîn.

Ji bo mersîyeya ku li ser siyasetmedaran hatine nivîsîn nimûne:

Ji Mela Nûrullahê Godîşkî⁵⁴⁴

Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun Mustefî ilun

- - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1- Zewq û şefa emn û wefa hatin ji ‘Adnan Menderes

Derdê dilan ra pur şifa hatin ji balê Menderes

2- ‘Adnan dinê ‘adnan kir têk da gul û çîman kir

Hem jî tijî îman kir rehmîet li ruhê Menderes

3- Bêzar bibûn ‘erq û welat zêde welatê rojhilat

Gund û bilad mabûn Mewat nûve vijand wan Menderes

4- Wî rojhilata me gerand cennet wî îmkanat şiyand

Xetîta trêne lê gerand pir da emek ax Menderes

5- Ji Anaîol ta Mûşê hem Tatwan û Wan hetta ‘Acem

Xetîta hesin vêk kir behem ew rehmîetiyê Menderes

6- Her gundekî varî dibir mizgeft û co av çêdikir

Dîne mubîn îla dikir xalî nebû jê Menderes

7- Hem da wezîfe ehlê dîn nedhişt feqîr û bê muîn

Yê pur belengaz ba yeqîn rê vedikir lê Menderes

8- Aletirîkê mescidan hem şehîr û gund û xanuman

Mîna siterikên asîman lê aliqand hem Menderes

9- Işya’ê kir edla ‘Omer şolan dikir pur mu’teber

⁵⁴⁴ Kardaş, *h.b.*, r.11.

Kes nedişê ji heqê bider di 'eħda 'edla Menderes

10- Dawî Sinimmar û Ebû Gaylan çewan ew jî we bû
Mehkûmê ihsan a xwe bû şed heyf û heywax Menderes

11- Nûrî tu nankorî meke bîra xwe bîn Qur'an veke
Pur lê bixwûn û hedye ke hem fatiħe bo Menderes

Ji teref Mela Nûrullahê Godişkî ve li ser Serokwezîrê berê yê Tirkîyeyê Adnan Menderes bi tevahî 3 mersîye hatine nivîsîn. Yek ji van mersîyeya jî li jorê wek nimûne hat dayîn. Ev mersîye bi teşeya qesîdeyê û bi qaliba mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun hatiye nivîsîn. Ev mersîyeya Godişkî bi tevahî ji 11 malikan pêk tê.

Ji bo hema hema temamê mersîyeyan qaîdeyêke bingehîn heye ku ew jî pêwendîya di navbera kesê şa'ir û kesê ku li serê mersîye hatiye nivîsîn de ye. Lêkolîner di vî warê de destnîşan dikin, ji bo mersîye bê nivîsîn divê muheqqeq pêwendîya kesê nivîskar û mirî bi hev re hebe.⁵⁴⁵ Lewra ger ev pêwendî hebe wê demê ew ê nivîskar karibe wê êş û elemê di bedena xwe de hîs bike û piştî vê gavê derd û kulên xwe di helbesta de bîne zimên. Lêbelê ev qaîdeya ku me anî zimên carinan derbasdar nabe. Bi gotineke din mersîye li ser kesekî mirî yê ku têkilîya wî bi kesê nivîskar re tune ye jî dikare bê nivîsîn. Lewra kesê ku mir ger di nav civakê de bê nasîn û jê bê hezkirin û yan jî rayedarê dewletê be wê demê ev nêzbûn û têkilî dibe yek alî.⁵⁴⁶ Ev taybetîya ku me anî zimên xwe di vê mersîyeya Godişkî bi xwe de jî nîşan dide.

Di mersîyeya Godişkî ya ku ji 11 malikan pêk tê û li ser Adnan Menderes hatiye nivîsîn de digel ku nêzbûneke yekalî hebe jî em dibînin ku Godişkî qedr û qiymeteke pir zêde dide Menderes. Em vê yekê di mersîyeya wî de bi şiklekî aşkere dibînin. Lewra Godişkî ji beyta ewil dest pê dike heta beyta dehan bi şiklekî bênavber pesnê

⁵⁴⁵Kardaş, *h.b.*, r.4.

⁵⁴⁶Canım, *h.b.*, 2010a, r.130.

Menderes dide û qala wan xizmet û tiştên ku wî di dema desthilatdarîya xwe de li herême kiriye dike. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de kêncaran tê dîtin ku di mersîyeyekê de ji şîn û girînê zêdetir pesindayîna hakim be. Yek ji van mersîyeyên bi vî tarzî ya Godîşkî bi xwe ye. Ev yek jî qedr û qiymeta Menderes a di nezera wî de û hezkirina mersîyenûs a li hemberî wî nîşan dide. Mersîyenûs piştî pesindayîne di malika dehan de heqîqeta mirinê qebûl dike û bi gotina “*Meħkûmê ihsana xwe bû şed heyf û heywax Menderes*” şîna Menderes digire û bi malika yazdehan a ku tê de şîretan li xwe dike da ku li ser rûhê wî pir fatîhayan bixwîne dawî li mersîyeya xwe tîne.

Ji bo vê mersîyeya ku hatiye nivîsîn dikare bê gotin digel ku tê de şîngirtin û di’akirin hebe jî zêdetir beşa pesindayîne derdikeve pêş. Ev, yek ji wan beşên mersîyeyan e.

8. Ên ku li ser Dost û Hevalan Hatine Nivîsîn

Yek ji wan kesayetên din ên ku di nav civakê de ji wan hatiye hezkirin, ji wan re qedr û qiymet hatiye dayîn û li ser wan mersîye hatine nivîsîn dost û heval in. Di warê mersîyenûsên ku li ser dost û hevalan hatine nivîsîn de, Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî 1 mersîye, Cegerxwîn 1 mersîye, Qedrîcan 1 mersîye, Mela ‘Elîyê Baqûstanî 1 mersîye û Seydayê Tîrêj 4 mersîye nivîsîne. Hejmara mersîyeyên ku di vî warî de hatine nivîsîn tevde 8 in. Di vî warî de kesê ku herî zêde mersîye nivîsîne Seydayê Tîrêj e. Wî tevde 4 mersîye nivîsîne. Ji ber ku wefata dîroka kesên li ser wan mersîye hatine nivîsîn nehat dîtin, em nikarin bibêjin di vî warî de mersîyeya yekem a filan şa’irî ye.

Me li jêrê wek tablo navê mersîyenûs, kesê li serê mersîye hatiye nivîsîn, teşeya nezmê û qaliba mersîyeya ku hatiye nivîsîn diyar kir.

Mersîyenûs	Kesê Ku Li Serê Hatiye Nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Xoce Se’îd	Muxemmes	Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilun

Cegerxwîn	Hişyar	Xezel	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun
Qedrîcan	Mehemedê Seyda	Qesîde	Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun
Mela 'Elîyê Baqûstanî	'Elî bîn Mela Muhemmed	Qesîde	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun
Seydayê Tîrêj	Kemalê Ehmed	Qesîde	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun
Seydayê Tîrêj	Mihemed 'Elîyê Şiwêş	Mesnewî	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun
Seydayê Tîrêj	Ehmedê Menco	Mesnewî	Mefa'ilun Mefa'ilun Fe'ûlun
Seydayê Tîrêj	Şêxmûsê kurê Se'îdoyê Gaso	Mesnewî	Mefa'ilun Mefa'ilun Fe'ûlun

Tablo 35: Mersîyeyên ku li ser dost û hevalan hatine nivîsîn û teşe û qalibên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser dost û hevalan hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Mela 'Elîyê Baqûstanî⁵⁴⁷

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Ah û efgan û nalîn çûn ji min bêhed gelek
Çû ji dest min rah û seyran û eywan gelek
2. Mame medhûş û muheyyer herwekî meyxwariyan
Qelbê mehzûn û mecrûh ku tê da kederek

⁵⁴⁷ Baqûstanî, *h.b.*, r.90.

3. Dil û canim vêk disojin hêstiren min xûn dirêjin
Ah û hesret her dibêjim ku ceger bûye belek
4. Piştî Seyda keyf û 'işret ma dimînit heyhat
Ne tebessum lezzet û coş û fereh û kenek
5. Sosin û reyhan û sumbul bû ji dest çû nayê dest
Di Hezan da bedreyek bû di Îrem da şu'leyek
6. Nêrgizek bû di çîmen da şafiyek bû di cîger da
Nazikek bû di beşer da melceê wek min gelek
7. Heyfe başed mişlê Seyda xanedan û ba weled
Bibin qurban ser û çav dil û canê min demek
8. Bîn yetîm cumle murîd û şofi û salik hemî
Lazim e feryad û zarîn her biçin ta neh felek
9. Tu ji min rehmê bikî ya Reb li rûhe wiy temiz
Bên tewafa çar teref wî hûrî û pêncşed melek
10. Layiq e rehmî li wî be bê hed û bê hed hisab
Her duaçîne ji bo wî her mudamî her kesek
11. Ya Îlahî baqirel bexşî ji lufta xwey 'emîm
Hey bikî dîwan û eywanan her tamam mişlê kelek
12. Tu nekî mehrûm ji ecdadan û etba'an hemî
Nîmet û feyz û 'ulûma zêdekî wan yek bi yek
13. Şafiyê min tu bikî ji bo me wê demê

Tu nekî mehrûm ji ewladan û eşaban hinek

14. Her du'aya min bikî ya Reb qebûl û her qebûl
Med'ûyê min kes tunîne geyrê te ya Reb gerek

15. Şahîbê nezman qeşîr bûye 'Eliyê stûxwar
Katib û nezman dikêşe dîn û sewda ma gelek

Ev mersîye ji teref Mela 'Elîyê Baqûstanî ve li ser wefata 'Elî bîn Mela Muhammed hatiye nivîsîn. Teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun û behra wê jî remel e. Ev mersîye tev de ji 15 malikan pêk tê.

Di vê mersîyeya Baqûstanî de ji beşên mersîyeyê klasîk ên ku di helbestê de tên xuyakirin ev in; şîngirtin, êş kişandin, pesindayîn û di'a kirin. Lewra ji beyta ewil heta beyta pêncan û her wisa di beytên heft û heştan de Baqûstanî ji ber wefata 'Elî bîn Mela Muhammed bînavber şîne digire, êş û elemê dikşîne. Ev êş û elem ew qas lê giran tê ku Baqûstanî daxwaz dike xwe jê re bike qurban. Di mersîyeyê de piştî şîngirtin û pesindayînê, vêca tê dîtin Baqûstanî bi şîklekî bînavber û xurt dest bi dayîna pesnê kesê wefatkirî dike. Baqûstanî di di'a û temennîyên xwe yên ku di malikên 9, 10, 11, 12, 13 û 14an dike de lavayî ji Xwedê dike da ku rehmê li 'Elî bike û cihê wî di cennetê de xweş û geş bike.

9. Ên ku li ser Helbestvan û Rewşenbîran Hatine Nivîsîn

Di nav civakê de hinek kes hene bi xebat û xizmetên ku di warê edebiyatê kirine tên nasîn. Li ser van kesên ku wek şa'ir û rewşenbîr tên wêsfandin jî mersîye hatine nivîsîn. Di encama lêkolîna ku hat kirin de hat dîtin Ebdilqadirê Hekkarî li ser Mela Huseynê Bateyî, Mela Ebdulkerîm Îbrahîm li ser Mela Ehmedê Nalbend, Mela Xelîlê Mişextî li ser Hêmin Mukrîyanî, Evdirrehîm Rehmî Hekkarî li ser Hemzayê Miksî, Şêx Xiyaseddîn li ser Celadet Bedirxan, Cegerxwîn li ser Osman Sebrî û Seydayê Tîrêj jî li ser Qenatê Kurdo û Rewşen Bedirxan mersîye nivîsîne. Hejmara mersîyeyên ku di vê kategorîyê de hatine nivîsîn bi tevahî 8 in.

Ji ber ku dîroka nivîsîna wan a teqez nayê zanîn nikare bê gotin mersîyeya filan mersîyenûsî di vî warî de ya yekem e. Me li jê re navê mersîyenûs, teşeya nezmê ya mersîyeyê, navê kesên ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û qaliba mersîyeyan wek tablo diyar kir.

Navên mersîyenûs û kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn û her wusa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Evdilqadirê Hekkarî	Mela Huseynê Bateyî	Murebbe´	mefa´îlun mefa´îlun
Mela Ebdulkerîm Îbrahîm	Mela Ehmedê Nalbend	Murebbe´	mustef´ilatun mustef´ilatun
Mela Xelîlê Mişextî	Hêmin Mukrîyanî	Xezel	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun
Evdirrehîm Rehmî Hekkarî	Hemzayê Miksî	Mesnewî	mef´ûlu mefa´îlun fe´ûlun
Şêx Xiyaseddîn	Celadet Bedirxan	Qesîde	mef´ûlu mefaîlu mefâîlu feûlun
Cegerxwîn	Osman Sebrî	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun fe´ûlun
Seydayê Tîrêj	Qenatê Kurdo	Mesnewî	mustef´ilatun mustef´ilatun mustef´ilatun mustef´ilatun
Seydayê Tîrêj	Rewşen Bedirxan	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun

Tablo 36: Mersîyenûsên ku li ser helbestvan û rewşenbîran mersîye nivîsîne û teşeya nezmê ya mersîyeyan.

Ji bo mersîyeyên ku li ser şa´ir û rewşenbîran hatine nivîsîn nimûne:

Ji Mela Xelîlê Mişextî⁵⁴⁸

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Bulbulê bagê welatî, şa'îrê Kurd û civatî
Şî'r û nûsîn hinde rêk û her wekî avê rewan
2. Nav û bangê şî'rê Xanî ewwel e, Hêmin jî şanî
Lê wî azar zêdetir dî, pêşewayê hozanevan
3. Bas neke nermî û evînî, 'ilm û dîn û kurdhebînî
Dilnetirs û merdemêr û 'eql û hoş deryayê pan
4. Arezû bûm bo dîdarî, şî'rê pir tam û wîtarî
Şênîya dîlkê Mişextî, hem pesendê şa'iran
5. Şed dirûd im ser heyatî, dağidar im bo wefatî
Heq nebû zû me bihêlît, bo gem û kovan û jan

Ev mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya xezelê ji teref Mela Xelîlê Mişextî ve li ser wefata Hêmin Mukrîyanî hatiye nivîsîn, qaliba wê mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun û behra wê jî hezec e. Ev mersîye tevde ji 5 malikan pêk tê.

Mersîyenûsê me yê bi navê Mela Xelîlê Mişextî di 4 malikên ewil a mersîyeya xwe de ji serî heta binî pesnê Hêmin Mukrîyanî dide û bi rêya hunerên edebî wesfên wî û tiştên ku ew di nav civaka Kurd de kirine tîne zimên. Em dibînin ku Mişextî bes di beyta dawî de li ser Mukrîyanîyê ku wefat kiriye şîrê digre û êş û elemê dikşîne. Ji ber vê yekê ji bo vê mersîyeyê em dikarin bibêjin di vê mersîyeyê de beşa ku derdikeve pêş a dayîna pesnê ye.

⁵⁴⁸ Hêmin Omer Ehmed, *Şîna Mela Xelîlê Mişextî*, Kovara Kelhaamed, s.13, h.15, Zivistan, İstanbul 2023, r. 21.

10. Ên ku li ser Hz. Muhemmed Hatine Nivîsîn

Çawa ku di edebiyatên neteweyên din de li ser wefata Pêxemberê Îslamê Hz. Muhemmed mersîye hatibin nivîsîn, di wan de li ser wî şîn hatibe girtin, rondik hatibin rijandin bi heman awayî di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî li ser wî mersîye hatine nivîsîn. Di mersîyeyên ku hatine berhevkirin de tê dîtin, mersîyenûs di mersîyeyên xwe de ji alîyekî ve li ser Hz. Muhemmed şîne girê dide û ji aliyê din ve jî pesnê wî dide.

Di warê mersîyeyên ku li ser Pêxemberê Îslamê Hz. Muhemmed hatine nivîsîn de hat dîtin ji teref 2 mersîyenûsan ve tevde 4 mersîye hatine nivîsîn. Nûnerên me yê vê qadê Şêx Ehmedê Kor û Ebdullahê Mexribî ye. Şêx Ehmedê Kor bi 3 mersîyeyan û Ebdullahê Mexribî jî bi 1 mersîyeyê nûnertîya wan mersîyeyên ku li ser Hz. Muhemmed hatine nivîsîn dîkin. Şêx Ehmedê Kor di navbera salên 1771-1856an de û Ebdullahê Mexribî jî di sedsala XIXem de jiyaye. Ne teqez be jî ger em wextê ku şa'ir lê jiyane esas bigirin em dikarin bibêjin mersîyeya ewil a ku li ser Hz. Muhemmed hatiye nivîsîn, mersîyeya Şêx Ehmedê Kor e.

Navê mersîyenûs û kesê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û her wisa qaliba û teşeya mersîyeya ku hatiye nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
Ebdullahê Mexribî	Hz. Muhemmed	Murebbe'	mustef'ilun mustef'ilun

Tablo 37: Mersîyenûsên ku li ser Hz. Muhemmed mersîye nivîsîne û teşe û qalibê mersîyeyên wan.

**Ji bo mersîyeyên ku li ser Hz. Muhammed hatine nivîsîn nimûne:
Ji Ebdullahê Mexrîbî⁵⁴⁹**

Mustefî ilun Mustefî ilun

- - + - / - - + -

1. Kan ma' dena şidq û şefa
Kanî Muḥemmed Muştefa
Beḥra kerem kanê wefa
Kanî Muḥemmed Muştefa
2. Kan gelo.....
Serdefterê pêgemberan
Kan meskenê di meqberan
Kanê Muḥemmed Muştefa
3. Kanê gelo şahî leṭîf
Kan qameta şubhê elîf
Mesken di nêv rewḍa şerîf
Kanî Muḥemmed Muştefa
4. Kanê şef' ê ummetê
Şebra min bi navê wî tê
Ew ku ji nûra qudretê
Kanê Muḥemmed Muştefa
5. Kanê gelo şahê emîn
Kan şehsuwarê Bedr û Huneyn
Kanê ceddê Ḥesen û Huseyn
Kanê Muḥemmed Muştefa

⁵⁴⁹ Doskî, *h.b.*, 2020a, r.42

6. Kanê gelo şahê Ereb
Kan şahîbê eşl û neseb
Mu'ciz ji bo pir bûn e'ceb
Kanê Muḥemmed Muştefa

7. Mu'ciz ji bo pir bûn gelek
Heft asîman hem neh felek
Xadim ji bo wî bûn gelek
Kanê Muḥemmed Muştefa

8. Xadim ji bo wî Cibraîl
Kewser ji bo wî Selsebîl
Mensûx kir Tewrat û Incîl
Kanê Muḥemmed Muştefa

9. Mensûx kir Tewrat û Zebûr
'Erşê e' la ji bo wî Tûr
Baxwê vexwendî pêş ḥuzûr
Kanê Muḥemmed Muştefa

10. Baxwê vexwendî lamekan
Te' lîm ji bo wî da Qur'an
Bê herf û bê şewt û ziban
Kanê Muḥemmed Muştefa

11. Bê şewt û elfaz û ḥurûf
Ew reng digo şahê 'eţûf
Anî Reḥîm û Reûf
Kanê Muḥemmed Muştefa

12. Hîna ku bû ew gull'izar

Xewxa kete ehlê kufar
Lerizî ji ber dêwê xedar
Kanê Muḥemmed Muştefa

13. Hîna ku bû Eḥmed.....

.....
Pişta muxalfan şikest
Kanê Muḥemmed Muştefa

14. Kanê gelo ew pêgember

Kanê Ebubekir û ‘Umer
Kanê ‘Usman û hem Ḥeyder
Kanê Muḥemmed Muştefa

15. Ger mu‘ min û ger kafir in

Ger ḥakim û ekabîr in
Wallah hemu dê bimirin
Kanê Muḥemmed Muştefa

16. Beqî'ê da ġafil nebî

Ḥetta teneffus te hebî
"Şelewatu'n 'ela qebru'n-nebî"
Kanê Muḥemmed Muştefa

Ev mersîyeya ku ji teref Ebdullahê Mexrîbî ve li ser pêxemberê dînê Îslamê Hz. Muhemmed hatiye nivîsîn tevde ji 16 bendan pêk tê. Teşeya wê ya nezmê murebbe‘, qaliba wê mustef‘ilun mustef‘ilun û behra wê jî recez e.

Ev mersîyeya ku ji teref Mexrîbî ve hatiye nivîsîn her çi qas wek medhîyekê xuya bike jî di eslê xwe de ji alîyekî ve mersîye ye. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de nimûneyên bi vî awayî yên mersîyeyan hene ku yek ji wan mersîyeyan a Ehmedê Xanî

ye. Wî li ser Muhemmed Begê Purbelalî mersîyeyeke bi vî rengî nivîsîye. Xanî di vê mersîyeya xwe ya ku li ser Purbelalî nivîsîye de çawa ku pesn û medhê mîrê xwe yên di warên curbecur de dide bi heman awayî bi gotinên cihêreng şînê jî digire. Mexrîbî jî bi heman awayî di mersîyeya xwe ya ku ji 16 bendan pêk tê de ji benda ewil heta benda duwazdehan pesnê Hz. Muhemmed dide û qala fezîlet û wesfên wî dike. Mexrîbî dema ku vê yekê dike wek Xanî di risteya dawî de û her wisa di risteyên din de gotina “*kanê*” bi kar tîne û dibêje “*Kanê Muḥemmed Muştefa.*” Mexrîbî jî bi vî awayî him pesn û medha Hz. Muhemmed dide him jî li ser wî şînê digire. Mexrîbî dema ku pesna Hz. Muhemmed dide û ji alîyekî ve jî li ser wî şînê digire.

Mexrîbî ji benda 15em pêve heqîqeta mirinê qebûl dike û destnîşan dike kî dibe bila bibe nikare ji destê mirinê xelas bibe û ew ê rojekê muheqqeq wek her zindîyekî bimire. Piştî destnîşankirina vê heqîqetê Mexrîbî bi şîretên ku li xwe dike û bi temennîyan û bi xwestina selawatan a li ser Hz. Muhammed dawî li mersîyeya xwe tîne.

Di warê mersîyeyên ku li ser mîran hatine nivîsîn de mersîyenûsên bi navê Xewsî û Weda‘î di bin tesîra Ehmedê Xanî de mane û ew jî di mersîyeyên xwe yên ku li ser mîran nivîsîne de gotina “*Kanî...*” bi kar anîne. Dema ku em li wan mersîyeyên ku li ser Hz. Muhemmed hatine nivîsîn -mersîyeyên Şêx Ehmedê Kor ne di nav demêze dikin em dibînin di vî warî de şa‘irê bi navê Mexrîbî di bin tesîra Xanî de maye û Mexrîbî mersîyeya xwe li ser peyva “*Kanî*” saz kiriye.

11. Ên ku ji teref Şa‘iran ve Berî Mirina xwe li ser xwe Hatine Nivîsîn

Di edebiyaya Kurdî ya klasîk de cureyeke mersîyeyan heye ku wan ji mersîyeyên din cudatir dike. Lewra ev mersîyeyên ku em qesda wan dikin ew mersîye ne ku ji teref mersîyenûsên Kurd ve berî wefata xwe demekê nêz an jî di halê nexweşîyeke giran de li ser xwe hatine nivîsîn.

Nûnerên vê qonaxê Mela Huseynê Bateyî û Mirad ‘Elî ne. Mela Huseynê Bateyî mersîyeya xwe ya li ser xwe di dema ku di demsala zivistanê de di şikeftê de asê dimîne li ser xwe dinivîse. Tê diyarkirin dema berf dihele, rê vedibin şênîyên

herêmê Bateyî digel vê helbesta ku li ser xwe nivîsiye di şikeftê de dibînin⁵⁵⁰. Ev mersîyeya ku qala wê tê kirin bi teşeya nezmê ya murebbe ‘ê hatiye nivîsîn. Qaliba wê mefa‘îlun mefa‘îlun , behra wê hezec e û ji 16 bendan pêk tê. Nûnerê me yê din ê ku di vî warî de li ser xwe mersîye nivîsiye Mirad ‘Elî ye. Lêbelê ya ‘Elî di halê nexweşiyê bi xwe de hatiye nivîsîn. Ev mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye bi qaliba mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun hatiye nivîsîn. Behra wê hezec e û ji 26 bendan pêk tê. Di her du mersîyeyên ku hatine nivîsîn de tê dîtin ku her du mersîyenûs gunehê xwe bi xwe tînin, dikin fixan û zarî û rewşa xwe ya nexweş û elemnak tînin ziman.

Ger em sedsala ku mersîyenûs lê jiyane esas bigirin, ji ber ku Bateyî di sedsala XVII-XVIIem û ‘Elî jî di sedsala XXem de jiyaye em dikarin bibêjin mersîyeya ku ji teref Bateyî ve hatiye nivîsîn di vî warî de ya yekem e.

Navê mersîyenûs, teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê û her wisa navê kesê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Mela Huseynê Bateyî	Li ser xwe	Murebbe‘	Mefa‘îlun Mefa‘îlun
Mirad ‘Elî	Li ser xwe	Qesîde	Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun

Tablo 38: Mersîyenûsên ku li ser mirina xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser xwe hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Mirad ‘Elî⁵⁵¹

Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun Mefa‘îlun

+ - - - / + - - - /+ - - - /+ - - -

1. Wey li mino di vî wextî, binêrin çali‘ û bextî,

⁵⁵⁰ Ji bo agahîyên zêdetir binêrin: Sadinî, *h.b.*, 2013b, r.41-42.

⁵⁵¹ Celîl, *h.b.*, r.90.

Nedî min kes li vî lextî, Xuda tuyî delîlê me.

2. Wey li mino ji vê gotinê, ketime nêv bela dinê,
Ji ʔengî û bizdandinê, Xuda tuyî delîlê me.
3. Hawar ji ber heşedbera, ketîme nêv pîs xebera,
Mame di qeyda bêbawera, Xuda tuyî delîlê me.
4. Mam nêv bêbext û nêv dîna, kezzab û hem derewîna,
Ji bo xo nakin texmîna, Xuda tuyî delîlê me.
5. Bê înaşafin, ‘eqil nînin, ʕi bê reḥmin, nemiskînin,
Bêbext û xohr û xayînin, Xuda tuyî delîlê me.
6. Hawar ji ʔulm a ʔalim a, ketim nêv eş û elema,
Rebbî, zaîl ke va ğema, Xuda tuyî delîlê me.
7. Kesê te ‘da li min kirî, ʔulm û neḥeqî li min kirî,
Xo ji lezzetê meḥrûm kirî. Xuda tuyî delîlê me.
8. Bizane ew ku şeytan e, ‘eduwwe, gelkî duşman e,
Kespa wî daim levdane, Xuda tuyî delîlê me.
9. Wey li mino di vê demê, ketim nêv eş û elemê,
Bûm pêkenîyê ‘alemê. Xuda tuyî delîlê me.
10. Rebbî, te ez nexoş kirim, mişlê bihê ez zer kirim,
Bê kesp û bê ‘emel kirim, Xuda tuyî delîlê me.
11. Şukur Rebbî, ji vê kuxikê, ketime ez ber tifikê,
Ji ber ax û ava germikê, Xuda tuyî delîlê me.

12. Ber kuxikê me xew naê, hesedê min ketî taê,
Dikim-nakim tabat naê, Xuda tuyî delîlê me.
13. Vê kuxikê em helandin, sîng û zikê me qetandin,
Hiş û 'eqlê me revandin, Xuda tuyî delîlê me.
14. Vê kuxikê em ker kirin, kakerîkê me kul kirin,
Êş û ta li min zêde kirin, Xuda tuyî delîlê me.
15. Vê kuxikê ez gêj kirim, bê mejî û bêhiş kirim,
Pişt û hinav ker-ker kirim, Xuda tuyî delîlê me.
16. Vê kuxikê çi dûm kirî, lehm û raê me qet kirî,
Enf û nefes li me têng kirî, Xuda tuyî delîlê me.
17. Ma qey bira ev kuxike, xirab kirî sîng û zike,
Zerer gêhandî qirike, Xuda tuyî delîlê me.
18. Min got ruh hate qirikê, ji ber derdê vê kuxikê,
Kes nîne ku dewa bikê, Xuda tuyî delîlê me.
19. Ya katibo qet neweye ev îrada Rebbê me ye,
Kerem kirî ji bo me ye, Xuda tuyî delîlê me.
20. Gotin tenê feyde nake, lefzê belaş nef'et nakê,
Illa Xudê te aza kê, Xuda tuyî delîlê me.
21. Min dî zelîlê bêhisab, cism û lehmê me bû kebab,
Ya Rebbî tu bikî sewab, Xuda tuyî delîlê me.
22. Rebbî, heyfê ji bo min veke, xêra min tu naqîş neke,
Derdan ji min zaîl bike, Xuda tuyî delîlê me.

23. Ya Rebbî me setar bike, ji şeytanî hîfîz bike,

Îmana me kamil bike, Xuda tuyî delîlê me.

24. Rebbî, Murad şifa bike, ji derd û bela xilaş bike,

Bi reħmeta xo şa bike, Xuda tuyî delîlê me.

25. Rebbî, reħma te ser me bî, razîbûna te ji me hebî,

Şelewat ser nebîyê me bî, Xuda tuyî delîlê me.

26. Rebbî, tuî reħîmê me, Kerîmê me, delîlê me.

.....

Di vê cûreya mersîyeyê ya ku ji teref ‘Elî ve di halê nexweşîyê hatiye nivîsin de tê dîtin mersîyenûs di malikên 1-8an de qet qala nexweşîya xwe nake û li ser xwe şînê nagire. Beravajîya vê yekê mersîyenûs gazin û gilîyan ji hal û rewşê dinyayê û kesên ku li derdora wî dijîn û xwedî tebî‘etên nebaş in dike.

‘Elî piştî van gazin û gilîyan ji benda nehan pêve dest pê dike û qala hal û wezîyeta xwe ya elemnak û nexweşîya ku ew pê ketiye dike. ‘Elî dema ku vê yekê tîne zimên 8 caran qala quxika ku ew pê ketiye û qala êş û elema ku ji ber wê quxikê pêr e peyda bûye dike. ‘Elî dema ku vê yekê tîne zimên dilê xwe bi xwe dişewitîne û destnîşan dike eva pê re ne quxik e, ji quxikê wîrdetir tiştêkî din e. Lewra ew heta malika 18an destnîşan dike, ew ji ber vê quxikê pir zêde êşê dikşîne û sebr û hedan naye wî. ‘Elî her çî qas ji malika 8an heta malika 18an qala rewşa xwe ya elemnak bike û ji halê xwe yê nexweşîyê gazinan bike jî di dawîya risteya duyemîn a her beytê de gotina “*Xuda tu yî delîlê me*” bi kar tîne û xwe dispêrî Xwedê.

‘Elî piştî gazin û gilîyên ji ber nexweşîya xwe vêca di malikên 19 û 20an de ji xwe re dibêje ev tiştê ku hatiye serê wî bi fermanê Xweda ye û ew li ber teqdîra Xwedê teslîm dibe.

‘Elî piştî ku rewşa xwe ya elemnak û kovandar tîne zimên, dilê xwe, li xwe dişewitîne û li ser xwe şîne digire; ji beyta 21ê dest pê dike heta beyta dawî ya mersîyeyê ji xwe re di‘a dike û ji Rebbê xwe daxwaz û lavayî dike da ku ew, derdê wî derman bike û ji bo nexweşîyê şifa bide wî.

Ev mersîye ji wan mersîyeyên din ên ku li ser mirîyan bi xwe hatine nivîsîn cudatir e. Lewra di vê mersîyeyê de tê dîtin ku mersîyenûs li ser halê xwe yê nexweş mersîye nivîsîye. Dema ku şîne digire li ser kesekî yan tişteki din nagire; bîleqs li ser xwe û li ser halê xwe yê kovandar şîne digire û êş û elema ku ew ji ber nexweşîya xwe dikşîne tîne zimên. Dîsa di vê mersîyeyê de bi şikleki pir xurt di‘a tê kirin û lavayî ji Xwedê tê kirin. Lê ev di‘a û lavayî bi xwe jî dîsa ne ji bo kesekî yan tişteki din e; ji bo xwe bi xwe ye. Şa‘ir bênavber di‘a dike û ji Rebbê xwe dixwaze ku şifayê bide şexsê wî bi xwe.

Berî niha jî me ji bo nivîsîna mersîyeyekê di xebata xwe de cî dabû du fikrên cûda. Di ya ewil de dihat destnîşankirin ji bo mersîye bê nivîsîn divê muheqqeq pêwendîya kesê nivîskar û mirî bi hev re hebe⁵⁵² û di ya duduyan de jî dihat diyarkirin, mersîye li ser kesekî mirî yê ku têkilîya wî bi kesê nivîskar re tune ye jî dikare bê nivîsîn, lewra kesê ku mir ger di nav civakê de bê nasîn û jê bê hezkirin û yan jî rayedarê dewletê be wê demê ev nêzbûn û têkilî dibe yek alî.⁵⁵³ Di vê mersîyeyê de em dibînin ku ev her du qaîde jî ne derbasdar in. Lewra mersîye ji teref şa‘ir bi xwe ve li ser halê xwe ya nexweşîyê bi xwe hatiye nivîsîn. Ev yek jî nîşanê me dide ku dibe ku mersîye li derveyî van qaîdeyan jî bîn nivîsîn.

12. Ên ku Nediya in li ser kî Hatine Nivîsîn

Di encama xebata ku hat kirin de hat tespîtîkirin ku mersîyeyek nediyar e li ser kî hatiye nivîsîn. Ev mersîye ya Feqîyê Teyran e. Mersîyeya ku ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn teşeya wê ya nezmê qesîde, qalîba wê mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun û behra wê jî recez e. Ev mersîye tevde ji 24 malikan pêk tê.

⁵⁵² Kardaş, *h.b.*, r.4.

⁵⁵³ Canım, *h.b.*, 2010a, r.130.

Nediyar e ev mersîye li ser kî hatiye nivîsîn. Di mersîyeyê de bes wek nav tabîra “*Eyn û Lam*” tê bikaranîn.⁵⁵⁴ Ji ber ku

Navê mersîyenûs û kesê ku li serê hatiye nivîsîn û her wisa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Feqîyê Teyran	Ne diyar e	Qesîde	Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun

Tablo 39: Mersîyenûsên ku nediyar in li ser kî hatine nivîsîn û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku ne diyar e li ser kî hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Feqîyê Teyran⁵⁵⁵

Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun

– – + – / – – + – / – – + – / – – + –

1. Îro werin lêzim werin cîran û xelkê Hêşetê
Hûn rayekê li min bikin îro qewî girya me tê
2. Îro qewî j’ mi tê girîn sosin li mergan xeyirîn
Şed heyfa lêvê şekirîn êdî venaxun şerbetê
3. Lêvên di le‘lîn û şeker kêmbûn ji wan durr û xeber
Şed ah û kovan û keser heyf eyn û lam çûn hicretê
4. Hêyf ‘Eyn û Lam bûne cuda şîn û girîn dîsa te da

⁵⁵⁴ Ji ber ku me berî niha di beşa yekem a tezê di bin sernava “Mersîyenûsên ku di Sedsala XVI û XVIIem de Jiyane” de van agahî û nîqaşên ku li serê hatin kirin, dabû me li vê derê cî neda wan.

⁵⁵⁵ Sadînî, *h.b.*, 2013a, r.139.

Em razîne b'emrê Xuda herçî ji dergahê te tê

5. Herçî dikit ew mîr dikit xêr û şeran teqdîr dikit
Dağan li qelban pir dikit şohtim bi narê firqetê
6. Şohtim bi nar û agirî vê faniyê em j'ev kirî
Hetta xweş in em dê girî dost çûye çerxa adetê
7. Eman adet bê eman e wan melek mehbûb revan e
Can di nêv axe nihan e ê felek bê minvetê
8. Ey felekê bê wefa yê te çira muhlet nedayê
Yar di nêv axê gihayê ey felek bê mirwetê
9. Ey felekê bê î'tibar min bi te nîn in qet çu car
Ne te gelek mehbûb veşar paşî ewan xal û xeşê
10. Nazik û mehbûb ciwanik wamet û bejna ziravik
"Kullu şey'in" dê bin halik ji geyrî Şahê Qudretê
11. Her bi can geyrî wî nabin ew hemî ax û turab in
..... çûye mala zulmetê
12. Zûlm eta tarî û kûr e meqbera nav lê qubûr e
Ji haniyan yanî dûr e qebr e benda firqetê
13. Meqbera mehbûb di nêve min muqîm çav man bi rê ve
Çirra yek nanî ji wê ve dîn kirim vê hikmetê
14. Min heyf li cotê şorgulan zulfê muqîm li ser milan
Danîne nav ax û hilan êdî bi kê dim ulfetê

15. Min heyfa reyhan ê di reş kan şorgul û werdê di geş
Kêm bûn bi wan bêhnê di xweş nîşan û xalê cebhetê
16. Nîşan û xalê fulfulîn min heyf li zulfa kagulîn
Hatin ku em jê dest hilîn hêj nagirin em 'îbretê
17. Paşî wan xal û nîşanan weş nayê bêhna rişanan
Ji mihnetê êş û janan tîn ji narê firqetê
18. Firqeta wê her bi derb e dalma êşan û kerb e
Ê ku dî zanî çî derb e min ji xewfan xew netê
19. Min ji şevan xew lê tunîne bager û êşan nihîn e
Daîma têtin girîne mam li ser kes ew netê
20. Tîreke dijwar fîraq e her kesê dî ev fîraq e
Mihnet û dağ û hîraq e d' 'eyd û bend û mihnetê
21. Gumbeda tarî sitar e meqbera dost lê veşare
Te l' min heram kir bihar e çiçek û bêhn j' dûrî te tê
22. Qeş nema bêhn kem çî werda çiçek û bîhnxoş li erda
Paşî me mehbûb ku b' derda çîmena kê j' dora netê
23. Çîçeka kanî û av lê sosina daim xunav lê
.....Dê tamam kim suhbetê
24. "Mîm û Hê" şa'irkî pak e herkesê b' ruh bû ji makê
Hemîyan dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê

Ev mersîyeya ku bi teşeya nezmê ya qesîdeyê ji teref Feqîyê Teyran vê hatiye nivîsîn bi tevahî ji 24 malikan pêk tê. Qaliba arûzê ya mersîyeyê mustefîlun mustefîlun mustefîlun û behra wê jî recez e. Me berî niha jî diyar kiribû mersîyeya ku bi Kurdîya Kurmancî di sedsala XVIIem de ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn di vî warî de mersîyeya ewil e. Hinek kes dibêjin ev mersîye li ser wefata Melayê Cizîrî û hinek kes jî dibêjin li ser qîza Mîrê Hêşetê hatiye nivîsîn. Lêbelê dema ku em li naveroka mersîyeya ku ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn mêze dikin em dibînin navê ti kesî di mersîyeyê de nehatiye zikirkirin. Bes di du beytên helbestê de gotinên “*Heyf ‘eyn û lam çûn hicretê*” û “*Heyf ‘eyn û lam bûn cûda*” heye û nayê zanîn “*Eyn û lam*” kî ye.⁵⁵⁶ Ji ber vê sedemê me vê mersîyeya ewil a ku ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn di vê kategorîya mersîyeyên ku nehat tespîtkirin li ser kî hatiye nivîsîn de bi cî kir.

Di mersîyeya Feqî de beşên mersîyeyekê yên mîna; şîngirtin, hêstirbarandin, ji felekê re bertek nîşan dan û dayîna pesnê kesê wefatkirî derdikevin pêş. Mersîye hêj di destpêkê de ast û zêdebûna xemgînî, êş, elem û kovana ji ber wefatkirina şexsekî dide nîşandan. Lewra Feqî hêj di malika ewil a mersîyeyê de ji ber tundîya êş û elema ku ew dikşîne bang li xelqê Hêşetê û wargehên derdora wê dike da ku ew jî bibin hevderdê wî. Di malika duyemîn de Feqî, şîngirtin û girîna xwe di asta herî jor de didomîne. Ji ber mirina pêkhatî, ê ku dinale û digirî bes ne ew e; bi heman awayî tebî‘et bi xwe jî pê re şîngirtinê digire. Ev yek jî tesîra wefata ku pêk hatiye nîşanî me dide. Teyran di malika sêyemîn û çaremîn de dest bi jimartina taybetî û wêşên kesê mirî dike û ew kesê wefatkirî bi gotina “*Heyf ‘eyn û lam çûn hicretê*” û “*Heyf ‘eyn û lam bûne cuda*” bi me dide zanîn. Teyran dema ku vê xebera hicretê û cudabûnê bi me dide zanîn cardin dest bi girî, nalîn û zarîne dike û vê firqetê wek sebeba sotina xwe diwesfine. Ev halê şîngirtinê ya piştî dayîna agahîya hicreta kesê wefatkirî heta malika heftan didome. Dema ku em li wan malikên heft, heşt û nehan mêze dikin em li rastî beşeke din a mersîyeyên klasîk tên. Ew jî ji felekê bi xwe re bertek nîşan dayîne. Mersîyenûs di vê beşê de ji ber ku felekê bi xwe wek mesûlê mirinê dibînin bi şiklekî xurt û tund ji felekê re reaksiyon nîşan didin. Di van her sê beytên navborî ya mersîyeya Teyran de

⁵⁵⁶ Me di beşa ewil a xebata xwe de me bi şiklekî hurgilî qala vê meseleyê kiribû. Ji ber vê yekê me li vê derê cî neda wan nîqaş û agahîyan.

jî em dibînin ku Teyran bi gotina “*Ey felekê bê wefa te çima muhlet nedayê*” hesabê ji felekê dipirse û felekê wek “*bê minwet, bê mirwet, bê wefa û bê îtibar*” diwesfîne.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de di hinek cureyên mersîyeyan de kesê mersîyenûs dema ku di heman malik an jî bendê de li ser kesê wefatkirî şînê digire ji aliyê din ve jî bi şiklekî bênavber û xurt pesnê mirî dide. Dema ku em li mersîyeya ku ji teref Teyran ve hatiye nivîsîn jî mêze dikin em vê taybetîyê dibînin. Lewra Teyran ji malika dehan dest pê dike û heta malika hefdehan ji aliyekî ve pesnê kesê wefatkirî dide û ji aliyekî ve şîna xwe didomîne û ji ber fîraqa wî hêstiran dibarîne. Li gorî Teyran digel wefata pêkhatî êdî tehma tu tiştî nemaye û tu kesekî ku ew karibe muhabbeta xwe jê re îzah bike û bîne zimên jî nîne. Ev yek jî qedr û qiymeta kesê wefatkirî ya di nezera mersîyenûs de nîşan dide.

Teyran, vê halê xwe ya şîngirtinê heta malika bîst û sisêyan didomîne û malika dawî ya mersîyeyê êdî xwe û reşwa xwe ya elemnak a ji ber wefata pêkhatî dispêre Xweda û dawî li mersîyeya xwe tîne.

“Mîm û Hê” şa ‘irkî pak e herkesê b’ ruhê bû ji makê
Hemîyan dê ew fena ke ew jî Şahê Qudretê(24)

B-MERSÎYÊYÊN KU LI SER WELAT, BAJAR, DÎN Û MIRINÊ HATINE NIVÎSÎN

Ew mersîyeya ku ji pênasaya wê jî tê famkirin heta demekê zêde jî ji ber mirina însanekî dihat nivîsîn û tê de şîn dihat girtin û rondik li ser mirîyan dihat rijandin û pesnê kesê mirî dihat dayîn û jêre dia dihat kirin. Vêca ev mersîyeya ku li kesekî mirî dihat nivîsîn çawa dibe dema di holê de bûyera mirinê tunebe bê nivîsîn?

Mersîye bes li ser mirina şexsekî nayên nivîsîn. Bi heman awayî li ser îşxalkirina welat an jî dûrbûna ji welat bi xwe jî yan jî ji ber bûyereke elemnak a ku dibe sedema êş û elemê jî tên nivîsîn. Mersîyeyên ku heta niha me qala wan kir tev li

ser wefata şexsekî ku jê dihat hezkirin û jê re qedr û qiymet dihat dayîn an jî di halê nexweşî û mirinê de li ser xwe hatbûn nivîsîn. Lêbelê ji bilî van mersîyeyên ku li ser însanan tînin nivîsîn hinek mersîye jî hene ew li ser dîn, welat, kovar û mirinê bi xwe hatine nivîsîn. Di van mersîyeyan de em dibînin di holê de mersîyeyê ku hatiye nivîsîn heye, lê şexsê ku li serê mersîye hatiye honandin tune ye. Yanî di vê kategorîyê de tê dîtîn di şûna şexsan de welat, bajar û dîn û di şûna wefatê de jî dûrbûn, hezkirin an jî êş kişandin heye. Mersîyenûs di vê kategorîyê de li ser wê êş û elem, hesret û kedera li ser dûrbûna ji welatê xwe yan jî li ser muhebbeta welatê xwe, yan jî ji ber tiştê dîn mersîye nivîsîne. Bi gotineke din mersîyenûs bingeha berhema xwe li ser babeta şînê, pêkveanîna têgeha dûrbûnê ava dike⁵⁵⁷ û ji bo rewşa nebaş a welêt mersîyeyên ku ji wan re ên weten tînin gotin hatine nivîsîn.⁵⁵⁸ Di bingeha vê dûrbûnê de jî muhebbet û hezkirina welêt bi xwe yan jî ji ber meseleyê kovandar kişandina êş û elemê heye. Ev hezkirin dema ku ji wî tiştî tê dîrketin forma wê vediguhere şînê. Di netîceya vê hezkirin an jî rewşa nebaş a welêt de ew mersîyeyên ku ji wan re mersîyeyên weten tê gotin derdikevin holê. Mersîyeya ku exleb li ser, alim, mîr, padîşah, şêx, mela, endamên malbatê û şehîdên Kerbelayê hatine nivîsîn çawa ji hêla naverokê ve ango tiştê ku li ser tê nivîsîn ve hatine guherîn? Her çî qas mersîye di destpêkê de li ser mirina însanan hatibin nivîsîn û gotin jî bi demê re lehengê ku li serê mersîye hatiye nivîsîn guherîya û ji xeynî însanan hinek mersîye li ser bajarên ku ji dest derketine yan jî li ser heywanekî ku pir jê tê hezkirin hatine nivîsîn. Ev guhartina naveroka mersîyeyê bi demê re çêbûye. Rıdvan Canım, di xebata xwe de derbarê vê yekê de wisa dibêje:

“Tê dîtîn ku mersîye bi demê re bi hinek guhartinan re rûbirû mane û ew mersîyeyên ku di destpêkê de ji bo kişandina êş û elema ku ji ber mirina kesekî dihatin nivîsîn piştî qonaxekê libasa feryad û fîxana ku ji ber bobelat û felaketên neteweyî tînin kişandin li xwe kirine. Nimûneyên wê pir zêde tunebin jî geh li ser axên ku ji dest derketine mersîyeyên bajarên û geh jî li ser heywanekî ku jê dihat hezkirin û miriyê mersîyeyên heywanan hatine nivîsîn.”⁵⁵⁹

⁵⁵⁷ Hêmin Omer Xoşnaw, *Şir'ê Şiwen li Edebî Kurdî da*, Zan, Kovara Taybetî Şi'r û Rexne, <http://zaan.blogfa.com/post/179>, (Dîroka Jêgirtinê: 22.06.2022. Seat:12:05.)

⁵⁵⁸ Çavuş, *h.b.*, r.136.

⁵⁵⁹ Canım *h.b.*, 2018b, r.130.

Di edebiyata Kurdî de him bi zaravayê Soranî him jî bi ya Kurmancî li ser dûrbûna ji bajar û welat û Kurmancî ne di nav de bi Soranî li ser heywan û kovarê bi xwe jî mersîye hatine nivîsîn. Di edebiyata Kurdîya Soranî ya klasîk de kesên bi navê Salim⁵⁶⁰, Hemdî (m.1936.)⁵⁶¹, Reşîd Necîb⁵⁶², Muftî Pêncwênî⁵⁶³, Wefayî⁵⁶⁴ û Hecî Qadirê Koyî (m.1897.)⁵⁶⁵ li ser dûrbûna ji war û welat; kesên bi navê Salim⁵⁶⁶, Hemdî⁵⁶⁷, Pîremerd⁵⁶⁸ û Exûl⁵⁶⁹ mersîyeyên ku mijara wan niştîman e; kesên bi navê Wîsalî(m.1973.)⁵⁷⁰, Şêx Riza û Nalî li ser heywanan û Pîremerd jî li ser tiştên nejîndar ên mîna kovarê mersîye nivîsîne.⁵⁷¹

Di edebiyata Kurdîya Kurmancî de jî em vê guherîna lehenga mersîyeyê dibînin. Lewra di vê sedsalan dawî de ji ber ku zext û zordarî li ser xakên Kurdan zêde bûn, rewşenbîr, edîb û şa'irên Kurdan mecbûr man ku bajarên ku ew lê dijîn biterikînin û berê xwe bidin yan bajareke din a welêt an jî biçin welatekî din. Ev yek jî bû sedem ku bi şa'irên Kurdan re hesret, êş û elema bi wan re peyda bibe. Di encama vê yekê de şa'irên Kurdan ên ku nikaribûn vegeerên warên xwe û pir hesreta wê dikşandin hinek mersîyeyên ku ew tê de him pesnê welêt û bajar didin û him jî ji ber dûrbûn û hezkirina wê şînê digirtin û rondikan li ser wan dibarandin, nivîsîn.

Di edebiyata Kurdî ya Kurmancî de ji bilî van mersîyeyên ku li ser bajar û welêt hatine nivîsîn hinek mersîye hene ku li ser dîn an jî li ser mirinê bi xwe hatine nivîsîn.

⁵⁶⁰Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser bajêr hatiye nivîsîn, "*Elweda' Ey Mulkê Baban Elweda'*", <https://books.vejin.net/ck/text/4073>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 00:12.)

⁵⁶¹ Mersîyeya ku ji teref Hemdî ve li ser bajar hatiye nivîsîn, "*Salî Carê Her Debê Em Şare Bête Mezbele*", <https://books.vejin.net/ck/text/4557>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:23:33.)

⁵⁶² Omêd Aşna, *Jiyan û Berhemakanî Reşîd Necîb Dîwan*, Weş. Aras, Hewlêr 2001, c.1., r. 24.

⁵⁶³Mersîyeya ku ji teref Muftî Pêncwênî ve li ser dûrbûna welat hatiye nivîsîn, "*Pêncwên bebê to nêzîke mergim*", <https://books.vejin.net/ck/text/3037>, (Jêgirtin: 01.01.2023. Seat:03:33.)

⁵⁶⁴ Mersîyeya ku Wefayî li ser dûrbûna ji welêt nivîsandiye, "*Nîgara Dilbera Namîhreban*", <https://books.vejin.net/ck/text/1074>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 15:34.)

⁵⁶⁵ Pîremerd, *h.b.*, r.135.

⁵⁶⁶ Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser niştîman hatiye nivîsîn, "*Lê Gerîm Ba Girye Kem Dîdem Be Dîdeî Xûnefsan*", <https://books.vejin.net/ck/text/4104> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12.12.)

⁵⁶⁷Mersiyeya ku ji teref Hemdî ve li ser niştîman hatiye nivîsîn. "*Çûn Zemanî Xame*" <https://books.vejin.net/ck/text/4550> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:12.34.)

⁵⁶⁸ Mersîyeya ku ji teref Pîremerd ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, "*Hatin Şehîdekan be Cilî Sorî Xwînewe*", <https://books.vejin.net/ck/text/35231> (Jêgirtin: 22.06.2022.Seat: 23.45.)

⁵⁶⁹ Mersîye ya ku ji teref Exûl ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, "*Be Carê Malî Wêranîm Silêmanî Xiroşawe*", <https://books.vejin.net/ck/text/3501>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 11:12.)

⁵⁷⁰ Cemal Muhammed Muhammed Emîn, *Dîwanî Wîsalî*, Çapxaney Darul Cahiv, Bexda 1986, r. 391

⁵⁷¹ Ji bo agahiyên zêdetir binêrin: Refîq, *h.b.*, r.90-93.

Di van mersîyeyan de dîsa ji ber rewşa nebaş û xirab a ku derketiye holê kesê şa'ir digel ku mirina kesekî di holê de tune be jî mersîyeya xwe li ser êş û elema ku ji ber tişteki pêre peyda bûye ava dike. Di van mersîyeyên wisa de jî dîsa însanekî mirî tune ye, lê ji ber rewşeke nebaş, ji ber nexweşî yan jî bûyereke elemnak kişandina êş û elemê û rijandina rondikan heye. Mînakên mersîyeyên bi vî awayî yên ku li ser welat, bajêr an tişteki din hatine nivîsîn di edebiyata Erebi, Tirkî û Farisî de hene. Wek mînak dema ku Endulus ji destê Mislîmanan derket, şairên wê dewrê ji ber ji dest derketin û îşxala ku hat kirin û her wisa ji ber zilm û xerakirina ku li wê derê hat kirin bi dehan mersîye nivîsîn. Di van mersîyeyên bi vî rengî yên ku hatine nivîsîn de temaya êş û elemê li ser îşxal, zilm, wêran û talana ku li wî bajarî hatiye kirin, hatiye saz kirin. Dema ku em li wan mersîyeyên ku di Kurdî de hatine nivîsîn mêze dikin em dibînin hinek xalên wan ên hevpar ên bi mersîyeyên bi vî rengî re hene. Lewra mersîyenûsên Kurd ên ku li ser welat an jî bajêr mersîye nivîsîne, demekê mecbûr mane terka war û welatê xwe bikin. Ji ber vê yekê ew li ser vê yekê rabûne mersîye nivîsîne, di wan de şîn girtine, pesnê wê dane û temennî û daxwazan kirine.

Em ê di vê beşê de qala wan mersîyeyên ku li ser welat, bajar, dîn û mirinê hatine nivîsîn bikin û em ê wek nimûne mersîyeyekê di bin beşa têkildar, di çarçoveya taybetîyên mersîyeyê klasîk de binirxînin.

1. Welat

Hat dîtin ku di vê kategorîya de bes ji teref 3 mersîyenûsan ve bi tevahî 7 mersîye hatine nivîsîn. Nûnerên me yên vê qonaxê Evdirrehîm Rehmî Hekkarî, Cegerxwîn û Silêman Bedirxan e. Evdirrehmîn Rehmî Hekkarî û Silêman Bedirxan di vî warî de her yek ji wan mersîyeyek û Cegerxwîn jî 5 mersîye li ser welat û dûrbûna welat mersîye nivîsîne.

Ji ber ku nivîsîna dîroka van 7 mersîyeyan nehat tespît kirin, em nikarin bibêjin di vî warî de mersîyeya ewil a ku li ser welat hatiye nivîsîn ya filan mersîyenûsî ye. Navê mersîyenûs û tiştê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û her wisa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Tiştê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib

Evdirrehîm Hekkarî	Rehmî	Welat	Tercî' bend	Mustef' ilun Mustef' ilun
Cegerxwîn		Welat	Tercî' bend	Mustef' ilun Mustef' ilun
Cegerxwîn		Welat	Qesîde	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun
Cegerxwîn		Welat	Qesîde	Mustef' ilun Mustef' ilun Mustef' ilun Mustef' ilun
Cegerxwîn		Welat	Qesîde	Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun
Cegerxwîn		Welat	Xezel	Fa'ilatun Fa'ilun
Silêman Bedirxan		Welat	Tercî' bend	Mustef' ilun Mustef' ilun

Tablo 40: Mersîyenûsên ku li ser welat mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser xwe hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Silêman Bedirxan⁵⁷²

Mustef' ilun Mustef' ilun

--+-/- --+-

1. Hêmd û şena bo ins û can
Bo xaliqê kewn û mekan
Xasma ko ev new'ê insan
Daye jê ra 'eql û ziman

Hubba welat ji îmanê

Ax Kurdistan ax Kurdistan

2. Çiqas şelat û hem selam
Ew bit li ser xeyrê enam
Hem ehl û eşhabê kîram
Ev e rîknê dîne Îslam

⁵⁷² Bedirxan, *h.b.*, r.146.

Ḥubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

3. Heçî kurd e mensûb bibit
Bal xeyrê xwe mel'ûn dibit
Bi nessê hedîs isbat dibit
Bêbav û bêqîmet dibit

Ḥubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

4. Kanî welat bav û biran
Kanî ew deng ka dilberan
Kanî çiya kanî zozan
Kanî ew berf kanî baran

Ḥubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

5. Heçî welat nahebîne
Rûmeta wî herḫal nîne
Bal pêgember meqbûl nîne
Namûsa wî yekcar nîne

Ḥubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

6. Kesê ḥubba welat nekit
Ni'metê xwe winda dikit
Ayet wusan ḥukum dikit
Ji bo xwe re meḥrûm dikit

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

7. Welatê me gul û reyhan
Jê têtin her bihna cînan
Em pê bûne mest û mestan
Hetta ebed axir zeman

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

8. Her çend welat wek şekir e
Halê zozan şêrîntir e
Ew sîr û mast hêj xweştir e
Bi hezaran jê çêtir e

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

9. `Eşqa welat dil şewitand
Ca û ceger tev peritand
Şebr û `eqil tevda revand
Qeweta pê tevda sitand

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

10. Ah ji destê vê firqetê
Ah ji destê vê hicretê
Heta kengê vê ğurbetê
Da em biçin nav milletê

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

11. Ev gotina Suleyman e
Ew ji nesla Bedir-Xan e
Xudan derd û bê derman e
Felek jê re bê eman e

Hubba welat ji îmanê
Ax Kurdistan, ax Kurdistan

Ev mersîyeya ku ji teref Silêman Bedirxan ve bi teşeya nezmê ya tercî' bendê hatiye nivîsîn, qaliba wê mustefî ilun mustefî ilun û behra wê jî recez e. Ev mersîyeya ku li ser hezkirina welêt hatiye nivîsîn tevde ji 11 bendan pêk tê. Bedirxan di destpêka mersîyeya xwe de ji benda ewil heta bend çaran diyar nake ku ew li ser welatê xwe şînê digire. Lewra di her sê bendên ewil de ji Rebbê aleman re hemd û sena dike û selat û selaman li ser Pêxemberê me tîne. Piştî benda 3yan em dibînin ku Bedirxan dest bi girtina şînê û destnîşankirina muhebbeta li ser welêt dike. Lewra di benda çaran de çar çaran peyva “*kanî*” bi kar tîne û pîrsa welat, bav, bira, çiya û kanîyên welêt dike û balan dikşîne li ser talan û xerakirina ku hatiye kirin ku ev yek pêre bûye sedema êş kişandinê. Di benda pêncan de jî ew destnîşan dike, kesê ku di qelbê wî de hezkirin û muhebbeta welêt tunebe ne xwedî rûmet e. Mersîyenûs dema ku hezkirin û muhebbeta xwe ya li hember welêt tîne zimên yazdeh çaran dibêje “*Hubba welat ji îmanê.*”

Bedirxan di benda şeşan de jî dîsa ji bo hezkirin û muhebbeta xwe ya li hember welêt qewîtir bike Qur'anê çavkanî nîşan dide û dibêje kesê ne xwedî muhebbeta welêt bi xwe be ew nimeta xwe winda dike. Ev yek jî asta hezkirina û muhebbeta Bedirxan a li hember welêt nîşanî me dide.

Yek ji beşên sereke yên mersîyeyan pesindayîn e. Di vê mersîyeya ku li ser welêt hatiye nivîsîn de jî tê dîtîn Bedîrxan di benda heft û heştan de balan dikşîne li ser bedew û xweşikbûna welêt û dest bi jimartina taybetî û xweşikayîyên welatê li ber dilê xwe dike. Bedîrxan bi vî awayî pesnê welatê ku ew jê hez dike dide. Di bendên pêş de ev halê aramî û pesindayîne ji holê radibe û em dibînin ku mersîyenûs vêca dest bi kişandina êş û elemê dike. Mersîyenûs di benda nehan de halê ku ew ji ber hezkirin û muhebbeta welêt ketiye navê û wê êş û elema ku ew dikşîne diyar dike. Di benda dehan de jî çavkanî û sedema kişandina vê êş û elemê bi peyvên “*fîrquet, hicret û xurbet*”ê tîne zimên. Bedîrxan bi benda dawî ku tê de qala nesla xwe û derdê xwe yê bêderman dike dawî li mersîyeya xwe tîne.

Di vê mersîyeya ku li ser dûrbûn û hezkirina welêt bi xwe hatiye nivîsîn de tê dîtîn pesindayîn û şingirtin gelek zêde derdikeve pêş. Lewra dema ku mersîyenûs qala êş û elemên xwe dike di ber re di seranserê mersîyeyê de yazdeh caran gotina “*Ax Kurdistan ax Kurdistan*” bi kar tîne.

2.Bajar

Yek ji wan tiştên din ên ku ji ber dûrbûn û hezkirinê li serê mersîye hatine nivîsîn bajar in. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de nûnerê vê qadê Cegerxwîn e. Cegerxwîn vê mersîyeya xwe li ser bajara Amedê nivîsîye. Mersîyeya ku teşeya wê ya nezmê qesîde ye bi qaliba fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun û bi behra remelê hatiye nivîsîn. Ev mersîyeya ku Cegerxwîn li ser Amedê nivîsîye bi tevahî ji 15 malikan pêk tê.

Navê mersîyenûs û tiştê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û her wisa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Cegerxwîn	Amed	Qesîde	Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilatun

Tablo 41: Mersîyenûsên ku li ser bajaran mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser bajêr hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Cegerxwîn⁵⁷³

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

1. Ey dil li qiraxê çemê Amed rune sergerdan;
Rind çavên xwe veke, temaşa ke welatê Kurdistan.
2. Li bajarê Amed çikandîne çend sêpî,
Bi wan ve daleqandi ne cindîyê Zazan.
3. Li alîkî tac û teylesan bê xwedî ne;
Li alîkî kolosen kevej ketine bin lîngan.
4. Ji berîka xwe destmalekê derxe û çavên xwe,
Paqijke, ji wan hêstirên xwe wek tav û baran.
5. Destên xwe li ber guhê xwe deyne û guh bidêre,
Li dengê Axtî ko dibêjî her bijî Kurdistan.
6. De bigirî bi dengê xwe ê zîz tim bike gazî,
Ey Amed, ta kengê bijî tu bi van kul û derdan.
7. Wek te xwînxwar in, Agirî û Dêrsim û Sasûn tev,
Wek te diljar in, Tor û Bext û Berzan.
8. Wek te bindest in çîyayên Şingal û Hemrin,
Wek te reş girê daye Sefîn û Girdê Seywan.
9. De bigirî û binale ey şarê Amed ey xwînxwar,

⁵⁷³ Cegerxwîn, *h.b.* c.1, r. 87.

De bigirî li ser tac û sera û textê Merwan.

10. Ax birano, ez nexweş im, nexweşê welatê xwe,
Derdê min jana zirav e, serxwebûn e derman.

11. Ez ê bimrim bi vê êşê her ev e daxwaza min;
Teneşoyê min çê kin ji textê ber derê zindan.

12. Darbesta min çê kin ji darên sêpîyên Amed, hem,
Qergerê min çê kin ji teylesan û şal û şedan.

13. Dixwazim min bişon bi ava Dicleya Amed, hem,
Ji ber gulavê li min bireşînin hêstirên keç û bûkan.

14. Eger li min negirin kovar û rojname û tarîx,
Bila li ser min bigirin çend Dilşah û Perîşan.

15. Ma ki wê nebeji; şed xwezî me bi dilê Cegerxwîn,
Ko ez li goristana Amedê carek bibim mêvan.

Di mersîyeya ku ji teref Cegerxwîn ve li ser bajara Amedê hatiye nivîsîn de, şa'ir derd û kulên di dilê xwe de, hesret û elemên di hişê xwe de û her wisa derd û birînên xwe ji ser bajara Amedê tîne zimên. Şa'ir di pênc malikên ewil ên mersîyeya xwe de çend bûyerên ku berî niha li Amedê bi xwe rû dane û ew bûne sedema êş û eleman tîne bîran û dûre dest bi şîngirtinê dike. Şa'ir dema ku dest bi şîngirtinê dike bang li bajar bi xwe dike û jê re dibêje “*De bigirî bi dengê xwe ê zîz tim bike gazî/ Ey Amed, ta kengê bijî tu bi van kul û derdan.*” Şa'ir piştî ku bi vê malikê bingeha şîngirtin û kişandina êş û elemê davêje vêca asta kişandina êş û elema xwe zêdetir dike. Lewra di malikên şeş, heft û heştan tê dîtin ku şa'ir derd û kulên xwe bi tiştên ku li bajara Amedê rû dane sînordar nake û gelek herêmên din ên welêt rû dane tevî êş û elema xwe dike. Şa'ir piştî kişandina êş û elemê, çavkanîya vê êşê wek “*nexweşê welatê*

xwe” bi nav dike û destnîşan dike ku dermanê nexweşîya wî, êş û elema ku ew dikşîne “serxwebûn” bi xwe ye.

Beşeke din a mersîyeyan kirina daxwaz û temennîyan e. Em vê yekê di vê mersîyeyê bi xwe de jî dibînin. Lewra şa’ir piştî ku derdê xwe tîne zimên û êş û elemê dikşîne vêca dest bi daxwaz û temennîyan dike û xwestekên xwe tîne ziman. Ev rewş heta malika dawî jî bênavber dewam dike û mersîye li ser vê rewşê bi dawî dibe.

3.Dîn

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de piştî mersîyeyên li ser welat û bajaran cûreyeke din a mersîyeyan heye. Ew jî ew mersîye ne ku li ser dîn bi xwe hatine nivîsîn. Nûnerê tekane ya vê qonaxê Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî ye. Qewmanî vê mersîyeya xwe dema ku axên Mislîman ji teref kafîran ve hatiye dagirkirin nivîsîye. Qewmanî di dema dagirkirina axa Mislîmanan de dibîne ku malên Mislîmanan hatine wêrankirin, zilm û zordarî li wan tê kirin, dîne Îslamê pir zirar dibîne. Ew ji ber vê yekê pir zêde êş û elemê dikşîne û pir xemgîn dibe. Qewmanî vê xemgînîya xwe û êş û elema ku ew ji ber vê rewşê dikşîne bi rêya vê helbestê anîye ziman.

Ev mersîyeya ku hatiye nivîsîn teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun û behra wê jî recez e. Ev mersîye bi tevahî ji 16 malikan pêk tê.

Navê mersîyenûs û tiştê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û her wisa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Şêx Muhemmed Hadîyê Qewmanî	Dîn	Qesîde	Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun

Tablo 42: Mersîyenûsên ku li ser dîne Îslamê mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser dîn hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Hadîyê Qewmanî⁵⁷⁴

Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun

- - + - / - - + - / - - + - / - - + -

1. Hey ho hewar hey ho hewar hey wax li min dînê mubîn
Hey wax û feryad û sitar hey wax li min dînê mubîn
2. Hey wax li min dîn çû ji dest em mane bêheş mane mest
Reş bû li me dewran û bext hey wax li min dînê mubîn
3. Reş bû li me dewr û zeman dîn çû ji dest me eleman
Em mane bêhêvî guman hey wax li min dînê mubîn
4. Em bêguman û bêxeber dînê ezîzê mu‘teber
Derket ji dest çûye li der hey wax li min dînê mubîn
5. Dîn çû ji destê milletê rabû ji nava ummetê
Ûetta bi roja axretê hey wax li min dînê mubîn
6. Hey wax li min hey wax li min dîn rabûye çûye jibin
Em şîn bikin tev mêr û jin hey wax li min dînê mubîn
7. Heqq e ku em şînê bikin terka evê jînê bikin
Riħlet ji bo dînê bikin hey wax li min dînê mubîn
8. Riħlet li me lazim bûye dînê Muħammed rabûye
Derdek li me peyda bûye hey wax li min dînê mubîn
9. Dêrde me dê xweş nabitin çawa dilê me şad bitin
Ûetta qiyamet rabin hey wax li min dînê mubîn

⁵⁷⁴ Qewmanî, *h.b.*, r.37.

10. Ey yar û eḥbab û biran wer hûn birêjin hêstiran
Dîn dan bi zêran û peran hey wax li min dînê mubîn
11. Ğaîb me kir wan şorgulan wan murşid û şêx û melan
Ey Şahê Qewman eleman hey wax li min dînê mubîn
12. Ey Şahê Qewman murşid î çavan bi mişlê te nedî
Destê me îro bernedî hey wax li min dînê mubîn
13. Destê me bigre bende me bêçare û şermende me
Şermendeyê şêxê xwe me hey wax li min dînê mubîn
14. Dunya li pê wî bû ḥeram bû tarî û ewr û gemam
Sergeşte bûne gas û ‘am hey wax li min dînê mubîn
15. Sergeşte û dîwane me bêmal û ez bêxane me
Çendî li dunyayê heme hey wax li min dînê mubîn
16. Dunya gelek bêbawer e Hadî mexape yeksere
Rabe ji dunyayê here hey wax li min dînê mubîn

Di seranserê vê mersîyeya ku ji teref Qewmanî ve li ser dîn hatiye nivîsîn de şîngirtin, daxwaz-temennî û şîret hakim e. Mersîyenûs hêj di malika ewil de bi gotina “*Hey ho hewar hey ho hewar hey wax li min dînê mubîn / Hey wax û feryad û sitar hey wax li min dînê mubîn*” dike feryad û fixan û dest bi şîngirtinê dike. Ev halê kişandina êş û elemê û şîngirtinê bi şiklekî bînavber heta beyta nehan berdewam dike û şa‘ir ji ber rewşa heyî dinale û dike feryad û fixan. Mersîyenûs piştî malika heştan bi gotina “*yar, eḥbab û bira*” bangawazîyekê dike û ji wan kesan daxwaz dike da ku ew jî werin digel wî hêstiran bibarînin û şîne girê bidin. Kişandina van êş û eleman û rijandina hêstiran û qalkirina derd û kulan tev êş û elema di qelbê Qewmanî de nîşanî

me dide. Sedema tamamê kişandina van êş û eleman ew zilm, zordarî, îşxal, talan û yexmeya ku li ser xakên Mislîmanan tê kirine.

Mersîyenûs piştî şîngirtin û rondikrijandinê heta malika çardehan dest bi daxwaz û temennîyan dike, hewara xwe dibe ji şêxên Qewman re û bi malika dawî ya ku tê de şîretan li xwe dike dawî li mersîyeya xwe tîne.

Di mersîyeyeke klasîk de beşên mîna; di ‘akirin, ji felekê re bertek nîşan dan, di ‘akirin, pesindayîn jî tev bi hev re nebin jî carina cî digirin. Lê dema ku em li vê mersîyeya Qewmanî dinêrin em li rastî van beşan nayên. Qewmanî di şûna van beşan de, beşa şîngirtin û kişandina êş û elemê derxistiye pêş. Qewmanî ji bo derd û kulê xwe û êş û elema ku ew dikşîne bîne ziman û bi derdorê bide famkirin di mersîyeya xwe ya ku ji 16 malikan pêk tê de tam 17 caran gotina “*hey wax li min dîne mubîn*” bi kar anîye.

4.Mirin

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de yek ji cûreyên mersîyeyê ew mersîye ne ku li ser mirinê bi xwe hatine nivîsîn. Di edebiyata Kurdî de nûnerê tekane ya vê qadê Şêx Ehmedê Kor bi xwe ye. Şêx Ehmedê Kor vê mersîyeya xwe li ser mirinê bi xwe nivîsiye. Teşeya wê ya nezmê qesîde, qaliba wê ya arûzê mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun û behra wê jî rezec e. Ev mersîye tev de ji 18 malikan pêk tê.

Navê mersîyenûs û tiştê ku mersîye li serê hatiye nivîsîn û her wisa teşeya nezmê û qaliba mersîyeyê wek tablo wisa ye:

Navê Mersîyenûs	Kesê ku mersîye li ser wî hatiye nivîsîn	Teşeya Nezmê	Qalib
Şêx Ehmedê Kor	Mirin	Qesîde	Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun

Tablo 43: Mersîyenûsên ku li ser mirinê bi xwe mersîye nivîsîne û teşeya mersîyeyên wan.

Ji bo mersîyeya ku li ser xwe hatiye nivîsîn nimûne:

Ji Şêx Ehmedê Kor⁵⁷⁵

Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun Mustef‘ilun

– – + – / – – + – / – – + – / – – + –

1. Şew dê le ‘umirim kem debê, ca çon dilim pir gem nebê?
Roj dê le ‘umirim kem debê, ca çon dilim pir gem nebê?
2. Dinya bewende mekir û fen, roş xoşewîste der beden
Hîcret dekatan az beden, ca çon dilim pir gem nebê?
3. Her kes ke bîbêtin kemal, dinyay wa pûç û betal
Neyka debê qeç qeç xeyal, ca çon dilim pir gem nebê?
4. Mîndal û xizim û dayk û bab, demirin îdî naden cewab
Bo to bes e hênde xîtab, ca çon dilim pir gem nebê?
5. Dinya bo kes naçête ser, bê î‘tîbar e û bê huner
demirin feqîr û mu‘teber, ca çon dilim pir gem nebê?
6. Xakîn debê bibîn be xak, danîştûyn bê xof û bak
Me‘lûm e her debîn hîlak, ca çon dilim pir gem nebê?
7. Bew xwaye pêt delêm feqîr, eto xuda meke lebîr
Wextê debê bikewye gîr, ca çon dilim pir gem nebê?
8. Daîm le dewam şeqye ecel, ew tund û tîj min kiwêr û şel
Demxate naw dawî emel, ca çon dilim pir gem nebê?

⁵⁷⁵ Şêx Ehmedê Kor, *Şev dê li umurim kê mî dibe*, Mersîyeya ku li ser mirinê bi xwe hatiye nivîsîn, <https://books.vejin.net/ck/text/26398>, (Jêgirtin: 10.04.2023 Seat: 00.13)

9. Ğerre mebe, ğerre mebe, çî fermû heq toş her webe
Rabird çî desga û debdebe, ca çon dilim pir ğem nebê?
10. Çend hatin û çûn sultan û şa, mirdin le textî bûn cuda
Waĥîd demênê her xuda, ca çon dilim pir ğem nebê?
11. Mal û xêzan û dewletim, lehžêkî naden mohletim
Lêm têk deden cê û ĥurmetim, ca çon dilim pir ğem nebê?
12. Lew qebreda tarîk û qûl, dadenîşin mat û melûl
Nakirêyn ‘îlac be zêr û pûl, ca çon dilim pir ğem nebê?
13. Lew qebreda tenya nefes, bo kes nîye feryadres
Çake bikeyn terkî hewes, ca çon dilim pir ğem nebê?
14. Ğemgînî dilim çatre, be zahîr nefsim kafre
Lêm demirin dost û bira, ca çon dilim pir ğem nebê?
15. Ew car were seyrî mezar, mirdin feqîran û hejar
Kewtûn têyda çendîn hezar, ca çon dilim pir ğem nebê?
16. Qeş niwêj û rojû nagrî, bo karî dinya ĥazrî
Pêt waye qeş qeş namrî, ca çon dilim pir ğem nebê?
17. Eĥmed bes ke le xeberan, sînet xezêney gewheran
Nesîhet e bo biraderan, ca çon dilim pir ğem nebê?
18. Ey Eĥmedî Korî feqîr, be destî nefis bûy esîr
Cehennemit kirdiwe lebîr, ca çon dilim pir ğem nebê?

Di vê mersîyeya ku ji teref Şêx Ehmedê Kor ve hatiye nivîsîn de tiştê ewil a ku li ber çavan dikeve xemgînî û mehzûntî ye. Şêx Ehmedê Kor vê yekê di mersîyeya xwe ya ku ji 18 beytan pêk tê de tam 19 caran bi gotina “*ca çon dilim pir gem nebê?*” tîne zimên.


Gelek beşên mersîyeyêke klasîk ên mîna şingirtin, di‘akirin, sebir xwestin, pesin dayîn û hwd. hene. Lê di vê mersîyeyê de bes beşa şînê heye. Şa‘ir di her beyteke vê mersîyeya xwe de pêşî sedema êş û elema ku ew dikşîne destnîşan dike û dû re bi pirsê “*ca çon dilim pir gem nebê?*” ku di dawîya her beytekê de dike, xemgînî û êş û elema xwe diyar dike. Ev êş û elema Şêx Ehmedê Kor carnan di malikan de wek kêmbûna umur, mirina nas û hezkirîyên mîna zarok, dê û bav xwe nîşan dide. Ev teswîra xem û kişandina êş û elemê di seranserê mersîyeya Şêx Ehmedê Kor de hakim e. Lewra mirin li ser wî tesîreke mezin hiştiye.

Şêx Ehmedê Kor di mersîyeya xwe de digel girtina şînê cî dide fanîbûna dinyayê û dinya û jiyana li ser rûyê dinyayê wek tiştêkî “*pûç û betal*” diwefîne. Em di malikên deh û yazdehan de dibînin ku Şêx Ehmedê Kor ji bo vê yekê çend mînanan dide û destnîşan dike, çend siltan û şahên ku xwedî mal û milk û her wisa qeweta zêde bûn hatine dinyayê, lê bi ti awayî mal û milkên wan feyde nedaye wan û ew ji mirinê bi xwe xelas nebûne. Ji vê qesda wî dîsa hebûna mirinê bi xwe ye. Şêx Ehmed vê girtina şînê û di bîr xistina mirinê heta malikên dawî yên mersîyeyê didomîne û bi şîretên ku li xwe dike dawî li mersîyeya xwe tîne.

Ji bo temamê vê beşa çaremîn em dikarin bibêjin; dema em 183 mersîyeyên ku hatine nivîsîn ji hêla kesên li ser wan hatine nivîsîn ve binirxînin em dikarin bibêjin, ên ku herî zêde li ser wan mersîye hatine nivîsîn pêşî şêx û dûre jî endamên malbatê ne. Li gorî daneyên li ber dest 94 mersîye li ser şêxan û 26 mersîye jî li ser endamên malbatê hatine nivîsîn. Ji bilî van her du beşan li ser kesên ku di nav civakê de wek pêşewa û rêber hatine qebûl kirin 8, li ser dost û hevalan 8, li ser alim/seyda/melayan 3, li ser seyîdan 3, li ser meseleya Kerbelayê-Şhadeta Hz. Huseyîn- 3, li ser sîyasetmedaran 7, li ser mîr, beg û axayan 4, li ser helbestvan û rewşenbîran 8, li ser hunermendan 2, li ser Hz. Muhemmed 4, li ser mirina xwe bi xwe 2, li ser welêt 7, li


ser bajar 1, li ser dîn 1, li ser mirinê bi xwe 1 û li ser kesên ku nehat dîtin kî ne 1 mersîye bi tevahî 183 mersîye hatine nivîsîn.

Navê kesan û hejmara mersîyeyên ku li ser wan hatine nivîsîn wisa ye:



Grafîk 21: Kes û hejmara mersîyeyên ku li ser wan hatine nivîsîn.

Rêjeya kesên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn wisa ye:



Grafîk 22: Rêjeya kesên ku mersîye li ser wan hatine nivîsîn.

ENCAM

Di çarçoveya xebat û lêkolîna ku hat kirin de di warê mersîye û mersîyenûsiya di edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek dane û agahî hatin berhevkirin. Bi saxîya van agahî û daneyan em bûn xwedî derfet ku di warê mersîyeyên di edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasîk de hinek tespîtan bikin. Tespîtên ku hatine kirin em dikarin wisa diyar bikin:

Di bergeha xebat û lêkolîna hat kirin de tevde 183 mersîye hatine berhevkirin ku ev mersîye ji teref 73 mersîyenûsan ve di sedsalên cuda de hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê me mersîyenûsan li gor sedsala ku lê jiyane dabeş kir. Di bergeha sedsala mersîyenûs lê jiyane de em dikarin bibêjin mersîyenûsên ku di sedsala XVI û XVIIem de jiyane 1 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XVII û XVIIIem de jiyane 3 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XVIIIem de jiyane 3 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XVIII û XIXem de jiyane 8 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XIX û XXem de jiyane 101 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XXem de jiyane 38 mersîye, mersîyenûsên ku di sedsala XX û XXIem de jiyane 25 mersîye û mersîyenûsên ku di sedsalên XIX û XXIem de jiyane 1 mersîye nivîsîne. Ji ber van daneyan em dikarin bibêjin sedsala ku lê herî zêde mersîye hatine nivîsîn sedsalên XIX û XXem e û dû re jî ji teref wan mersîyenûsên ku di sedsala XXem de jiyane ve herî zêde mersîye hatine nivîsîn.

Hat tespîtkirin ku di van sedsalên navborî de 183 mersîyenûs bi tevahî ji teref 73 mersîyenûsan ve hatine nivîsîn. Ji van mersîyenûsan; mersîyenûsek di sedsalên XVI û XVIIem de, 3 mersîyenûs di sedsalên XVII û XVIIIem de, 3 mersîyenûs di sedsala XVIIIem de, 4 mersîyenûs di sedsalên XVIII û XIXem de, 4 mersîyenûs di sedsala XIXem de, 38 mersîyenûs di sedsalên XIX û XXem de, 14 mersîyenûs di sedsala XXem de, 5 mersîyenûs di sedsalên XX û XXIem de û mersîyenûsek jî di sedsalên XIX û XXIem de jiyane.

Temamê mersîyeyên ku hatin berhevkirin ji aliyê rûxsarî ve yek bi yek hatin nirxandin. Di encama nirxandina ku li ser 183 mersîyeyan hat kirin de derket holê; 2

mersîye bi teşeya muselles, 1 mersîye bi teşeya museddes, 92 mersîye bi teşeya qesîdeyê, 29 mersîye bi teşeya murebbe´, 15 mersîye bi teşeya muxemmes, 18 mersîye bi teşeya mesnewî, 17 mersîye bi teşeya xezel, 8 mersîye bi teşeya terci´bend û 1 mersîye bi teşeya terkîbbend hatiye nivîsîn. Ji van teşeyên nezmê ya ku di mersîyeyan de herî zêde hatiye bikarîn bi rêjeya % 50 qesîde ye dû re jî bi dorê murebbe´, mesnewî, xezel, muxemmes, terci´bend, muselles, museddes û terkîbbend e.

Dîsa hat dîtîn di nivîsîna 183 mersîyeyan de tevde 9 cure behr û 24 qalibên erûzê hatine bikaranîn. Ji van behran a ku di nivîsîna mersîyeyan de herî zêde hatiye bikaranîn behra remel e ku pê 68 mersîye hatine nivîsîn û rêjeya wê% 37e. Her wisa hat tespîtkirin rêjeya behra hezecê bi 54 mersîyeyan ji % 29 û rêjeya behra recezê jî bi 46 mersîyeyan ji % 25 e. Di nivîsîna van mersîyeyan de mersîyenûs bi dorê herî zêde qaliba arûzê ya Fa´ilatun Fa´ilatun Fa´ilatun Fa´ilun(40 mersîye), Mefa´ilun Mefa´ilun Mefa´ilun(35 mersîye) û Mustef´ilun Mustef´ilun Mustef´ilun Mustef´ilun (30 mersîye) bi kar anîne.

Temamê mersîyeyên ku hatin berhevkirin ji hêla serwayê ve jî di bin du binbeşên bi navê “*Li Gorî Cih Cureyên Serwayê*” û “*Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureyên Serwayê*” de hatin nirxandin û rêjeya bikaranîna van cûreyên serwayê ya di 183 mersîyeyan de hat tespîtkirin.

Di encama lêkolîna ku di bin sernava “*Li Gorî Cih Cureyên Serwayê*” hat kirin de hat dîtîn; 98 mersîye bi serwaya bêpaşserwa hatine nivîsîn. Ji van 98 mersîyeyan; 40 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê, 23 mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe´ê, 9 mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmesê, 13 mersîye bi teşeya nezmê ya mesnewîyê, 7 mersîye bi teşeya nezmê ya xezelê, 1 mersîye bi teşeya nezmê ya museddesê, 5 mersîye bi teşeya nezmê ya terci´bendê û 2 mersîye bi teşeya nezmê ya musellesê hatine nivîsîn. Di encama lêkolîna ku di bin sernava “*Li Gorî Cih Cureyên Serwayê*” hat kirin de jî hat dîtîn ji mersîyeyên ku hatin berhevkirin tevde 47 mersîye bi serwaya bipaşserwa hatine nivîsîn. Ji van 47 mersîyeyan; 30 mersîye bi teşeya nezmê ya qesîdeyê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya muxemmesê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya murebbe´ê, 3 mersîye bi teşeya nezmê ya terci´bendê, 4 mersîye bi teşeya nezmê ya xezelê, 1 mersîye bi teşeya nezmê ya terkîbbendê û 3 mersîye bi teşeya nezmê ya

mesnewîyê hatine nivîsîn. Di bergeha van daneyên ku derketin holê de hat tespîtîkirin teşeya nezmê ya ku herî zêde di wan mersîyeyên bîpaşserwa û bêpaşserwa de hatiye bikaranîn teşeya nezmê ya qesîde ye. Lewra hat dîtin di 40 qesîdeyên ku wek mersîye hatine nivîsîn de serwaya bêpaşserwa û di 47 qesîdeyên ku wek mersîye hatine nivîsîn de serwaya bîpaşserwa hatiye bikaranîn ku rêjeya wan a bi dorê ji % 39 û ji % 64 e.

Di encama lêkolîna ku di bin sernava “*Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureyên Serwayê*” hat kirin de hat dîtin; di 183 mersîyeyên Kurdî de; 24 qesîde, 13 murebbe‘, 9 muxemmes, 6 xezel, 6 mesnewî û 1 tercî bend bi tevahî di nivîsîna 59 mersîyeyan de cureya serwaya mucerred; 3 qesîde û 1 muselles bi tevahî di nivîsîna 4 mersîyeyan de cureya serwaya muqeyyed; 24 qesîde, 13 murebbe‘, 9 muxemmes, 6 mesnewî, 6 xezel, 1 tercî bend bi tevahî di nivîsîna 59 mersîyeyan de cureya serwaya murdef ji teref mersîyeyên Kurd ve hatiye bikaranîn. Hat dîtin ji van her sê cûreyên serwayê ya ku di mersîyeyan de herî zêde hatiye bikaranîn bi dorê serwaya mucerred, murdef û ya muqeyyed e. Derket holê ji van 122 mersîyeyên ku bi serwaya mucerred, murdef û muqeyyed hatine nivîsîn de herî zêde bi teşeya nezmê ya qesîdeyê bi serwaya mucerred, murdef û muqeyyed hatine nivîsîn ku hejmara wan 51 e.

183 mersîyeyên Kurdî yên ku hatin berhevîkirin ji hêla paşserwayê(redîf) jî hatin nirxandin. Di encama nirxandina ku hat kirin de hat dîtin 21 qesîde, 9 murebbe‘, 5 muxemmes, 2 tercî bend, 2 xezel, 1 muselles û 1 terkîbbend bi tevahî 41 mersîye redîfa wan di halê qertafê de; 9 qesîde, 3 xezel û 1 tercî bend bi tevahî 11 mersîye redîfa wan di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de û 26 qesîde, 2 xezel û 12 murebbe‘ û 2 muxemmes bi tevahî 42 mersîye redîfa wan di halê bêje an jî kombêjeyan de ne. Rêjeya bikaranîna van paşserwayan(redîf) a di mersîyeyên Kurdî bi dorê wisa ye:

Mersîyeyên bi paşserwayên qertafî hatine nivîsîn: Ji % 45

Mersîyeyên bi paşserwayên qertafî hatine nivîsîn: Ji %: 43

Mersîyeyên bi paşserwayên ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de hatine nivîsîn: Ji % 12

Mersîyeyên ku berhevkerin ji hêla hunerên edebî ve jî hatin nirxandin. Di encama nirxandin û lêkolîna ku hat kirin de hat tespîtkirin di wan mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin de ji teref 73 mersîyenûsan ve bi tevahî 3422 caran hunerên edebî hatine bikaranîn. Ji van hunerên edebî yê ku ji teref mersîyenûsan ve herî zêde hatiye bikaranîn hunera teşbîhê ye ku hejmara wê 774 e. Hejmara bikaranîna hunerên din ên edebî jî bi dorê wisa ne: Îstîfham 717, tenasub 377, kînaye 251, nîda 234, tekrîr 195, mecazi mursel 164, telmîh 160, tecahula arif 143, îstîfare 135, mubalexe 115, întaq 58, tezad 51 û îqtîbas 48.

Ji sedsala XVIIem ku hat tespîtkirin mersîyeya ewil tê de ji teref Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsîn heta sedsala XXem(mersîyenûsên ku piştî sala 1923yan hatine dinyayê ne di nav de) di warê mersîyenûsîyê de bi zaravaya Kurmancî tevde 183 mersîye hatine nivîsîn. Ji van mersîyeyên ku hatine nivîsîn ji hêla kesên ku li ser wan hatine nivîsîn ve lêkolîn hat kirin. Di encama lêkolîna hat kirin de derket holê di vê heyama de ên ku herî zêde li ser wan mersîye hatine nivîsîn pêşî şêx û dû re jî endamên malbatê ne. Lewra hat dîtin 94 mersîye li ser şêxan û 26 mersîye jî li ser endamên malbatê hatine nivîsîn. Ji bilî van her du beşan li ser kesên mîna Şêx Se'îd, Se'îde Kurdî, Mele Mistefatê Barzanî ku di nav civakê de wek pêşewa û rêber hatine qebûlkirin 8, li ser dost û hevalan 8, li ser alim/seyda/melayan 3, li ser seyîdan 3 mersîye, li ser şhadeta Hz. Huseyîn û Hesen 3, li ser sîyasetmedaran 7, li ser beg û axayan 4, li ser helbestvan û rewşenbîran 8, li ser hunermendan 2, li ser Hz. Muhemmed 5 mersîye, li ser şexsê xwe bi xwe ya berî halê mirinê û yan jî di nexweşîyê de 2 mersîye, li ser kesên ku nehat tespîtkirin li ser kî hatine nivîsîn 1 mersîye, li ser welat 7 mersîye, li ser bajar 1 mersîye, li ser dîne Îslamê 1 mersîye û li ser têgeha mirinê bi xwe 1 mersîye hatiye nivîsîn. Di nav van de beşa ku herî zêde mersîye hatine nivîsîn bi rêjeya ji % 51ê şêx û dû re jî bi rêjeya ji % 14 ew mersîye ne ku li ser endamên malbatê hatine nivîsîn.

Hat dîtin ji 73 mersîyenûsên Kurdî de hinek ji wan di warê hejmara mersîyeyên ku nivîsîne de derdikevin pêş. Di encama lêkolîna ku hat kirin de derket holê ê ku di warê nivîsîna mersîyeyan de pêşî derdikeve pêş Mela Zahirê Tendûrekî ye ku wî tevde 27 mersîye nivîsîne. Piştî Tendûrekî ê ku di vî warî de herî zêde mersîye nivîsîne Mela

Ehmedê Nalbend û Cegerxwîn in ku ew bi tevahî her yek ji wan 12 mersîye nivîsîne. Piştî van ên ku herî zêde mersîye nivîsîne bi dorê bi 11 mersîyeyan Seydayê Tîrêj û bi 9 mersîyeyan Mela Ebdulfettahê Hezroyî ye.

Di lêkolîna me ya ku hat kirin de derket holê ku kevneşopîya mersîyenûsîyê di edebiyata Kurdî de xwedî cihekî bi qedr û qiymet e. Lewra di bergeha xebatê de 183 mersîye hatin tespîtkirin û derket holê ku ev mersîye ji şêx, alim, seyîd, mîr, beg, axayan bigirin heta li ser dost, heval, helbestvan, rewşenbîr, hunermend, Hz. Muhemmed, Hz. Hesên, siyasetmedar, pêşewa û rêberên Kurdan, endamên malbatê yê mîna; bira, bav, kurap, qîz, hevser, kalik û kur û her wisa li ser dîn, mirin, welat, bajêr hatine nivîsîn. Ji ber ku berî niha di vî warê beyar de xebateke wisa berfireh nehatibû kirin û ji ber ku di lîteratura akademîk de valahîyeke mezin hebû ev xebata ku hatiye kirin girîng e û xwedîyê cihekî bi qiymet e.

Ji aliyekî din ve pêwîst e bê gotin xebata me ya ku bes li ser wan mersîyeyên klasîk ên ku bi Kurdîya Kurmancî hat kirin, ji ber ku di pêvajoya coronayê ya ku bi nêzî du salan berdewam kir û ji ber pêvajoya erdheja ku qewimî de hat amadekirin em li rastî zehmetîyan hatin. Ev yek jî dibe ku bûbe sedem em negihaştibin hinek mersîyeyên ku di vî warî de hatine nivîsîn.

Wekî gotina dawî em hêvî dikin ku ev xebat di zanista Kurdî ya pêşeroj a ku geş û dewlemend e lê hêj bi şiklekî kamil pêşve neçûye û li benda kişîfkirin û pêşvebirinê ye de bibe têkarîyeke hêja û lêkolîner karibin jê îstîfade bikin.

ÇAVKANÎ

Kitêb:

1. **Adak**, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014.
2. _____, *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, İstanbul 2019.
3. **Agirîn**, Abdulla, *Dîwanê Şi`rê Mehemed Salih Dîlan*, Weş. Çiwarçir, Hewlêr 2013.
4. **Alan**, Ahmet, *Hetawî Kurd*, Weş. Avesta, İstanbul 2016.
5. **Alan**, Remezan, *Bendname*, Weş. Peywend, İstanbul 2013.
6. _____, *Keşkûl*, Weş. Peywend, İstanbul 2019.
7. **Amedî**, Zeynelabidîn, *Şerha Rewdul Ne`îma Şêx `Ebdurrehman Aqtepe*, Weş. Seyda, Diyarbekir 2016.
8. _____, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî`uzzemân*, Diyarbakır Söz Yay., Diyarbekir 2004.
9. **Aslan**, Ensar, *Türk Halk Edebiyatı*, Weş. Maya Akademi, Ankara 2010.
10. **Aşna**, Omêd, *Jiyan û Berhemakanî Reşîd Necîb Dîwan*, Weş. Aras, Hewlêr 2001, c.1.
11. **Aydın**, Vamıkiddin, *Kasideler ve 19 Risale*, yy., 1999.
12. **Azad**, Abdulwehîd, *Dîwanî Şêx Nûrî Şêx Salih*, Dezgehê Çap û Belavkirinê ya Aras, Hewlêr 2008, c.1.
13. **Bapîr Axa**, Elî, *Dîwanî Kemalî*, Amd. Mamoste Şekur Musetefî, Weş. Dezgehê Rewşenbîrî û Belavkirdinî Kurdî, Bexda 1986.
14. **Baqûstanî**, Mela `Elîyê, *Dîwana Baqûstanî*, Metn û Lêkolîn: M. Zahir Ertekîn, Weş. Zankoya Soran, Bîngol 2017.
15. **Bayezîdî**, Mela Mehmûdê, *Adat û Rusûmatnameê Ekradîyeyê*, Lêkolîn: Jan Dost, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012.
16. **Beki**, Mela Aziz, *Diwon Cebexçuri*(Edt. Murat Varol) Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2015.

17. **Bolelli**, Nusrettin, *Belagat (Beyan-Me'anî-Bedî' İlimleri: Arap Edebiyatı)*, İFAV Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı Yayınları, İstanbul 2017.
18. **Canım**, Rıdvan, *Divan Edebiyatında Türler*, Weş. Grafiker, Ankara 2010.
19. _____, *Latîfi Tezkiretü'-Şu'arâ ve Tabsıratü'n-Nuzamâ*, T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü, Ankara 2018.
20. **Cegerxwîn**, *Ji Min Dil Bir Bi Carek*, Weş. Lîs, Ankara 2018, c.II.
21. _____, *Ronahî Li Pey Tarî Ye*, Weş. Lîs, Ankara 2018, c.I.
22. **Celîl**, Celîlê, *Keşkûla Kurmancî*, Weş. ?, Wine 2004.
23. **Cizîrî**, Melayê, *Dîwan*, amd. Tehsîn İbrahim Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012.
24. **Cihanî**, Perwîz, *Mem û Zîn*, Weş. Nûbihar, İstanbul 2010.
25. **Çiftçi**, Cemil, *Divan Şiirinde Kerbela Ağıtları*, Weş. Kevser, İstanbul 2008.
26. **Çoğreşi**, Mele Es'ed, *Qesîdeyên Mala Seydayê Mele Es'edê Çoğreşi*, (Amd. Mele Muhammedê Çoğreşi), Mîrgemîr Yayınları, İstanbul 2005.
27. **Dilçin**, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2016.
28. **Durre**, Abdurrahman, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*, Weş. Keskesor, İstanbul 2002.
29. **Doskî**, Tehsîn İbrahim, *Baxê Îrem, Geşteki li Nav Şi'ra Kurmancîya Klasîk*, amd. M. Zahir Ertekin, Weş. Dara, İstanbul 2020.
30. **En-Nevevî**, Muhyiddin, *Riyâzü's-Sâlihîn -Metin ve Çevirisi*, Tasnif-Çeviri: Prof. Dr. M. Emin Özafşar- Prof. Dr. Bünyamin Erul, Weş. Diyanet, Ankara 2021.
31. **Ertekin**, M. Zahir, *Kürtçe Sıyer Yazıcılığı*, Weş. Sıyer Akademi, İstanbul 2022.
32. **Esad**, Nafizade Ahmed, *Mir'at-i Muhammedi Divan Şiirinden Na't Örnekleri*, amd. Ahmet Tanyıldız-Mehmet Büküm, Weş. Dün Bugün Yarın Yayınları, İstanbul 2020.
33. **Eskerî**, Şêx, *Keşkol*, Weş. Doz, Wergera Ji Tîpên Erenî: Zeynelabîdîn Zinar, İstanbul 2009.
34. **Ferrûx**, 'Omer, *Tarîxu'l-Edebi'l-'Arabî, Daru'l-'İlm li'l-Melayîn*, Beyrud 1981, c.I.

35. **Findikî**, Seyid 'Elîyê, *Dîwan*, amd. Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014.
36. **Gîwî** Mukrîyanî, Kurdistan, *Honrawey Afretî Kurd*, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr 1980, r. 37-38. Vgh: Hêmin Omer Xoşnaw, *Şir 'ê Şiwen li Edebî Kurdî da*, Zan, Kovara Taybetî Şi' r û Rexne, <http://zaan.blogfa.com/post/179>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:12:05.)
37. **Haşimî**, Seyid Qedrî, *Dîwana 'Îrfan, Edîsyon-Krîtîk*, amd. M. Nesîm Doru, Weş. Nûbihar, İstanbul 2016.
38. **Hezanî**, Şêx Evdilqadirê, *Dîwan*, Tîpguhêzî: Mela Birhanê Tarînî, Weş. Lîs, Diyarbekir 2016.
39. **Hezroyî**, Mela Ebdulfettahê, *Dîwan*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012.
40. **Hîkmet**, Bedran, *Dengbêj Geleneği*, Berhem: *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, Berhevkar: Vecdi Erbay, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2012.
41. **Hûnî**, Mela Mehemed Elî, *Mewlid, Yûsûf û Zelîxa&Qesîdeya Kerbela*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004.
42. **Izady**, Mehrdar R., *Bir El Kitabı Kürtler*, Doz Yayınevi, İstanbul 2013.
43. **İbni Hişam**, Muhemmed, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.2.
44. _____, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.3.
45. _____, *İslam Tarihi-Sireti İbni Hişam*, Weş. Ravza, İstanbul 2013, c.4.
46. **İmamî**, Nasrallah, *Mersîyeserayî Der Edebiyatê Farisî İran*, Weşanxaneyê Deftera Navendî ya Cihadê Danişgahî, Tehran 1369.
47. **İsen**, Mustafa, *Acıyı Bal Eylemek, Türk Edebiyatında Mersîye*, Weş. Akçağ, Ankara 1994.
48. _____, *Dile Duran Ölüm*, Weş. Kapı, İstanbul 2012.
49. **Kakeres**, Omêd, *Dîwana 'Arif 'Orfî*, Çapxaney Kamranî, Silêmanî 1985.
50. _____, *Dîwanê Selam*, Çapxaneyê El-Hewadis, Bexda 1990, c.2.
51. **Kardaş**, Canser, *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi (Dengbêjlik Ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme)*, Weş. Eğiten Kitab, Ankara 2017.

52. **Kerbelayî**, Şêx Mihemed, *Dîwana Kerbelayî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Îstanbulê, İstanbul 1992.
53. **Kirmanî**, Abdu'1-Rızâ Efseri, *Nigerişî be Mersîye-serâî der Îran*, Weşanxaneyê Ittila'at, Tehran 1371.
54. **Komasî**, Ehmed Begê, *Dîwan*, Amd.Muhemmed 'Elî Sultanî, (Wergêr: Gulsum Osmanpur) Weş. Viyan, Sine 2011.
55. **Kor**, Şêx Ehmedê, *Dîwan*, Saxkirin û Lêkolîn: Fener Rojbiyanî, (Berhem hêj nehatiye çapkirin û lêkolîna li ser berdewam dike.)
56. **Köksal**, M. Asım, *İslam Tarihi-Peygamberler Peygamberi Hazreti Muhammed ve İslamiyet*, Weş. Işık, İzmir 2011, c.7-8.
57. **Le Breton**, David, *Acının Antropolojisi*(Wergêr: İsmail Yerguz), Weş. Sel, İstanbul 2019.
58. **Liceyî**, Mela Mihemedê, *Dîwana Hadî*, amd. Tehsîn İbrahim Doskî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012.
59. **Mela Kerîm**, Muhemmedî, *Dîwanê Bêxûd*, Weşanxaneyê Kurdistan, Sine 1386, c.1.
60. _____, *Dîwanê Goran*, Çapxaneyê Korî Zanyarî Kurd, Bexda 1980, c.1.
61. **Mu'temen**, Zeynel 'Abidîn, *Şi'r û Edebê Fairisî*, Weş: Kitêbxaneyê İbnî Sîna, Tehran 1333.
62. **Muderris**, Mela Ebdulkerîm, *Dîwanî Nalî*, Weş. Selahaddîn Eyyûbî Navenda Weşanxaneyê Ferheng û Edebiyata Kurdî, Urmîyê 1976.
63. **Muhemmed Emîn**, Cemal Muhemmed, *Dîwanî Wîsalî*, Çapxaneyê Darul Cahiv, Bexda 1986.
64. **Mukrîyanî**, Hejar, *Bo Kurdistan*, Dezgehê Çap û Belavkirinê ya Aras, Hewlêr 2001.
65. **Mukrîyanî**, Kurdistan, *Dîwanê Esîr*, Pêdaçûmewe û Berawird: Ehmed Teqane, Weş. Aras, Hewlêr 2006.
66. **Nalbend**, Mele Ehmedê, *Baxê Kurda*, *Dîwana Mela Ehmedê Muxlis Kurê Emînê Nalbedê Bamernî*, Berhevkar: Tehsîn İbrahim Doskî, Berhema Hêj Neçapkirî.

67. **Onay**, Ahmet Talat, *Türk Halk Şiirinin Şekil ve Nev'i*, amd. Prof. Dr. Cemal Kurnaz, Weş. Akçağ, Ankara 1996.
68. **Pertev**, Ramazan, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Gotar:Sedat Ulugana, *Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê*, Çavkanî: Weş Avesta, İstanbul 2015.
69. **Pîremerd**, *Dîwan*, Latînzekirin: Newzad Hirorî, Weş. Nefel, Stockholm 2005.
70. **Qadir Mihemed**, Enwer, *Lîrikay Şa'irê Gewreyê Kurd Mewlewî*, Weş. Serdamco, Silêmanîyê 2007.
71. **Qani'**, *Dîwan*, Helbest: Şêx Mihemed Kabulî, Berhevkirin: Burhan Qani', Weşanxaneyê Panîz, Tehran 2014.
72. **Qeredaxî**, Mihemed Elî, *Dîwanî Wefayî*, Mîrza Ebdulrehîmê Sablaxî- Weş. Korî Zanyarî Kurd, Bexda 1978.
73. _____, *Dîwanî Mestûre Mahşeref Xanimî Erdalanî*, Weş. Aras, Hewlêr 1998.
74. _____, *Dîwanî Rencûrî*, Çapê Yekem, Weş. Afaqî Erebiyye, Bexda 1983.
75. **Qewmanî**, Şêx Muhemmed Hadiyê, *Dîwan*, amd. Muhemmed Seydaoğlu, Weş. Nûbihar, İstanbul 2011.
76. *Qur'ana Kerîm û Meala Wê ya Kurdî*, Werger. Fikrî Amedî, Weş. Ensar, Ankara 2014.
77. **Ritter**, Hellmut, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi Karşılaştırmalı Edebiyat Metinleri*, Editör: Mehmet Kanar, Weş. Ayrıntı, İstanbul 2011.
78. **Sadinî**, Xalid, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbihar, İstanbul 2013.
79. _____, *Feqîyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbihar, İstanbul 2014.
80. **Sahîbkiran**, Abdurrehman Beg, *Dîwanê Salim - Abdurrehman Begê Sahîbkiran-* Saxkirdinewe û Lêkdanewe: Mela Abdulkerîmê Muderrîs, Fatîh Abdulkerîm, Mihemedî Mela Kerîm, Amd: Sidiq Salih, Weş. Binkey Jîn, Silêmanî 2010, c.1.
81. **Saraç**, M.A., Yekta, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, Gökkuşe Yayınları, İstanbul 2012.

82. **Saraç**, M.A., Klasik Edebiyat Bilgisi, Belagat, Weş. Gökkubbe, İstanbul 2010.
83. **Saydun**, Edip, *Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî Di Dîwana Feqiyê Teyran de*, K.T. Zanîngeha Wan Yuzunci Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Wan 2018.
84. **Temo**, Selîm, *Antolojîya Helbesta Kurdî*, Weş. Agora, İstanbul 2019, c. II.
85. **Tendûrekî**, Mela Zahirê, *Dîwan*, amd. Mela Abdurrahman Biçici, Weş. Nûbihar, İstanbul 2007.
86. **Tîrêj**, Seydayê, *Dîwan(Xelat-Zozan-Cûdî)*, Weş. Peywend, İstanbul 2014.
87. **Turan**, Cihan, *Dîwana Mela `Ebdulfettahê Hezroyî-Metn û Vekolîn*, Weş. Banga Heq, İstanbul 2022.
88. **Weda`î**, *Dîwan*, Vejandin:Se`îd Dêreşî, Weş. Nûbihar, İstanbul 2012.
89. **Xeznedar**, Marûf, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.1.
90. _____, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.2.
91. _____, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.4.
92. _____, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.5.
93. _____, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Dezgehê Aras, Hewlêr 2001, c.6.
94. **Yıldız**, Ayhan, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî-1*, Weş. Lorya, İstanbul 2017.
95. **Zengine**, Mela Omer, *Dîwanî Rencûrî*, Weş. Afaq Erbeyt, Bexda 1983.
96. **Zinar**, Zeynelabidîn, *Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexkirî*, Weş. Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm 1991.

Gotar û Hevpeyvîn:

1. **Adak**, Abdurrahman; **Baluken**, Yusuf; **Acar**, Hayrullah, *Gora Feqiyê Teyran*, Kovara Nûbihar Akademî, İstanbul 2014, j.1, s.1. r.111-120.
2. **Atlı**, Zafer - **Güzel**, Şerif “*Mela Huseynê Balekî û Çend Helbestên Wî*”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Bingöl 2016, c.2, h.3, r.165-182.

3. **Bayram**, Mesut, *Enderunlu Fazıl'ın III. Selim Mersîyesi (İnceleme-Metin)*, Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi c.21, h.39, Haziran 2018, r.19-37.
4. **Bedirxan**, Silêman, *Ax Kurdistan*, Kovara Hawar, Weş. Belkî, İstanbul 2012, h.10, r.146.
5. **Çağmar**, M. Edib, *Seydayê Mele Elî û Nirxandina Wefatnameya Wî ji Alîyê Hunerên Edebî ve*, Kovara Kurdînameyê ya Navnetewî, j.4, Nîsan 2021, r.25-45.
6. **Çavuş**, M.Zeliha Stebler, *Türk Edebiyatında Mersîye*, Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Erzurum 2008, h.38, r.131-138.
7. **Deştî**, Osman, *Matemname Le Şî'ri Kurdî Da*, Kovara Wêje û Rexne, h.2, s.2014, r.182-201.
8. **Doskî**, Tehsîn İbrahim, *Sê Klasîkên Me Yên Nenas: Mela Hesên û Qasim û Mela Şems*, Kovara Kurdîname, Jimar: 7 Mijdar 2022b, r.161-164
9. **Ehmed**, Hêmin Omer, *Şîna Mela Xelîlê Mişextî*, Kovara Kelhaamed, s.13, h.15, Zivistan, İstanbul 2023, r. 21.
10. **Ertekîn**, M. Zahir, "Du Mersiyeyên Nû Li Cîhana Edeba Klasîk a Kurdî Zêde Bû" Kovara Nûbihar, s.2022, h.160, r.11-13.
11. _____ *Recmiyye/Le'netname Wek Cureyek Nezmê û Le'netnameya Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepe*, Şarkiyat, c.11, h.1, s.2019, r.36-51.
12. **Ezîzan**, Herekol (Celadet Bedirxan), *Klasîkên Me*, Kovara Hawar, İstanbul 2012, Weş. Belkî h.33, r.558-565.
13. _____, *Klasîkên Me*, Kovara Hawar, İstanbul 2012, Weş. Belkî h.6, r.82.
14. **Gariper**, Cafer, *Akif Paşa Ve Torunu İçin Yazdığı Mersîye Üzerine Bir Değerlendirme*, Hacettepe Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları, s.2, h.3, Payîz 2005, r. 51-70.
15. **Göçemen**, Yakup, *Cahiliyeden Endülüsün Yıkılışına Kadar Arap Edebiyatında Şehir Mersîyeleri*, Kilis 7 Aralık Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi 2020/1, c.7, h.1, r.270-320.

16. **Hakan**, Sinan, *Ji Wida hetta Mele Muhemmed Gulnarê Miksî û pêwendiya helbestvan û mîrên Miksê*, Kovara Nûbiharê, h.111, r.45-47.
17. **Karak**, M. Zana, *Bi Mexlasa "Feyzî" Du Helbestên Nû Yên Şêx Mistefayê Sîsî*, Kurdîname, j.5, Midar 2021, r.58-80.
18. _____, *Helbesta Şîna Şêx Selîm a Seydayê Xasî*, Kovara Nûbiharê, İstanbul 2021, h.156, r.82-84
19. **Kardaş**, Sedat, *Muşlu Şa'ir Nûrî'nin Adnan Menderes'e Yazdığı Kürtçe Mersiyeler*, Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, c.10, h.1, Hazîran 2021, r.9-11.
20. **Kaska**, Çetin, *Fars Edebiyatında İlk Mersîyeler*, Rûmelide Dil Ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, s.2019, h.145, r.253-262.
21. **Kaynar**, Cihan, *Di Dengbêjîyê De Li Dor Temaya Şer û Kuştinê Nirxandina Klamên Şînê*, The Journal of Mesopotamian Studies, c.3/2 Summer: 2018, r.65-94.
22. **Korkmaz**, Seyfullah, *Tokatlı Sâir Rızâî Ishâk b. Hasan'ın Bir Mersîyesi*, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, h.12, s.2002, r.185-202.
23. **Köprülü**, Fuat, *Bizde Mersiye ve Mersiyeciler*, Yeni Mecmua, İstanbul 1917, h.17, r.324-328.
24. _____, *Bizde Mersiye ve Mersiyeciler*, Yeni Mecmua, İstanbul 1917, h.16, r.305-308.
25. **Mengi**, Mine, *Eski Edebiyatımızın Mersîyelerine Toplu Bir Bakış*, Türk Dili ve Edebiyatı Araştırmaları Dergisi II, Prof. Dr. Harun Tolasa Özel Sayısı, İzmir, 1983, r.91-101.
26. **Neya**, Nasır Mohseni Neya - Kırmani, Arezou Porizdan Penah, *Mersîyeserayî Der Edebê Farisî û 'Erebî*, Edebiyatê Tetbîqî, s.2, h.8, r.175-193.
27. **Qedrîcan**, *Tabûta Bixwîn*, Kovara Hawar, Weş. Belkî, İstanbul 2012, h.11, r.166.
28. **Selçuk**, Ersin, *İran Edebiyatında Mersîye Türleri*, Doğu Araştırmaları, s.2013, h.2, r.5-22.
29. **Serfiraz**, Mesud, *Mersîye û Di Edebiyata Kurdî de Mersîye*, Kovara Nûbiharê, h;120, s.2012, r.30-33.

30. **Seyarî**, Ahmet, *Mersîyeyên Mela Zahirê Tendûrekî ji Alîyê Tema, Ziman û Hunerên Edebî ve*, Kovara Nûbiharê, h.147, s.2019, r.32-36.
31. _____, *Mersîyeyên Mela `Elîyê Baqûstanî Ji Alîyê Tema, Ziman, Teşe û Hunerên Edebî ve*, Kovara Nûbiharê, h.148, s.2019, r.44-49.
32. **Taşkın**, Hanefî, *Du şîrên li ser Şêx Muhammed Diyauddîn yên Mela Zubeyr û Mela Abid*, Kovara Nûbiharê, h.140, s.2017. r. 54-59.
33. _____, *Mela Hesenê Kaçkarî û Mersîyeyên wî yên li ser Şêx Maşûq*, Kovara Nûbiharê, Payîz 2017, h.141, r.88-92.
34. **Tek**, Ayhan, *Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Mukaddîme, h.3, s. 2010, r.41-60.
35. **Ulugana**, Sedat, *Di Kurdolojîyê de Keşfeke Nû: Xewsî û Dîwana Wî-Sedsala XVIII-*, Kovara Nûbiharê, İstanbul 2016, h.137, r.4-9
36. **Xoşnaw**, Hêmin Omer, *Şir`ê Şiwen li Edebî Kurdî da*, Kovara Taybetî Şi`r û Rexne, <http://zaan.blogfa.com/post/179> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat: 00.56.)
37. **Yerdelen**, Cevat, *Azmizade Haleti`den Bir Mersîye*, A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Erzurum 1999, h.12, r.133-141.
38. **Yörür**, Ali, *Hasan Daniş Bey`in Kerbela Mersîyesi*, Hikmet Edebiyat Dergisi, Prof. Dr. Ali Nihad Tarlan Özel Sayısı, s.4, Berfanbar 2018, r.680-694.
39. **Zinar**, Zeynelabîdîn, *Feqîyê Teyran*, Nûdem, s.1992, h.3, r.84-86.

Tez:

1. **Abed**, Athraa Abdullah Abed, *El- Ferazdak`in Şiirinde İslam`ın ve Ehl-i Beyt Sevgisinin Etkisi*, T.C. Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı Arap Dili Ve Belagatı Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, 2019 Kayserî.
2. **Arslan**, Mesut, *Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme)*, T.C. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Teza Doktorayê ya neçapkirî, Diyarbekir 2021.

3. **Aykaç**, Yakup, *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Doktora Tezi, Diyarbakır 2020.
4. **Beyter**, Önder, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî*, Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2012.
5. **Çelik**, Bilal, *Hafız İbrahim'in Divanındaki Mersîyeler ve Tercümeleri*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri Anabilimdalı, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul 2019.
6. **Çetîn**, Ramazan, *Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm*, K.T. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2019.
7. **Demir**, Yunus, *Dîwana Namî(Fehmî Begê Pêçarî): "Meğmuru'd Dewawîn"*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2019.
8. **Güven**, Abdullah Muaz, *Sahâbe-i Kirâm'ın Hz. Peygamber İçin Yazdıkları Mersîyeler*, T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslâm Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı Türk-İslâm Edebiyatı Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Konya 2017.
9. **Güzel**, Abidin, *İbni Abdirabbihin el-İkdul Ferid Adlı Eserinde Taziye ve Mersîye*, T.C. İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlahiyat Fakültesi Temel İslâm Bilimleri Arap Dili ve Belagati Anabilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Malatya 2020.
10. **İbrahim**, Akram Baqer, *Irak Türkmen Mersîyelerinin Halk Bilimi Açısından İncelenmesi*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı Türk Halk Edebiyatı Bilim Dalı, Teza Doktorayê İstanbul 2019.
11. **Jasim**, Saad Yousif, *Endülüs Mersîyesi'nin Tercüme Ve Tahlili*, T.C. Erzincan Binali Yıldırım Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Erzincan 2019.
12. **Karak**, M. Zana, *Dîwançeya Şêx İsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*, K.T. Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2020.

13. **Karakuş**, Yasemin, *Seyyid Nizamoğlu Mersîyelerini İçeren Bir Şiir Mecmuası: Mecmû'a-i Kasaid*, T.C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul 2014.
14. **Mawaldı**, Zahraa, *Endülüs Döneminde Şehirler Hakkında Yazılan Mersîyeler*, T.C. Necmettin Erbakan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Anabilim Dalı Arap Dili Ve Belâgati Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, Konya 2020.
15. **Refîq**, Aşna Celal, *Lawandinewe li Şî'ri Kurdî Kurmancî Xwar da*, Fakulteya Ziman a Zanîngeha Silêmanîyê, Teza Masterê, 2011 Silêmanîyê.
16. **Tîfîz**, *El-Cewahîru'r Reşadiye Fî Sîretî'n Nebewîyye Ya Mela Nûrûllahê Godişki* (Metn û Lêkolîn û Ferheng), Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Bîngol 2020.
17. **Toprak**, M. Faruk, *Endülüs Şiirinde Mersîye*, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doğu Dilleri Ve Edebiyatları Arap Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Doktora Tezi, Ankara 1990a.
18. **Yılmaz**, Mehmet Yalçın, *Türk Din Musikisinde Mersîyeler ve Mersîyehanlar*, T.C. Marmara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlahiyat Anabilim Dalı İslam Tarihi ve Sanatları Bilim Dalı, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul 2006.

Ferheng:

1. **Develioğlu**, Ferit, *Osmanlıca Türkçe Andisklopedik Lugat*, Weş. Aydın Kitap Evi, Ankara 2017.
2. **Farqînî**, Zana, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya İstanbulê, İstanbul 2011.
3. **Ferhenga Bradost**, *Lawandin*,
<https://bradost.net/ferheng/?name=%D9%84%D8%A7%D9%88%D8%A7%D9%86%D8%AF%D9%86> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat:00.47.)

4. **Ferhengî Anahîta**, Lawandinewe, <https://ferheng.info/alfba/39199/> (Jêgirtin:29.03.2023, Seat:00.47.)
5. **Hayig**, Rosan, *Zazaca-Türkçe Sözlük ve Türkçe-Zazaca Sözcük Listesi*, Weş. Tij, İstanbul 2012.
6. **Îzolî**, D. *Ferheng(Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî)*, Weş. Deng, İstanbul 2013.
7. **Kanar**, Mehmet, *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Weş. Say, İstanbul 2011.
8. **Naci**, Muallim, *Lugat-ı Nacî*, Weş, Asr, İstanbul, 1990.
<https://ia802907.us.archive.org/26/items/lgatnaci0001na/lgatnaci0001na.pdf>
(Dîroka Jêgirtinê: 22.05.2021, Seat:21.57)
9. **Pala**, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, İstanbul 2014.
10. **Redhouse**, Sir James W. *Lexicon, Turkish And English Lexicon*, Weş. Pirtûkxaneya Libnanê, Beyrûd 1987.
[https://turuz.com/storage/Dictionary/2016/0806-A Turkish And English Lexicon-Shewing In English-The Significations Of The Turkish Terms-James William Redhouse-1987-2246s.pdf](https://turuz.com/storage/Dictionary/2016/0806-A%20Turkish%20And%20English%20Lexicon-Shewing%20In%20English-The%20Significations%20Of%20The%20Turkish%20Terms-James%20William%20Redhouse-1987-2246s.pdf) (Dîroka Jêgirtinê:22.06.2021, Seat:21.20)
11. **Sami**, Şemseddin, *Kamûs-i Türkî*, İstanbul 1978.
<https://www.pdfdrive2.com/kamus-i-t%C3%BCrki-d156729280.html> (Dîroka Jêgirtinê: 16.06.2021, Seat:22.45)
12. **Şenates**, Şaban, *Ferhengê Zazakî Dimilî-Kurmancî-Tirkî*, Weş. Nûbihar, 2022 İstanbul.
13. **Şîn**, <https://ku.wiktionary.org/wiki/z%C3%A4mar>, Jêgirtin: 15.02.2023. Seat: 12.03.)

Ansîklopedî:

1. **Canan**, İbrahim, *Hadis Ansiklopedisi, Kütüb-i Sitte*, Weş. Akçağ, Ankara 2019, c.15.
2. **Çetin**, Nihad M., “*Arûz*”, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, İstanbul 1991, c.3, s. 424-437.
3. **Güngör**, Şeyma, “*Maktel-i Hüseyin*”, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2003, c. 27, r.456-457.

4. **İsen**, Mustafa, *Mersîye(Türk Edebiyatı)*, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004, c. 29, r.218-219.
5. **Toprak**, M. Faruk "*Mersîye*", Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004, c. 29, r.215-217.
6. **Topuzoğlu**, Tefik Rüştü, "*Hezec*", DİA, İstanbul 2007, c.17, r.1998, r. 302. /r.302-304.
7. _____, "*Remel*", DİA, İstanbul 2007, c.34, r.553 /r.553-554.
8. **Yazıcı**, Tahsin, *Mersîye(Fars Edebiyatı)*, Türkiye Diyanet Vakfı İslâm Ansiklopedisi, Ankara 2004, c.29, r. 217-218.
9. **Jewish Encyclopedia**, New York, London, 1905, c. I, r.48- 49
<https://jewishencyclopedia.com/articles/216-abel> (Dîroka jêgirtinê:01.12.2021, Seat:15.21.)

Destxet, Metnên Wordê û Qeyda Deng:

1. **Bidlîsî**, Mela Ezîz, *Dîwana Şeyda*, Nusxeya Destxetê.
2. **Çoxreşî**, Şêx Ebdurrahmanê, *Qewî îro ze `îf halim*, Destxeta neçapkirî û bêreqem a Mehmet Firat.
3. **Sidîq**, Mela, *Cerg û Dilê Min Kir Birîn Deng û Nidaya Rihletê*, ev mersîyeya ku li ser Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî hatiye nivîsîn ji destxeta Mela Ehmed Yalar a bêçap û bêreqem hat girtin.
4. **Hezrowî**, Mela Ebdurrahman, *Hicreta sahib cemalî ey gelê yarê zebûn*, ev mersîyeya ji destxeta Mela Ehmed Yalar a bêçap û bêreqem hat girtin.

Rojname

- 1.**Rojname Evro**, h. 2150, s. 16.07.2017, r.13.

Sempozyum

1. **Adak**, Abdurrahman , *Helbestvanên Klasîk Yên Herêma Hekarî, Analîz û Nirxandineke Giştî*, Uluslararası Zap Havzası Uleması Sempozyumu, Hakkari Üniversitesi, 21-23 Ekim 2022e, r. 239-252.
2. _____, *Helbestên Kurdî Yên Li Ser Bediuzzeman Se 'îdê Nûrsî Hatine Nivîsîn, Di 50 Salîya Wefata Wî de Sempozyuma Bediuzzeman Se 'îdê Nûrsî*, Weş. Nûbiharê, İstanbul 2011c.
3. _____, *Siirt Şîrnak Silvan ve Lice Şa'irleri*, Mêrdîn 2012d, metna wordê ya ku jê hatiye girtin, r. 109.(Ev çavkanî wek word ji Mamoste Abdurrahman Adak hat girtin.)

Çavkaniyên Dîjîtal:

1. "Lawandin", <http://mb-soft.com/believe/tasm/lamentat.htm> (Jêgirtin: 29.03.2023, Seat:00.47.)
2. Mersîye ya ku ji teref Exûl ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, "Be Carê Malî Wêranîm Silêmanî Xiroşawe", <https://books.vejin.net/ck/text/3501>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 11:12.)
3. Mersîyeya ku ji teref Esîrî ve li ser Şêx Muhemmed 'Elî hatiye nivîsîn, "Mirdin Êsteka Lekwêy Deysawere", <https://books.vejin.net/ck/text/23528>, (Jêgirtin: 12.05.2022. Seat: 21:13.)
4. Mersîyeya ku ji teref 'Asî ve li ser Şêx Mahmud hatiye nivîsîn, "Felek Şîn e Le Ber Şîwen Melek Pir Zar e Lem Zar e", <https://books.vejin.net/ck/text/25930>, (Jêgirtin: 12.05.2022. Seat: 21:13.)
5. Mersîyeya ku ji teref Cewherî ve li ser şîna Şêx Evdilqadirê Nehrî û hevrêyên wî hatiye nivîsîn, "Refêqan Ba Bikeyn Şîwenke Wextî Hicrî Yarane", <https://books.vejin.net/ck/text/3112>, (Dîroka Jêgirtinê: 25.06.2022. Seat: 15:13.)

6. Mersîyeya ku ji teref Exûl ve li ser bavê xwe hatiye nivîsîn, “*Heta Rojî Dexûlî Min bi Seywan*”, <https://allekok.ir/poet:33/book:1/poem:43>, (Jêgirtin: 03.01.2023. Seat:12:05.)
7. Mersîyeya ku ji teref Faîq Bêkes ve li ser Mihemed Emîn Zekî Beg hatiye nivîsîn, “*Şînî Mihemed Emîn Zekî Beg*”, <https://books.vejin.net/ck/text/29026> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:15:12.)
8. Mersîyeya ku ji teref Faîq Bêkes ve li ser wefata Mehmûd Cewdet hatiye nivîsîn, “*Şînî Mehmûd Cewdet*”, <https://books.vejin.net/ck/text/28944> , (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12:55.)
9. Mersîyeya ku ji teref Hemdî ve li ser bajar hatiye nivîsîn, “*Salî Carê Her Debê Em Şare Bête Mezbele*”, <https://books.vejin.net/ck/text/4557>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:23:33.)
10. Mersîyeya ku ji teref Hemdî ve li ser niştîman hatiye nivîsîn, “*Çûn Zemanî Xame*” <https://books.vejin.net/ck/text/4550> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:12.34.)
11. Mersîyeya ku ji teref Hêmin Mukrîyanî ve li ser Goran hatiye nivîsîn, “*Şînî Goran*”, <https://books.vejin.net/ck/text/1203> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:15:15.)
12. Mersîyeya ku ji teref Kamran Mukrîyanî ve li ser Şêx Mehmûd nivîsandîye, “*Şêx Mehmûdê Nemir*”, <https://books.vejin.net/ck/text/3701>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12:25.)
13. Mersîyeya ku ji teref Mîrza Ebdurrehîmî Wefayî ve li ser Şêx Ubeydullahê Şemzînî hatiye nivîsîn, “*Derîxa Bayê Xezan*”, <https://books.vejin.net/ck/text/1784> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat:23:34.)
14. Mersîyeya ku ji teref Muftî Pêncwênî ve li ser dûrbûna welat hatiye nivîsîn, “*Pêncwên bebê to nêzîke mergim*”, <https://books.vejin.net/ck/text/3037>, (Jêgirtin: 01.01.2023. Seat:03:33.)
15. Mersîyeya ku ji teref Pîremerd ve li ser mijara niştîmanî hatiye nivîsîn, “*Hatin Şehîdekan be Cilî Sorî Xwînewe*”, <https://books.vejin.net/ck/text/35231> (Jêgirtin: 22.06.2022.Seat: 23.45.)

16. Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser bajêr hatiye nivîsîn, “*Elweda ‘ Ey Mulkê Baban Elweda ‘*”, <https://books.vejin.net/ck/text/4073>, (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 00:12.)
17. Mersîyeya ku ji teref Salim ve li ser niştîman hatiye nivîsîn, “*Lêm Gerîm Ba Girye Kem Dîdem Be Dîdeî Xûneşan*”, <https://books.vejin.net/ck/text/4104> (Jêgirtin: 25.06.2022. Seat: 12.12.)
18. Mersîyeya ku Kakay Fellah li ser dostê xwe nivîsîye, “*Ey Mamoste we ey hewrê...*”, <https://allekok.ir/poet:56/book:1/poem:62>, (Jêgirtin: 06.01.2023. Seat:22.12.)
19. Mersîyeya ku Kamran Mukrîyanî li ser hevrê/dostê xwe Hesên Tefwîq nivîsandiye, “*Şeweyê Ciwanet Hîwa û Taset*”, <https://books.vejin.net/ck/text/3708>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat:22:25.)
20. Mersîyeya ku Mela Mustafayê ‘Asî li ser şehîdên Filistînê nivîsîye, “*Muslimanan Temaşe Kin Leber Şîwen Felek Şîne*”, <https://books.vejin.net/ck/text/25938>, (Jêgirtin: 04.01.2023. Seat:22.12.)
21. Mersîyeya ku Mewlewî li ser mirina xwe nivîsîye, “*Ney Gehwarey Dewr Tay Desraze Xem*”, <https://books.vejin.net/ck/text/234> , (Jêgirtin: 23.06.2022. Seat:22.05.)
22. Mersîyeya ku Qani‘ li ser welêt nivîsîye, “*Şîwenî Niştîman*”, <https://books.vejin.net/nk/text/6989>, (Jêgirtin: 06.01.2023. Seat:21.06.)
23. Mersîyeya ku Wefayî li ser dûrbûna ji welêt nivîsandiye, “*Nîgara Dilbera Namîhreban*”, <https://books.vejin.net/ck/text/1074>, (Jêgirtin: 22.06.2022. Seat: 15:34.)
24. Şêx Ehmedê Kor, *Dîwan*, <https://books.vejin.net/ck/book/26370> (Jêgirtin: 22.01.2023. Seat:21:21.)
25. Şêx Selîm Efendî “*Gelo qutbê Xweda dabû ku sed heyf çû ji dinyayê*”, <https://www.youtube.com/watch?v=SFns7RbcVQc> (Dîroka Jêgirtinê: 20.04.2023, Seat: 13.32)

PÊVEK:

Pêvek 1: Lîsteya temamê mersîyenûs û mersîyeyên ku li ser wan xebat hat kirin digel kesê ku li serê mersîye hatiye nivîsîn û her wisa teşe, qalib û behra mersîyeyê nîşan dide.

Mersîyenûs	Li Ser Kî ye	Teşe	Qalib	Behr
Feqîyê Teyran	Ne Diyar e	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Ehmedê Xanî	Muhemmed Begê Purbelalî	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Mela Huseynê Bateyî	Li ser xwe	Murebbe´	mefa' ilun mefa' ilun	Hezec
Axayokê Bêdarî	Lawên xwe	Muxemmes	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Qasim	Ebdullah	Murebbe´	fa' ilatun fa' ilatun	Remel
Evdilqadirê Hekarî	Mela Huseynê Bateyî	Murebbe´	mefa' ilun mefa' ilun	Hezec
Xewsî	Mîr Mustafa Beg	Murebbe´	mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Şêx Ehmedê Kor	Mirin	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun	Remel
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun	Remel
Şêx Ehmedê Kor	Hz. Muhemmed	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun	Remel
Şêx Ehmedê Kor	Seyyîd Taha	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun	Remel

Şêx Muhemmed Xelîfe	Şêx Ebdurrehmanê Taxî	Murebbe´	mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Şêx Ebdurrahmanê Çoxreşî	Seyyîd Sibxatullah Erwasî	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Weda´î	Şêxê Begî Miksê	Qesîde	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Esamî-Mela Meqsûd	Hevser	Xezel	mefa´îlun mefa´îlun fe´ûlun	Hezec
Ebdullahê Mexrîbî	H. Muhammed	Murebbe´	mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Şêx Hemza Hîmmedullah	Sûltan Memdûh	Murebbe´	mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Şêx Selîmê Gêxî	Şêx Ehmedê Çanî	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Şêx Mustafayê Sîsî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Murebbe´	mefa´îlun mefa´îlun fe´ûlun	Hezec
Mela Mihemedê Liceyî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Muxammes	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun	Remel
Mela Mihemedê Liceyî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Muxammes	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Mela Mihemedê Liceyî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Tercî´bend	mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Mela Mihemedê Liceyî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Murebbe´	mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Şêx Evdirrehmanê Aqtepî	H. Huseyîn	Mesnewî	feûlun feûlun feûlun feûl	Muteqarib
Şêx Esed Çoxreşî	Mela Xelîl	Qesîde	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun	Remel

Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Fethullahê Werqanisî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Fethullahê Werqanisî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx 'Elaeddîn Oxînî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulezîzê Bidlîsî	Şêx Ebdurrehmanê Taxî	Murebbe'	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Şêx Evdilqadirê Hezanî	Şêx Ebdurrehmanê Taxî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Mûsayê Mizî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Muxemmes	mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun	Hezec
Mela Ehmedê Xasî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Şêx 'Eskerî	Muhemmed Kerbelayî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Şêx Meczûb	Şêx Husameddîn	Qesîde	fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun	Remel
Mela Ebdulkerîm Îbrahîm	Ehmedê Nalbend	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun	Recez

Mela Ebdurrehmanê Hazrowî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Murebbe´	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilun	Remel
Şêx Silêman	Şêx Zeynelabîdîn	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Molla Mahmud	Şêx Hezîn	Muxemmes	mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Molla Mahmud	Mela Mustefa Barzanî	Mesnewî	mef´ûlu mefa´ilun fe´ûlun	Muzari´
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun mefa´îlun	Hezec
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun fa´ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Murebbe´	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mef´ûlu fa´ilatun mef´ûlu fa´ilatun	Muctes
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Xezel	mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun mustef´ilun	Recez

Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî				
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Museddes	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Murebbe'	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun	Recez
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun	Hezec
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun	Remel

Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Tercî' bend	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Fethûllah	Xezel	mef'ûlû fa'îlatun mef'ûlû fa'îlatun	Muctes
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Fethûllah	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Mela Zahirê Tendûrekî	Şêx Fethûllah	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Remel
Şêx Muhemmed Hadiyê Qew.	Şêx Mustafayê Sîsî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Şêx Muhemmed Hadiyê Qew.	Şêx Mustafayê Sîsî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Şêx Muhemmed Hadiyê Qew.	Li ser Dîn	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Şêx Muhemmed Hadiyê Qew.	Şêx Muhemmed Çanî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Remel
Şêx Mihemed Kerbelayî	Hz. Huseyn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Şêx Celaleddîn Eskambevî	Şêx Zeynelabidinê Fersafî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Evdîrrehîm Rehmî Hekkarî	Welat	Tercî' bend	mustef'îlun mustef'îlun	Recez
	Hemzayê Miksî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun	Muzar'
Şêx Xiyaseddîn	Celadet Bedirxan	Qesîde	mef'ûlu mefâîlu mefâîlu feûlun	Hezec
Mela Ehmedê Nalbend	Şêx Xiyaseddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun	Remel

Mela Ehmedê Nalbend	Şêx Tahayê Mayî	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe´	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Xezel	mustef' iun fa' ilun mustef' iun fa' ilun	Besîd
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe´	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Murebbe´	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Xezel	mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun	Hezec
Mela Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Xanima Xwe Fehîma	Terkîbbebd	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Mela Ehmedê Nalbend	Xanima Xwe Fehîma	Qesîde	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Şêx Heybetullah Abirî	Şêx Fethûllahê Hamîdî	Muxemmes	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Şêx Heybetullah Abirî	Şêx Seyfeddînê Hamîdî	Muxemmes	fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun	Remel
Molla Isamuddîn	Şêx Hezîn	Qesîde	mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun mefa' ilun	Hezec
Mela Muhemmedê Seyda	Şêx Ebdullah	Mesnewî	mefa' ilun mefa' ilun	Hezec

Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Murebbe'	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Zîyaûddîn	Qesîde	fa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx 'Evdilqadirê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Remel
Mela Ebdulfettahê Hezroyî	Xoce Se'îd	Muxemmes	fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun	Hezec
Seyid 'Eliyê Findikî	Se'îdê Nûrsî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Seyid 'Eliyê Findikî	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Seyid 'Eliyê Findikî	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Seyid 'Eliyê Findikî	Şêx Îbrahîm Heqqî	Xezel	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Celadet Bedirxan	Şêx Evdirrehmanê Garisî	Mesnewî	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel

Mela Nûranî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Muselles	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Seydayê Mela Omer	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Kamiran Bedirxan	Şêx Evdîrrehmanê Garisî	Mesnewî	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Zubeyr Bildirici	Şêx Muhemmed Zîyaeddîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Şêx Ebdurrahmanê Şawûrî	Şêx Îbrahîmê Heqqî	Mesnewî	muftê'îlun muftê'îlun fa'îlun	Serî'
Seyîd Qedrî Haşimî	Şêx 'Elî Husamettîn	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Molla Reşîd Comanî	Şêx Evdilqahhar	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Ruşdî Efendî	Seyda Muhemmed Hadî	Qesîde	mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun	Muctes
Mela Muhemmedê Saricanî	Şêx Mustafayê Sîsiyê	Mesnewî	mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun	Muctes
Silêman Bedirxan	Welat	Tercî'bend	mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mirad 'Elî	Li ser xanima xwe	Muxemmes	mustef'îlun mustef'îlun	Hezec
	Li ser xanima xwe	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Recez
Cegerxwîn	Şêx Kemal	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Cegerxwîn	Lawê xwe Xurşîd	Murebbe'	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun	Muzari'
Cegerxwîn	Leyla Qasim	Tercî'bend	mustef'îlun mustef'îlun	Recez

Cegerxwîn	Stalîn	Tercî' bend	mef'ûlu mefa' ilun fe'ûlun	Muzari'
Cegerxwîn	Hişyar	Xezel	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa' ilun	Remel
Cegerxwîn	Osman Sebrî	Qesîde	mefa' ilun mefa' ilun fe'ûlun	Hezec
Cegerxwîn	Welat	Tercî' bend	mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Cegerxwîn	Welat	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa' ilun	Remel
Cegerxwîn	Welat	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Cegerxwîn	Welat	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa' ilun	Remel
Cegerxwîn	Welat	Xezel	fa'ilatun fa' ilun	Remel
Cegerxwîn	Amed	Qesîde	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun	Remel
Mela Yasîn Yusrî	Li ser xanima xwe	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
Ehmedê Namî	Haco Axa	Mesnewî	mef'ûlu mefa' ilun fe'ûlun	Muzari'
Mela 'Ebdussemed Comanî	Se'îde Nûrsî	Xezel	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez
	Se'îde Nûrsî	Muxemmes	fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa' ilun	Remel
Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Qesîde	mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun	Recez

Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Ebdilqadirê Hezanî	Tercî' bend	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Yahyayê Çoqreşî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Hezec
Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Yahyayê Çoqreşî	Murebbe'	mefa'îlun mefa'îlun	Recez
Şêx Îsmetullahê Karazî	Şêx Muhemmed Selîmê Hezanî	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Recez
Şêx Îsmetullahê Karazî	Seyîd Sibxetullah Erwasî	Muselles	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Hesenê Qerenazî	Şêx Masûm	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela Hesenê Qerenazî	Şêx Maşûq	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela Hesenê Qerenazî	Şêx Maşûq	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Fehmî Begê Pêçarî	Şêx Se'îd	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Fehmî Begê Pêçarî	Hz. Huseyîn	Qesîde	failatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Fehmî Begê Pêçarî	Li ser birayê xwe Cewdet	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Fehmî Begê Pêçarî	Li ser qîza xwe	Qesîde	fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun	Remel
Qedrî Can	Şêx Ebdurrehmanê Garisî	Murebbe'	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun	Muzari'
Qedrî Can	Mehemedê Seyda	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec

Mela Xelîlê Zoqeydî	Şêx Mahmudê Karakoyî	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela Hesenê Kaçkarî	Şêx Maşûq	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Şêx Bahaeddin	Şêx Zeynelabidîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
B.Ferîdun	Şêx Evdirrehmanê Garisî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun	Muzari'
Mela Sidîq	Şêx Muhammed Selîmê Hezanî	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela 'Ebdulhadiyê Comanî	Molla Muhyeddîn	Murebbe'	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela 'Ebdulhadiyê Comanî	Se'îdê Nûrsî	Murebbe'	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Seydayê Helîm	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Lawê xwe Wehîd	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Mela 'Eliyê Baqûstanî	'Elî bîn Mela Muhammed	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Şêx Seyfeddîn	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Şêx Seyfeddînê Ehmedî	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Şêx Seydayê Cizîrî	Qesîde	mustef'îlun fe'ûlun mustef'îlun fe'ûlun	Munserih'
Mela 'Eliyê Baqûstanî	Şêx Seyfeddînê Mardînî	Muxemmes	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel

Mela Nûrullahê Godişkî	Adnan Menderes	Qesîde	mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	Recez
Mela Nûrullahê Godişkî	Adnan Menderes	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Mela Nûrullahê Godişkî	Adnan Menderes	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel
Seydayê Tîrêj	Mistefa Barzanî	Mesnewî	mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun	Muzari'
Seydayê Tîrêj	Idrîsê Barzanî	Mesnewî	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Leyla Qasim	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Kemalê Ehmed	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Seydayê Tîrêj	Mihemed 'Elîyê Şiwêş	Mesnewî	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun	Remel
Seydayê Tîrêj	Ehmedê Menco	Mesnewî	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Şêxmûsê kurê Se'îdoyê Gaso	Mesnewî	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Qenatê Kurdo	Mesnewî	mustef'îlatun mustef'îlatun mustef'îlatun mustef'îlatun	Recez
Seydayê Tîrêj	Rewşen Bedirxan	Qesîde	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Tehsîn Taha	Murabbe'ê	mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Hezec
Seydayê Tîrêj	Mihemed Şêxo	Qesîde	fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Remel

Mela Tahayê Mayî	Şêx Se'îd	Qesîde	mefa'îlun(4)	Remel
Mela Xelîlê Mişextî	Hêmin Mukrîyanî	Xezel	mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Hezec

